

•

Li ser bûna jîra jîrê

•

Abdusamet Yîgît

Weşanên Han

·
·
·
·
Li ser bûna jîra jîrê
Weşanên SORAN e

·
berlin 2013

Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpîrsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han

·
email: han-grafik@hotmail.de

·
Bûlowstr. 56-57 10783 Berlîn

·
ISBN 978-3-942735-33-9

Pêşgotin:

Ziman û felsefe, bi hevdû ve ji navikê ve girêdayî na. Lê çendî ku hevdû bi hevdû ve ji navikê ve girêdayîna, evçendî ziman û felsefe bi hevdû re ji navikê ve bi civatê û pêşketina wê ve girêdayî na. Pêşketina civatî, li ser ziman û felsefê re dibêt. Ku em li dîroka civatê binerin, weke civatên kurd û hwd, em dibînin ku 'kevneşopî', pirr bi giringî û heyînî û her wusa serdestî hena. Kevneşopî, bi gotinî hebûna wan, weke destûrên heyînî ku hebûna civatê bi rêve dibin û pêş dixin û hwd, hena. Ziman, salixkirina gotinên wê û rengê gotinên wê, rengê pêşketina civatê jî didina dîyarkirin. Bo vê yekê, ziman dibe 'nasnema' bo heyînîya civatî û mirov bixwe jî.

Hûrîyan, weke ku çawa ku î ro jî di kurdî de ji ziman re gotina 'ziman' dihê bikarhanîn, di dema xwe de hûrîyan bi rengê «zaman» û ankû «zûwan» û hwd, navê ziman hanîna ser ziman. Bo civatekê, sînorê wê û pêşketina wê û reng û heyînîya pêşketina wê, ku mirov li zimanê wê û pêşketin û awayê bikarhanîna wê binerê, mirov fahm dike. Bo vê yekê jî, felsefe, hinekî, çendî ku bi heyînîya wê hizrî, emwê dihênina ser ziman, li ser temenê salixkirina gotinan, bi kirde, wate û lêkerîya li wan re xwe diafirêne. Bi wê re jî, têgihîştina bi teybetî weke hiş ku bi hişarî di derbarê wê gotinê, kirdeya wê, wateya wê û lêkerîya wê û hwd jî, rengê felsefeya hemdem a şariştanî dihêne ser ziman. Felsefe, rengê jîyane şariştanîyê bi pêşketina wê re dike temenê xwe de û pêş dikeve. Dema ku em li dîroka wê binerin jî, em vê yekê dibînin. Lê hertimî, hewldanên dîtina 'rê' û 'aliyê ku têre çûyin bibe' jî, biqasî wê gotina 'dîtina rê' giringa û felsefeyê di jîyanê de bi heyînîya civatê serî li wê watandîya. Kifşkirina pêşketinê û bitêgihîştinkirina wê, bi wê re li heyîna civatî û dîroka wê hizirîn, her wusa bi demê re di nava jîyane me ya ku pêşdikeve re bûya. Ev jî, renegekî hizirkirinê ya ku em dikarin bi navê hiziratiyê(felsefeyê) werênina ser ziman in.

Piştî dema kevnera, dema serdema navîn tê. Piştî serdema navîn jî dema 'ronasans'ê tê. Piştî wê re jî, êdî wê demên aqil li dûv hevdû bi jîyane mirov re pêşbikevin. Bi wê re jî, salixkirina van deman bi serê xwe di nava aqil de bûya. Minaq, 'serdema navîn' weke serdemeka ku di wê de "hînkirinê" hatîya salixkirin. Di wê dema hînkirinê de fêrkirina aqil û li ser aqil bûya. Bi wê fêrkirinê re, êdî rewakirin jî bûya. Di aslê xwe de,

ronasans li ser wê re bûya. Piştê demên aqil ên piştê jî, li ser wê û pêşketina ronansê re bûna. Bi wê hewldanên "fahmkirinê" bênavber hebûna xwe bi aqil û pêşketina aqil re domîyana.

Bi wê re, çendî ku fêrkirin pêşketîya, hînkirin jî bûya. Çendî ku hînkirin jî bûya, rawakirin li ser jîyane mirov re bi dîrokê û hizirkirina bi wê re pêşketîya. Di vê yekê de, felsefê, weyneka dîrokî bo pêşketina civatî a civakan leyîstîya. Piştî pêşketin û têrîtîya bi tîrîtîya bi felsefê re, êdî gotina felsefe cihê xwe ji ya 'zanyarîyê' re hiştîya. Bi wê re, êdî rengê hizirkirinê li ser pêşketinê û heyînîyê û her wusa civatîtîyê pêşketîya. Di roja me de, gotina 'zanyarîyê' ya ku serdestîya xwe denezendîya, di wê îdîayê de ku serdestîya li cihê ya felsefê û olê bihevdu re bicih bikê ya. Pêşketina,, beşên zaneyarîyê ku 'genetîkê' lédikolin, beşên civaknasiyê ku civatê lédikolin, beşên deronîyê û hwd ku keseyetîyê û hwd lédikolin û hwd jî, bi pêşketina xwe re ne tenê rewşeka mazin ya pêşketinê bi têgihîştinê re dihênina li ser holê, her wusa dibina beşna zanistî ku êdî pêwîstîniya wan jîyanî bi jîyane mirov û civatê re dihê li holê na. Divê temenê de, biaqil hizirkirina wê êdî giring dibe. Felsefe, bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku weke ku çawa ku cihê xwe di roja me de ji gotina 'zanyarîyê' re hişt, her wusa gotina fîlosofên dema kevnera jî di roja me de cihê xwe ji gotina 'profesorîyê' û hwd re berda ya.

Di vê çerçoveyê de 'serûwane' pêşketina hizir ji dema gotina felsefê li ya gotina zanyarîyê, em ji demên kevnera û demên berî wê heta dema me bibînin. Di vê çerçoveyê de, rastîyê civatê jî bi ziman, û hwd, cihê wê çawa ya, emê hewl bidin ku wê jî fahm bikin, bi gotinên aqil û zanistî re.

..

Abdusamet yigit

Destpêk: bi demê re bûn û kirina felsefê.

Li ser dîroke felsefe sekinandin, mirov bi dilper dike. Felsefe, pir mazin xwediyê demne pêşketinê ne. Lê ew demên wê, hê wilo zêde li gor xwe bi tememî ne hatina ser ziman. Hate nahaka, bi teybetî ji ji demên berî zayînê yên antikî ku li Grekê wanderan bûna hatina ser ziman. Ev ji, weke dîroke felsefê ye destpêkê hatiya ser ziman. Divêt ku mirov herê bike ku deme antikî ye Grekê, demeke pêşketî ya. Di wê demê de, felsefe dibe têgihîştineke şaristaniyê. Şaristaniya li ber bahra reş ku pêşketî û ji wir hate bi ber deryaya mazin de diçê ku herêmemê mazin ku jê re Anatolia tê gotin lê pêşketin dibêt. Bi vê yekê re mirov karê wê bêne ser ziman.

Pêşketine felsefe, li Anatolia, ji demên berî zayînê ji sadsalên 8 û bi vir de dest pê dike û pêş dike. Berî wê ji, demên pêşketinê yên ku hene, bi xwandina rojhilat û ber Diclê û ber Firatê re têne ser ziman. Bi teybetî ji, mirov karê deme Homeros, ji wê pêşketine Grekê re weke destpêkekê bêne ser ziman. Ev pêşketin ji, pêşketineke mazin e. Homerosê, bi mejiyê xwe yê ku tê de girtî re pêşketinekê dide çê kirin. Bi vê yekê re mirov karê wê pêşketine wê bêne ser ziman.

Pêşketine Anatolia û Grekê, divêt ku bi vê yekê hinekî weke demeke nû ku felsefe êdî afirîya û bûya pêşketine şaristaniya ye ku di derbarê wê de têgihîştin bûya ya. Vê yekê, mirov divêt ku bi teybet bêne ser ziman. Lê deme ku mirov bahse felsefê dike, mirov bahse pêşketine hizir û têgihîştine di derbarê de dike. Bi vê yekê re ji, mirov divêt ku bêne ser ziman ku hizir û pêşketine wê ji wir dest pê nakê. Ku mirov bixwezê herê destpêkê, divêt ku mirov hinekî hê ji bi demên berê de herê. Mirov herê deme Sumeriyan. Deme Sumeriyan, demeke ku pêşketin lê pir mazin bûya. Şaristani pêşketiya. Bi şaristaniyê re sazî û dezgehên wê hatina afirandin û ava kirin. Bi vê yekê, Mirov karê Demên Sumeriyan, weke demne pêşketinê yên şaristaniyê pêşî kifş bike û piştê ji, pê re kifş bike ku di wan deman de pir mazin pêşketine pêşketî ye bi hizir bûya.

Şaristanî bixwe ji, divêt ku mirov di destpêkê de bi çend gotinan ji bê hildê dest û hinekî wê ji bêne ser ziman. De ne, deme ku em bahse felsefe dikin, ku ne rastûrast ji bê, mirov hinekî ji bahse şaristaniyê û pêşketine wê ji dike. Ev yek wilo ya. Felsefe bixwe, di aslê xwe de pêşketineke deme şaristaniyê ya. Mirov divêt ku vê yekê di vir de di serî de kifş bike û bêne ser ziman. Pê re ji, hinekî di derbarê wê de kifş bike û bêne ser ziman.

Şaristanî, temenê wê bi sazîavabûna wê re li ser têtgihiştinê ya. Saziye wê yên ava dibin hemû ji, yên ku bi têtgihiştinê hatina ava kirin in. Mirov vê yekê ku kifş kir, êdî mirov karê bêje ku hebûne têtgihiştinê bi pêşketine hebûne felsefê re bi şaristaniyê re heya û pêşketiya. Sumeriyan, ol, pêş xist. Hizre olê hanî holê. Ev yek, tê wê wate ku deme berî olê ye ku jê re tê gotin deme pêşketinê ye Mîtolojiyê ji buhurandina di xwe de di demên xwe de. Her weha ev yek weke têtgihiştinekê xwe dide berçav.

Şaristaniya sumeriyan, bi têtgihiştin pêşketiya. Pişt wê re gelek şaristan derketina û çûna. Şaristana pişt wan re ku hatiya û navê xwe mazin li dîrokê hoştiya û çûya, şaristana *Misre kevn* e. Misre kevn, ku mirov wê bêne ser ziman, ku bi çend gotinan ji bê, mirov karê bêje ku ew bi têtgihiştinê ava bûya. Wê demên sumeriyan yên ku pêşketine pir baş û qanc xwandina. Ew di xwe de bi têtgihiştin kirina. Bi wan re, têtgihiştine xwe ye demê afirandiya û hanîya ser ziman. Pê ji, şaristaniya xwe pêş xistiya.

Sumeriyan, bi teybetî, divêt ku mirov di serî de wê pir baş û qanc kifş bike û bêne ser ziman. Demên wan yên ku pêşketine, bi qasî ku hatina kifşkiirn û bi wan kifşkirina çî hizrê me re çêdibin ji, divêt ku em bênine ser ziman. Ev yek, ji bo têtgihiştine rast û pak pêdivî pê heya.

Deme Sumeriyan, demne dirêj in. Pêşketine wan li ber Diclê û Firate dest pê dike. Diclê û Firat, bi awayê xwe wê demê yê ku pir bilind, ku qadaka pir mazin digirt, li ber wê pêşketineke pir mazin ku mirov wê bi teybet bêne ser ziman bi şaristaniyê pêşdikeve. Ew pêşketin, pişketineke temen e. Mirov divêt ku vê yekê her weha di serî de bêne ser ziman û bêje. Berdiclê û berfiratê, ji ber ku ji jiyane û jiyandinê re cihne herî baş in, êdî mirovan bi xwe li wanderên ji bo jiyane û jiyandinê girtinê re, êdî pêşketin bi pêş dikeve. Şaristani, bi bicihbûnê dest pê dike. Li wir, bicihbûn, destpêka wê heya. Ê ew destpêk ji, destpêka mirovahiyê yer herî kevn e ku mirov wê wilo bêne ser ziman.

Jiyana, li ber avê li ber diclê û firatê, bi vê yekê dibe temenê pêşketinê di jiyane û jiyandinê de. Lê ev jiyane û jiyandin ji, jiyane û jiyandineke bi cihbûnê ya. Bi vê yekê, mirov divêt ku vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman.

Ber diclê, her weha divêt ku mirov wê di serî de kifş bike û bêne ser ziman. Li vir, di pêşketine li wir de, jiyane hin bi hin temenê xwe ji temen diafirêne û diyar dike. Ev ji, hin bi hin mirov re bi têtgihiştin bicih dibe. Bi wê bitêtgihiştin bicihbûnê re êdî hizre şaristaniyê pêş dikeve. Di jiyana bicihbûnê de, hin bi hin bi pergalbûn diafirê. Malbat, tax û di asta herî

bilind de gund diafir in. Piştê hin bi hin bi ber bajarbûnê ve çûyin dibêt. Ev pêşketin, di aslê xwe de pêşketine şaristaniyê de. Çendî ku têgihîştin di afirê, êdî pêşketine wê ji mazin û maztir dibe û tê ser ziman. Pêşketine wê ji, her weha pir mazin dibêt. Malbart, saziya herî bingehe e. Pê re, parastgah diafir in. Ev cih cihên ku êdî wê di wan pîrozî biafirê nin. Wê ew, bina temenê pêşketineke mazin di jiyane de. Bi wan, wê hizir bi pergal bibe û wê jiyane bi wê pergalbûnê bi pergal bibe û wê jiyane bi wê bi xal û zagon û destûr bibe. Her weha êdî gav bi gav wê pêşketin bibe. Ev pêşketin, li ber Diclê dibêt. Li ber Diclê û li ber Firatê dibêt.

Li ber Diclê û li Ber Firatê, pêşketina ku dibê ji, her weha pêşketineke pir mazin ye ku mirov wê pir mazin bêne ser ziman e. Têgihîştine ku li wir diafirê, temenê pêşketinê li herêmên dora xwe bi jiyana ku diafirê re dibe. Vê yekê, mirov divêt ku bi teybet bêne ser ziman. ...

Ji demên berî şariştaniyê û heta demên şariştaniyê ên ku pêşketin.

Demên berî şaristaniyê demen ku mirov wan bi teybet fahm bike û li ser wan bisekinê ne. Bi teybetî ji demên Zeolojîk hata demên Peleolotîkê û Neolotîkê ji, pêşketinên ku dibin, dem bi dem bêne fahm kirin girin in. Girîngiye wan ji, ji bo fahm kirina pêşketinê pir girîng e. Bi teybet ji, di kijan demên de kijan herêm bi teybet zû ji jiyane û jiyandinê re vebû, wê bê fahm kirin. Ji demên Zeolojîyê ku weke "demên dînazoran" ji tene bi nav kirin fahm kirina wan ji bo fahm kirin û têgihîştine di derbarê dinye me û pêşketinên tede yê ji aliyê Zeolojîyê û her weha fîzîka wê de girîng e. Berî nahaka dinye me di awayekî çawa de bû? Ew fahm kirin girîng e. Li ser wê hinek hizrên ku Zeologan yê ku tene ser ziman hene. Ew hizir hinekî ji jev cuda ne ji. Lê bi teybet ji, di xalakê de levkirin heya. Ew ji her weha ku ji aliyê hebûnê ve arde dinyê her timî di guharê. Arde dinyê, di guharandinê de ya. Zeolojî, vê yekê, wan labitandinên di ardê de bi pêşketin û demên berê yê ku hatina jin kirin re ji xwe re dike mijar û li ser bi lêkolîn kirinê dihizirê. Ji deme cihana yê herî mazin û demdirêj ku jê te deme "Preqambriya" ji tene gotin û ku tene gotin ku ne bin 3 an 4 milyar sal re ya, pişt wê re pêşketinên ku dibin bi demên kin yê ku weke "demên Pretozoyîk" re ku ne bin çend sad hezar salan re ne û di wan deman de êdî jiyane bi nebat û tiştên wilo re diafirê û êdî her weha pêşketin dibin dibêt.

Ev dem, demne ku weke tene ser ziman ji, demên ku êdî ji jiyane bi

tiştên(jîndarên) ku wê bijîn re diafir in. Jîndarên ku diafirin ji, yên ku destpêkê ne û ew ji jîndayên yek Şaneyî(Celle) ne. Jîndayên yek şaneyî, jîndayên destpêkê ne. Ew ji, di demên pêşketinên yên bi xwe re yên ku di buhurênin, êdî hin bin pêşketinên û dibine jîndayên pir şaneyî. Pêşketina wan, bi avê û di nav avê de destpê dike. Bi vê yekê, êdî mirov karê bêje ku jîndayên pêşî bi avê an ji di nav avê de diafir in û dijîn, êdî. Pêşketine wan destpêkek mazin ji jiyane re bi xwe re ji. Lê ew jîndayên ku diafirin ji, wê demêne pir mazin yên pêşketinê wê bi xwe re bi demên jiyane re bijîn. Jiyane, êdî mirov karê bi wan re afirîya û di jiyandinê de ya. Şaneyên ku di afirin, hê ku di hundurê wan de pir destpêk ji bê, genetike wan heya û ew ji ji qeydkirina wan e. Bi vê yekê, êdî ew pêşketin, di xwe de weke ku xwe hilda bê awlakariyakê ji. Her weha ji tê berçav. Di rastiye de ji wilo ya. He jînda, çend ku biçûk û yek şaneyî ji bê, bi vê yekê re êdî dikeve pêşketinê de. Genetik di vir de weyne wê, morv karê bêje ku di pêşketine dest pêkê de pir mazin a.

Her pêşketin û demên pêşketinê, di xwe de hinekî bi cerbiniyê û demjîniyê pêşketine xwe di xwe de qayîm dike. Bi vê yekê, êdî demên jiyandinê yên jîndayên yek şanê ji, bi vê yekê û awayê pêşketinê, di deman de dubuhurê û di buhurîna wan de di demê de xwe digihêne deme xwe ye pirşanêbûnê. Bi vê yekê, êdî mirov karê bêje ku pêşketineke mazin ye li jiyane bi vê yekê temenê wê tê avêtin. Bi vê pêşketinê, êdî hin bi hin wê bi jîndayên pirşanê re wê êdî jîndayên pir mazin wê êdî bi afir in. Wê li jiyane pir jînda bi afirin. Wê xweza bi afirê. Di rastiye de, ew pêşketin û bûna jîndayan ji bi xwezayê re ya. Ji xwezayên neqût û bêxweza

ya ..

Xweza, bi pêşketine wê re êdî jîndayên pir mazin ku êdî li dinyê deng derdixin dibin. Temenê malbatitîyê tê avêtin. Weke ku di kurdîya berê de tê gotin û ji komên nebatan yên ku weke malbata tene bi navkirin û ji wan re "femiliya" diafir in. Bi afirîna wa re, li jiyane temenê pêşketinê, êdî ji aliyê jiyane ve bi hebûnên pir alî re berdewam dike. nebat ku em bêjin şînatîyê her cureyên wê ku hebin yên yên bi yekşanê ji, piştî bûna wê pirşane bûnê pior zêde diafir in. Ew jîndayên yekşanê yên piştî wê demê ji, bi hebûnên xwe re ji jîndayên yekşanê yên ku berê wê demê hebûn û yên destpêkê bûn, ji wan cuda na. Mirov karê vê yekê bêne ser ziman. Bi genetikê re, ew yekşanebûna wan ji, di xwe de mereteyekê bi genetikê dihilêne. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji her weha bêne ser ziman. Rewşek ku bû, piştî ne bi demê re bê û ne ji bi bûnê re bê, dubarabûna wê nîn e. Mirov wê nabînê.

Ev pêşketin, piştire wê pir mazin hebûna xwe bide berdewam kirin. Wê hin bi hin pir mazin bibe. Şanê û genetikê, di wê demê de deme ku digihê deme xwe ye pirşanebûnê, êdî pir mazin bi wêne dike û diafirêne. Lê piştire ew pêşketin û afirandina ku bû ji, wê jiyandinê re wê hin bi hin wê di xwe de bi pêş bikeve û bi nirx bibe. Ew ew ji têde bi nirx û têgihîştinê wê giraniyekê çêke. Ew pêşketine ku em jê re bi têgihîştinê bahs dikin û ténine ser ziman, di rastiyê de qeyde bi genetikê ye di şanê de ya. Ew bi afirandina xwe re mazin êdî diafirîne û pêş dixê.

Ev dem, pêşketine wê, bi hebûne xweza û hewayê ve ji girêdayî ya. Çendî ku hewa dibe û bi demê re ku hin bi hin germbûn ji dîrêjên ku ji rojê tén germî di wan de zêde dibe, êdî hin bi hin wê guharandin bi wan re bi wê hebûne ténne rojê re ji bibe. Ev yek ji, her weha pir girîng e ku mirov wê kifş bike. Bi kifşkirina wê re, wê pêşketineke mazin ye demê biafirê. Dem, êdî wê biafir in. yanî wê demsal bi afir in. Pê re ji, wê di navabîna rojê û dinyê de qatên ku tîrêjên rojê re di wan re tê û ku tê ji, êdî hin bi hin bandûrê wê wilo êdî mazin li jîndayan nekê dibêt. Ji ber ku tîrêjên destpêkê pir jidahîbûn, êdî jîndayên ku dibûn ji li gor wê ji bo ku karibin di bin wê de bijîn çermê wan diafirî. Çermê Dînazoran ku mirov bêje ku ka çima wilqasî stûr bû, mirov divêt ku ji vê hebûne rewş tîrêjê dûr bersivekê nediyê de. Ev yek, her weha pir girîng e. Ev yek û rewş, ne tenê ji bo jînda û çermê wan wilo bû, her weha ji nebatên ku şîn bûbûn ji wilo bû. Ew ji, di wê şert û mercê de bi awayekî ku karin xwe bi parzên û bidine berdewam kirin diafir in. Ténne ku dihate dinyê ye rojê ye ku di wê demê de hê qatên atmosferê yên ku hebûn nebûn an ji ne weka ye roje me bû. Piştire, ku dem têve diçe û hin bi hin atmosfer diafirê, êdî ténne tîrêjên rojê yên ku tène dinyê weke ku weke ku di nav avakê de bêne şîştin tène tenikkirin û zirevkirin. Bandûra tîrêjên rojê li jînda û nebatên ku di bûn ji bûn û pêşketine wan ye di xwe de pir mazin e. Nebat, ne pê bin, wê nikaribin wilo zêde bibin û mazin bibin.

Bi wê, jîndayên ku dibûn ji, pir mazin bû. Ma ku tûpişkekî ku î ro di roje me de biqasî tekiliyekê dirêjî û mazinahiye wê heya, di wê demê de biqasî qama mirovekî û jê dirêjtir ji ku mazinbûnaka wan hebû, ma mirov wê çawa wê bêne ser ziman. Roj, ténh û tîrêjên wê, ku digihine jînda û êdî ew jê bi bandûr dibe û genetikê wê ji jê biafir dibe. Her weha divêt ku mriov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Li gor zanistên ku di roje me de hene û têgihîştine wê, mirov her weha karê vê yekê bi rehetî bêje û bêne ser ziman.

Genetikê, di wê demê de, weke zanistekê roje me ku çawa ku di hizirê

li ser rewşan û ji wan dike ku ancaman derxe, her weha di wê demê wî karê wî yê wê demê wê dikir. Zanistê roje me, di serê xwe de digirê, wê ji di xwe de digirt û li gor wê xwe diafirand. Mirov karê bêje ku ew ji zanistê roje me zanisttir ji bû.

Hate ku dem tê deme dawiyê ya mazin ye Zeolojiyê, jîndayên ku bûna, êdî serweriya wan li jiyânê li dinyê bûya. Mirov vê yekê ji dibîne. Lê ew jîndayên wiilo ku di roje me de mirov dikeve zore de ku wê mazinatiya wan fahm bike ji, êdî hin bi hin ji holê dirabin. Ji holê rabûna wan ji, bi têhn ji şikeştina ye tîrêjên rojê û her weha bûna atmosferê ve mirov karê girêdê û bêne ser ziman. Li gor hinek zanistan ji ku pir bi deng ji tê ser ziman, taqîna wolkanan û bi wê windabûna wan, ne wilo zêde ya. Ku taqîn pêk hatibin ji, her weha hemû ne bi wê windabûna. Ji ber ku her jînda bi zabûn û zêdebûna weha hebûne xwe dide berdewam kirin. Lê ku derfet her weha ji wê rewşe wê re namêne, êdî piştire, êdî mirov bike û neke wê nikaribin ku hebûne xwe bidina berdewam kirin. Di roje me de wê dînazorek bijî bi awayê wê rojê? Bersive vê pirsê, wê hinekî ji vê pirse ku me pêşî pirsî re ji wê bê bersiv û wê têgihîştinekê pêre bi wê demê re bide çêkirin. Ew dînazor, divêt ku wê rewşe hewaye xwe de bijî. Ev ji her weha heya û divêt ku mirov vê yekê ji wilo fahm bike.

Bi bûna atmosferê re li dinyê temenê pêşketine jiyana jîndayên pirşane pir zêde bû. Pêşketine wan pir bû. Hebûnên wan pir bûn. Bi vê yekê êdî demeke nû bi bûna atmosferê re di jiyânê de dest pê kir. Atmosfer, rewş jiyânê yê ku ew jîndayên pirşanê têde dijîn diafirêne. Her weha divêt ku mirov wê ji kifş bike. Atmosfer, her weha di vê yekê de ji bo fahm kirinê girîng e. hebûne Atmosferê û bûna wê û rewşe wê ye ku wê di afirêne û bûna wê û berdewam bûna wê ji girîng e. Jiyana li dinyê mirov karê bêje ku bi hebûne atmosferê re girêdayî ya? Bersive wê pirsê ji bi xwe re mirov digihêne hinek têgihîştin na ku mirov pê deman û pêşketine deman yên bi dinyê ji aliyê zeolojiyê re fahm bike.

Ev demên pêşketinê ne bê *hebûne peresendinê* ne. Peresendin, di jîndayên ku dibin de dibêt. Di bûn û mirinê de pêşketineke ku mirov wê bi teybet ji jîndayiyê re bêne ser ziman heya. Her mirin, bi xwe re zîndîbûnekê bi hebûne peresendinê re dihêne. Peresendin, di jîndayên ku dijîn û hebûne xwe bi zabûn û her weha zêdebûnê didine berdewam kirin de pêşketineke li gor demê dide çê kirin. Genetik, di jîndayan de temenê w pêşketinên bi afirandina xwe de diafirêne. Mirov di vir de di vê rewşê de nikarê genetikê ji peresendê dûr bike û wan bi teybetî ji jev dûr bêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê wê peresendina ku di wan de

dibin mirov karê bêne ser ziman. Peresendin, di xwe de di ponijê. Bi wê yekê, di xwe de bi hebûne xwe re û rewşe xwe re ku deme xwe ye nû bi zabûnê re bi jîndayên din re da dest pê kirin, wê cerbên ku di jîndayên pêşî de bûna bi bûn, mazinbûn û pîr bûnê re afirîne ji di xwe de di wê afirandina xwe ye dawiyê de bi wate bike. bi vê yekê, peresendin, mirov karê bêje aliyê wê ku mirov biolojîyê re bêne ser ziman, di vir de mirov ku di hizirê derdikeve pêşîye me û ji me bi pê hizirandinê di xwezê. ..

Peresendin, di vir de, divêt ku em hinekî dî ji li ser bisekin in û wê pir baş û qanc fahm bikin. Ew bixwe ji, divêt ku ji bo têngihîştinê pir baş û pêşketine qanc ji were têngihîştin. Ew ji, ji hebûne wê ye girîng ku em di derbarê wê de xwedî zanebûn in, ji wê zêdetir girîngiyekê bi xwe re dide berçav. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Jîndayên ku bûna û pêşketine, ji aliyê bîolojîyê ve bi teybetî têngihîştinê ji mirov bi fahm kirina wan re dixwezên. Em wê fahm kirinê ji deme pêşketinê ye bi yekşanê re hate ku tê deme pîrşanê, mirov çawa karê wê fahm bike û bêne ser ziman. Dem bi dem pêşketine wê, mirov wê divêt ku fahm bike. Di rastiyê de ji, ev yek, zanebûne wê di pêşketine di mirov de yên ku dem bi dem bûna û di genetîkê mirov de wate wan heya de bi hebûn in. Mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Pêşketina ji yekşane bi jîndayan re dest pê kiriya, hate ku tê pêşketine destpêka mirov bixwe ji, her weha di mirov de bi hebûne xwe re heya. Ew ji, ku hate kifş kirin, wê hingê bê dîtin. Wê bê fahm kirin. Pirtûka mirov, genetîke mirov wê di xwe de dihilêne. Dem bi dem pêşketinên ku bûne tede bi wate ne. Ne tenê ji bi mirov ji bo her jîndî ev yek wilo ya ku mirov wê wilo fahm bike. ..

Bi Pêşketine mirov re, hebûne pêşketine jîndiyan ji dikeve demeke xwe ye nû de. êdî hin bi hin, wê pêşketinê hebe. Wê êdî meji pêş bikeve. Meji, bi sad hezar salan demên pêşketinê di xwe de di buhurêne hate ku tê û digihê deme xwe ye ku wê karibe bi hizirê. Weke ku zanist dibêjin ji deme 'naendertal' hate ku deme 'homo sampîyans', her weha pêşketine mirov tê destpê kirin. Bi vê yekê re, demên mirov êdî dest pê dikin. Ew dem dawî ye ku tê gotin ye homo sampîyans, deme ji deme ajalbûnê qûtbûn e. Her weha êdî rewşeke din di afirê. Destpêka wê qûtbûn bi pêşketine meji û destpêka hizirandinê ya. Bi aqil bidest rîya xwe li jîyanê xatandin e.

Xosletên jîyana mirov yên bi femilyabûnê ji, di vir de derdikevina pêş. Hin bi hin 'qilan' tî derdikeve holê. Qilanti, deme ku êd mirov bidest afirandina xwe ye li jîyanê bi komî ji dike. Kom diafir in. Bi hev re jîyan

diafirê. Li hevdû meyîzêndin û ji hevdû nerîn girtin û di serî de ew bi wê wênebûne wê re bûnê aqil êdî diafirê.

Jiyana, êdî dikeve deme ku di mirov î roj jê re dibêje 'peleolitik'. Ev dem, deme ku pêşketine weke mirov bûya. Deme qûtbûna mirov bi mirovbûnê ji hebûn ajalbûnê ya. Bi vê demê re, demeke pêşketine ku nêzî 40 an 50 hezar salî heya. Heya ku ev dem hê ji dirêjtir bê. Ev dem, li gor pêşketine di mirov de ye bi ber mirovbûnê ve wê dîyar dike. Ev dîyarbûn, êdî dîyarbûnaka mazin ye dîrokî ya. Ev pêşketin ji pêşketineke dîrokî ya. Mirov êdî dibe û li ser lingên xwe dimeşê û bi awayê xwe re ji pir mazin bi ber mirovbûnê ve pêşketineke mazin jîn kiirya. Di deme neolitikê de ew awabûna mirov, mirov karê bêje ku pir mazin nêzî awayê mirov yê demên nêzî me dibêt. Wê hate ku dem were deme ku jê re tê gotin deme 'Neolitikê', wê êdî pêşketineke mazin bê jîn kirin. Hate ku hatina wê demê dibe, êdî wl rengê mirov bi mirovî bi tememî hema bêja wê kifş bibe. Wê ew mirovê roje me, wê awayê wî bê standin. Bi vê yekê re, di serî de ji meji ji êdî bi dest afirandinê dike. Ji hewirdorê bi nerînê dîmenên ku diafirin di meji de, dibine temenê bûn êqil di demê de. Wê êdî malbatîfî ji bi pêş bikeve. Wê jîn û mêrtî bi pêş bikeve. Ev hemû pêşketinne ku di nav hev de êdî dibin û di demê de dîyar dibin û di demeke ku li gor demên berî xwe pir kin de pêşketineke mazin ji jîn dibin. Komên mirovan yên ku diafirin hene. Ew dibine temenê qilatîyên piştre. Wê êl û aşîrên piştre ji temenê wan ji wan bêt.

Lê wê bikombûnê re êdî hîyayerşî êdî wê buiafirê. Serekê komê yê pêşeng yê ku herî mazin û yê mêr e. Ew rê şanî dixê û ji xatarayan encamên qılanê xilas dike. Jin û mêrtî kifş dibêt. Malbatîfî kifş dibêt. Bi malbatîfî lev kombûn heya. Di malbatê de zarok bûna wan û mazin kirina wan bi li ser xwe girtina malbatê re dibêt. Mêr bi nêçîr û hatina xwarinê re û bi çê kiirn û jev belabkirina jinê re pêşketine xwe dide berdewam kirin. Hate demekê bi jinekê re çend mêr karinbikevine têkiliyê de. An ji bi mêrekî re her weha çend jin karin bikevine têkiliyê de. Lê ev yek ji, êdî hin bi hin ji holê di rabê. Nirxên malbatîfîyê diafirin. Nirxên ku diafirin ji malbatîfîyê bi pêş dixin. Wê bi êdî bi rê ve dibin. Wê hin bi hin, êdî nirxên ku nêzîkatiyê kifş dikin bi afirin. Ahlaq, wê biafirê. Ahlaq, bûna wê, mirov karê weke destpêkeka şoreşî bêne ser ziman. Wê piştre ev pêşketin, gelek pêşketinên ku bibin wê bide kifş kirin. Wê nirxdariyê û nêzîkatiyên ku li hevdû dibin wê bide kifşkiirn. Wê nêzîkatiye jinê û mêr ji jevre kifş bike. Wê nêzîkatiya ji miriyan re kifş bike. Ev kifşkirin, wê bi xwe re hinek têgihîştinne dîn ji bi xwe re

bêne. Hizre mirinê û çûna *dereke din* wê bi xwe re bêne. Piştire wê ew *der* bi tégihîştine û pêşketine wê re wê bibe *dinyeyeke din* ye ku heya. Wê nêzîkatiyên di naqabîna serekê komê û ancâmên komê ji wê bê kifş kiirn. Ev hemû û hê gelek aliyên din yên ku wê bêne jîn kiirn, wê bi nîrx wê nêzîkatiya wan bê kifş kirin. Ev pêşketin, êdî pêşketine pêşî û ya mazin ye ancama pêşketine aqil ye bi tégihîştin e.

Êdî dem, bi vê pêşketinê tê demeke nû ku jê re êdî tê gotin 'Neolotîk'. Ev dem, êdî demeke nû ya. Ev dem, bi nîrx e. malbatiti têde afiriya. Nîrxbûn têde heya. Wekî din ji, mirov karê bêje ku bi pergalbûn ji têde heya. malbatiti, pergalbûna herî mazin ye wê demê ya. Temenê malbatitiyê yê bi nîrxê wê re li ser tégihîştinê ya.

Ev dem, demeke ku mirov wê bi pêşketinên têde pir baş fahm bike ya. Ji ber ku pişt vê demê re demên şaristaniyê tèn û ew dem li ser vê demê û pêşketinên wê bi pêş dikevin. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Ev dem, di pêşketina xwe de pêşketinên dijî, bi wan, demên piştire yên ku tèn û dijîn dide kifşkiirn. Bi vê yekê, mirov divêt ku vê demê pir baş û qanc fahm bike. Pêşketinên wê, pir mazin in. Mirov, di demê de fêr di bin pergale de jîn bûnê ji dibin. Di asta herî bilind de di demên wê yên dawiyê de fêrî di bin destiyê de jîn bûnê ji dibin. Yanî yên ku serdest e, wan dike bin destê xwe de. Bi sadan mirov di bin dest û hikme yekî serek de dijî. Pêve girêdayî na. Ew çî bêje weke wî dikin. Ew bêje herîne miirne, wê ji bo wî çîna mirinê ji. Ew bêje herne ku derê wê çîna wê derê. Ev hemû kiirn û nîşanak, nîşanakên hin pêşketinên nû yên ku di bin û pêre nîşanaka pêşketina bi pergalbûnê re ji ya. Pergalbûn, di wê demê de di seran de diafirê û piştire di jîyanê de pêş dikeve. Xala herî girîng di vir de ye ku mirov wê fahm bike ji, her weha pêşketin û bi tégihîşt bûna pergalbûnê ya. Ev pêşketin, destpêka wê çendî ku wir li wê demê ya, bi bûna wê tégihîştinê û pergalbûna wê re êdî ji wê demê buhurîbûn ji dibêt. Buhurîbûna *demên Şaristaniyê* êdî dest pê dikêt. Demên şaristaniyê, êdî mirov ji vir pêde karê bêne ser ziman.

Demên şaristaniyê, bi pêşketine bi pergale re destpê dike. Di demên destpêkê de bi pergalbûn dibêt. Weke tégihîştineka mazin mîtoloji hebûne wê pêş dikeve. Hizir kirin bi wê, bi afirandinên di xwe de dest pê dike. Deme Berî demên şaristaniyê deme Neolotîkê, deme ku mirov di vê pêşketine ku em nahaka weke destpêke pêşketin û derketina şaristaniyê bènine ser ziman. Ev deme ku em jê re dibêjin deme Neolotîkê, di jîyanê û jîyandinê de pergalbûn daya ava kirin. Bi vê yekê, demne pêşketinê ji jîn kiirn. Cih girtin bi komên ku afirîne re dest pê kiriya. Cih nas kirin û

li wê mazin bûn ji hin bi hin dibêt. Bi vê yekê êdî hizre cihê yanî ye cihbûnê ji weke têgihîştinê pêş dikeve. Ev pêşketin. demeke nû ye pêşketinê ya. Ev têgihîştin, pêşketine wê, mirov karê weke destpêka bûn û derketina têgihîştine şaristaniyê bêne ser ziman. Mirov li cihê ku lê bicih e, li wir jiyaneke ji xwe re bi jiyana xee ye ku têde dijî ava kiriya. Hin bi hin wê nixx û ahlaqê wê awayê jiyaneke ya bi mirov wê biafirê. Ev ji, êdî wê bê destpêka pêşketine nixxûna wê jiyaneke û pêre ji têgihîştinê. Têgihîştin, destpêkaka mazin ye pêşketinê ya di rewşan de ya. Bi naskirinê re destpê dikê. Nas kirin, hizre lê xwedî derketinê bi xwe re dihêne. Wê bi vê yekê, têgihîştineke mazin bi afirê. Nixxûna di jiyaneke de bi jiyandîne re diafirê ji, wê êdî mazin bibe.

Bawerî hê di wê deme berî deme şaristaniyê de bi destpêka re bi totemên ku hatina afirandin re dest pê kiriya. Piştî wê pê re hizre anamizmê de wê xwe bi afirêne. Ev êdî tê wê wate ku pêşketine têgihîştinê bi pergal dibe. Çendî ku mirov toteman weke hinek şekl û awayana ji bêne ser ziman. Lê di aslê xwe de di serê mirov de bûna xwediyê hizreke ku li gor demê mirov bi awayekî pêşketî û bi pergal bêne ser ziman. Ew awa û şekl yê ku diafirin, piştî wê bine temenê pêşketine mîten ku wê bibin û wê bi têgihîştineke deme xwe wê bi pêş bikevin. Ev ji her weha êdî dide nîşandin ku pêşketineke çawa mazin ye demê êdî dest pê kiriya.

Dem bi pêşketinê bi xwe re, çendî di buhurê deme pêşketinê ya şaristaniyê ji, divêt kuu mirov bêje ku di cih de bi carekê re bi vê yekê awayê wê jiyana ku di deme berî de dest pê kiriya ji holê na rabê. Ew jiyaneke, bi têgihîştinê dibe û xwe ji xwe di buhurêne. Bi vî awayî wê bê buhurandin. Di demên têgihîştinê de xosletekî pêşketinê êdî bi vê yekê xwe dide berçav. Bi pêşketinê ji astakê buhurîna astaka din pêşketin û buhurin dibêt. Mirov karê di vir de careka din hebûne peresandinê bi bîr bixe. Lê ev hebûne peresandinê êdî di têgihîştinê de di hundurê wê de hebûne bi pêşketinê ku di bin di de berdewam kirin.

Bi vê yekê, êdî bi ketine deme pêşketine ye ku mirov bi deme şaristaniyê bêne ser ziman re, pêşketin ne bi boyutekê bi gelek boyuten di nav hev de û di hev re pêşketine xwe dide berdewam kirin. Ev ji xosletê pêşketinê ye bi têgihîştinê re ya. Ev xoslet, wê di deme şaristaniyê de bêhtir xwe bide berçav. Wê bêhtir were kifş kirin. Wê pêşketin, ji zana ku mirov jê zan dike bêhtir bi lezekê êdî bi pêş bikeve.

Pergalbûn, her weha mazin di afirê. Pêşketin mazin diafirê. Hizir û bawerî di afirê. Bawerî, di xwe de bi têgihîştineka mazin di deme

pêşketinê ye şaristaniyê de pêş dikeve. Pîroziyê ji êdî wê ku bi çi sedemên ku di pêşketinê de wê bi pêş dixê ji bê. wê pêş bikeve û li jiyânê bi baweriyê êdî serwer bibe. Ev pêşketin, êdî wê di gelek qadên din ji wê pêşketinê bide pêş xistin. Di despêka pêşketine demên şaristaniyê û buhurina ji deme Neolotîkê ye lê de, êdî mîtoloji, bi pêş dikeve. Bi pêşketin û bi pergalbûna wê re ji, êdî şaristanî ji bi pêşdikeve. Hê zûtir bi pêş dikeve. Ew pergalbûna wê ye ku dibe ji, êdî pergalbûnê bi xwe re di hizir de dide çê kiirn. Ew pergalbûn, pergalbûna mirov ye di xata pêşketine wê de ye herî mazin ye deme wê ye pêş e. Ev yek, her weha girîng e, ku mirov wê kifş bike û bêne ser ziman. Wê temenê pêşketinê yê bi şaristaniyê re pê re li ser wê bidest ava kirina xwe bike.

Di deme pêşketinê de ku dem tê demên şaristaniyê, êdî bi pergalbûn pêşketin dibê. Mîtên ku afirînê bi têgihîştinê êdî hizire mîtolojiyê di afirînê û pê pêşketineke mazin ye ku mirov wê pir mazin bêne ser ziman diafirînê. Bawerî ji, êdî têde cih digirê. Bi vî awayê xwe yê pêşketin mît an ji bi têgihîştine mîtoloji, êdî wê biqasî ku ji wê pêşketine şaristaniyê dibe temnê wê bi wê pêşketine xwe re êdî wê ji bûna têgihîştinê olê ji derketin û pêşketine re ji bibe temen. Her weha êdî pêşketin bi awayekî geometrikî hebûne xwe dide berdewam kirin. Bi vê yekê, êdî pêşketineka mazin dibê. Ji vir pêde, êdî bi sîmset mirov divêt ku demên şaristaniyê bêne ser ziman. ..

Demên şaristaniyê ên bi felsefê pêş dikevin. ..

Demên şaristaniyê, êdî demne ku mirov bêje ku bi têgihîştinê bi pêş dikevin in. Her weha mirov divêt ku wê bi teybet bêne ser ziman. Demên şaristaniyê, demne ku êdî bi awa û şekil û şamalên xwe re yên ku li berçav in bi pêşketin û bi mazinên xwe re. Şaristanî, bi wate gotina xwe re ji wate jiyana bi pergâl û bi sazî û mendîyên xwe re di xwe de dihêne ser ziman e. Her weha mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Ku mirov bahse demên şaristaniyê dike, bêguman berî her tiştî û bi bîrxistinê ji, wê bi gotina şaristaniyê re navê şaristana sumeran were bîra mirov. Ew şaristan an ji deme şaristaniyê ye deme destpêkê ya ku mirov wê fahm bike û bêne ser ziman e. Ev destpêk li Kurdistanê ya. Li ber Diclê û li ber Firatê ya. Ji ber firatê hate ku mirov tê ber Diclê û ji wir li dora van herdû avan li qadaka pir mazin belav dibe. pêşketineke mazin dibê. Ew pêşketin, ye ku bi pergâl e. Naskiirn û mazinbûn pê heya. Mirov ji di wê demê de, bipêşketine ku dibe re dibîne ku ji şaristaniyaka

roje me ne kêmtir pêşketineke wê ye ku mirov weke pêşketineke destpêşkê bêne ser ziman heya. Nivîs ji tê kifş kirin. Sazî têne ava kirin. Bi wan ji, êdî jiyan mazin bi pêş dikeve. Di rastiye de, demên sumeriyan yên pêşketinê bi hezar salan a. Hate roje me ji, hê wilo zêde na hatina fahm kirin ku ka çendî pêşketineke mazin ye di xwe de çê kirin e. Lê em di zanîn ku ji zanîn di roje me yên di derbarê wan de hê mazitir û dirêjtir jîna. Mirov karê vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman.

Sumeri, pêşketine wan ye ku î ro ji kêvalbarên wan yên ku wan têde rewş û jiyana xwe hanîna ser ziman de mirov dibîne ku di astaka pêşketinê ku ji ya roje me re bi têgihiştin û bi bîr û baweriyê ji dibine mînaq in. Her weha ev ji rastiya wan ye li berçav heya. Lê ev pêşketin, ne di demeke kin de bûya. Di derbaerê wan demên wan de wilo zêde ti agahiyên ku ji destpêka wan pêşketine wan bi me bide fahm kirin nîn e. Lê em bi zanebûnaka ku gelemperî di derbarê wan de xwedî zanebûn in. Ew zanebûn ji, têrê nake ku em wan bînine ser ziman ji her aliyê wan ve.

Lê em di zanîn ku wan têgihiştineke mazin di xwe de pêş xistina. Wan di demên xwe de bidest nivîsandinê ji kirina. Hizrên xwe hanîna ser ziman. Komên ku bûna û mazin bûna û di nav xwe de her weha pêşketineka mazin dana ava kirin û pê dijîn wê şaristaniyê di dine berdewam kirin. Sumeri, demên berî xwe, çendî pêşketineke mazin jîne, her weha di xwe de bi awayekî ku mirov bêje ku bi sentez kirina di xwe de hanîna ser ziman. Zanîna wan û pêşketine bi wê mazin dibêt.

Ji destenên wan yên weke yên "Gilgamêş" û "tûfanê" û hwd, têgihiştine mazin di dine me. Ev destan radixina berçavan ku wan di xwe de bi têgihiştinê û pêşketine wê cihana xwe ye ku di seran de afirandiya. Mirov wê dibîne. Têgihiştine wan gihiştîya wê astê ku li sedemê bûn û hebûnê bigihihin. Hebûn û nebûn, rastî û jiyana hwd bi hev re li têgihiştine wan tê lêgerîn. Mirov bi têgihiştine di serê xwe de fahm kiirna di derbarê xwe de digirihê. Dixwezê fahm bike ku ka ji ku derê hatiya. Li bersivan gerîn û afirandina bersivan ji, di vir de derdikeve holê. Destana tûfanê, ji vê yekê re ji bûna mirovan re vegotinaka ku di derbarê bûna wan de hinekî dike ku wan bitêgihiştin bike ya.

Destana tûfanê, dike ku vegotinekê ji bûn û hebûne mirov ye bûne wê re bêne. Mirov çawa Bû(xulîqî)? Ji wê re dixwezê vegotinekê bêne. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pêşketine ku bûya, bi asta ku hatiyê de gihiştîya astaka ku bi hizirkiirmê afirandin pê bê kirin. Di rastiye de, destana tûfanê tiştekî dî ji bi xwe re dide rû. Ev ji her weha, êdî deme derketin û pêşketine hizrê olê dest pê dike. Vegotinên bi mîtan, hate wê

demê gihiştine astaka mazin. Di wê asta ku gihiştinê de, êdî xalkî ji bi komên mrovan re bûya. Xalkîtî, êdî pêş dive. Xalkîtî, di aslê xwe de, temenê wê bi pergala wê demê ye ku di deme mîtan de bû û pê têgihiştineka mazin têde afirî ji bû, pêş dikeve. Bi vê pêşketinê, êdî pêşketine mirov dikeve astaka din de. Hizir, di afirê û êdî srweriye wê li jiyânê dibêt. Bi vê yekê, êdî pêşketineke mazin ye ku mirov bahse wê bike dibêt.

Sumeriyan, di deme xwe de, bi bûna pergala têgihiştine ye mitolojiyê re di demên xwe de pergala xalkîtiyê bi pêş dixin. Bi wê pêşketine şaristaniya xwe diafirênin. Şaristaniya wan, xosletê wê li ser hîmê kifşkirin û afirandinê ya.

Jiyana wan ye bi wan re ku mirov wê bêne ser ziman, her weha bi wê afirandinê bi pergala dibe. Pergalbûn, ancama têgihiştine di serî de ya. Mirov di serê xwe de hevokna bi afirêne û wan bi rêzê bi wate xwe re bêne ser ziman, pêşketineke mazin e. Ev wê jîn dikan. Bi pergala wan re şaristaniyan wan awa distêne. Şaristaniya wan, deme pêşî ye deme xalkîtiyê ya. Xosletên wê demê bicihbûne jiyânê û di deme bicihbûnê re pêşketine li gor wê di jiyânê de kirin. Her weha çandin û cohtkirin, derdikeve pêşiya jiyana nêçîriyê. Jiyana nêçîriyê, di jiyana xalkê ya bicihbûnê re ne li pêş e. Cohtkirin û çandin li pêş e. Bi vê yekê re, temenê jiyânê tê avêtin. Ji jiyana wilo re ji ku der û kîjan qad û herêm ji bo wê baş e? Ew ji, tê gerîn. Ber Diclê û ber firatê cihne pir baş in. Cihên avî, cihên ku mirov xwe lê digirin. Cihên ku şaristan lê şîm di bin in.

Di wê jiyânê de, bi pergala tevgerîn heya. Afirandina di serî de heya. Ew pir girîng e. Li ser wê, divêt ku mirov bisekinê. Ew pir girîng e. Pêşketine wê pir girîng e. Pêşketine wê, têgihiştine mazin dike. Ji ber vê yekê girîng e. Wekî din ji, ji rewş û hebûnên ku li jiyânê hene re nav dîtin û hewldana fahm kiirn û naskirinê bi pêş dikeve. Di deme şaristaniyê de, ev yek herî li pêş e. Têgihiştine ku bi hebûne mîtan û mitolojiyê bi pergala bûya, êdî bi demên xwe yên piştî buhurîna deme pêşketine dijî. Bi vê yekê re, demne têgihiştinê yên ku mirov wan bi teybet bêne ser ziman bi pêş dikevin. Hewldana nas kirinê û fahm kirinê derdikeve pêş. Hizirkiirn, her weha mazin derdikeve pêş.

Navê Xwûdê tê kifş kirin. Ew ji bi kifşkirina wî êdî di derbarê wî de hewldana naskirin û fahm kirinê derdikeve holê. Ev ji bi xwe re hinek pêvajoyên pêşketinê di têgihiştine de di hênin. Pêşketine vê demê, mirov di destana Gilgamêş de tê berçav. Ev dem, ku di destana gilgamêş de tê berçav, deme ku ji demeke têgihiştinê buhurîna deme dî ye hê têgihiştinê

ya. Mirov wê ji kifş dike. Nirx û nêzîkatî bi têgihiştin têde hene û têne berçav. Mirov wê ji her weha dibîne. Li ser wan re hanîna ser ziman heya. Gund, di wê demê de pêşketine. Bi wan re ji, buhurîbûna bajarbûnê bûya. Li ser bajarbûnê re waletbûn bûya. Gilgamêş bixwe ji, keyê *bajarwaletêkî* ya. Mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Lê ew deme ku pê re tê ser ziman, di wê demê de hebûne navê xwûdê hatiya kifşkirin û pê re ji, bi navê wî re pergalak ji hatiya pêşxistin. Ew pêşxistin ji, demne pêşketinê yên ku mirov wan pir mazin bêne ser ziman buhurandîna. Hebûn û navê xwûdê serseriya wê li dinyê û li jiyane bi têgihiştine wê ya bi pergal bûya. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku di deme sumeriyana de olîtiyê her weha bi hizre xwe bidest afirandinê pir mazin kiirya. Hizre serwerbûn û serdestbûnê ji bi pêşketine navê xwûdê re diafirê. Her bajarwaletê ku bûya xwedî xwûda, di xwezê ku xwûdayê wan bibe yê herî mazin yê li dinyê. Bi vê yekê ji divêt ku ew serwerî her derî bibe. Bi vê yekê ji êdî bidest bindestkiirina herême û deveran tê kirin bi navê xwûdê û ji bo xwûdê di demê de. Ew yek, wê bi xwe re demeke nû bêne ser ziman. Ev yek, wê bi xwe re pêşketineke nû ye ku mirov wê êdî bi serdestiyê bêne ser ziman wê dest pê bike. Bajarwaletê ku xwûdayê wan xurt yê ku ew bi ser dixistin di vê yekê de. Her weha bawerî ji diafirt.

Bi vê yekê re, weke ku di dîrokê de ji bo demên pêşketinê yên deme mîtolojiyê tê ser ziman, êdî şerên di nav xwûdayan de bi mirov re di jiyane de dest pê dike. Wateyeka wê hebûne şer ye ku di mitolojiyê de tê ser ziman heya. Mirov divêt ku wê ji fahm bike. Ew, di aslê xwe de bi vê yekê re êdî şerê serdestbûnê ya. Wilo tê berçav.

Mirov, di deme mîtolojiyê de, hem di serê xwe de û hem ji bi vê re di jiyana xwe de hema bêja bi tememî serweriya xwe li hevdû û xwezayê dike. Wê bi ser dixe. Mirov karê vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Mîtolojî hate ku deme wê tê ber buhurîbûne wê, her weha ev yek bi serketin bi serdikeve. Bi vê serketinê re mîtolojî demên xwe di buhurêne demên olê. Deme olê ji destpêkê, ku mirov gotinekê di vir de bi vê ve girêdayî pêre bêne ser ziman, mirov vê bêne ser ziman û bêje. *Jiyana li dinyê, bi yekbûna ku bi navê Xwûdê re hatiya çêkirin gihiştîya yekbûnekê û astaka bilind.* Êdî ew yekbûn, wê pêşketine xwe bi pergal di jiyane de bide berdewam kirin. Wê pir bajarwaletên ku hene di bin siha xwûdayakî de bigihêne hevdû. Ev bi pergalbûna bi hev re bûnê ya. Sumeriyana, ev yek di deme xwe de bi pêşxist û bi ser xist.

Navê xwûdayan yên ji deme suemriyan mana yên weke *Enlîl, Enkî, Îştar, Lîrit* û hwd, hê gelek navên wilo hene. hemû ji navê yên ku di wê demê serek an ji key ji bûn. Zagonên jiyandinê yê bi xwe re hanîna ji hene. Ew pir mazin pêşketineke mazin bi xwe re dihênin. Sumeriyan, wê piştî wan re, wê ew pêşketine wan ye ku bi wan re di deme wan de bûya, wê bê temenê pêşketineke mazin ye di demên pişt wan re de. Pişt wan re, Ji aqadiyan û babilîyan bigire hate digihê Urîyan, Mîtaniyan û Hûrîyan û hwd, demên şaristanan û şaristaniyê pêş dikevin. Ev demên pêşketinê, deme Sumeriyan, çi pêşketin û têgihîştin jîn kiriya û pêşxistiya, li ser wê pêşketin û têgihîştinê pêş dikevin û mazin dibin. Piştî sumeriyan re, wê êdî dem bi dem wê li gelek der û deveran wê şaristanên nû wê rû bidin. Wê derkevin û pêş bikevin. Lê Hemû ji wê pêşketine deme sumeriyan ji xwe bike bingeh û pêş bikeve. Ev yek, her weha bêgûma e. Piştî sumeriyan re, şaristana ku li ber Çemê Nîlê pêş dikeve ye Misre kevn heya. Misre kevn, ne Dûrî berdiclê û firatê Kurdistanê ya. Ew jê demeke dirêj di hildin û di xwe de pêşketinê jîn dikin. Li Kurdistanê ji di wê demê de ji deme sumeriyan hate deme Mîtaniyan û Hûrîyan pêşketineka mazin bûya. Bi teybetî i demên Xanadanên Kîş û Urîyan, têgihîştineke mazin ku pişt re ku jê bahs bê kirin wê bê gotin ku statûqû ji *di xwe de bi wê pêşketine xwe bi pêşxistin* pêş dikevin. Wê pêşketine wan, temenê pêşketineke mazin avêt. Pişt wan re li Kurdistanê hate ku dem tê deme Gûtî û Naîriyan ji, ew pêşketin mazin tê jîn kiirn. Gûtî û naîrî, wê pêşketine di astaka din de jîn dikin.

Gûtî ji û Naîrî ji çendî ku demne ku bi sadsalan tê ser ziman dijîn ji, di derbarê deme wan de î ro em ne zêde xwedî agahî ne. Afirandin û nivîsandinên wan ji ji ber şer û pevçûnên ku bûna ne gihiştine roje me. Hemû hatina xuruxandin. Navende Gûtîyan li Kurdistanê di wê demê de Herême botanê bû. Naîrî ji ji wir dest pê dikin, lê pişt re ew navende di xîşiqênine bi aliyê Herême Kurdistanê Aliyê Serhadê wanderan, ku ji wir êdî hate Zagrosan wanderan serweriyaka mazin ye bi demê re li herêmê pêş dixin. Di wê demê de bi pêşketine Asuriyan re êdî hin bi hin weke ku li herêmê demeke din êdî li ber vebûnê ya. Asuri, ku hinekî pêş dikevin pişt re ku serweriya li wan herêman pêş xin. Pişt re serweriya wan demekê ku kurdistanê dibe. Ew dem ji rastî deme Naîriyan têt. Ji xwe, ew bi tê biirina rêveberiya Naîriyan li herêmê serdestiya xwe mazin dikin. Şerê di naqabîna wan û naîriyan de yê di sala 1128an de berî zayîne baxê wan û naîriyan bi hev re kifş dike. naîrî bi têkçûna wan re baxtê wan kifş dibe û Asuri ji bi serketina wan re baxtê wan alî wan dike. Tê gotin ku

Asuriyan bi tēkçûnê re 43 keyên naîrîyan yên ku î ro ji wan re *mîr* ji di nav kurdan de tē gotin tē dilgirtin û di berêla bêşan de serbest tēne berdan. Ev dem, demeke nû ya li Kurdistanê. Lê kurdistanê çendî ku serweriya xwe ya mazin ji ser xwe winda dike ji, her weha hebûne wê wilo zêde ji holê narabê.

Li Kurdistanê, di wê demê de ji serwerî heya. Lê serdestiyaka mazin ye Asuriyan ji heya. Mirov divêt ku wê ji bêne ser ziman. Ji deme wî şerî hate ku dem tē sadsalên 8. min û wan, êdî serwerî berdewam dike. Lê piştre, êdî hin bi hin bi demê re weke ku ji holê rabûn dibêt. Lê kurdistanî wê yekê herê nakin û li ber wê li ber xwe didin. Bi pêşketinên bi tēghiştinê re dijîn li Kurdistanê serî hildanên wan ji hene. Ji sadsalên 8 hate dem sadsalên 7. û 6. min ji, her weha ew rewşe li berxwedanê berdewam dike.

Herê mê hate ku dem hatiya wê demê, pêşketinên bi hizrî ji pir mazin hene. Di deme Gûtîyan de pêşketineka mazin di deme wan de jîya ya heya. Gûtî ne bin 300 salî re di deme xwe de serwer wan. Pişt wan re Naîrî ji, her weha demeke wilo serwer man. Li gor pêşketine herê mê ku mirov pêşketine wan bêne ser ziman, mirov karê wê pêşketine li herê mê weke pêşketineke antikî bêne ser ziman. Di wê demê de Li Misre kevn ji pêşketineka mazin heya. Ew ji berê wan li ber Diclê û firatê û bi pêş dikevin.

Li herê mê, hate wê demê Pêşketineka mazin ye herê mî û dem dirêj li Kurdistanê û li Misre kevn heya. Ev herdû der, bi pêşketine xwe re li herê mê xwediyê pergala mazin yên ku bi pêşketine xwe re xwediyê demne dirêj in. Hata ku dem tē deme Derketina Mediyana, êdî pêşketine herê me careka din, weke geş dibe. Mediyana, ew serihildanên ku li ber Asuriyan ji sadsalên 8. min û wan dest pê kirina, di dawiya sadsala 7. min de ancâmê di hildin û li herê mê careka din kurdistan bi pêşketina rêveberiya Mediyana re ku li herê mê bigiştî serweriyaka mazin ye pir mazin heya derdikevine holê. Li herê mê serwer dibin. Digihina asta împaratoriya mazin ku herê bi ser anatolia de ku wê bixwezê bike bidestê xwe de. Li herê mê çend xalk hene di bin *serbanê* wan de lev digihine hevdu. Medî, li herê m Li Kurdistanê pir mazin xwediyê pêşketinekê ne. Ew pêşketine wan, herê mên dora wan ji xwedî dike. Bî teybetî ji, ji herê mên weke Anatolia mirovên ku piştre weke filozof tēna nas kiirn Thales diçina wir û li wir xwe mazin dibin bi zanebûnê û piştre di vegeirihin û divegeirihin.

Kurdistanê, pêşketine wê ya van deman û hinekî demên wê yê berê ji

ku tê ser ziman bi navê *Mesopotamya* tê ser ziman. Ev beêjeyeke teybet ku têde û pêre gelek pêşketin û têgihiştin tê ser ziman a. Bi vê gotinê ji divêt ku mirov hinekî bi çend gotinan ji bê bêne ser ziman.

Bi navê mesopotamya re ku mirov demên kurdistanê yê berê bi bîr dike, hingî pêşketineka mazin dikeve hişê mirov de. Bi teybetî ji, emê deme mediya hinekî li ser bisekin in. Ew dem, demeke ku êdî felsefe serdest bûya. Pergala wan ye ku afiriya ji bi têgihiştine felsefê afiriya. Ji ye demên berî xwe cudaya. Bi vê yekê, pir mazin li pêş in. Zanistê ku bi aslê xwe ji kurd û herême hawramanê, yên weke Zerdest ji derdikevin. Wan hizreke mazin ku ew pê weke pêxember têna ser ziman haniya ser ziman. Wî bi hizre xwe re rastiya têgihiştina deme rastiya berçav. Li *ser gotina qanc û kirina baş û tevgerê rast sekiniya*. Ew zanebûnê ji xawêneke mirov ye ku bidest kirî dibîne. Li ser kirin û tevgerê pir disekinê. Rastiyê ji kirina baş di hasibêne. Zerdest, bi têgihiştin di nav dem û rewşan de bi nêzikatiyaka bi teher têkilî daniya û ew ji haniya ser ziman. Wî wilo ji bawer dikir. Wî pê hizre xwe haniya ser ziman. Di deme wî de felsefe dihate afirandin. Ew ji, di wê deme afirandinê re afrînerêkî pir mazin bû. Bi vê yekê, divêt ku mirov wê pir mazin û qanc bêne ser ziman. Di deme Mediyan de, hizre ku pêşketibû, civaknasiya wê pir xurt e. Divêt ku mirov wê ji bi teybet bêne ser ziman. Ev dem, di pêşketine têgihiştin û felsefê de û dîroke wê de demeke pir girîng e.

Deme mediyan, mirov divêt ku bêje ku zanistên wan pir hebûn. Yên ku felsefe di afirandin pir bûn. Di civat û levcivînên xwe de pir jevre dihanîn ser ziman. Hizre xwe jevre bi par dikirin. Mirov vê yekê karê bi hesanî bêne ser ziman. Ku Kurdistanê li ber Diclê û li ber firatê ji, pêşketine mazin ye bi pergala hebû. Ola yek- yazdanî ji bi Êzîdîtiyê re pêşketibû û têgihiştine olên mazin yên ku piştê bidest afirandina xwe kiirbûn weke Cihutiya ji dabû kifş kirin. Ji deme Nebî Nuh, Her weha ew pêşketin hebû. Nebî Nuh, warê wî berdiclê Herême botanê ku bi navê Î ro Cizîre botanê tê ser ziman û di deme Gûtiyan de bi navê "Gerzûbaqarta" û an ji piştê bi navê "batanê" hatiya ser ziman bû. Li wir, hingî ava Diclê pir bilind bû. Tirba Nebî Nuh li ber Ava Diclê hatibû çê kirin. Destana Tûfanê ji nivîsandina wê li wir e.

Di rastiyê de ji deme Mediyan pêde, mirov karê dem bi dem, êdî demên pêşketinê yên ku tenê bi hebûne têgihiştine felsefe û bi wê bi xwe re bi pêş dikevin bêne ser ziman. Êdî ji Mediya, mirov wê wê destpêkê bide destpêkiirn û ji wir ji were hate anatolia û Grekê û li wanderan pêşketinên ku bûna bêne ser ziman. Wê êdî têgihiştine felsefe û ol wê bi

hev re demeke xwe ye bi hev re ku bi teybet bidine dest pê kirin. Wê bi hev re ku bandûra wan jevre pir mazin e bi pêş bikevin.

Serdeme mediyan ye li ber Kurdistanê ye ku pêşket, ji aliyê hizir ve ji pir mazin bandûraka wê li pêşketine têgihîştinê ye ku pêşket bû. Di pêşxistina wê ye li herêmên din yên weke Anatolia û Grekê wan deran bandûra wê bû. Ji serdeme ku Homeros jîn bû hate ku hate wê deme ku Athane ku weke navende wê ya ku pêşketineka mazin bû ji, van herdu herêman pir baş û di cih de Kurdistan û çanda ber Diclê û firatê wan deran xwand. Homeros bixwe ji tê wan herêman û ji wan re hate ku tê gotin ku xwe digihêne Misre Kevn ji. Her weha li herêman digerihe û vegotinên li wanderan yên wan herêman têne vegotin his dike û piştê bi wan re vegotina xwe amede dike. Pişt wî re her weha Thales ji diçê, Mediya û li wir gelek salan ji dimêne. Li cem keyê med ji demekê dimêne. Piştê di vegehihê û tê. .. Weke wî Herodot ji çûya wanderan. Di *dîroka* xwe de ji wê nerîn û di wê deme xwe de ji wê hiskirina xwe nivîsandina baş ji di derbarê wan de dike û bi xwe re dihe.

Li Anatolia û Grekê, ji ber hahra reş hate digihê ber Qibrisê li ber avê pêşketineke mazin rû dide. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku pêşketineke mazin dibê. Hate ku dem tê sadsalên 5. min 4. min û bi vir de, pêşketineke ku hin bi hin bi hizir û pêşketine wê dibe û geşbûnekê çêdike heya.

Di rastiye de, ku mirov bêne ser ziman, Medî, bi du sedeman têk diçin. Yek ew şerên ku bi hêzên herêmê yên weke Lidya û wan re kirin û bi wê re bi sînor neman hata bi navên anatolia çûn û li wanderan bi armanca kirina bindest de şerên ku ketina wan de, çendî ku bi ser ji diketin, lê ji ber ku bi wan şeran hêze wan kêmbû, êdî ew ji kêmbûn dibûn. Ji aliyê din ji hêrîşên hovan ji li wan û herêmên wan hebûn. Wekî din ji, di nav wan de ku hate wê demê bideng jiyabû, xanadana persan mazin bûbû û êdî bidest bidestxistina hêzê kiribû. Bi vê yekê û tekoşînên di qasrê de yên ji bo serweriyê û hêrîş û kêmbûna hêzan di şeran de têkçûn dibê. Di qasrê de Kîrusê ku ji aliyê bav ve digiha kurdan û ji aliyê dê ve digiha persan, di qasrê de bi aligirên ku ji xwe re çêkir re serdestî bidest xist û bû key. Ew bûna key ye wî bi destpêka ji holê rabûna Mediyan bixwe ji. Piştê wî ji, bi şerên ku dana kirin, êdî di qasrê de hate kuştin. ..

Lê di wê heyemê de pêşketineke pir mazin ku çavên mirov jê ne diçû hebû. Pir mazin pêşketinek hebû. Ew rewş, wê hebûne xwe di piştî mediyan de ji hate demekê bide berdewam kirin. Ew xweşikbûn wê hate

hatina Îskenderê Zûrqerneyn ye li Kurdistanê wê hebûne xwe bide berdewam kirin.

Di wê demê de bi têkçûna Rêveberiya Mediyana re êdî weke serdeme kurdan li Kurdistanê winda dibe. Êdî di pêşketin û pêşxistinê de ji di asta rêvebertiyê de ne wilo li pêş in. Lê di serberçav in û di herêmên xwe re kifşkar in. Hizir û pêşketine wan pêşketinên piştî ji dide kifş kirin. Piştî ne bi gelekî re derketina holê rêveberiya pers Aqamanîş ji li ser wê pêşketinê û wan nirxan hebûna xwe dide ava kirin. Divêt ku mirov vê ji bêje, êdî herême weke berê nabê kifşkar. Mafê kifşkariyê herême anatolia û Grek dihildest. Ew êdî di pêşketine ku dibe xwedî weyn in. Pêşketinên ku hate wê demê bûn û têgihiştine ku bûya û afiriya, grekî sentezeke wê ye pir mazin di xwe de bi pêşxistina felsefê re didina çê kirin.

Demên kevnera(antîkî) û destpêkirina serdemek nû biaqil. ..

Piştî Thales re Anaqşîmes û Anaqşîmedres derdikevin. Ev herdû, kevneşopîya Thales didina berdewam kirin. Têgihiştina bi felsefe re ku wî haniya ser ziman, ew hinekî bi rêxistin dikin û didina berdewam kirin. Piştî yê wê werin ji wê wan ji li berçav bigirin. Piştî ne bi gelekî re wê li Girekê Filozofên weke Democrates wê derkevin. Ew ji, hizre ku tînine ser ziman, hinekî di bi felsefe bi pergaltira û têgihiştinê bi bûna jiyane û tîmenê wê û destpêkirina wê re bi hizre xwe re di nav xalkê de didina dest pê kirin. Ew di nêzîkatîya xwe de bêhtirî pêzavî ya. Ew, hizre wî bi yekbûnaka bitêgihiştine tê ser ziman. Li ser cewherê ku hebûne jiyane û berî wê dinyê jê dest pê kiriya dihizirê û wê xalê weke 'şaneyeke ku di derbarê wê de wilo zêde ti tişte neyê zanîn' hizre xwe dihêne ser ziman. Wî xwestiya ku îzahaka ku bêgûman ji hebûnê re bêne. Wî hanî ser ziman û got ku "her tiştên ku di xweza û fezeyê de dijîn, pêwistiyeka ku ew bêçare li gor wê bijîn heya. Her tişte ku heya mirov bixwezê jê re îzahankê bêne ji herzekê pêve ne tişteke. Tişte nebûyî, winda nabe û ye ku nayê guharandin e. Ew ji cewher e. Ji wê ji ye li berçav "camîd" çêdibin". Ew her weha hizreke di derbarê şaneyên ku temen di afirênin ji li ser wan hizreke dihêne ser ziman. Bi vê yekê xwestiya tîkiliye di nav ji berê ve bûnê û sermediyê ji bi hev re dêne holê. Ya bêdawî ku hertimî mayindaya û ye ku hertimî tê guharandin û ne mayinda ya. Filozofên weke Parmenides ji, bandûra wê hizre wî ye ku ew tîde dibêje ku "hemû tişt yek e û nayê guharandin, ya dayimî û ku hertimî ya" ji li ser wî heya. Ew hebûn(jînda)yê teqez dibîne. `Ti tişte ku heya, ne ti tişte ku nîn e´. Ev

gotin, cewherê hizre wê ji temen dihêne ser ziman. Anaqsîmenes yê ku pêşî vacê di hizre xwe bi têgihiştin bi kar dihêne. bandûra wî li ser Parmanîdes ji heya.Lê Parmanides, rastiye û sehê, di xwezê ku ji ser bêjeyan re jev cuda bike. Bi vê yekê, di xwezê li ser vacê bigihê têgihiştinê bi jiyane re. Li gor wî, tişte ku mirov li ser hebûnê bêje ew ku biheyî heya û hebûne. Bi vê yekê, têgihiştinê di dene holê.Weke wan Empedokles, yê ku êgir, av, hewa û axê bi hev re di hizre xwe de bi jiyane re bi temen dike û dihêne ser ziman e. Ev hemû elementên ku li ber diclê bi têgihiştin bûn û pêre ji ku mirov bi ser bike ax ji deme sumeriyayî ve pîroz dihate dîtin û bi axê ve girêdayî jiyayî dihate ser ziman, ew bi wê ji xwe re felsefeye dihêne ser ziman. Bi van filozofên xwezavan re divêt ku mirov Anaqsîgoras ji bêne ser ziman, ew piştî ku di srê xwe de hinekî bi hizir dibe. Bi ewrîpîdes re dikeve têkiliyê de û bi hev re li ser cism û hebûnê li azmana bidest hizirandinê dikin. Mediyayî, di nav xwe de bi Magûyan re ew kar weke karekî bi pîroz hildabûn dest û jê stêran û cismên azmana yê wilo demên ku wê werin di derbarê wan de dibûna xwedî zanebûn. Bi wan re, ev ji di buhurê herême Grekê. êdî li ser van temenê bi xwezêbûnê pêşketineke mazin dibêt. Her weha hate dem tê deme Sokrat, pir filozofên ku mirov weha bêne ser ziman hene. Lê ji vir pêde, bi sokrat re, êdî deme filozofên xwezavan tê bidawî kirin û êdî deme nû ye bi sokrat de tê dest pê kirin. Ew ne weke xwezavanekî tê nas kirin. Bi hizrên xwe re Sokrat demek pêre tê dest pê kirin. Platon, xwandavanê wî yê ku li ber destê wî di xwêne ya. Ew hizrên wî yê ku jê his dike dihêne ser ziman.

Li grekê û li dora wê bi vê yekê, êdî weke ku deme xwe ye pêşketinê dide dest pê kirin. Piştî wan filozodên xwezavan re êdî filozofên weke Sokrat û Pê re Platon derdikevin. Platon bi goftûgoyên ku di rijênê ser ser rûpel re demekê dide dest pê kirin. Herkesek bi wan nivîsên wî, wî û mamosteyê wê Sokrat nas dike û hizre wan fêr dibe. Platon ji fêr dibe ku weke mamosteyê xwe i goftûgoyan bide fêr kiirn. Di felsefe xwe de Platon li ser zanebûnê û nemirbûna giyanê di sekinê. Pir li ser wan tene ser ziman. Li ser evrenê ji hizrên wî hene. Li gor wî temenê xawênîyê zanebûn di afirêne, lê cewherê wê ji têgihiştine hizran e. Li gor wî, Jiyanaka bi xawên ji bi domandinê tê bidest xistin. temenê wê ji zanebûn e. Zanebûn ji li gor wî bi têgihiştina hizran a û jiyayî di dawîya xwe de cihê wê ye ku koçî wê dike ji "cihê hîç mirin lê nîn e" ya.Li gor wî qancî, jiyana rast armanca wê ya.Li gor wî giyana mirov nemir e. Ji ber vê yekê ji, fêrbûn ji li gor vê ji bo mirov tişteki ku bê bir xistin ji wê pêve ne

tê Kurdistanê ji. Deme ku tê Kurdistanê, bi hêzeke mazin tê. Kurd ji, ku fahm dikin wê nikaribin xwe li ber wê hêze pêre ya pir mazin bigirin, êdî xwe dispêrine Zagrosan. Ew çend ku diçê wir bi ser wan de ji, nikare herê û xwe bigihêne Wan. Çend, hêze wî diçê wir, li wir tê têkbin.

Ew dem, demeke ku kurd hê ji li herêmên xwe bi hêz in. Hate wê demê ji, çendî ku di qasrê de bi persan re li ber hevdûbûna hebê ji, di qadê de di wê rewşê bi hev re ne.

Di deme Pêşketine Helenizmê de, pêşketineke ku êdî tede Hest û raman bi hev re derdikevine holê û bi pêş dikevin dibêt. Wê pêşketinê, li herêmê ji bandûra wê dibêt. Lê ew pêşketin, di wan demên pêşketin yên bi felsefê re demeke nû ya. Ji demên berî zayînê ji 250 û wan dest pê dike û berdewam dike. Hate deme zayînê ji berdewam dike. Wê ew pêşketin bi têngiştine felsefe yê li ber Firatê ku li Rihayê ku bi Birehim xelil re pêşketiya û ye ku li ber Diclê ku li Cizire bota ku bi Nebî Nuh re pêşketiya re wê bandûra wê li derketina filahiyê ji bike. ..

Di vir de bêlî ku em hinekî ji pêde herîn, em li ser pêşketin û têngiştine felsefe di çerçove pêzaweriyê û mengiweriyê de ji hinekî bînine ser ziman. Bi têngiştine ku derketa holê re, hizre olî ji hinekî dî ji di xwe de bi rêxistin û pêşketî bû. Êdî Ew ji di têngiştine xwe de kete demekê nû de. Di demên wê yên pêşketine wê de ji, nîqaşên ku derketin bûn. Biqasî nîqaşên mazin yên diî naqabîna di nav felsefe mengîwer û felsefe pêzawer de, nîqaşna weha yên mazin di her aliyê bixwe de ji bû. Felsefe Pêzaweriyê, di nav xwe de bi têngiştin û nêzikatiyên jê cuda hatina di nîqaşê de bû. Her weha mirov karê bo aliyê felsefê yê mengiweriyê ji bike. Ev nîqaş, hin bi hin ji êdî zêdetir dibin. Wê di demê de hin bi hin zêde bibin û hebûne bidina berdewam kirin ji. Ev ji aliyekî dî yê pêşketine ya û ev alî wê pêşketinên piştre wê pir mazin bê xwedî weyn ji. Bi teybet ji. di demên serdemên navîn de wê bandûra van nîqaş û hizrên ku d'têne holê wê bêne dîtin. ..

Ji demên sadsalên 7. min û 6. min hate dem tê deme zayînê her weha pêşketineke mazin ye ku mirov wê pir mazin bêne ser ziman heya. Ew pêşketin ji, demê bi pêşketinên bi felsefe re diafirênin. Têngiştine bi felsefê re êdî dem û pêşketine di deman de dide kifş kirin. Pêşketinên ku di bin ji, yên ku êdî yên demên serdeme ku felsefe bi têngiştin û pêşketinên bi xwe re lê serwer û serdest in. Ev rewş, hate deme zayînê berdewam dikin. Di deme zayînê de, êdî bi derketina Nebî Îsa re demeke nû temenê wê tê avêtin. Ev dem, bi derketine filahiyê re ne tenê dîroka olê dikeve demeke nû de, dîroka mirovahiyê ji dikeve demeke nû de. Ole

nû ye ku derdikeve ji ole deme serdeme ku felsefe lê serwer e. Ol ji vegotinan hate dûr kiirn. BI felsefê têgihîştine wê û pergala wê hate afirandin.

Berî ku em hanina xwe ye li ser ziman de ji vir bi buhurin û herine deme piştê, divêt ku em bi çend gotinan ji bê, hinekî li ser Roma û pêşketine wê ji bînine ser ziman. Ew pêşketineka wê ya mazin heya. Ji demên berî zayîn ji sadsalên 5. min û wan ve pêşketineka bi komarî di xwe de dike. Lê piştê hin bi hin peresendî împaratoriyê dibe. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji, weke ancama wê pêşketine ku ji Girekê û herêmên xwe biriqîna wê derê bûya bêne ser ziman. Li wir ji filozofên ku mazin ku navê wan derdikeve derketin. Wan ji pêşevaniya wê pêşketinê bi hizre xwe re kirin. Li Romê filozofên weke Cîcero ku deme ku di axiftin biqasî wan dengxweşên kurd ku li civatan di rûniştin û bi dest gotin û vegotinê dikirin û bi deng xwe re mirov di serê xwe de ji xwe dikirin karibû xweş biaxivê û lev bêne. Bi vê aliyê wî ji hinekî navê wî derdikeve. Hinekî dî ku mirov bi vir de tê, êdî filozofên weke Sanaca ji derdikevin. Hate ku dem tê deme zayinê yên weke Lutretianus ji derdikevin. Dîroka romiyan, biqasî ku di pirtûkên Homeros de ji tê ser ziman, bi derbasbûna *Etrûskan* ye li wê herêmê re destpê dike. ..

Ji deme Komarê ta deme împaratoriyê pêşketineke mazin dibêt. Deme împaratoriyê, bi serwerî û serdestiya herêmên din kiirna bin destê xwe de êdî dest pê dike. Ji afrîqa ji qartaca hate ku tê rojhilat ber Misre kevn û ber bahra reş di qadaka mazin de şerên wan yên serwerbûnê hena. Di gelek de ji bi ser ji dikevin. Roma, xwediyê têgihîştineka ku mirov wê bi ye deme pêşketinê ye deme felsefê re bêne ser ziman a. Ew, di aslê xwe de, weke ancama wê pêşketine deme felsefê ya. Piştî têkçûna Mediyana, rêveberî keta destê Persan de, Wan ji pêk ne hanî ku aramiya herêmê bi afirênin. Kurd ji, mafê çûna serdestiyê di wê demê de ne distandin. Hate ku tê deme Şasaniyan, wan, hinekî weke ku li berxweda dî dîrokê cih girt. Lê ew li berxwedan ji, her weha bi hatina romiyan ye li herême û ketina herêmên kurdan û wan de, dibû. Kurdan, li ber wan li berxwedana mazin dida.

Herêm, hate wê demê di bin serdestiya romiyan de bû. Hate ku dem tê deme zayinê, li gelek herêman bi xuruxandinê ji bê, serdestiya xwe ava kirin. Di sadsalên 3. min de di berî zayinê de hate bi ber Misre kevn diçin. Ku pirtûkxane Îskenderiya bi hezaran pirtûk têde hebûn ji aliyê keyê romî yê bi navê Theodosiusê yekem ve di sala 391an berî zayinê de hate xuruxandin û şawitandin. Ew şawitandin, weke nîşanaka

serdestbûnê hatibû nîşandin. Piştê li Rojhilat rewşên wilo berdewam kirin. Hate ku tê deme Juliu Sezar ji, ew ji deme ku bi hêze xwe re diçê wir, wê careka din wê di şawitêne. Li Kurdistanê, di wê deme ku Îskenderê Zûrqayneyn hatibû de, hingî her weha pirtûkxaneyên wan yên bi hezaran pirtûkan hatibûn şawitandin. Ji ber wê bû ku kurdan navê Îskenderê Zûrqayneyn lê kiribû. Kurdistanê, wê demê bîreke xwe ye ku pir kur ye bîrê winda dike.

Dem hate ku tê deme zayinê, pêşketinne mazin dibin. Lê şer û pevçûnên mazin yên weha ji dibin. Bi van şer û pevçûnan, dinye weke ku bi awayê ku heya, guharandinekê jîn dike. Lê ev şer û pevçûnên ku dibin, hemû ji weke ku me li jo hanî ser ziman, divêt ku mirov wan bi teybet fahm bike. Pergalên di afirin yên weke yên roma, her weha di hebûn û pêşketine xwe de li gor pêşketin û têgihîştine ku bi demê re bi felsefê re jîn bûna hene. Bi vê yekê, mirov karê bêne ser ziman. Jiyan, hebûna wê her weha di hundurê êqil de tê ser ziman. Lê ew ew hatina li ser ziman, bi ser xwe weke ancamedê ya. Pêşketinên ji sadsalên 7. min pêde bin, mirov karê bêje ku hemû ji weke yên ancamedên pêşketin têgihîştine felsefê ne. Dem hate ku deme zayinê, mirov karê bêje ku êdî bi pêşketinên bi felsefê re weke êdî di jiyane de bi pêşketinên ku bûna êdî têrbûnak bûya. Serweriyaka pir ya bi aqil ye bi felsefê afiriya. Hizir, êdî li gor wê di afirêne û ew ji serweri jiyane ya. Ji aliyê olî ji mirov karê bêje ku weke olê yên xwûdayî, bi rêzê ji êzîdîtiyê hate ku dem tê cihutiye pêşketineke baş bûya. Bi ser bûna cihutiye re ji demeke pir mazin ye bi hizir bûya. Êzîdîti ji û cihuti ji olên deme pêşketinê yên civakatiyê na. Her weha mirov karê wan bi teybet ji bêne ser ziman. Lê ew dem ku têve diçê, êdî pêşketin bi hizir mazitir derdikeve holê. Di deme Êzîdîtiyê de li ber Diclê û firatê pêşketineka civakê bi awayê xwe re hebû. Deme ku Cihuti derdikeve, ew ji bi awayekî dibe ole wê demê. Her weha mirov karê wê bêne ser ziman. Bi wan her dû olan re ji re pêşketinek bû. Cihuti, deme ku dem tê demê serweriya roma, ew bi xataka ku xwe bi wê didina herê kirin û ji aliyê rojava xwe bidest pêşketinê dike. Lê êzîdîti ji, weke xwe dimêne û wê kevneşopîya xwe xira nakê û di ber diclê û firatê re di wê xatê de pêşketine xwe dide berdewam kirin. Bi wê re, hate ku dem tê wê demê ji, mirov karê bêje ku pêşketineke mazin bi wê re ji bûya. Mître ji û Piştê Zerdsşt ji, piştê ku derdikevin, wê xatê û pêşketinên têde li berçav digirin û pêş dikevin. Ew weke xata li rojhilat tê berçav.

Bi vê yekê, êdî hinek navendne pêşketinê yên ku weke navendên şaristaniyê yên jev cuda derdikevin. Bi Grekê û pêşketine wê ye ku ji

sadsalên 7. min pêde di xwe de daya jîn kirin re, serweriyekê wê û li pêşbûnaka wê hebû. Wilo dihate berçav. Lê bi pêşketinek roma re, ew pêşketin ji, ku awayê xwe yê statûqûtiyê diafirîne, êdî hin bi hin, êdî weke çirayaka ku file tê kişandin li xwerê, kêmbûn û mivirandin çê dibe. Di deme zayinê de, ku dem tê deme derketina filahiyê, êdî rewşan wê filahî bide berxwe ku wan ji holê rakê. Yek, wê statûqûtiya ku afiriya wê bi awayekê artarnatifikê jê re çêke. Ye duyemin ji, xata olê ye ku bi yek-yazdaniyê destpê kiirya û bi rêzê bi êzîdîtiyê û piştîre cihutiyê re hate ku hatiya wê demê, êdî ku wê xatê li gor demê bi têgihîştine ku bi felsefê re hate demê ji ku afiriya li berçav bigirê û pêşketinekê têde çêkê. Ye sêyemin ji, her weha di wê pêşketine felsefê de bi xwe re demekê pêşketinê bi têgihîştine wê bide dest pê kirin û êdî bi wê re hebûna pêşketine ye li jiyane bê berdewam kirin. Vê xalê mirov karê bi vî awayî ji bêne ser ziman û bêje ku *êdî deme ku têde hate wê demê mîtolojî dihate ser ziman bide girtin û êdî hemû tiştî û pêşketinê êdî bi hizir û felsefê bêne ser ziman*. Bi vê yekê re, mirov karê vê ji bêne ser ziman û bêje ku êdî hizir serweriya xwe li jiyane di denezêne û ew ola nû ye ku derdikeve ye ku navê wê filah e, êdî dibe ole wê deme aqil. Bi vê yekê, ji her aliyê ve bi aqil tê ser ziman. Jiyan, ji her aliyê ve bi aqil tê ser ziman. Hebûn xwûdê ji, bi aqil û asta wê ye ku hate wê demê afiriya xwe bi têgihîştin û bi pergal tê ser ziman.

Wekî din ji, mirov karê bêje ku êdî ol bi pergala xwe re serweriya li jiyane li hemû aliyên wê di danezêne. Vê yekê ji her weha mirov karê bêne ser ziman. Pêşketinên ku bi rome re bûna ji, zanebûnak dana çê kirin. Wekî din ji, hizre olî êdî mirov bi felsefê dike navende xwe de û tê ser ziman. Rahm û wijdan, du bêjeyên ku felsefe wê bi awa dikin in. Li gor wan, êdî li rome ji tê meyîzandin û nêzîkatîya rêveberîyan ye li mirov û jiyane wê çawa bê, li ser hizir tê afirandin û tene ser ziman. Bi vê ji, nêzîkatîyaka baş tê xwestin. Bi hizir û têgihîştin, êdî ji nû şiroveyne ku tene kirin û serweri jiyane dibin çêdibin.

Nebî îsa ji, deme ku hizre tene ser ziman û mirov lê dihisênin, pir jê bi bandûr dibin. Ew bangî wijdanan dikê. Hizre ku dihene ser ziman, êdî wilo dihene ser ziman. Bi vê yekê, êdî deme hemdem ye nû ye ku êdî wê hizir bi hebûne xwe ye awayê felsefê re wê serwer bibe tê jîn kiirn. Parastgihên wê demê ji, ne weke yên berê ne. Li wir, pêşketine felsefê ya ku hate ku bû ya têde tê ser ziman. Têde perwerde kirin ji dibêt. Ev ji bi felsefê dibêt.

Ew deme nû, ye ku tê holê, êdî jiyane bi wê bi felsefê diafirê.

Nêzikatiyê bi aqil têne nîşandin. Lê hê ji, felsefe ji û aqil ji, ji yên serdest tê pirsin. Hê nebûya malê girsayan. Lê ev nîşanak ji, nişanakên wê ne, ku wê êdî ev yek hin bi hin pêk were di jiyanê de. Piştî, derketina filahiyê re, êdî ew awayê rêveberiya romê ji, êdî mafê pêşketinê di jiyanê de ji xwe re nabîne. Êdî ew ji, hin bi hin ji holê di rabê. Piştî ku filehî derket û nêzî 314 an ji 315 salan ne fermî hebûna jîn kir, piştî ku ji aliyê rome rojhilat ve hate fermî kirin û weke ole xwe ew ol denezand, êdî aliyê wê rêveberiyê yê rojava ji xwe li gor wê adiland. Bi vê yekê re, di rastiyê de, ew ole nû ku bi girsayan tede bicih girtibûn, êdî bû fermî û êdî demeke nû dest pê kir. Bi wê ole filahiyê û her weha bi lê xwedi derketinê fermî kirina wê re rojava xwe gihanda hizre xwe ye bi pergala ku rojava gişkî bike nava xwe de ye pêşî.

Rojava êdî bi wê pêşket. Rojava, ji sadsalên 7. min û 6. min, hate ku digihê sadsalên 2. min û piçekî dî ji bi vir de, zîndîbûna xwe ku hin bi hin di demê de winda ji bike di parêzê. Lê ji wê demê pêde, êdî wilo zêde ne dikarê wê bi parêzê. Êdî hin bi hin bi ber mivirandinkê ve diçê. Bi fermîkirina ole filahiyê re, êdî li wê zîndîbûnê lê gerîn dest pê dike. Her weha wilo tê berçav. Filozofên ku ji wê demê de pêde derdikevin yên weke Fileonê îskenderî, Agustionius û hwd derdikevin, hemû ji oldarna olî yên wê olê ne. Lê di wê demê de, bi wê mivirandinê re weke ku rojhilat, rohaniya wê tê xuyakirin. Agustionius tê rojhilat û ku mirov bi teybet bêje tê Kurdistanê û li wir, ji oldarên Manîvanan fêrê digirê û piştî pirtûka xwe yê bi navê "Walêt" dinivîsêne. Di vir de, deme ku ma bahse Manî kir, ku em çend gotinan li ser wî ji bejîn û bi buhur in nabe. Ew di demên piştî derdiketina Nebî Îsa bi dusadsalekî re derdikeve. Li Kurdistanê derdikeve. Li Merdînê derdikeve. Ji malbata kurd ye ku wilo zêde ti mal û semyenê wan nîn e têt. Lê hizrên ku ew dihêne holê wê demê û pêşketine di xata pêşketinê yê ku ber diclê û firatê re dide kifş kirin. Hizre wî, wî ji pêxember di denezêne.

Manî, piştî zayînê di salên 216 û 276an de tê dijî. Di wê demê de, pêşketineke mazin heya. Li berdicle, hê ji, ola yek-yazdanî ye êzîditiyê heya û serweriya wê heya. Li ber Diclê û firatê li Kurdistanê pîranniyên xalkê êzîdî ne. Filahî, çendî ku li rojava derdikeve pêş û zû belav dibe ji, li rojhilat û bi teybetî ji, li Kurdistanê ew zûbûn xwe nadê der. Ji ber ku êzîdîti, bi hebûne xwe re wê valabûna yekbûnê ye bi pergala olî ye yek-yazdantiyê dagirtiya. Çendî ku êzîdîti, oleke ku hate wê demê bi hezar salan jîya bê ji, di her demê de xwe li gor demê kariya ku bêne ser ziman. Bi vê yekê, pêşketine xwe parastiya. Wê pêşketine

wê, hate sadsalên 6. min piştî zayinî Îsa re berdewam kir.

Ji sadsalên 6. min pêde li rojhilat, êdî li gor nirxên xwe û wê pergala ku heya, êdî oleke nû derdikeve holê. Musulmanetî derdikeve holê. Musulmanetî, ole yek-yazdanî ye demê ya. Pêxemberê ole musulmanetiyê Hz. Muahammed, pêşketin, têgihîştin û awayê pergale yê li ber diclê û firatê dihêne ser ziman di hizre xwe ye olî de. Bi wê yekê pêşketine mazin di deme xwe de dijî. Li nîvgirava araba, hate wê demê pêşketine misre kevn, hebûne xwe berdewam kiriya. Ew ji, di têgihîştine mitolojiyê de ya. Her keyê wê yê ku hatiya ku ji wan re dihate gotin *firawûnan* xwe weke xwêdayan denezandina. Lê li ber diclê û firatê, ew çand, ji demên ku Birehîm Xelîl bi Nemrûd re ketiya şer de û ew bi têgihîştina wî re têk biriya ve, xwe wilo xwûda denezandin nebûya. Pêxember, hatina û çûna. **Gotina 'pêxember' ji kurdî ya û temenê wê li ser 'peyam' û 'ber' a. Gotina «peyam»'ê, agahiyê dihêne ser ziman. Pêveka dawî a «ber» jî, koka wê li ser «bê» û ankû «be» ya ku em dikarin wê di wateya 'bên'ê û ankû 'hanînê' ku fahm bikin a. Gotina 'bên' jî û ya 'hanînê' jî di temenê wateya wekehevdû de jî didin me. 'Hatinê', 'peyama hatî', û hwd dihêne ser ziman. Bi rengê gotina 'bên' jî, minaq, 'peyamê bên!' û ankû 'peyamê bêna!' û hwd dihêne ser ziman, Gotina 'bên' biser xwe jî, weke gotinaka teybet bi rengê 'bên!' dihê bikarhanîn. Koka wê 'bê', di temen ji 'bên'ê re, ji 'bêja!' ji 'bêrê!' re, ji 'bê tê!' re, ji 'bêtê!' û hwd re. .. Minaq, herdû gotinên 'bê tê' were nivîsandin û di nava 'bê' û 'tê' de navber hebe, dikeve wateya, 'wê were tê' û hwd, bi çend wateyên din re. Lê ku bi rengê 'bêtê' ku bi hevdu re bê û navber di wê de nebe, dikeve wate 'bê tê', û ankû ku 'tu nebe wê çênebê' û hwd, bi vê rengî bi gelek wateyan dikarê xwe werêne ser ziman. Lê ji wê pêve ti pêşketinên din yên ku xwe xwûdê danadênin nebûna. Pêxembertî di çanda li ber Diclê û firatê de çanda wê pir zû ve heya. Ji deme Nebî Nû ve heya. Nebî Nuh, bi xwe re deme keyan ye ku xwûda deneznin ji girtiya. Pişt Nebî Nuh re ole pêşî ye yek-yazdanî Êzîdîti hatiya û bi pergala xwe ye ku bi têgihîştine hizir ye ku afirîya serwer bûya. Pêxemberê wê *Melekê Tawûs* e. Pişt ole êzîdîtiyê re ole yek-yazdanî ye Cihutiyê hatiya. Ew ji pêxemberê wê *Nebî Musa* ya. Lê berî Nebî Musa, li ber diclê li Kurdistanê ku pêxember in Lut, yusif, yunus û hwd hatina û çûna. Hê hinekê din ji hene. Hemû *pêxember* in. Hemûkan ji hebûne xwûdayakê li ser xwe ye re ku *yek* e herê kirina. Xoslete wê çanda li Kurdistanê li berdiclê her weha ew e ku her pêxemberê ku hatiya, pêxemberê wan yek e.**

Ev çand û hizre wê û felsefe wê, bandûrê li Pêxemberê ole nû ye musulmanetiyê dike. Ew bi vê yekê, çandaka ku bi awla piştire xwe bidiyê û jê bawer bike û ew xwûdayê xwe yê ku bi arabî nav lê kir û got ""Allah" hanî ser ziman û deme wî da dest pê kirin. Êdî ne tenê li wir li nîvgirava araba, li herêmê bi giştî bi demeke kin re zû pêşketine wê û li ser diclê û firatê û bi teybetî ji li Kurdistanê ji serwerbûna wî ya zû, bi hatina wî ya bi wê çanda wir ve girêdayi ya.

Piştire di demeke kin de li rojhilat bigiştî pêşketine wî dibêt. Êdî bi vê yekê û pêşketine rojhilat ji, ole xwe ye yek-yazdanî di afirêne û pêş dixê. Rojhilat, piştî weqas deme buhurandî û pêşketin û xuruxandinên ku jin kirine re, demeke pêşketine ye xwe ye teybet bidest dixê. Li gor demê, êdî çanda, berdiclê bi pîroziya wê re li herderî serwer dibêt. Kevneşopîya Misre kevn tê redkirin. Lê ew kevneşopî, ew çend hezar salin ku ku dijî. Ne hesaniya ku zû bi zû ji holê rabê. Gelek Banekî û xûyên ku hatina afirandin, ku bi rêveberiyê re bê û an ji bi aliyên din yên jiyane re bin hene. Ew ji, hê serweriya wan li jiyane serwer e. Lê Hz. Muhammed nêzîkatiyaka safî û bi biryar dide nîşandin li ber wê di wê heyemê de. Piştire bawermendên ku baweriyên lê heya, êdî xwe bi hizrên nû yên felsefê re aras dikin û di kevina hanîna ser ziman de. Bi ole musulmanetiyê re rojhilat ji, bi giştî weke rojava ku çawa ku bi ole filahiyê re gihiştîya pergala xwe ye gihiştîya pergala xwe ye giştî. Musulmanetî, di demeke kin de serweriya wê li rojhilat hemûkî dibêt. Bi Musulmanetiyê re rojhilat ji gihiştîya têgihiştineke nû. Ew ji, êdî ketiya riya xwe ye ku tenê pê bi hizir û felsefê bi pêşkeve. Piştire ne bi gelekî re li herêmê êdî filozofên herêmî yên weke **Îmamê Gazalî** ku ji herêmê re derdikevin. Weysel qaranê derdikeve. Di wê deme nû ye ku êdî bi hizir bidest pêşketine xwe dike de êdî aliyên pêşketinê yên di hizir de yek bi yek tene kifş kirin. Matematik, fizîk, astronomî, bijîjkî û hwd tene kifşkiirn û bidest hizirkirina wan û pêşxistina wan tê kirin. Hate ku dem tê sadsalên 9. min û 10. min û wan, êdî pêşketineke mazin derdikeve holê bi felsefê û têgihiştine wê ye li herêmê re. Filozofên ku weke Êlî Herîrî ku di wê demê de derdikevin û bi hizre xwe ye felsefê re ye ku dihênine ser ziman re pêşketine mazin didina çê kirin hene. Ew felsefe musulmanetiyê li gor deme felsefe û têgihiştine wê diafirênin. Baweriyê, tede têgihiştineke ku felsefe tede xurta di afirênin. Her weha bi wî re filozofên deme yên weke Gazalî ji derdikevin. Êlî Herîrî, aqil ji rastiyê di hasibêne û di cewherê rastiyê de rastteqniyeke ku mirov digihêne xwûdê dihêne ser ziman. Guhdana li jiyane û têgihiştine di

derbarê wê de pêşxistina wê li ser disekinê û bi wê yekê aqil dide dora xwe di wê deme xwe de. Li gor wî, Zanebûn, ye ku herî zêde wê mirov bi ser bixe ya.. Lê wî zanebûn ji baweriyê qût ne dihanî ser ziman. BI vê yekê re ew felsefe dihêne ser zimên. Gazalî, zanebûnê ji bo têgihiştine di jiyane de û bi navê xwûdê re giringiye wê dihêne ser ziman. Zanebûn, li gor wî mirov bizanebûn dike ku mirov wê çawa di riya xwûdê de bi meşê. Lê mirov wê ti carî nikaribe ku xwe bigihêne rastiye hemûkî. Kengî mirov mir, hingî mirov wê karibe aliyê rastiye yê ku me li dinyê ne dîtina mirov wê li axîretê bibîne. Ew ji wilo dihêne ser ziman. Êlî Herîrî, rastiya weke xawêneke li jiyane dibîne û jiyane ji pêre weke rastiya ku ji aliyê xwûdê ve hatiya afirandin ku mirov wê fahmbike dibîne. Di wê de ji rastiye ku mirov fahm bike yêbi aqil hene. Mirov divêt ku dinye xwe fahm bike. Dinye mirov wê mirov bi têgihiştine yê ku ew dinye çêkiriya bike. Yanî wê wî bi bîr bixe. Ev ji zanebûnaka mazin e,

li gor wî. ..
 Êlî Herîrî, hinekî dî ji pêde diçê û dihêne ser ziman ku rastî, ne tenê ye ku di serê mirov de ku mirov dizanê ya. Ew tene ser ziman ku rastî bîaqil dibe sê beş. Beşe pêşî zanebûna mirov ye ku mirov wê bidest bixe û pê bijî ya. Ew hebûn û bûna dinyê ji li ser wê her weha mirov fahm dike ku xwediyê têgihiştinekê ya. *Li gor wî, dinye û hemû tişt ji şaneyekê dest pê kiriya. Ew şane ji, her timî mazin bûya û çend ku mazin bûya ji di xwe de afirandiya. Ew wê hertimî bi afirêne. Ji ber ku xwûdê, vejen wê ye ku kiriyê de, di xwe de karê vejene xwe bi afirêne. Bi vê yekê, ew şanê, ti carî mirov nikarê wê hêzê wê fahm bike, hingî têde heya û wê pêş bikeve. Li gor wî, ew vejene wê, di xwe de bêsnor e. Serê wê têde heya û hebûne wê ya, lê dawiye wê ye ku lê bidawî dibe ji nîn e. Ew bi vê yekê li ser vejene mirov ji di rawastihê. Ew li ser wê vejene ku mirov di jiyana xwe ye rojene de bi xwe re di serifêne ji di rawastihê û wê ji ji wê vejene di hasibene. Aqil, bi xwe ji, têde vejene mirov ye ku bi teybet ji wê vejene hatiya afirandin heya. Rastî, her weha ev hemûya ku mirov wê fahm bike. Li gor wî aqilê mazin yê ku temen e û yê ku wê di dawiye ji de ji têgihiştinê mirov têbigihê ji heya. Rastî, lê li gor wê xala herî mazin ye ku bi hebûne xwe re cewhertiyê ji disfirêne û mirov dike ku xwe bigihênîye de ya. Lê hemû di laşê teqez de ya. Bi vê gotinê emê têgihiştina wî ye metafizîkî ji bîne ser ziman. Ew, gûmanî û pêwistinîye weke du xosletên laşê mirov dihêne ser ziman û bi minaqa ku *mirov ma karê bi ser zivirandinê re karê rûyê xwe bibe pişt xwe re pêwistinîye* dihêne ser ziman. Temenê felsefe wî bi metafizîkî re bi*

heyînê teqez ku dayimîya û têde ji heyînîyên ku dem bi dem li wir têgihiştine wê heyînê teqez dijîn hene. Xwûdê heyînîyê teqez e. Lê mirov ye bi teqezîyeke ku deme wê hatiya kifş kirin dijî. Ew bi jiyana ku xwûdê dayê de, girêdayî ya. Li gor teqezetiye wî, bi vê yekê wê bijî. Bi vê têgihiştinê Êlî Herîrî, dixwezê di têgihiştine metafîzîkê de hîyayerşîyekê bêne ser ziman. Ew bi vê re, ne tenê hebûne pêwistîniyê di xwezê bêne ser ziman, pêre weke xalna giring di jîyanê de hem ji bo jiyandinî û hem ji bo bûnê pêdivîyên ku mirov bêne bicih balê dikişêne ser wan ji. Wan ji, dihêne ser ziman. Lê weke hinek, xosletên ku mirov di derbarê wan de bibe xwedî têgihiştin û zanebûn dihêne ser ziman.

Di wê demê de, piştê ne bi gelekî re wê gelek filozofên ku her weha dihizirin wê derkevin. Filozofên weke Îbnî Rûşt û Îbnî Sîna derkevin. Îbnî Sîna, wê bi teybetî li ser bijîjkî bisekinê û rê û rêbazên wê yê şifakiirnê bike ku kifş bike. Felsefe Îbnî Sîna, temenê wê li ser metoda metafîzîkê di sekinê û têgihiştine ku bi wê tene ser ziman heya. Ew mijara metafîzîka xwe li ser *laşê teqez* ku tenê bi hebûne xwûdê re tê ser ziman heya dihêne ser ziman. Pê re ji, ew laş li sêye beş dike û gûmanî an ji ye ku derkete holê û ye ku mir û winda bû û çû. Gûmanî û pêwistinî, ku yê ku ji xwe dibin û bê ku sedemek ji bûna wê re hebe ya, ew e. Wê ji bi hebûne xwûdê re dihêne ser ziman. Û hebûnên ku divêtin ku hebin. Îbnî Sîna Metafîzîkê weke qadaka zanistê ye ku pêwistî pê heya dihêne ser ziman. Îbnî Sîna li ser aqil di sekinê û pênc cureyên êqil hanîya ser ziman. Ew ji her weha ne; Aqilê ku yê divêtinî ku bizane, aqilê ku ji bo fahmkirin û têgihiştinê alî mirov dike, aqilê ku ku pir mazin ku ew bi xwe ji jê re "aqilê qûts" dibêje ku li gor wî di hemû kesekî de nîn e û hemû kesek ji nikerê xwe bigihênîyê de. Aqilê ku di xwe de heya yê rûyê yên maqûl dide dîyar û têgihiştinekê pêre bi mirov re çêdike û aqilê ku maqûl ku têgihiştinên ku hene dide têgihiştin. Yên ku maqûl in, wê aqilê dawiyê, ye(aqil) ku bi wan re heya û ku mirov xwe gihanda wê, wê mirov xwe bigihêne aqilê wan yê ku heya ji. Ev qizinceke. ..

Îbnî Rûst ji felsefê wî, mirov karê weha bêne ser ziman. Îbnî Rûst, fêrbûnê weke pêdivîyaka olî ye ku mirov wê bêne bicih dibîne û dihêne ser ziman. Li gor wî ol bi aqil meyîzendinê ji mirov dixwezê. Li gor wî, çend, ol û dîroka wan heya ji divêt ku mirov wê bizanê. Rastî, li ku derê bê, divêt ku mirov xwe bigihênîyê de. Yên ku berê hatina û çûna di pirtûk û hizrên wan çî hene zanebûna wan ji divêt ku bibe. Li gor Îbnî Rûst, aqil û felsefe riya ku mirov xwe pê bigihêne rastîyê na. Îbnî Rûst, li gor wî hate derekê bi aqil û felsefê mirov karê bixwe bidigihê her tiştê li

jiyanê. Lê li gor wî hinek tiştên ku mirov bi xwe nikarê xwe bigihêne wan ji hene. Lê aqil û felsefê hate ku derê em birin, emê herin. Ji wê pêde, ye ku wê xwûdê mirov bigihênîyê de. Divir de, bi Îbnî Rûst re pir nêqaş têne kiirn. Li jiyane mirov karê xwe bigihêne her tiştê ku heya û hinek tiştên ku mirov nikarê xw ebigihênîyê de, di çerçove felsefe û aqilê wî de mijara nêqaşaya ku hate roje me têt. Îbnî Rûst li ser felsefê bi xwe ji gotiya ku 'mijara wê ew e ku heyînîyên ku hene wan bi me bide fahm kirin e'. Çend cureyên heyînî hebin, ew wê wan ji me re bêne ser ziman. Li gor wî, tenê hebûne Xwûdê dervî wê ya ku wer ser ziman, ew ji wê bi her pence sehên mirov karê tenê xwe bi 'gihêne têgihîştine wî. Lê ew û heyîne wî, ne biderfet e. Bi vê yekê, di felsefe xwe de sînorekî ku pişt wî re her timî di çerçove felsefe wî de dibe mijara nêqaşan dimêne. Wî bawer dikir ku wê bi felsefe lê bi olê wê kariba ku xwe bigihanda rastiyê.

..

Bi zanist û filozofên weha re têgihîştineke mazin li herême pêş dikeve. Zanist û têgihîştine êdî pêş dikeve. Herêm, hate ku tê sadsalên 11. min û 12. min, û wan, êdî mirov karê bi wan zanist û filozofên weha pêşketineke mazin derdikeve holê. Li herême bi têgihîştin û bi teybetî ji, bi felsefê re pêşketinên mazin derdikevina holê. Ku dem tê sadsalên 12. min û wan êdî li herême zanistên weke Teymîyê Haranî, Ferabî, omer hayam û hwd derdikevin. Ev zanist û filozofên weha, xoslete wan ye sereke ew e ku bi qadên zanistê yên weke matamatikî û hwd re ji mijul dibin. Zanistên weke Îbnî Haldûn ji derdikevin. Îbni Haldûn, li ser civaknasiya civakê û pêşketine wê û dîroke xwedîyê têgihîştin û zanebûnaka mazin a. Pişt wî re ji, hizrên wê bandûra xwe li zanistên ku hatina kiriya. Li ser pêşketina bajartî û jiyana gundan û goçbertiyê ji hinek zanebûnên ku jê hena. Mirov divêt ku vê ji bi teybet bêne ser ziman. Lê xosletê Ibni Haldûn ew e ku ew bi teybetî bi şiroveyên xwe yên di derbarê civakê pêşketine wê de riya pêşketine ye ku hin bi hin bi ber bajartiyê ve dibû ji haniya ser ziman. Bi vê yekê, wê bi wan hizrên xwe re weke ku pêşiya xwe bidîtibe tê ser ziman. Hizrên wê yên li ser dîrokê ji pêşketinekê dihênin berçav. Di pirtûka xwe ye bi nav û deng ye bi nav "Muqadîma" de di destpêkê ku li ser dîrokê hizre xwe dihêne ser ziman, pêşiyê weke hinek bûyarna ku diqawimin dihêne ser ziman. Lê ku pêde diçê ji, êdî di çerçove tehereke ku jev ne qût de dihêne ser ziman. Bi şiroveyên wê yên aliyê civakî û civaknasî de ev bi têgihîştin xwe bi bêhtirî dide berçav. Bi vê yekê re, her weha ku em bînine ser ziman, emê nêzîkatîya wê ye di di derbarê dîrokê de bînine ser ziman.

Wî hizir dikir ku hizirvan û dîrokzanên berê wî, dîrok ji ber ku jevqat û weke çîrok û çîvanokan hanîna ser ziman, êdî ne gihiştina sentezeke baş. Li gor wî, ji ber vê yekê, divêt ku mirov dîrok bi jînhatinên bixwe re ne wilo bêne ser ziman. Bi têgihîştin weke ku çawa mirov di wê rojê de dijê bêne ser ziman. Bi vê yekê, mirov wê dîrokê di jiyane de fahm bike. Bi wê fahm kirinê ji êdî mirov wê bigihê rastiya wê ye ku hatiya jîn kirin. Bi vê yekê û nêzîkatiyê ew li dîrokê nêzîk dibû.

Îbni Haldûn, di aslê xwe de bi xwe re peyemnêrê deme tê ya. Ew bi şîroveyan xwe re wê têgihîştinê bi me re dide çê kirin. Weke wî, Teymîyê Haranî ji, wilo ya. Ew ji di civaknasîyê de pir xurt a. Ew hizrên wî yên di derbarê dîrokê de bi têgihîştine xwe re ne bin yên Îbni Haldûn re ne. Teymîyê haranî, nêzîkatiya wî yê civakê di çerçove civaknasîyê wê de ku li gor hinek zagonên pêşketinê bijî ya. Bi vê yekê, ew hinekî felsefê di têkiliyan de derdixe pêş. Lê felsefê di nav têgihîştineke civakî de ku ji awayê baweriyê yê olî ne dûr dihêne ser ziman. Li ser stêran û matamatikî ji sekinî ya. Piştî Teymîyê Haranî re pirtûkên wî, weke yên perwerde yên bingeh hatina xwandin di cihên ku lê perwerde dihatina dayin de.

Li rojhilat, bi vannêzîkatiyan û pêşketinan û awayê pêşketinan re pergalaka nû ye demî afirî bû û ava bûbû. Herêm, di her aliyê xwe ve di pêşketinekê de bû. Lê mirov tiştêkî din ji dibîne. Ew ji har weha ji sadsalên 12. min û 13. min pêde, weke ku bi pêşketin û têgihîştin û ole xwe re rojhilat li ber kiirna hinek xwenûkirinna(reform) ya. Mirov wê ji dibîne. Îbni Haldûn, di nêzîkatiya xwe de dinyewîtiyê derdixe pêşiya axretiyê. Li zaningahên ku li herêmê avabûna yên weke Azherê û li Şam û li Rihayê, mirov nîqaşna ku bi oldaran dibin û bêhtirî aqil derdixina pêş dibîne. Nêzîkatiyên zanistan yên ku di bêjin mirov bîaqil nikarê hemû tiştî fahm bike û bêhtir pêde herê û derkeve dervî ya dil, li ber wan zanistên weke Îbni Haldûn hinek zanistên yên weke wî li ber wê di sekin in û hizre xwe dihênine ser ziman. Bi vê yekê re, b teybetî, demeke Ronasansê(jinûvebûnê) diafirê. Mirov wê her weha dibîne.

Hate ku dem tê sadsalên 14. min û pêde, êdî ew pêşketin ku Kurdistan bi Cizira bota û Rihayê re di navende wê de disekinê di bêt. Rojhilatê kurdistanê jî derdikeve pêş. Bajartî li van deran pêşketiya û awayê jiyana wê ji tevî gelek hêrîşên hovan ji pêşketiya û rûniştîya. Li herêmê, li aliyê anatolia ji li Costanipolosê ji bi zanistan ku mirov bêne ser ziman lev civînak bûya. Herêm, bi vê yekê, ji Kurdistanê hate ku digihîşt ber Riha û ji wir de hate ku digihîşt gelek herêmên anatolia ku

digihîşt ber bahra reş, pêşketinek hebû. Li herêm bi teybetî ji ku ol ji di nav de ji gelek aliyên xwe ve li ber hinek xwenûkirinan bû. Bi vê yekê re hizir ji ji zanistan derdikevina holê. BI teybetî, awayê zimên yê Êlî Herîfî derketibû pêş. Lê bi zanistî bi hizrên wî re derketibû pêş. ..

Li Herêmê, bi wê yekê û rewşê ku mirov karê bêje ku bi zanistên ku hene re li ber bûnaka ku xwe ji nû ve bi afirinê bû. Li herêmê lê bi derketina hêzên weke yê Osmaniyan re ew rewşe xwenûkirinê ye ku wê bûba ji ji holê di rabê. Osmani ku li herêmê di bine xwedî hêz, êdî li herêmê hizrên cuda yên ku wê werine ser ziman, êdî ne li herême têne ser ziman. Hin bi hin bi pêşketin û serwerbûna wê hêzê re ji herêmê çî zanist hene bi zanebûna xwe re bazdî rojava dikin. Rojava ji, piştî ji holê rabûna împarotiya roma re rewşeke nû weke ku afirî bû Hinek hêzên din li ser wê rewş û pêşketin û mîreteye wê derdikevina holê Di sadsalên 12. min, 13. min û 14. min û wan de, filozofna mazin yên ku bi têgihîştinaka mazin re derdikevin û êdî wê bi zanebûna ku dihênine ser ziman re wê bine temenek derdikevin. Zanist û filozofên weke Copernîcûs derdikevin. Ew li ser azman û stêran dihizirin û li ser hebûn û xwezaya li derve dinye me dihizirin. Yê ku pêşî gotiya dinye bi gelek dinyên din re li dora rojê digerihe ew e. Wî ev hizir bi zanebûn haniya ser ziman. Pergala rojê, bi vê haniniya xwe ye li ser ziman vegotiya. Lê di wê demê de serweri û serdestiya dêrê ye li rojava hemûkî bandûra wî ji dike û dike ku ew dihanina ser ziman ye hizre xwe de bi sîn de gavê bi avêje. Hizrên ku ew dihêne ser ziman, bi xwe ji di tirsihê ku li wan xwedî derkeve. Lê di demên jiyana xwe yên dawiyê de êdî ku wê tirsê hinekî li ser xwe diavêje êdî bi dest hanina hizrên xwe û lê xwedî derketinê bi wêretî dike. Wî temenê zanista astronimiyê avêt. Wî xalên ku dinye bi dinyên din re li dora rojê digerihihin vegotin. Pişt wî re yê ku hinekî ji vî aliyê pêşxistina da çê kirin ji Galîleo bixwe bû. Ew bi aslê xwe ji froransa bû. Di zanisgaha ku têde bibe keşe dixwêne lê wê terk dike. Ji ber ku eleqeyeke wî bi matamatikê re xurte û di wê qadê de pir zû fahm dike û bi wê yekê re êdî zû pêş dikeve, êdî bi matamatikê re mijul dibe. Wî Aristoteles pir xwandîya û bandûra wî li ser wî heyra. Ew, bi wê zanebûna xwe dike û di xwezê ku hizrên aristo di qada matamatikî de ji bêne ser ziman. Lê ew di têgihîştine xwe de di wê baweriyê de bû ku weke aristo haniya ser ziman, ji wê cudatir e. Bi vê yekê ji fîzîye aristo cuda hizre xwe ye fîzîkê diafirîne. Ji ser kula pîsa cismê ku giraniya wan wek hev e lê jevcuda na, bi hev re di berde xwerê û pêre "kultê" kifş dike. Bi vê yekê, xelatiya fîzîka Aristo ji didêne holê. Li gor wî, ku şert û merc wekhev bin, ketina

cismekê giraniya wê bi serê xwe azad e. Piştê ew dibe zanistê matamatikê li zaningaha Padova dibe mamosteyê matamatikê. Di 1597an de wî pusula çekir û derxista firotinê. Di sala 1604an de wî bi zagonên matamatikê yên bidest kifşkirina wan yên bi ser xwe kir. Li ser astronomiyê lêkolînên xwe berdewam kir û li ser *Riya kakêşan* ye stêran kifşkirinên xwe yên destpêkê kirin.

bandûra wî li ser pêşketinên deme wî û demên pişt wî re dibêt. Di wê demê de ne bi gelekî re Descartes derdikeve holê. Ew ji, zanist û filozofekî ku bi hizrên xwe yên di hêne ser ziman re bandûra wî pir mazin dibêt. Berheme wî ye ku di "riya felsefe de zagonên wê" dihêne ser ziman bandûraka mazin dike. Li ser Metodê pir disekinê. Ji tevlihevbûnê bi ber hesanatiyê ve hanîna rewşan ye li ser ziman, wî derdixê pêş. Di deme ku felsefe ji serdestan dihate ser pirsîn û ser ziman, wî ji da nîşandin ku herkesek karê wê bike. ew li ser kirdariya lêkolînan pir disekinê. Li gor wî, ji zanstan ye herî giring mekanîk, mekineyên ku alî mirovan dikin hunere wê, başkirin û bijîjkîti û ahlâq xweş û bişahî jînbûn, hunre wê ya. Ew bi vê yekê girîngiyê dide jiyan û baş jîndûna mirov. Bi vê yekê re ji tişt û amûrên ku di jiyanê de alî wî bikin, wê ew ji di wê de bina aliyek pêşketinê jê re. Li ser geometriyê navê wî derdikeve. Ev deklam ji bi navê wî tê ser ziman; denkleme ku bi qartyazyânê tê ser ziman: $x^3+y^3=3axy$. Denkleme wê ye paramatrikê ji her weha: $x=3at/(1+13)$, $y=3at^2/(1+13)$. Bi vî awayê tê ser ziman. Ew ji ber ku di matamatikê de xurt e, pirsên weke ku rastteqniyê yên ku di pirsê ji di wir de dixwezê bi bersiv bike. Di heman demê zanist û filozofên weke Kepler ji hene û bi lêkolînên xwe yên li ser gerdûnê di dev de ne. Pirtûka Kepler ye bi navê *Nepeniyên gerdûnê* wî pir mazin dihêne ser ziman. Piştê ew karê li ser ensîklopediyê dike. Lê di jiyana xwe de rastî pir zoran tê û bi vê yekê ji bêderfetî barî gelek cihan dike.

Bi van minaqên ku me dan ji, tê dîtin ku êdî zanist bi awayê fîzîk û astronomiyê di pêşketinekê de ya. Ev êdî wê bi vê awayî wê pêşketineke mazin di demê de pê jîn kirin. Bi vê yekê re, em êdî dikevîne demeke nû de. Wê êdî felsefe bi awayê xwe yê ku zanist tede li pêş û serdest e, wê êdî di jiyanê de bêhtirî bigotin bêt. Lê ev ji êdî wê bi demekê nû re wê hebûne êdî bêne ser ziman. Êdî ji vir pêde em pêşketine Ronasansê bînine ser ziman.

Demek nû ku weke tê ser ziman 'dema jinûvebûnê' û ankû 'dema ronasansê'.

..

Ronasans, demeke nû ya ku êdî wê zanist serdestî jiyana mirov bibe. Wê bajarvanî pêş bikeve. Wê jiyana bi hizir û opêşketinên ku pêre dibin re wê ji nî ve xwe ava bike. Wê felsefe di xwe de êdî weke ku tê ser ziman, wê ekoltiyê di xwe de bipêş bixe û pê pêş bikeve. Pêşketinên ku hate wê demê bûna û li jiyana hatina ser ziman, pêşketinaka mazin dana çê kirin. Hizir, êdî bitêgihiştin di jiyana de weyn dileyizê. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Lê ronansans, divêt ku mirov wê hinekî dî bi teybet û bi pêşketinên bi hizir bêne ser ziman. Ronansans çawa dibêt û destpêdikê? Ev ji pirsê ku mirov wê bi pirsê û bersive wê bide.

Pêşî. em li ser bersive wê pirsê bisekin in û ji wê bersive wê werine hanina ser ziman ye ronansansê. Bi vê yekê re, divêt ku em demekê ji serî hate bîni bînine ser ziman. Demên serdemên navîn yên ku mirov wan bi awayê pêşketinên wan re fahm bike û bêne ser ziman in. Piştî holê rabûna împaratoriya roma, êdî deme serdemên navîn destpêdikin. Dêr, ji her aliyê xwe de serdestiya wê li jiyana heya. Her qadên jiyana û pêşketinê û bi teybetî ji yên hizir û felsefe di bin sehê wê de ya. Mirov karê vê yekê her weha bêne ser ziman. Dervî hizre olî re ti hanina ser ziman jê re destûr nîn e. Skolasîzm, weke ku tê ser ziman serdest e.

Lê di nav xalkê û civakê de di qadên jiyana de hizrên ku hene û tene ser ziman ji hene. Ew zanistên ku me li jor bahse wan kir, bi teybetî hema bêja hemûkên wan bitirs dihanina ser ziman. Lê dihanina ser ziman. Hizrên wan yên ku hatina ser ziman, gelek ji wan ji holê hatina rakirin ji. Lê gelek ji wan man ji. Piştî bi wê yekê li lêgerînekê lêgerîn hate kirin. Bi vê lêgerîne ku lê hate lêgerîn, pêşî olê paya xwe jê girt. Demeke xwenûkirinan ku jê re "raformasyon" tê gotin dibêt. Mirovên ku bi aslê xwe di nav perwerde keşetiyê de mazin bûna yên weke Luther derdikevin, wê destpêkê dikan. Pêşî pirtûka pîroz ye filahiyê Încîlê di vegeerînine latinî. Xal û zagonên dêrê di nivîsênin. Û her weha temenekê bi vê yekê re di nav xalkê û civakê de diafirînin. Ev kirinên Luther wê bine sedeme Derketina Mezhebe filahiyê yê binavê *protastantiyê* ji. Ev awayê pêşketinê û pêşketin, wê bê pêşketine paşerojê ji. Şerên ku li rojava dibin yê *sadsalê* û yê *şerên sihsaliyê* rojava kiriya qada şer. Bi teybetî ji gundî di van şeran de li pêş in. Bi van şeran re çendî ku rêveberên ku hene yên *monarşî* ji holê naçin ji, lê deme wan êdî dawiyê wê tê denezandin. Êdî rêveberne ku xalkê li berçav digirin tene xwestin. Mirov bi hebûne xwe re weke hizrekê di seran êdî şaq daya û li gor xwe nêzîkatiyekê dixwezê ji rêveberan. Ev hemû ancamên

pêşketine hizir û bi teybetî ji yên felsefê ne.

Ku mirov li van pêşketinan dimeyîzenê, mirov fahm dike ku êdî tevgerek li rojava dest pê dike. Li rojhilat, ew tevgere pêşketin ye bi aqil felsefê re ku bi derketina ole îslamê re dest pê kiribû, hate dem tê sadsalê 15. û wan berdeyam dike. Lê piştê bi derketin û serwerbûna Osmanîyan re êdî ew rewş ji holê weke hin bi hin dirabe. Li şûn mayîna rojhilat û destpêka pîrsgirêkên wê ji mirov ji vê demê pêde pir mazin karê bide dest pê kirin. Deme ku êdî wê bi aqil û zanistê pêşketiba, bi wê ji holê weke ku rabû. Zanistên ku hizrên xwe hanibûn ser ziman ji, hizrên wan li cihê xwe man û ne hatina ser ziman. Deme ku me got ne hatina ser ziman, em bahse ne hatina wê ye li rojhilat dikin. Çendî ku ew filozofna rojhilat ji bûn, ku li wir hatina hizre wan ye li ser ziman, maf nayê dîtin, ku mirov wê dibîne, dilêşiyak bi mirov çêdibe.

Lê bi wê tevgere li rojava ku dibe re, ew ji têne ser ziman. Lê rojhilat têne ser ziman. Hizrên Îbnî Rûşt ji û Îbnî Sîna ji li wir dihêne ser ziman. Ew dem, weke demeke nû ya û weke ku mirovek ji nû ve ji xewekê ku têde demeke dirêj mabû û rabê ser xwe bû. Her weha dihate berçav. Piştî ku xwenûkirina deme wan bi olê re dest pê kir, di demeke kin de bandûra xwe di qada felsefê de ji da nişandin. Zanistên nû derketin û hizrên xwe hanîna ser ziman. Ev dem, di destpêka xwe de pêşi hizrên ku demên berê yên antik de hatina ser ziman, dike ku wan pêşi kifş bike. Ji nû ve aristo tê xwandin û tê şirove kirin. Her weha Platon ji ji nû ve tê xwandin û hizrên wî têne şirove kirin. Di wê demê, ku ji wan re *Platonvanên nû* tê gotin derdikevin û hizrên xwe dihênine ser ziman. Tercûma pir mazin pêş dikeve. Tercûme li latînî dibêt. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku tercûmeyeke pir mazin dibêt. Hizir kirin, pir mazin dibêt. Felsefe, ji nû ve careka din tê kifş kiirn. Lê vê naqlê pir mazin tê kifş kirin. Pêşketinên ku di demên serdemên navên de bûna û bi avadanîyan de derketiya pêş, li berçav nerîneke xweş di afirêne. Avadanî û bi avadanîya naqşkirin pir mazin derdikeve holê Nîgarvanên mazin yên weke Da vincî derdikevin. Çîrokvan û wêjevanên weke Montaigne derdikevin. Pê re ji, nivîsarên deme yên weke Cerwantês derdikevin. Cerwantes bi pirtûka xwe bi navê "Don kîşot" re mohre xwe li demên xwe yên piştê dixê. Bi wê pirtûka xwe tê naskirin. Bi vê yekê re, mirov karê ku demeke nû ji her aliyê ve destpê dike. Bajarvaniya ku pêşketî di navendên mazin de ji wê pêşketinê re dibê temen. Bajarvanê, awayê jiyana demê dihêne berçav. Li ser wê û wê hebûne wê ye ku dibe temen pêşketinên deme yên nû ji rû didin. Lê Ronasans, di aslê xwe de di hizir û nivîs û têgihiştine xwe de

mirov derdixe pêş. Ev ji, pêşketineke nû ya ku mirov wê bêne ser ziman.

Mirov bi hebûn û jiyana xwe re di pêşketin û pêşxistinê de êdî weke ku dibê navend. Her weha tê berçav. Mirov ku li pêşketinê demê ji dimeyîzenê di felsefê de li rastiyê lê gerîn û hanîna wê ye li ser ziman, li ser awayê jiyana mirov ku wê çawa û bi çi awayî bijî sekinandin û hwd, mijarna ku di lêgerînan de derdikevine pêş in. Mirov, êdî hem dora wî û hem ji ew bixwe ji, bixweşikbûnê re di lêgerînê de ya. Ev ji, weke mijaraka girîngi ye ku di deme ronansê de derdikeve pêş e. Rexnekirin li ser ne baş û ne baş dîtîne têne ser ziman. Bi vê yekê re wê başbûn ji awayê wê çawa bê tê ser ziman. Di jiyana de awayê wêje ku jiyana û mirov hest û ramanê wî bi hev re dike mijar ji xwe re derdikeve pêş. Helbestgerî bi jiyana ku tê de şano û şanogerî cih digêre derdikeve pêş.

..

Lê destpêka ronansê ku mirov wê bi gotinekî ji bê bêne ser ziman, mirov dibêne ku weke destpêkaka nû ya di jiyane mirov de û di pêşketine hizre netewiyê de ji ya. Ev ji her weha divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Netewî, pêş dikeve. Temenê wê bi pêşketin û têgihîştine bi naskirinê re ku bi têgihîştineke xwedî derketinê re pêş dikeve heya. Her weha pê re ji, xwe ji civakakê û derekê û nirxekê dîtîne û wilo hasibandin ji tede tê ser ziman. Ziman, çand û civaknasiya ku mirov xwe di nav dihêne ser ziman ye wê civaka ku di nav de, ji wê pêşketinê re temenê herî mazin e. Lê ev hemû ji felsefe û têgihîştine wê di pêşketine wê de weykeke mazin dileyizê. Felsefe di wê demê de, bi gelek cureyên hizir êdî derdikeve holê. Lê felsefe, êdî ji wê demê pêde, hin bi hin di xwe de xwe ji ji xwe di buhurêne. Bi ronansê re nûbûnak di wê de ji heya. Pozitîwîzm pêş dikeve. Pozitîwîzm, bi *felsefe diyarde* pêş dikeve. Têde ne teolojî û ne ji metafîzîk heya. Ev wê, di demên piştî ronansê de pir mazin êdî pêşketineka mazin jîn bike. Di deme ronansê de nîşanakê wê felsefê çawa ku xwe didina nîşandin, êdî di qada felsefê de nîqaşna pir mazin dest pê dîkin. **Pozitîwîzm**, *vacê* derdixe pêş. Êdî ku piştî wê weke ekoleke felsefê êqil wê xwe bidîyarî bide holê *felsefe vaca heyînî* derdikeve holê. Nerîn û dîtîne, di vê aliyê felsefê de pir girîng e. Lê bi vê felsefê re *vac*, êdî bi serê xwe xalaka ku mirov lê meyîzenê û weke xala felsefê ye bîngê ji bêne ser ziman. Rastbûn, nerîn di jiyana û hebûnde di ahangekê de bûn ji pê re weke xalîna girîng yê bîngê têne berçav. *Vac*, ji bo ku zagon û xalên xwe yê ku pê kifş bike û bêne ser ziman kifû bike, wê demne pir mazin pêre bi nîqaşkirinê re bi buhur in. Lê divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman ku *felsefe cerbê* wê di wê demê de bidest

pêşketine xwe êdî bike. Ev ji, wê weke temenê wê pêşketine felsefe vacê ye ku bidest pêşketine xwe kiriya wê bê berçav. Kifşkirin û hizrên vê felsefe cerbê wê ye felsefe vacê ji pêşketine wê kifş bikin.

jî, mereqê mirov dihanî ser ziman. Mereq, bi zanînekê dijî. Lê mereq, li ser zanînakê re hebûna xwe diyar dike. Di wê rewşê de jî ev yek wilo bû. Ew gotin "çi", hertimî lê gerin hate kirin. Piştî gula navika yekemin jî jî ve û ew hundurê hate dîtin, li ya di navika sêyemin de lê hat hizirkirin. Piştî ku ew jî hat û vebû li ya di navika wê de lê hat kirin. Lê her gula ku vebû, çend ku navika wê hat dîtin, êdî mereqê ku bi gotina "çi" re dihat ser ziman, dêsa bi heman gotinê re li holê ma û di serî de, weke xwerheka bêserdem hebûna xwe da berdewam kirin. Xwesteka gihiştina wê "çi"yê, bi xwe re, dem li ser demê kirin û gul li ser gulê kirin. Lê ew, dîsa weke ku di serî de bêbersiv ma. Weke ku ew çi, ne hat zanîn ku çi bûya. Çi, çi bû? Bersiva wê bêbersiv ma. Çi, çi bû, weke pirsêka ku ji pêşîya xwe hemû dem û serdem rakirina û bêdem û serdem hebûna xwe di kurahîya zamên de dide domandin li holê ma. "Çi", navika hemû pirsên ku êdî di wê rêwîtiyê de dihatina pirsin bû. Lê hemû pirs jî, yên ku di cihna demê de dihatina pirsin, di demne de, weke ku dihatin û digihiştina hin bersivna xwe. Wilo li mirov û li têgihiştina mirov dihat. Lê ew "çi", weke xwe di wan de jî, bêbersiv dima. Her pirsêka ku bersiva wê lê dihat dayin, bi wê re her bersiv, bi xwe re ew çi jî, weke ku di parast li jîyanê û fikir ku ew bibe temenê hin pirsna din yên ku biafirin û werina pirsin. Çi, çi ya? bersiva wê, weke ku bersiva hemû pirsên ku wê bân pirsin û hatina pirsin bû. Wilo li mirov dihat ku bersiva wê, wê bi xwe re, êdî hemû pirs û pirsatîyên ku dihatin pirsin wê ji holê rakê.

Her pirs, nêvî bi nêvî zanebûna bersiva xwe jî ya. Lê her bersiv, bi xwe re, mirov karê bi temenî bersiva pirsê xwe di xwe de dihele ser ziman? Ya ku pirsê dike pirs *çi ya*. Ew *çi ya*, pirsê di pirsan de ya. Weke ku heta ku ew bêbersiv bê, wê hemû pirs jî bê bersiv bin. *Çi ya*, di pirsê û *çi çi ya*. Bi berisva *çi yê re*, wê bi *çi were bersivandin*.? Divêt ku mirov, pêşî wê pirsê bi bersiv bike. *Çi*, *çi rastîyê di cewherê xwe de dihawane?* Ew *rastî çi ya?* Bi wê re, mirov wê bigihê *çi?* Zanîn, heta vê dera ku hatîyê de, tenê karê hê wê bi pirsê. Lê ne di wê astê de ya ku bersiva wê bi temenî hê bide. Ew *çi*, weke xelaka ku hê tariya. ew xala tarî, weke navikakê ya. Ê ew navik jî, weke xelaka ji xwe diafirênê ya. Tarî, di wê xalê de, ne bi gotinaka ku hê hatîya salixkirin a. Ew navik, navika hemû zanînekê ya jî. Zanîn li dora wê, weke leşkerê ku bike ku bikevê hundurê wê de ya. Bi vê yekê û armancê, weke ku di tekoşînekê de ya. Lê ew xal û navik, pirr jidahî ya. Zanîna aqil, an jî ku mirov bi gotinaka din bibêje bîrewerîya aqil, jîre têde, di vir de, bêtêr a ku karibê wê fahm bike. Gîyane ku weke hilme têgihiştinê ya û ku mejî ew hilm bisalixkirîya jî,

wê xalê ji xwe re êdî dike bingeh û li ser wê re, weke cewherê jîyane me ya ku bi aqil pêş dikeve û pêşketîya dijî.

Rewîst , rastî û hizir û pêşketina wê. ..

Li ser rewistê sekin in, hinekî ji aliyê êqil ve heyîna serdestî ji mirov dixwezê. Rewist, rastîya wê bi aqil dihê holê. Li ser aqil ve, hate nahaka li gor pêşketin û nirxa wê û pêşveçûnên ku bûna pîrr hatîya li ser ziman. Di wê yekê de di hanîna li ser ziman de jî, her hanînîyeka li ser ziman ji aliyekî xwe ve bûya xwediyê wate û awa, di wê hanîna wê ya li ser ziman de. Ji aliyê aqil ve hanîna wê ya li ser ziman, wê rewistê bi gotina wê re bihizratî bike û bêne ser ziman. Ji ber vê yekê, ji aliyê hizir ve, weke ku me li jor jî di serî de hanî ser ziman, aqilekî mazin yê ku di xwe de bûya xwediyê xal û bi temen û hîm bûya, pêdivî bi pê heya. Pêşketina aqil, di wê de pêşketina rewistê de xwediyê weynekê ya. Lê divêt ku mirov bêne ser ziman û bêje ku pêşketina aqil, çend ku pêşket û bû jî, wê hingê ji rengê wê yê ku bû, wê awayekî rewistî ji bi xwe re bêne holê û bide berçav. Bi vê gotinê re em dihên li ser ziman û em dibînin ku aqil, bi xwe re bi awayê xwe yê bû ya re awayê rewistîyê xwe jî dihêne holê. Bi vê yekê re aqil, weke ku ji wê rastîya xwe ya ku bi pê diafirê ve, weke ku nêvî bi nêvî ji aliyê ve yê bûnî ve rewiste jî. Ji ber vê yekê ya ku di demên berê de pîrr mazin li ser pêşketina aqil bi rewistê re hatîya sekin in. Bi aqil re rewist û bi rewistê re aqil, xwediyê du awayê pêşketinê yên ku mirov wan bi pergalî her yekê ku ji aliyê wê ve bêne ser ziman in. Bi vê yekê re, mirov karê bêne ser ziman ku aqil, bi vê gotinê re dibe duaqlî bi pêşketina xwe ya bi xwe re ya bi aqil re. Pêşî, aliyê pêşî yê aqil bi rewistê re heyîna wê, wê di çerçova pêşnûmayaka aqilî ya ku bi wê tê hizirîn re wê heyîna wê bidest xwe dana nîşandina li berçav bike. Bi vê yekê re wê aqil, deme ku hate ser ziman, wê heyîna xwe re li gor xalna û awayna heyînî yên li berçav re wê were holê û li ser ziman. Di wir de aqil, ne bi bêrewist a. Awayê wê yê ku mirov di vir de bi gotina rewistê bêne ser ziman jî, bi pêşnûmahîya wê re dihê holê û xwe bi me re bi awayê jîyandinê re di jîyanê de dide bifahmkirin. Bi vê yekê re aqil, deme ku bidest pêşketina xwe ya bi wê re dike, weke ku Zanistên ku weke yên weke Êlî Herîrî kirina li ser gotina 'rastteqînî'yê re ku weke awayekî aqilbûnê dihê holê û li berçav, wê bi wê re bidest pêşketina xwe ya bi xwe re bike. Bi vê awayê wê re aqil, mirov ku lê dihizirê, mirov dibîne ku xwediyê çî awayê pêşketinê ya jî. ..

Ji rewşekê ku derhanîna aqil, wê çawa bê? Pêşî, wênekirina rewşê ya

bi hanîna li ser ziman re, wê aqilek biafirêne. Pêşnûma wî aqilîya ku hatîya holê û afirandin jî, ew rewşa ku dihê dîtîna û an jî hatîya dîtîna ya ku li berçav a, bi nerînê re ku têgihîştîna di serî de bi pêra bûya, awayê rewşê ji her aliyê wê ve ku jê hatîya holê û li ser ziman, wê bi wê re, aqilê wê rewşê bi wê afirandina wê aqilê wê re wê biafirê û were li holkê û li ser ziman. Di wir de wê ew aqil, bi heyîna xwe re gelo di piştî wê afirandinê ve wê tenê awayekî wê rewşê ya ku hatîya dîtîna û an jî li berçav bûya? Di wir de ev pirs, deme ku me pirsî, hingî wê bi bersiva ku em bidîna de û bêne "na" re, wê hingî, li duv hevdû bidest afirandina aqil bike. Lê wê weke xaleka bingihîn ew aqilê pêşî yê rewşê jî, wê hebe û li ber çav bê bi wê re. Wê ew were ser ziman. Piştî wî rê deme ku mirov li ser wî aqilî hizirî, hingî wê bi wê awa û aliyê ku mirov li ser hizirê ve de, wê hingî bidest afirandina aqilekî bi xwe re ji wê aqilîya xwe ya bi xwe re bi me re bike. Di wê yekê de wê aqil, êdî afrîner bê. Di nerîne ku mirov lê dinerê de, di awayê ku mirov wê têde dibîne de û bi hizre ku bi wê re bi mirov re çêdike de, wê hingî bi wê re di rêzekê de bidest awadana mirov jî bike. Aqil, ji wê rewşa ku jê bûya ew pêşnûmayîya ku ew xwediyê wê ya, wê ew, çend ku aqil bi mirov re bi nirx bû, wê ew jî bi xal bibe û were li holê. Ew xalbûn, weke destûrîyaka mirovî êdî wê bi mirov re bidest karîna xwe ya afirandinê bike. Ew hizirê wê aqilê re jî, wê bi mirov re hingî, bidest afirandinê bike. Di wê rewşê de wê hingî hin bi hin bi ber rewistîfîya aqilî ya rewşî ve wê çûyin biafirê. Bi wê re û bi wê yekê re wê êdî xalbûn biafirê. Xalbûn, ji bilî rewşa aqilîyê wîrdetir aqilîya rewşê ya ku bi safîfîyê di serê mirov de di mirov de bûya ya jî.

Ew xalbûn, di wê rewşê de, heyîneka wê ya bi heyînî ya bi mirov re di nerîne mirov de ku ew heya, wê bi wê re bi heyînî bi wê yekê re wê hebe û bi wê re bi ber bûnîya aqilîya rewistî de çûyinê de wê bidest afirandinê xwe bike. Di wê rewşê de rewist, pêşîya wê bi wê têgihîştîna wê aqilê rewşê ku êdî bi mirov re bûya darêjk, wê bi wê darêjkîya wê re êdî wê nirxîya wê ya ku bi mirov re wê da afirandin, wê bi wê re bidest pêşxistîna nirxîya rewistî ya bi mirov re bike. Mirov, di wê yekê de di wê afirandinê de ku weke afirandinaka keseyetî ya bi wî re jî ya, ji hemû aliyên ve di farqê û têgihîştîna wê de ya? Mirov nikarê wê yekê bi tememî wilo wê bêne ser ziman û bêje. Lê mirov karê bêje ku wê hin bi hin bi rewş û nerîn û dîtînan re wê ew aqilê wê yê ku bidest afirandina xwe ya li gor wê afirîna ku bûya ku bike, di wê yekê de, bi rewş, aqil, mirov û keseyetîya mirov di teherîyaka di jîyanê de ku bi hev re û li duv hevdû di meşîna de ya, wê bi hev re wê pêşketîna bi du awayan bide kirin

bi keseyetîyê re. Aliyê wê yê pêşî, dem bi dem bi pêşketinê û afirandinê re ku dibê ya. Aliyê din jî bi dû û an jî sêdîmenîtî ku bi wê re dibe û diafirê ya. Heya ku hê bêhtir dîmenîtî bi hev re di nav hev re hebin. Di vir de zanîna xêvî, hîs û jîr û bîr xwediyê weyneka mazin in di pêşketina ku dibê de. Sehkirin, di kirdatîyaka teorîkî de wê êdî di vir de ji hin aliyna ku mirov karê wan bêne ser ziman bi dem bi dem bi pêşketinê re wê weyne wê bibe. Hîskirin, di nêzîkatîya rewşîtî de çawa ku aliyekî zanîn di mirov de ku mirov wê wî aliyî bike temen ji pêşketina wijdanîya xwe re wê êdî bidest pêşxistina wê di mirov de bike. Ev jî, aliyekî dî yê wan pêvajoyên pêşketina aqilîyê ya di mirov de ya. ..

Di wê rewşê de, mirov karê bêje ku aqilê ku afirî û êdî bidest afirandinê kir, êdî wê xalên wê yên afirandinê wê hebin. Destûr, zagon û xal û hwd, wê bitêgihiştinî pêpelokên pêvajoyên wê yên pêşketinê yên di aqil de ku bi pergali temenê afirandinê dikin bin. Ew pergaliîtî, wê aliyê rewistê yê aqil, wê ji wê bidest afirandina xwe bike. Gotina, çawa gav wê were avêtin li gor wê aqilê, wê rewistîya aqil bi pêdivîya wê re wê bihatina li holê wê bi mirov êdî bide fahmkirin. Aqil û rewist, dervî û ji bilî ku kirdetîya di hundurê hevdû de, bi awa dikin, awayê hevdû yê ku bi demê re ku diafirê jî dihênina li holê bi heyîn û hebûna hevdû re. Bi aqil û pêşketina wê re afirîna darêjkîya aqil, wê şênberîyekê di kirdetîya êqil de bide çêkirin. Ew şênberî ku afirî, êdî wê darêjka kirda aqilê rewistê jî, bi xwe re bide afirandin. ..

Darêjka rewistî, wê êdî ji wê afirînê ku biafirê û wê şênberîyê bi tevgerên ku li wê di tevgerîyê de bèn şênberkirin re wê bê holê. Ew, xêve mirov ya ku êdî wê hin bi hin ku aqil têde biafirê û bicih bibe jî, di wê de ku bê bipêşnûmabûn, wê bi wê re bèn holê. Rewist, di wê de ji ya ku em dizanin bêhtirî bi mirov re xwediyê afirînîyeka afrîner a. Ew pêşnûmabûn, awayekî wê yê bûyinî ya. Mirov karê vê yekê jî, her weha bi wê re bêne ser ziman. Lê aqil, di wir de, ew awayê wê yê rewşî ku bi wê re xwe afirandîya, bi wê re pêşnûmabûna ku heyra, hingî wê bi wê re bidest afirandinê jî bike. Lê di vir de em çiqasî di farqê de bin û çiqasî jî ne di farqê de bin, ew pîrr dîmenîtî ya bi aqil re ku mirov ji wê darêjkeka aqilî ya rewistî derxe û şîrove bike û bêne ser ziman, mirov wê bibîne ku bi têgihiştinaka serrastîtî û seraqilîtî, wê pêşketina xwe ya ji wê deme xwe û pê de, êdî bide berdewam kirin jî, pê re heyra. Di vir de, destpêka wê rastîya pêşketina mirov fahmkirna wê jî, wê mirov di têgihiştinê de di wê xate wê ya teherî de, bigihêne wê destpêka pêşketinê ya serrastîtî û seraqilî û ku êdî bi xêvîyê re û bi seraqilîya xwe ya bi mirov re ku xwe

afirandiya û mirov êdî çend ku bi hizirê re jî ya wê dijî, wê di dereke aqilê mirov de di temenê wê de bi hîmî wê hebe. Ji vê xalê(vêderê) û pê de, ew êdî ew xala me ya li jor ya ku bi rewistê re aqil û pêşveçûna wê ya di jîyanê de êdî ku wê biafirînîya, wê bi xwe re êdî wê werêne li holê û wê xwe bi me(di aqil û têgihiştina me de) û aqilê me re bide têgihiştin. ..

..
Ku em di vir de, wê rastîyê li berçav bigir in û hinekî derkevîne dervî mijara xwe, û weke qadarekê li ser heyîna mirov bihizirê, wê têgihiştina ku em di dawîya wê hanîna xwe ya li ser ziman de û ku bi vê xalê re girêbidin, wê bi me re ji me re bide çêkirin. Mirov, nirxên ku wî dikina mirov hene. Aqil, yek ji wan nirxan a. Bi vê re wijdan jî, mirov karê wê bêne ser ziman. Hizirkirin û li gor hin rastîyna ku wê êdî weke "rastiyên xwe" dibîne û lê dihizirê, mirov wê bi rastîya wê hizrê û rastîya mirov re jî li berçav bigirê û li ser bihizirê, mirov wê bibîne ku di pêşketina mirov de çendî awayekî pêşketinê bi çî awayî heya. Mirov, heyînaka wî ya bi teherî ya dayîmî heya. Ew heyîna wî ya teherî û dayimî, wê çawa were ser ziman? Divêt ku mirov wê di vir de bi çend gotinan bêne ser ziman. Ew jî pêdivî bi pê heya.

Di destpêka pêşketina mirov ya di mejî de, mirov wê êdî wê bi aqil re esas bigirê, mirov wê bi nêrînî bibîne û wê bêne ser ziman, ku mirov heyîna wî ya heyînî ya dayimî heya. Heyînen mirov yên gîyanî û hîsî jî, li ser wê sûwar in bi hev re. Mirov karê bêje ku ew gîyan, weke ku ji wê aqilîyê xwediyê awayekî pêşketinê yê ku mirov wê bi teybet bêne ser ziman jî. Aqil, xêvîbûna wê ya bi mirov re, wê dem bi dem wê sentezbûna wê ya carek din bi mirov re, wê êdî bike ku temenê wê gîyanîyê bi aqilî û biafirêne. Têgihiştin, ji du aliyên xwe ve ku mirov bi têgihiştina rewistîtiya mirov re ku lê bihizirê û lê binerê, mirov wê bibîne ku bi aliyên xwe yê hizrî yên heyînîyîyên xwe re heya. Bi wê heyîna wê re jî, weke pêvajoyaka wê ya pêşketine ya ku bi mirov re ya, ku mirov wê aliyê hîsî bi gîyanîya mirov re wê bi wê re kifş bike. Hîs, wê çend ku ev aliyê têgihiştinî bi pêşketina xwe re bi wê re hebe jî, wê ne tememî bi wê re û bi pêşketina wê re bê ser ziman. Lê divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman, ku bi wê heyîna mirov ya jîndayî re rakendîtiya mirov ya ku dibe, temenê wê dayimîtiyê wê diafirinê û wê bixwe jî dihêne holê.

Ji ber ku mirov jîndîya, bi wê jîndîtiya mirov re aliyê hîsî bi wê jîndîti û têgihiştina wê ya ku bi hizirkirinê re afirîya ra heya. Ew afirîn, wê mirov bi gîyanî biafirêne. Heyîna mirov ya jîndî, ji aliyê ajoyî ve jî bi mirov re û an jî bi jîndatîyê re wê di temenê wê de biheyîn bê.

Mırov, di wê afirandina bi hizrî ya bi xwe re digihê tiştêkî bi xwe re. Ew tişt, bûyînaka. Ew bûyîn, têgihîştinaka jî. Lê bi navkirinê, mirov karê navekî dî jî lê bike. Tenê ew navlêkirin, navlêkirina me ya. Ew, wê weke "rastîyaka bi me re" ku afirîya wê hebe. Ji ber ku bi me re ya, êdî têgihîştina ku "bi me re bûya", wê bi wê re û bi me re û bi bûna wê re wê biafirê. Tiştê ku wê hizra lê xwedî lê derketinê wê biafirê jî ev a. Gotine "me", di vir de, êdî divêt ku mirov hinekî li ser têgihîştina bi wê re û ya di wê de li ser serî biwastêne.

Hizre lê xwedî derketinê, ji aliyê rewistî ve, ku bi aqil, "mirov wê ji xwe re rast dibîne" û bi wê ji xwe re rast dîtine re, êdî bidest pêşketina xwe dike. Lê berî wê, mirov rastîya xwe bi rastî herê dike û li gor wê 'rastîya xwe' êdî bidest hizikirinê dike û li gor wê jî kifşkirinê dike. Di vir de, aliyekî kifşkirinê yê rewistê bi keseyetîya mirov re xwe didêne holê li berçav. Ji wê, emê êdî ji vir û pê de, bi mijara xwe re wê aliyê li gorxwebûnîya keseyetîya ku di temenê wê de rastîya wê ya ku bitêgihîştinî ku heya, ji bin ve ya bi pê re bînina ser ziman. Lê xwedî derketin, bi sê temene wê pêk were. Temenê pêşî wê bi 'ligorbûnê' bê. Temenê dûyemîn, wê bi wê ligorbûnê re 'li gor pêdivîya mirov' bê. xela xwestinê, wê bi wê xalê ve girêdayî biafirê. Temenê sêyemîn jî, wê bi 'heyînîyê' bê. Yanî, wê di temenê wê ligoratîya mirov bê, ku wê bi têgihîştin bê bi mirov re. Ku mirov, ew li gor wê yekê pêdivîya xwe hanî li cih, hingî, wê bi wê re û li gor wê pêdivîyê ku weke ancama wê ya ku ew derketîya li holê, wê hingî, li ser wê re bidest hizirandinê xwe bike. Li ser wê hizirandinê re, wê hingî, bê temenê hizirandinaka 'nû' ya ku wê bibe jî. Nûbûn, di vir de, bi têgihîştina wê re û bi rewş û tevgerên nû re û an jî bi hizirkirinê re, gihîştinaka ku hin bitêgihîştin û bi hizrê re wê werine holê bê. Lê di vir de, wê wate gotina 'nûbûnê', wê di wate destpêkê de jî bê. Bi wê yekê re, wê mirov bi xwe re êdî li gor hin xalna ku ew êdî xwedîyê wan a di xwe de, wê bi wan re bidest pêşketina xwe bike. Pêdivî, bi serê xwe, çend ku aliyekî aqilê mirov diafirêne jî, li gorbûna bi têgihîştin û hîskirinê bi rewşê re jî ji dixwezê ji mirov.

Di vir de, ku mirov bahse têgihîştina li gorbûnê kir, divêt ku mirov hinekî dî di wê de pêde herê. Ji ber ku ev gotin jî, bi serê xwe xwediyê gelek alî û awayên ku cuda bi cuda werina ser ziman in. Di serî de, deme ku mirov kifşkir ku "li gor wê ya", hingî; mirov fahm dike ku ew li gora mirov, li gorbûnaka çawa û çendî û çiqasî li gor jîyane mirov ya dervî mirov a? Ev bitêgihîştin kirina jî. Ev pirs, wê ji gelek aliyan ve bersiva wê, lê were dayîn. Divêt ku jî were dayin. Lê di serî de, emê li ser wê li

gorbûna ku "li gor me ya" ka ma ka li gor "yên li dervî me ya, bisekin in. Ew "yên li devî me ne" jî, weke me, xwediyê xalna rewistî û li gorxwebûnna bi xwe re na. Prensîbna rewistê, di wê xalê de jî li holê na, ku afirî hena. Minaq, pergale tirk, î ro zimanê kurdî qadaxa kirîya û nahêle ku zaroyên kurd bi zimanê xwe perwerde bibînin. Di vir de, ne hizirkirina li wan zaroyên kurd heya. Ne hizirkirina, li pêdîvîyên wan heya. Li gor têgihîştina rewistê ya ku me hanî ser ziman, ev kêmesîyekê diafirîne. Lê ku bizanebûn, ev ne hatibê hizir in û kirin jî, hingî jî, êdî li gor xalna rewistî ku bi têgihîştin bûna, nêzîkatê wê lê were kirin û li gor wê kêmesîyên wê werina dîtin li gor wê têgihîştinê. Lê ku mirov çî têgihîştinê li berçav bigirê û li gor wê şîrove bike jî, hemû têgihîştinên ku li gor wan şîrove bê kirin, wê ji rastî, têgihîştin, pêşketin û berî hertiştî hebûna zaroyên kurd wê gava xwe biavêjin. Ya rast jî, ev a. Hizirkirina bizanebûn ku ew newê kirin û ne hizirkirina bêzanebûn ku ew newê kirin, weke du mijarên jecuda êdî derdikevina ber me ku mirov wan cuda û cuda fahm bike û bêne ser ziman in. Rewist, hinekî jî, têgihîştina di derbarê têgihîştinê de jî ya. Bi aqil û têgihîştina rewistî re, beremberê têgihîştinê ne bitêgihîştin bûn a.

Bi vê yekê re di vir de, ya ku emê li ser bisekin in û wê bêne ser ziman a jî, têgihîştina 'hevbeşbûn'ê ya. Lê bi wê re ev hevbeşbûn, di nav xwe de, weke ku me di paragrafa li jor de hanî li ser ziman, wê mafê perwerdehiya zimanê dayikê yê zaroyên kurd, yê komî jî, li gor wê tevgerîn, wê di temenê wê hevbeşbûnê de ku nêzîkatîyaka li gor xwesteka wan hate nîşandin re, wê êdî li gor wê nêzîkatîya rewistî tevgerîn bi afirê. Gotina hevbeşîyê, ji du aliyan ve dihê ser ziman di vir de. Pêşî ji aliyê navxweyîya komîyê û piştî navxweyîya koman û hwd. Lê herdu alî bi nêzîkatî û xwestên xwe yê ku werina li cih re, ku levkirina wan bû, wê hingî, hevbeşbûn, di nêzîkatîyê de rastîya xwe bide nîşandin. Hevbeşbûn, ku li dora nîrxekê ku mirov li gorî wê tevgerîya êdî dibê. Yanî, di çerçova wê li gorxwebûnê de, pîr mirov, bi heyîna xwe re digihîna hevdu. Bi wê gihîştina hevdu re di wê de levkirina xestekan heya. Bi wê re, ew levkirin, çendî ku ew xwestên ku bi hev re hebûn, wê ew jî hebe. Bi vê yekê re li gorbûn, li ser temenekî berjewendî ya bi xwestekê re jî heya. Ev ligorbûn, ku ji wê nirxa ku ew li dora wê civîbûn ku bûya, ku mirov pêde herê û bigihê civîna din ya komî, wê ew nîrxê ku heya, ku ne li gor wan bê. Bi vê yekê re, li gorbûn, êdî wê bi temenî di gihandina li hevduyîya wê de ne bes bê. Bi ligorbûnê re, gotina "rastîyê", divê ku mirov wê bêne ser ziman. Rastî, ku mirov li ser dihizirê, mirov

karê bi pirsê ku "çawa û li gor çî rasta û heya" di levkirinê de? Di vir de, rastî bi heyîna xwe re gotinaka dîtbar a.

.. **Rastî, têgihîştina wê**, ji aliyekî ve ligorbûnê ji rewşê, tişt û mirov dixwezê. Bi wê yekê re, *levkirin*, di xwestekê de aliyekî wê yê rastîyê dihêne ser ziman. Lê hemûyî, nahên ser ziman. Ku mirov, tenê li ligorbûnê binerê, di vir de wê ji gelek aliyên wê yên ku bi pê re werine ser ziman, wê kêmbimêne. Di serî de, divêt ku mirov vê yekê bêne ser ziman. Bi hev re bi aqil û pêşketina wê ya ku bûya re, ku mirov li jîyanê binerê û bi wê re bidest hanîna li ser ziman bike, wê hin bi hin êdî bi bêhtirîya wê re were ser ziman. Ji vir û pê de, weke mijaraka di berdwame wê de, ku mirov êdî divêt ku bi aqil û gotina rastîyê re êdî bidest hanîna wê ya li ser ziman bike. Cihê gotina rastîyê û heyîna wê, bi vê yekê re di vir de, divêt ku ji aliyê têgihîştina rewistîyê ve di çerçova mijarê de were fahmkirin. ..

Gotina rastîyê, ji gelek aliyên xwe ve di vir de mirov karê were ser ziman. Lê di serî de, divêt ku mirov hinekî gotina rastîyê, di çerçova heyîn û hebûnê ya di jîyanê de wê fahm bike. Bi wê yekê re, êdî ew di berdewam wê de hewldana fahmkirina nêzîkatîya rewistî, wê hingê, bi têgihîştinekê xwe re xwe bide li berçav. Ku mirov, li dora xwe binerê, mirov wê heyînên ku mirov dibîne ku dest li wan dide hemûyan yên ku hene, karê wan weke rastîyana li jîyanê ku hene bêne ser ziman. Car bi car, gotinên ku gîyan bêtêgihîştin û hişa jî hatina gotin. Wan gotinan jî, mirov ku bi çavekî sêyemin li wan binerê, mirov wê bibînê ku piştî safîbûnek di ser de bi têgihîştina ku ji têgihîştinê bû û ku xwe qayîmkir û serdest kir, êdî bi serê xwe bi wê têgihîştina ku di derbarê xwe de wê têgihîştinê bi xwe re çê kir, li ser wê re dibe xwe bixwe. Mirov karê vê jî, weha fahm bike, weke ku têgihîştinê ku êdî darêjka xwe çêkir û bidarêjk bû û êdî bi wê re bû biserê xwe û hwd. Gîyan û têgihîştin, weke ku dê û zaroyên hevdû na. Di têgihîştinê de bi çûyinê gîyan, riyeka bêserdem û dayimî ji xwe re çê dike. Têgihîştin jî, bi gîyanê re jindatîyekî û rihekî ji xwe re dibîne. Subjektîvîte giyanê, bi awayekî jîrî, weke xwûna ku di rayên laşê jîndîyekî de ku di herikê û diçê û tê, weke ku bi jîyan a. Ti rastî, nîna ku giyaneka wê nebe. Ev jî, bi hişkirina wê re wate distêne. Gotina 'gîyanê' bixwe jî, bi pêşketina hişkirinê re pêşketîya û awa û reng standîya. Piştî ew hişê ku bûya bi bûna hişê wê bixwe jî bi rengê 'hizra hizrê', êdî hişarîya wê ku pêş dikeve, temenê wê pêşketin û têgihîştina wê ya ku renekî 'heyînî' bi hebûnê bistêne jî wê biafirêne. Gîyan, li ser têgihîştina li ser wê gotina rast re ji wê re diafirê. Yanî, êdî mirov karê

kifş bike ku gîyan, bitêgihîştin têgihîştina têgihîştinê ya. Lê divêt ku mirov bibêje ku gîyan jî, bi têgihîştina aqil re heya. Rastî, heyîna ku mirov karê wê fahm bike, bi xwe re û bi gotinîya xwe re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re rastî, di aslê xwe de bi heyîna a. Heyîna, di vir de bi jîyanê re tê holê. Li Jîyanê, di deme ku mirov dijî de, mirov çawa dibîne û dijî, mirov wê di pêşketina xwe de bi pêde biçê. Ev, jî rastîyaka mirov ya di jîyanê de jî ya. Lê di vir de rastîya mirov, birastî dijî, 'ne bêtevger û gavavêtin' a. Gotina 'ne bêtevger û gavavêtin' ê, di vir de di wate rêzeka xalî de dihê ser ziman. Mirov, deme ku wê bi kar dihêne jî, ev dihê fahm kiirin. Di wate wê de, yanî 'ne bê hizira.' di deme ku em dibêjin "ne bêhizra", em ji xaynê wê tişta ku em bahsê dikin, bahse têgihîştinaka me ya ku di serê me de heya jî dikin. Gotina di piştî vê de tê jî, her weha êdî ew 'ne bê rewista'. Ev jî, di wê wate de dihê ku êdî mirov ne bêtêgihîştina têgihîştinê ya. Bi vê yekê re, rê nîşandin, di têgihîştinê de dihê li holê. Hinekî dî jî, li ser wê gotina rastîyê, mirov karê pêde herê. Ev gotina rastîyê, çi rastîyê dihêne ser ziman? Di vir de, deme ku mirov got ku 'ew gotina rastîyê di xwe de çi rastîyê dihêne ser ziman, hingî, em nîşandidin ku ew gotina rastîyê, di xwe de heyîna û hebûnaka têgihîştî dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, em êdî dibêjin ku 'tişte' di wê gotinê de heya û bi wê re dihê ser ziman. Ew tişt, bi wê re tê ser ziman. Di vir de, em wê gotina rastîyê, bi hizir binavkin û bi wê re tînina ser ziman. Hingî, mirov wê hizir bike ku 'tişta' di hizir de ku tê ser ziman, mirov wê bi hizir û têgihîştina wê re tê digihê.

Di vir de, di berdewama wê gotinê de mirov êdî fahm dike ku hizir bi xwe û heyîna xwe re ne "valatîyeka". Tişte, têde heya. Nirxek, têde heya. Lê ka ew tişt û an jî nirx çiya, mirov êdî divêt ku li ser wê hinekî hizir bike. Di vir de, ya ku wê mirov bigihêne çewherê wê jî, di aslê xwe de ev a. Hizir, heyîna ku dihê ser ziman a. Lê, ku dihêne ser ziman a jî. Hizra di derbarê wê hizrê de, bi têgihîştinê, wê hizrê jî çawa ku bi wê re dike nirxek, her weha bi têgihîştina bi wê re ku êdî mirov bi têgihîştin dibe û pêre fahm dike ku bahse çî dike, êdî bi wê re, bi awayekî dîmenî, mirov bi têgihîştinê li ser wê re dimeşê bi aqil re. Gotina me ya rastîyê, ya ku me li jor hanê ser ziman jî, di vir de ji du aliyan ve wê hayîniya wê ya li ser ziman bibe. Aliyê pêşî, wê bi heyîna, gotina hizir, wê bi wê bixwe re wê were ser ziman. Aliyê din jî, wê bi têgihîştina ku di wê de dihê ser ziman re, wê were ser ziman. Aliyê duyemîn yê hundurû, ku weke ku me di hevoka xwe ya pêşîya vê de jî bilêvkir, bi "hizra hizrê" re, hatina wê ya li holê dibe. Di aslê xwe de, di vir de gotina têgihîştinê, di deme ku

dihê ser ziman de, ji aliyê xwe yê pêşî ve ku wê zanatîya di hundurê gotina hizirê de ku bilêv dike, wekî din jî, ji wê wîrdetir, êdî piştî ku bi nav jî dike û êdî ew binavkiirn jî, wê bi têgihiştinaka şênberî, wê heyîna wê êdî wê bişênber bike û bêne holê û bi mirov re bitêgihiştin bike. Di vir de, êdî wê li ser wê têgihiştinê re, wê têgihiştinak ji, bi mirov re biafirê û çêbibe. Ew têgihiştin jî, êdî dibe "têgihiştina têgihiştinê". Têgihiştina têgihiştinê, di aslê xwe de, zanîna gotina hizir ku têde kirde ya jî, bi xwe re bi gotinbûnê re şênberîya wê dihê li holê. Bi vê yekê re, wê êdî ji wê gotinê, gotina din ya ku wê were li holê wê biafirêne. Weke pêvajoya dûyemin ya bi têgihiştina têgihiştinê ya duyemin re, wê xwe bide dîyarkirin. Hizir, di vir de, bi wê rastiyê re, dihê ser ziman. Hizir, nasîna têgihiştina wê ya bi gotina têgihiştinê re dihê holê. Gotina hizir jî, weke qalibekî darêjkî, dihê li berçav û dimêne û bi têgihiştin dibê. Mirov, êdî wê têgihiştinê, karê bi serê xwe re bi teybet jî bêne ser ziman. Bidarêjkkirin, êdî ji û bûna wê pêde, bi awayekî sênberî ê pêzayî, bi hebûn dibe. Ev, êdî bûna aqilekê, şênber û pêzayî, ku bidarêjkî ya ku êdî wê temenê hizrên din weke ku çawa ku hin darêjk û awa bûna temenê wê û ew afirî û hwd. Ji xwe, ev jî, êdî bi bûn û şînbûnê asta û pêvajoya piştre ku êdî wê ew jî were ser ziman. Di gotinê de, ya ku wê were gotin dihê gotin. Di vir de, em careka din vegehihina gotina xwe ya 'rastî'yê. Em, wê êdî di vir de karin hinekî dî bi şênberî bêna ser ziman. Bi vegotinê darêjka ku di serê me de ji bo bûn û pêvajoya hizir bû, wê êdî gotina rastîyê jî, bi şênberîya xwe re bi me de bide salixkirin. Êdî ji aliyê wê yê din ve, bi danûstandina li ser awayê wê darêjkê û hizrê re û fahmkirina wê re, ku rengê wê hat fahmkirin, êdî wê awayê gotina rastiyê jî, were fahmkirin, weke ku deme ku me hizrek ji di riyekê de li ser çûnê afirandibê, ku em di awayê têgihiştinê de gihiştina wê, hingî, em gihiştina rastiyê êdî. Ji gotina 'hizir' bi rastîyê re, wê du heyîn û awayê wê birastî wê êdî werina li holê, ku mirov fahmkirî. Wê ew, êdî werina dîtin. Herdû rastî, ji rastîyaka ku bi gotina hizir re ku pêre têgihiştin heya re

Di vir de, divêt ku em hinekî li ser gotina rastîyê, divêt ku em ji aliyê heyîna têgihiştinê ya wê ve bihizirin. Wê hingî, rastîya wê ya biheyînî, ku bi şênberîya wê re dihê holê, mirov wê êdî wê fahm bike. Rastî, ji aliyê heyînî ve fahmkirina wê, weke ku me di çerçova wê ya li jor de hanî ser ziman, bi fahmkirina têgihiştina wê re wê were fahmkirin. Lê rastî, di vir de, ji aliyê xwe yê heyînî ve jî, ku afirî jî, bi levkirinekê re êdî dihê li holê. Minaq, bêjeyek, deme ku afirî, çawa diafirê? Mirov, ku li ser wê

bihizirê, mirov wê êdî wê fahm bike. Pêşî, wê di afirandina wê de, heyîna bêjeyê re ku wate ku bi kirdeyî lê hatîya kirin re wê ew bitêgihîştin, wê di wê bêjeyê de bi bêjeyê re di levkirinê de bê. Ew levkirin, wê aliyekî wê yê rastîfîya wê jî bi xwe re bêne holê. Lê hîs jî, di wê levkirinê de bi weyn a. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku levkirina di wê bêjeyê de di jîyanê de rastîyakê biwatî ku bi wê levkirina xwe re ku xwe biwate kirîya û bi pê re afirîya, bi wê awayê levkirinê re, heya. Kevirek, deme ku mirov lê dihizirê, mirov, wê kevire dibîne û lê dihizirê. Ew kevir, şênbera û li berçav a. Miïrov, wê, dibîne. Ji wê, mirov, lê dihizirê û bi bêja kevir re wê xosletên kevir jî, wê xwe bi bêjeyî re di hişê me de di bîra me de bisalix bibe. Çawa ku me got, kevir, eme ne tenê kevir bi bîr bikin, bi wê re xosletên wê jî, ku hişka, rengê wê çawa ya û hwd jî, mirov wê êdî bi bîr û hiş bike. Deme ku êdî piştê gotina kevir hate ser ziman, wê hingî, ew kevir, wê were li berçav û wê lê bêhizirin. Bi vê yekê re, em bêjin ku her bêja darêjkaka jî. Bi wê re, wê têgihîştina hişkbûna wê û giranbûna wê jî, êdî wê bi wê gotinê wê re weke xosletên wê bi gotinê re, wê werina li hiş û bîrê. Kevir, rastîyaka ku afirî dihêne holê bi dîtina bi xwe re. Bi hizirandina li ser kevir re, wê kevir, di serê mirov de bê têgihîştinak jî. Ew dîtina bi pê re, wê di meji de bi wê têgihîştinê re bicih bibe. Di vir de, mirov karê aliyekê wê têgihîştinê yê din jî lê bihizirê. Hizira kevir, wê bi me bide fahmkirin ku kevir hişk û giran a jî. Ji ber ku me ew bi cerb bê wilo bi wan aliyên wê re jî di darêjka wê ya di serê me de, bicih kirîya. Lê ku dervî wê, vajî wê, kevirekî ku tede giranî û hişkî hebe, ew, wê dervî wê darêjk û têgihîştina wê bimêne. Êdî ew jî, li ser xosletên wê re salixkirina wê re, wê bibe û binav bibe. Bi wê yekê re, deme ku mirov lê bihizirê, hingî, mirov wê wan xosletên wê jî li berçav bigirê. xosletê temenê salixkirinê na. Her xosletek, qatek ji têgihîştina wê tiştê ku ew xoslet xosletê wê ya. Ku mirov, wê gotina kevir, bike navê tiştêkî dî û wî tiştî dî bi wê bêne ser ziman, wê ew tişt, bi wan xosletên xwe yên ku hena re, ne dûrî wan xosletên ku kevir yên hene, wê bi xoslet bin. Êdî, ew tişt bi xosletên xwe re li holê nemêne. Di bêje de, têgihîştina wê ye ku tede bi kirdeyî heya, deronîya wê, wê rengê û xosletên wê yên weke yên nermbûn û hwd jî hene. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku her bêje ji çar aliyên xwe ve pêdîya wê bi salixkirina wê hertimî heya.

Bi gotina kevir re, rastîya gotina kevir, tê ser ziman. Bi rastîya gotina kevir re jî, kevir, xosletên wê, dihêna ser ziman. Xosletên kevir, di aslê xwe de, di bûna têgihîştina kevir de di afirandina hizra kevir de xwedî weyn in. Di çerçova hizra kevir de, afirîna têgihîştinaka bi pergali, bi wan

xosletan re, wê biafirê. Bi vê yekê re, wê êdî pîrr mazin ew kevir, weke ku di wê afirandîna bi hizra xwe re de, di nav de êdî weke ku 'xawr' bibe, wê lê were û wê têgihîştina kevir ya ku afirîya, wê bi jîrekê re wê li holê bimêne. Lê ez dixwezim bibêjim ku têgihîştina kevir, ku afirî, wê hişkbûn zexmbûnekê jî, bi xwe re bêne holê. Bi têgihîştina kevir re, razberîya teorîkî û hizrî ku afirî, wan xosletan jî, têgihîştina wan wê mayinda bike. Bi vê yekê re, ew qayimtî, êdî wê xwe bide der. Qayimtîya hizra kevir, wê di xwe de xosletên xwe safî bike. Zanebûn û têgihîştina di derbarê kevir de û bi wê re di astaka sêyemin de ji kevir û zanîn û kirdeya wîrdetir, ku zanebûnêka di derbarê xwe de da çêkirin û ew zanebûn bi têgihîştin bû, wê hingî biafirê û ew afirîn jî, êdî aqil û zanebûnêka pîrr safîya. Ji wê asta sêyemin mirov, du gavan bi şûn de biavêjê û li kevir vegehîstê û li kevir binerê û wê binirx bike, hingî, wê kevir, li ber wê zanebûnê, tenê weke kevir nemêne, wê bê têgihîştinê jî. Bi vê yekê re, wê safîbûn biafirê li ser kevir. Bi têgihîştin û zanebûna kevir ya ku em jê re jîbêjin kevir, di aslê xwe de, ev hersê pêvajoyên têgihîştin û zanebûnê bi hev re hena. Me dît, di xwe de bizanebûn kir, û zanebûn li ser wê zanebûnê re di xwe de çêkir û ew zanebûn û bi me re carek din bi têgihîştin bû, êdî bi zanebûnê em gihîştina zanebûna kevir û me got kevir. Bi wê tehera têgihîştinê re, levkirinêka xurt êdî wê derdikeve li holê li ser gotina kevirê ku em bilêv dikin. Bi têgihîştina kevir re, ku weke wî kevirî hişktîyekê çêbike, xosletên têgihîştinê yên safîtîyê, jidandinê û levkirinê, bi hev re û di nav hevdu de ku hevdu jî biafirênin wê werina li holê. Ew awayê têgihîştinê, rastîyaka ku ku afirîya wê dihêne ser ziman. Di wê rastîyê de, nêzîkatî, wê wilo safî û hişk bê. Minaq, di çerçova wê nêzîkatîya têgihîştina hizrî ya kevir de, nêzîkatîyaka ku di çerçova hizratîya rewistê de bê kirin, wê nêzîkatîyaka ku bi xosletên xwe re safîtî, jidandin têde heya wê were holê. Ji wê têgihîştinê hizratîya rewistî, xwe ku afirand, wê bi wê safîtîyê re biafirê. Di nêzîkatîyaka rewistî de bêrewistîtî, ji ne safîbûn û an jî ji tevlihevîkirina di nêzîkatîyê de ya pîrr xosletên jêvcuda re dihê holê.

Bi nêzîkatîyên bitevgerî yên ku hatina nîşandin re, wê bi demê re wê bi wê tevlihevîyê re li gor xwe weke ku 'safî' tîyekê çê bike. Safîtî û rewîsta wê ya ji gotina wê ku afirî a darêjkî, di xosletên kevir bi bi kevir û gotina kevir hanîna li ser ziman de ya. Ev awayê rewîstê, pîrr jî li ser hatîya nîqaşkirin. Lê di vir de, ku em zêde bi wê ji mijara xwe dûrnekevin em karin bêjin, ku êdî bi kifşkirina xosletan û hanîna wan ya li cem hevdu û bi wê afirandina darêjkna din yên nû û afirandina awayna

nû yê din, êdî weke ast û radayaka ku di ancama têtîhiştina aqil de derdikeve li holê jî heya. Ew rewş jî, êdî li gor rewşa xwe, tenê bi wê nêzîkatîya me ya aqil re têtî nemêne. Bi teybetî, êdî li gor xwe nêzîkatîyeka aqilî û rewîstî bi hebûna xwe ya ku afirandîya êdî dixwezê. Em jî, ku wê rewşê û awayê bi têtîhiştin bikin û ji wê gihîştina têtîhiştinê, êdî bi wê têtîhiştinê re, emê rewîstîya rewşa nû kifş bikin û bi wê têtîhiştinê re êdî têtîbigihin. Xosletên wê tevlihevîyê ku safî bûn (Bi darêjk bûn û bi wê re bitêtîhiştin bûyin), ew heyînen ku hatina tevlihevkirin, bi nasîna wan re wê werine fahmkirin. Weke ku bi genetike mirov re, pîrr tevlihevîyeka pîrr mazin heya û pîrr jî di nav hevduîyî de heya û ew pîrrbûn hemû bi hev re ya. Bi pergalyaka ku hebûna mirov têtî bisalixa, ew pergal, waqas genetikan bi hev re dihêle. Her xoslet û gen, xwediyê reng û têtîhiştina bi xwe re di xwe de ya. Karê wê jî, li gor wan xoslet û teybetmendiyên wê ya. darêjkîyaka ku ew jî, weke ku nikarin derkevina dervî wê, bi hebûn û rêzîbûna wan ya bihev re heya. Ji vir, ku mirov li wê rêzîna genetîkê dinerê, mirov di çerçova heyîn ku afirî ya asta giştî de, bêhna pêwîstîyêkê dike. Her gen, bi xwe re heya. Serwerbûna li pergala wan ya bi hev re ya asta giştî, wê hêzaka rêzîkirina wan û bi wê re çêkirina darêjkên nû jî bike destê mirov de. Gotina safîyê, di vir de, di aslê xwe de, li ser darêjkê û têtîhiştina wê ya ku bi mirov re bitêtîhiştin bû re heya. Safîyê wê ya ku heya, ew awayê ku afirandîya ya. Lê ku bi ber hundurê wê ve çûyin bû, piç bi piç ji binî ve qat bi qat hate kifşkirin, weke ku bi hebûna genan re dihî dîtî û hwd, weke wan hevgerînen wê û hwd, êdî wê bê fahmkîrn ku ew safîbûn, ji tevlihevîyêkê dihê li holê. Rastî jî, di jîyanê de xwediyê vê xosletê ya. Gotina rastîyê, xwediyê vê awayê û xosletê ya.

Em, di vir de, carek din hinekî dî li şûn li hanîna xwe ya li ser kevir vegerîhin û werîna ser gotina xwe ya kevir. Kevir, di çerçova wê têtîhiştina xwe ya *rast* de di aslê xwe de çiqasî hişk û kevir a? Em, ku hinekî li ser kevir dihizirin û di nav hizratîya wê de diçin û hinekî kur dibin, em dibînin ku rastîya kevir ya ku hişka, xwediyê tevlihevîyeka *saf* a. Di çerçova gotine kevir de, gotina saf û ya rast, di çerçovaya darêjkîyaka bihevreyî de dihêne li holê û li berçav. Di çerçova heyîna darêjka kevir ya ku afirîya de xwediyê xoslet in. Ev, têtîhiştinaka din jî bi me re çêdike. Ew têtîhiştin jî, her weha ew e ku bi afirandinê re pêvajoyên afirandinê ên hiyererşîk dihê ber me. Di vir de, ku em nexwe hinekî dî pêtî herin û ji wê rastîya kevir ji wê asta wê hinekî dî pêtî herin bi hundurê wê ve, emê ji, piç bi piç bûyînen wê yê ku bi

hevdûgirtî re pêde herin û bigihina rastîyên din yên ku kevir wan di xwe de diveşêrê jî. Nexwe, êdî mirov karê bi vê gotina xwe re li dûv wê êdî vê jî bêje, ku rastîyên kevir yên di bin wê awayê wê yê kevirî de yên ku hene jî, mirov karê bêje ku êdî bi heyînê hene. Di vir de, êdî nexwe, ya ku êdî li mirov dikeve û ji mirov re dimêne jî, bi safîkirinê re, fahmkirina wê ya. Di vir de safîkirin, bi gotinê, êdî ghiştina wan heyînên wê yên hevgirtî na. Safîkirin, bi wê re bitêgihiştin bûna jî. Fahmkirina wan a jî. Safîkirin, di vir de bi du aliyên heya. Aliyê wê yê ku bizanebûna bizanebûn heya. Û aliyê din jî, ê heyîna binqatkên kevirî yên ku hevdûgirtina û kevir diafênin in. Aliyê pêşî, yê *subjektif* ya. Aliyê duyemîn jî yê *objektif* ya. Bi wê re, weke ku me li jor hanê ser ziman, êdî mirov wê pergalîyekê jî bi kevir re ku wê ahangê wê dihê li holê û li berçav, êdî mirov wê êdî wê kifş bike. Bi wê re, êdî pergalîya darêjkî wê were holê bi heyîna darêjkî û awayê wê yê kevirî re. .

Ji hiş û hişkirina rastîyê felsefe xwe diafirêne bi demê re. .

Felsefe, bêjeyeke ku weke ku tê gotin di deme Yewnaniyan de xwe daya der e. Lê felsefe ku mirov bahsa wê dike, mirov di serî de bêje ku mirov bahsa têgihiştineke pêşketiye ye dîrokê dikêt. Ew têgihiştin bixwe ji, ku hinekî li ser dihizîrê, mirov dibîne ku temenê diçê ta demên sumeriyan wan. Felsefe, bi serê xwe aqil têne ser ziman. Ku mirov bahsa wê dike, mirov bi sîmsetî bahsa êqil dike. Aqil, ku mirov bahs dike, mirov bahsa pêşketinekê û pêre ji, bahsa pergalaka pêşketî ya bi hizir ku

tê	ser	ziman	dikêt.
----	-----	-------	--------

Felsefe, dîroka wê ye demên berê wilo zêde he ne hatiya şîrove kirin û kifşkirin. Hata nahaka çî bi felsefê hatiya ser ziman, ji deme antik ye girêkiyan hatiya dest pê kirin û hatiya ser ziman. Ji wê wirdetir çûyîn çêne bûya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku dîroka felsefê nêvî bi nêvî weke ku hatiya ser ziman. Di rastîyê de, ku mirov li dîrokê dimeyîzenê, mirov felsefe rast û asil ku were ser ziman, mirov di demên berî wê demê de dibîne. Di dîroka pêşketinê ya li ber diclê û firatê de, deme Mîtanîyan, Gûtiyan û bi teybetî ji deme Naîriyan demne antik in. Divêt ku mirov van deman her weha bi teybet di qada felsefê de kifş bike û bêne ser ziman. Temenê felsefeyên ku piştî derketine û demên felsefê yên ku afirîne ji, li ser pêşketin û têgihiştinên wan deman in. Ev yek ji, divêt ku bi teybetî mirov bêne ser ziman. Bi vê yekê û nêzîkatîyê, mirov divêt ku li demên berê

yên	pêşketî	meyîzenê.
-----	---------	-----------

Bi teybetî ev demên li ber diclê û firatê ku me bahsa wan kir, xarîta têgihiştinê ya demên piştî ji pêşketine wê kifş dikin. Pergala pêşketinê

ya ku afriya di wan deman de, piştêre di wan der û demên piştêre yê n pêşketinê de tê rûnandin. Her weha ji divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Weke demeke nûjen ku mirov bahsa deme Medan bike, wê rast bêt. Deme Medan, pêşketinên ku li anatolia ji yê n ku bi felsefe re dibin bi bandûr dike. Mirov karê ji wê wirdetir bêje û bêje ku kifş ji dike. Filozofên girêkî yê n weke Thales û piştêre yê n weke Aristoteles ji diçina mediya û li wir demne perwerdekirinê bi xwe re jîn dikin. Pêşketinên ku ew bi xwe re jîn dikin ji, piştêre pêşketinên hizrî yê n ku dibin dide kifşkirin.

Felsefe ku mirov ji demên berê yê n li ber diclê û firate, destpêka wê bide destpê kirin, wê ne xelat bê. Wê rast bêt. Bi teybetî ji, felsefe, bi pêşketine civakî ya bi pergala re bide dest pêketine xwe dike. Pergalbûna civakî, mirov karê weke destpêka wê ya serî bêne ser ziman. Pergal, ku ava bû, xwestina xwe anêna ser ziman ye wê heya. Ew ji, deme ku tê ser ziman, ne tenê bi awayekê bi gelek awayan dibêt. Felsefe, weke encama wê têgihiştine ku tê ser ziman xwe dide der. Di rastiyê de, mirov karê bêje ku ew têgihiştin bixwe ji ya. Bi navkirin û anîna ser ziman ye wê têgihiştinê bixwe ji ya. Di pêşketinê de, di têgihiştinê de boyutên pêşketinê yê n ku bi têgihiştinê re hene bi felsefe re xwe diyar dikin li jiyane. Her pêşketin bi têgihiştine xwe re, dixwezê ku were têgihiştin û di meji de naskirinekê di derbarê xwe de bide çêkirin. Bi vê yekê, êdî lêgerîn û hewldan dibin. Lê di vir de, divêt ku em bi teybet bêjin ku ev lêgerîn û hewldan ji, lêgerîn û hewldanne têgihiştinî na. Di meji de, wate wan ji pêşketinê re pir mazin e. Li avakê meyîzandin û xwestina fêrbûna ku ew av ji kuderê bide herikandina xwe dike û an ji di ku deran ve tê û diçê. Av ji çêdibêt û hwd. Pirsne ku mirov di serî de, deme ku mirov şatakî ava dimeyîzenê û di serê mirov de çêdibin in. Lê ew şatê avê, ku mirov li ser di hizirê, mirov bi wê hebûna xwe ye ku tê berçavên mirov re, mirov di nav gelek hizir û pirsan de dihêle. Ew pirs û hizir hemû ji, di serê mirov de, mirov dibine astaka têgihiştinê. Mirov ji rewşekê dibin û dikina rewşeke din de. Her weha mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Bi çend awayan mirov karê li wê herîkîna ava û hebûne wê bixwe ji meyîzenê. Aliyekê ku mirov pê meyîzenê, tehereke meyîzandine bi mirov re dide çêkirin. Ji aliyê, metafizikî ku lê tê meyîzandin, av, hebûnaka ku mirov di hebûne wê de ji bo famkirinê tede herê û çiqas herê ji, mirov wê negihê dawîya têgihiştine wê ye ku mirov wê bigihiyê de. Bi vê yekê re, xwediyê metodakê ya Metafizik. .. Lê aliyekê din ji yê

teherî heya ew ji ku li hebûne jiyane ji weke wê avê ku çawa diharikê lê dimeyîzenê û di derbarê de dibe xwediyê têgihîştin û bi wê têgihîştinê ji dibe xwediyê baweriyekê. Her weha ew ji jê re tê gotin " dialektik". Dialektik, çend ku bêjeke ku di terminolojiya rojava ye felsefe wê de bi temene ji, di dawiya xwe de bêje bixwe ji, bi hinek rengên anêna xwe ye ser ziman û anîna ser ziman ye têgihîştine xwe re diçê ta deme Naîriyan. Naîriyan, di naqabîna baran û şînbûnê de têkiliyek di hizre xwe de bi zanî danîbûn. Yên ku li ser têgihîştine Lipît Îştar hinekî kur bibe, wê xwe gihandina têgihîştineke wisa xilas nekê. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku temenê wê têgihîştinê, hata wan deman ji diçêt.

Bi teybetî, demên piştî pêşketine sumariyan, yên Urî, mîtanî û naîriyan, demne têgihîştinê ne. Hizir bi hebûne felsefê re bi wan re heya. Di nêzîkatiyên xwe yên rêveberî de statûqûperezîyekê ji diafirênin. Ev yek, bê têgihîştine felsefê na afirê. Divêt ku mirov vê yekê ji, her weha bi teybet bêne ser ziman. Lê naîriyan, deme ku mirov li ser deme wan bihizirê, mirov dikarê bêje ku wan demeke wê xata pêşketinê ye pir pêşketî ya antîk jîn kirina. Rastiya pêşketine wan, mirov karê weha bi teybetê rast û di cih de bêne ser ziman. Ew filozofên wan yên ku li civatan dirûniştin û her çara ku diaxiftin, weke ku pirtûkekê ji serî hata binî bixwênin, yên ku di dîrokê de ji î ro ji ji bo tê gotin ku weke ku bênav cih girtina, weyneke mazin ye **dîrokî** leyistina. ...

Gotina rastiye, gotinaka têgihîştinê û felsefê ye bingeh e. Hate nahaka pir li ser hatiya sekinandin. Hê ji li ser dihê sekinandin. Di kurdî de gotina rastiye, gotinaka teybet e ku li berçav rastiye ji nerîn û dîtîne dihêne ser ziman. Ku mirov di temenê hîmzaniyê de li gotinê di hizirê, ji aliyê têgihîştinê ve mirov ji sê aliyan ve wê fahm dike. Yek bi rastiya ku dihê dîtîne li berçav e. Ye din, bi wê rastiye re heyîn û hebûne darêjkitiyê ya. Ye sêyem ji, gihiştina serzaniya wê çerçova heyîn û hebûne ku heya ya. Lê çerçovabûna rewş û heyînê ye li jiyane ye bi rewşê re, hebûne rastiye diafirêne. Rastî, bigotinî, ji heyînê û hebûne wê nerînekê bi dîtîne re dixwezê bi çerçova wê re. Çerçova aliyekî ku bi teybet ê rastiye ya. Di wê temenê de rastî, hebûna wê, ye ku dihê dîtîne. Di vê çerçovê de rastî, heyîne wê, divêt ku mirov hinekî li ser aqil bimeşene. Heyîn hebûna wê ye rast e. Neyîn ji, hebûne wê ye ku mirov bi gotina rastiye re bêne ser ziman heya. Rastî, ye ku heya û bi heyîne û mirov karê wê bigirê, jê sûd bigirê û wê fahmbike ya.

Di çerçova heyîne de jîr, heyîneke wê ye rast heya. Jîr, ji temenê xwe yê ku jê bûya, êdî pişt wî re bûya heyîneke rast ye ku mirov bi wê re bêne

ser ziman e. Jîrî, di vir de, heyîne ku li berçav dihê dîtin, wê çerçova wê, mejîyê me digirê û di xwe de di xêvê de bicih dike. Ew bicihkirine ku hatî kirin û tişte ku hatî bicihkirin, bi hev re dihêne ser ziman. Gotina "ew bicihkirine ku hatî kirin" ye ku me di hevokê xwe pêşî de di serî de bi kar hanî, berî gotina ku me di heman hevokê hanî ser ziman e "tişte ku hatî bicihkirin" wê newê ser ziman. Wê newê holî jî. Ji ber ku deme ku bahse bicihkirinê hate kirin, hingî, mirov bahse tişteki dike. Ew tişte tişteki ku mirov karê dest lê de û an ji mirov nikarê dest lê de ya. Lê têgihîştina ku bigotina tişte ku hatî bicihkirin re dihê ser ziman, wê temenê afirîna gotina ew bicihkirina ku hatî kirin ji wê biafirîne bi xwe re. Bi vê yekê re, ye ku li pêş di sekinê di gotinê de û bi teybetî ji di têgihîştinê û zanîna wê de, tişte ku hatiya bicihkirin e. Di wê gotinê de bêja "tişt" temenê wê gotinê di afirîne. Di aslê xwe de hîmê gotina ew bicihkirina ku hatî kirin ji diafirîne. Ew gotina 'ew bicihkirina ku hatî kirin' di xwe de bi wateyî du lêkeran di hawênê. **Lêkeriya pêşî**, ye rewşê ye bi bicihbûnê re ku diafirê ya. Lêkere din ji, her weha ye tişte ku hatiya bicihkirin e. Di gotina din e 'tişte ku hatî bicihkirin' de ji, bi lêkere heyîne tiştê ye di xwe de ku bi kirde kiriya lêkeriyeke xwe ye ku dihêne ser ziman bi xwe re diafirîne û lêkereke din ji, her weha bi hebûne heyînê re bi xwe re ku mirov li ser bihizirê dihêne ser ziman.

Di vir de, rastî, aliyê wê yê bi gotina 'ew bicihkirina ku hatî kirin' re aliyê xwe yê ku bûya dihêne ser ziman. Lê di gotina 'tişte ku hatî bicih kirin' de, gavekê li pêşiya wê, heyîna rastiye bi têgihîştinaka ku pê wê tomar dike re wê dihêne ser ziman. Bi wê re, aliyê wê yê din ji her weha ew e ku êdî rastî jîrîya wê, bi bicihkirina wê re û bi wê bikirina wê re bûna têgihîştina bicihkirinê ye bi pêre re jîrîya xwe ye kirdeyî ku jê bê afirandin diafirîne. Tişte heyî dihê bicihkirin. Tişte ku nîn e, wê newê bicihkirin. Lê ber ku nîn e. Nîniye wê, nebûna heyîne hebûnê dihêne ser ziman. Nebûna hebûnê, di aslê xwe de, ku mirov bi pê re dihizirê, bi têgihîştina zanîne e li ber wê re têgihîştine heyînî bi pêre dihê ser ziman. Heyîn û hebûne wê, wê gotina rastiye birast bike. Heyîn, hebûne wê, ku heya rastiye birast dike. Rastî, bi wê, ye ku heya dihê ser ziman. Ye ku nîn e ji ji ber ku nîn e nayê ser ziman. Neyîn, wê xwe bi heyîne hebûnê re bi hebûn bike û bibe hebûn û rastiye bêne ser ziman.

Meleyê Cîzirî, di pirse ku "ma ku tişte ku nebe, mirov wê çawa karibe bêje ku ew heya(?)". Ew di gotina xwe de, xatekê di nava hebûn û nebûnê de dixîzêne. Ew xîzandina wî, wî digihêne têgihîştinekê ku "her tişte ku heya" li aliyê xatê yê ku heya dijî û heya. Ew, bigotinê, dihêne

ser ziman ku"piştî ku bûn bû, êdî wê nebûn bi wê bûnê re newê ser ziman". Nebûn, hebûnê nikarê şerîn bike. Ji ber ku hebûn bi hebûne heyînê re heya. Heyîn, di hebûne xwe de rastiyeke bi hebûne xwe re dihêne ser ziman. Ew wê rastiyeke dihêne ser ziman. Di têngiştina xwe de, ew weke ku xwediyê metafîzîkeke camidî ya. Mirov wê jê fahm bike.

Li ser rastiyeke hizirkirin, temenê her pêşketine hizrê ye ku hate nahaka afîriya afirandiya. Gotina rastiyeke, çî têngiştinê lêkeriya wê li xwe bike ji, ew têngiştin jîrîyaka wê ye ku fahm bike heya. Jîr, zîrebûnê bi pêş dixê. Zîrebûna ku diafirê ji, weke ancamaka jîre bixwe ya. Jîr û zîrebûn, li ser zanînê re di jîyanê de bi tevgeriya ku diafirê re lev dikin. Rastî, li ser wê hizirkirin, ji bo wê, pêşî rastî çiya, bersive wê hatiya dayîn. Di çerçova rêzkariyekê de, li di jîyanê de li bersiva wê hatiya lêgerîn. Rastî, di aslê xwe de, di pêşketinên ku bûn de, temenê mazin ye ku afirandiya. Di jîyanê de, heyîn û hebûne wê ye ku heya, ew di çerçova wê hebûne wê de ew hatiya kifşkirin û ew hizre rastiyeke ye ku hatiya ser ziman ji, ji wê hatiya deranîn. Di çerçova heyîn û hebûne wê ye şênberî e camidî de, rastî bi heyînê hatiya salixkirin. Rastî, ku heyîne hebûnê e têrkerî ji dike nava xwe de bi rêzkariyekê ku çerçova wê hatiya afirandin re heya. Pergalbûn, rêzkariyê û darêjk, bi bûna wan ye bi hev re heyîne rastiyeke diafirê. Hizir û hizirkirin, hest û hestbûn, gotin û gotinandin û hwd, bi heyîn û rewşe bi wan re rastî heya. Rastî, ne bê heyîn e. Bi heyîn e. Hizirkirin, ji heyîne ku jê re şênber e û bi wê şênbertiyê ku xwediyê camidîtiyekê ya heya. Bi wê heyîne ku heya re, rastî hebûne wê bi heyîn dibe.

Di naqabîna rastî û heyînê de, ku bi rastî bi hebûne heyînê dihê ser ziman, heya. Rastî, çiya? Ev pirs, di çerçova heyîne ku heya de ku hemû tiştên ku hene, di kevîne ber wê hebûnîtiya wê de. Meleyê Cizîrî, deme ku mirov bahse gotina rastiyeke bike, mirov divê ku wî bêne ser ziman ku gotinaka wî ye pir rastî hebû. Li ser têngiştine wî ku mirov dihizirê, mirov wê têngiştina wî ye ku di çerçova gotina rastiyeke de bûya mirov wê dibîne. Ew rastiyeke, ji heyînê di hasibêne. Lê ew rastiyeke bi têngiştina xwe ye ku hanîya li ser ziman de, ku mirov li ser dihizirê, mirov dibîne û fahm dike ku wî rastî di çerçova rêzkariyekê de bi jîyanê re dîtîya. Ew rêzkariya ku wî hizirkirîya, wî bi pergal û bi çerçova hanîya ser ziman. bi wê re, wî rastî, bi awayê heyînê ye ku haniya li ser ziman re bi jîrîyaka jêdarî haniya ser ziman.

Rastî. bi wê têngiştina wî ku mirov lê di hizirê, mirov dibîne ku bi çerçova û pergalbûnekê re wî bi darêjkîyaka ku bijîrî ku dihê holê

hanîya ser ziman. Di vê yekê de awayê ku hatiya konsantrakirin, wê awayê têgihîştina gotina wî ya rastiye dihêne ser ziman. Di gotina rastiye de dem, wê bi qorsîyaka kişînê re ku bi wê kişîna wê re bi hev re û bi hev ve xwe girtiya wî dihanî ser ziman. Bi vê yekê re, gotina wî ya rastiye, ne bê xosletiya demî ya. Ew gotina wî ya rastiye, bi du awayan di pêşketina xwe de ya. Aliyekî wê bi demê re ya. Ew aliyê demê ji dibê dualî. Aliyek, bi berdeambûna demê re hebûne wê, ku di wê demê de di çerçova xwe de bi pergal ku konsatrabûyî ya, bi demê re û berdeambûna wê ye ku têde mazinbûnaka bi firehî dihêne holê re, ew ji bi wê re di mazinbûna xwe ye li gor wê de ya dihê holê. Aliyê duyem ji, bi hebûna rastiye ye bi dem ve ya. Bi vê yekê re herdu aliyên bi demê re dihêne ser ziman. Lê aliyê din yê rastiye ji her weha bi heyîn û hebûne wê ye bi di ahangê xwe de dihêne ser ziman. Di aslê xwe de gotina rastiye, bi vê awa û heyêne xwe ye ku pê dihê holê û têgihîştin re, xwediyê camidîtiyaka ku bi heyîne di jîyanê de ya.

Dem ku hate ku dihê sadsala 15 û wan pêde, li Kurdistanê di pêşketine têgihîştinê de, gelek pêvajoyên ku bûna hene. Aliyekî wan pêşketina bi goptina rastiye re dihê ser ziman. Bi gotina rastiye re weke ku bi nerîne re ji şênberiyak bi kevneşopîyan re hatiya afirandin. Li civatan deme ku kurd li hevdû di rûniştin, jevre, hertimî hewldanaka wan ye ku rastî çiya wê bi hev re kifş bikin û bidina bi têgihîştin hebû. Di temenê rastiye de, deme ku em li wê awayê hizirkirina wan dihizirin, em di bînin ku bi du awayan wan rastî di xwe de û bi xwe re şênber kiriya. Aliyek bi heyînen weke bûna barana baranê û berfina berfê û hwd, dihê ser ziman. Aliyî din ji, bi baweriyê dihê ser ziman. Ew ji bi hîyerarşiyekê dihê ser ziman. Metafizîka wan ji, mirov karê bêne ser ziman û êmin bêje ku têde camidîyek bi têgihîştin bi pêvajoyên pêşketinê yên dem bi dem re afiriya. Awayê Metafizîka kurdan, xwediyê xosletekî xwe yê teybet e dîrokî ya. Mirov ku wê kifşnekê, mirov wê wê pêşketine wan ye hizrî awa û hebûne wê ji pir baş fahm neke.

Deme ku mirov li metafizîka wan hizirkirinê bike, mirov divêt ku wê gotina wan ye ku ji her zanist û filozofên wan demên berê re bûya temen ji hanîna wan ye li ser ziman re e bi navê rastteqniyê ji fahm bike. Ew ji, fahmkirina wê, bi serê xwe, di çerçova heyîne pergal û pergaltbûnekê de dibê. Ew gotina wan, di aslê xwe de, awayê pêşketina felsefe ya wan ye têgihîştinê haniya holê. Bi wê gotinê re, metafizîka wan jîyan ji xwe re dîtîya. Di xwe de, hate ku çûya kur çûya. Metafizîka kurdan, ji sê aliyên ve bi sê pêvajoyên xwe yên sereke re dihê ser ziman. Pêvajoya pêşî, ji

destpêkê ku bûna wê ya li jiyane bi têgihiştinê xwe re ya. Di wê demê wê de ji, demne bi afirandin, pîrozkirin û bawerkirin, di çerçovayekê de adilandina cihanaka bi nirx ye di serî de û di wê cihanê de têgihiştin û hizir û felsefeye wê ku wê dinye me ye derve ji wê bide adilandin û kifşkirin hatiya afirandin, bi wê bixwe re dihê ser ziman. Deme duyemin, li ser wê demê, bi felsefebûna wê re dihê ser ziman. ..

Bikevneşopîbûna civakê ji mirov karê bi wê re bêne ser ziman. Bi pergalbûn bûna wê ya. Di wê demê de, metafîzîka wan têne bi felsefekirinê re dihê ser ziman. Gotinên weke gotinên rastteqniyê yên wê demê na. Lê berî hertiştî mirov karê bêje ku tede, di wê deme wê ye duyemin de hizirkirina li ser rastiyê û safîkirina wê heya. Deme ku metafîzîka wan pir afrîner dibe di xwe de, ew deme wê ya. Bi wê afrînertiya wê re, mirov karê wê bêne ser ziman. Ji Nebî Nuh, hate ku digihê lut, Yusif, Yunis û Birehim xelîl û hwd, li gor wê xala wê ye duyemin dijîn. Bi pê re ji, felsefekirin, ye wê demê ya. Di vê demê de, hinek pêvajoyên wê yên ku di çerçova heyîne deme duyem ye wê de dibin hene. Xwûdê û an ji bi navê xwe yê yazdanî serweriya wî di wê demê de diafirê.

Deme wê ye sêyemin ji, bi tîrîti û tîrîtiya di wê deme duyemin de bi pêşketine wê re, bi serwerwîya xwe ye ku afirandîya û adilandiya re derdikeve pêş. Ew dem, demeke pir mazin ye pêşketiya jîrîya ji. Di wê demê de pêşketinaka mazin ye dîrokî dihê jînkirin. Ew pêşketin, weke ku çawa ku mirov hizre xwe birijêne ser rûpelekî ew di awayê kevneşopîyan ji xwe dike rûpel û dirijiê ser wê û di jiyane de hebûna xwe bi jiyandina xwe re dide berdewam kirin. Dem hate ku dihê deme Meleyê cizîrî û hwd, mirov dibîne ku ew û yên weke wî, aliyekî wan yê zanistvanitîyê yê wê xalê ji heya. Ew ji, weke di bîr û bîreweriya wê de ne. Mirov wê yekê bi wan re wilo **fahm** dike.

Ku mirov li dîrokê dinerê, mirov karê bêje ku dîroka kurdan pir dirêj diçê. Gelek tabletên (kêvalberên) sumeriyan çawa têne xwandin em nizanin. Lê belê, weke ku tê ser ziman, ne tenê di navbara bêja "nîn-tî" û "jîn-tî" wekhevî hene. Di awayê jiyane û kisakirinê de ji ev yek heya. Kurd, hata î ro ji, ku dengbêjên wan hena û ew denbêjên wan, di demên berê yên kevn de, bi hebûna xwe re karekî ku mirov bi awayê nivîskartiyê ji bêne ser ziman, anîna bicih. Bi vê yekê mirov karê wan bêne ser ziman.

Li ser zimanê kurdî, lêkolîn ku tê kirin, tê dîtin ku zimanê kurdî çend kevn e. Bi kevnbûna xwe re heya deme sumeriyan diçê. Di tabletên

sumeriyan de, navê "dîclê" bi "degrê" di buhurê. Navê firatê ji bi heman weke xwe di buhurê. "Firat" buhurê. Lê di hinek tabletên de, weke "aufirat" du buhurê. Ku mirov bi kurmanciya me ye roje me têne ser ziman, dibe AVA FIRAT. Bi vê yekê, divêt ku mirov hinekî li ser bisekin ê. Di tabletên sumeriyan de, gelo hemû tîp û bêje rast têne xwandin? Vê pirsê ji mirov karê bike. Weke ku tê ser ziman, di tabletan de, bahsa "nîn-tî" tê kirin. **Wate wê JIYAN an ji ku navkirin JINTÎ YA. Her wusa "jin-tî", di kurdî û kurmancî de tê wate ya "jîyanî te" jî. Du kurmancî de, jintî, ji jina birayê mêr re tê gotin. "tî", çawa ku weke ku tê ser ziman di zimanê sumerî de, her weha di kurmancî de ji pir girîng xwediyê cihêkî ya, ku mirov pir mazin û bi girîngî li ser bisekinê ya.** Bi vê yekê re, hêya ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Zimanê sumeriyan de, "ga" heya û ji ga re tê gotin. Di kurmanciya î ro de ji ga bi heman awayê tê ser ziman. Ga dise ga ya. Jin, di kurmancî de wate wê ya jîyanê ji heya. Dii zimanê sumerî de ji her weha ev yek heya. Kîjen pêvajo çawa hatina jînkirin, hê wilo zêde ne hatina fahm kirin. Li ser sekinandin ji bi vî awayî girîng dibêt.

Ku sibe derkeve hole ku ji dêla "j" di xwandinê de "n" hatiya bi karanîn, hingî, gelo wê bê gotin ku tenê ev tîjbandinaka? Her weha bi vê awayê mirov hê gelek rewş û pêşketinên ku hatina kifşkirin bênine ser ziman.

Di vir de, divêt ku mirov vê yekê ji her weha kifş bike, ev ji, her weha ew e, ku zimanê kurdî di deman de gelek pêvajoyên pêşketinê jîn kirin. Gelek guharandin ji buhurandina. Wan guharandin û pêvajoyên pêşketinê yên ku hatina jînkirin ji, divêt ku mirov di berçav de bigirê. Her dem û pêşketinek, li gor xwe, karê zimên biafirîne û awa bide zimên. Tenê bi afirandina hin bêjeyên nû re ev yek nayê ser ziman. Bi karanîna zimên di rewşan de ji her weha ev yek wilo ya û tê ser ziman. Weke efsanaya hawwa ku ji hestûyê tihêlê yê Adam hatiya afirandin ji, weke xwe hata î ro di nav kurdan de cihê xwe parastiya û di hizrên wan yên olî de bicih bûya. Gelek rewşên weha yên ku di nav xalkê de hene û di nav hizre olî ye herêmî de bicihbûna û têne ser ziman hene. Lê bi navê olê têne ser ziman. Di kurmanciya î ro de, ji jinê re gotin JINÊ bikaranîna wê û di deme sumeriyan de bikaranîna weke ku tê ser ziman "nîn"ê, di awa û temenekî de têne ser ziman. Hata deme kawa, hebûna bandûra "Lipît Îştar" û nîrxên ku bi wê re afirîne ji, divêt ku mirov bêne ser ziman. Mîtra, çend ku weke Xwûdayakê mêr tê ser ziman ji, bi wê kevneşopîyê weke ku hatiya şîştin. Lê piştî ketine Medan û serwerbûna persan re, êdî

ew ji dikeve destê wan de, ji ber ku di destê rêveberiyê de ya. Êdî li ketine perestgihên wî, ketine jinê ji tê qadaxakirin. êdî hin bi hin weke ku çandaka ku bi nêrîtî tê ser ziman, bi rêveberiyê re serweri aliyê jiyanê hemûkan dibêt. Bi vê yekê re, êdî gelek guhanrandin di demê de dibin.

Di wate navê jinê de habûna wate jiyanê, ji hinek nirxên ku afirîne û "pîrozî" ji li wan tê kirin bûya. Divêt ku mirov bi vê yekê, mirov bêje ku wateyeke "nîn"ê, ye din ji, di zimanê sumeriyên de, pîrozî ya ji. Di nav kurdan de, di demên berê de ku hinek kurdên me î ro erê ji nekin ji ber çanda mêritiyê ya ku di wan de û şaxsiyeta wan bicih bûya pîrozî bi jine re di jiyanê de hebû. Weke ku hata roje me ji hatiya, ku hamawiya jinê çend pîroz tê dîtîn û di nav berberiyên de ji hata avêtin, êdî berberî bidawî dibûn. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Ev xoslet ji, mirov hinekî li ser pîroziya bi jinê ye ku afiriya re di deman de dide hizirandin û digihêne hinek hizran..

Bi vir veg girêdayî, ku **zimanê kurdi** ku mirov bahsê bike, divêt ku mirov dîrokeke ku pir dirêj bêne ser ziman. Zimanê kurdi dîroke wê ye ku tenê em zanin ne bin 8 hezar salan re ya. Hê gelek pêvajoyên pêşketine wê ji em nizanin. Di derbarê wan de wilo zêde ti zanebûna me ye mazin nîn e. Ji deme suermiyên û vir de, em hinekî xwediyê têgihîştinekê ne. Lê di deme sumeriyên de ji, pêşketineke çawa û bi çi awayê di xwe de jîn kiriya, di derbarê wê de ji, wilo zêde agahiyên me nîn in. Deme sumeriyên bixwe ji, çiqasî dirêj berdewam kiriya? Ev pirs ji, deme ku tê pirsin, li ser deme hinek qanaatên aqadamîkî têne rojeve. Hinek zan têne rojeve. Lê yên ku wan qanaat û zanan ji tênine rojeve, bi xwe ji dibêjin ku "deme sumeriyên û ev pêşketinên ku me anîna ser ziman, heya ku hinek awayên wan yên hê cudetir ji hebin". Vê hizrê ji tênine ser ziman. Lê deme ku mirov li wê demê û pêşketine wê wan, ew awayê wê yê ku î ro ji, hinekî ji bê hatiya kifşkirin, ku mirov lê dimeyîzêne, mirov dibîne ku pêşketineke mazin jîn kirina. Tenê parastgaha ku li gundê Rehayê hata dîtîn, biserê xwe karê hinek hizrên aqadamîkî yên ku hatina afirandin û îro ji di rojevê de serûbin bike. Li gor hinek zanan, tê gotin ku ew parastgah "berî zayîna di naqabîna 13 û an ji 13 hezar salan de hatiya avakirin. Her weha hinek hizir têne ser ziman. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku pêşketineke mazin ye ku mirov wê kifş bike li herême jîn bûya. Hê ji gelek aliyên ve ji, pêşketine wê, ne hatiya kifşkirin. Aliyên ku hatina kifşkirin ji, têne yên rêveberî û an ji her weha yên desthildatdarî ne. Wilo zêde li ser jiyan û û pêkhatinên wê kifşkirinên mazin ne bûna. Ev yek, bi serê xwe ji, mirov dikê nava hinek

hizirne de, ku ew pêşketine wê çend mazin e. Li herême zimanên ku herî kevn yên ku pêşketine herême di xwe diparezên, kurdî, farsî, arabî û asurî ya. Ev herê ziman zimanên ku ji wan deman mana. Farsî dîroka wê hinekî î ji bi vir de têt. Lê kurdî hê bêtir dîroka wê bi asûrî re bi wirde diçêt. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha di serî de kifş bike.

Deme ku mirov bahsa zimên bi xwe ji bike, divêt ku mirov zanibe ku mirov bahsa çî dikêt. Kurdîya ku îro em bi kar tênine, ti çarî ji ne weke ye wê demê ya. Ji ya wê demê çûdatira. Bêjeyên kurdiya îro, li ser hîm û temenê têngihîştinê yên ku avabûna na. Divêt ku mirov vê rastiyê di serî de kifş bike. Ev yek her weha ku mirov wê di serî de kifş kir, êdî wê mirov di serî de bigihêne hinekî rastiyên in ji. Her weha wê di serî de, pirseke ku mirov bi pirsê û bersive wê bide wê ji me kê. Ew pirs ji, her weha, di zimanê kurdî de, demên wê yên berî deme têngihîştinê çawa na û çawa pêşketina na. Ev pirs, pirseke serekê ya ku mirov bi pirsê û bersivekê bidiyê de. Kurdî, hata nahaka wilo zêde li ser lêkolîn ne hatiya kirin. Hinek, bêjeyên ku ji deme sumeriyana mana weke "ga" ji, hinek hizirne di serê mirov de çêdikin. Ev bêje ji, bêjene ku mirov wan li ser wan bihizirê û hinek analizên ji temen bike ne. Ev bêjeyên halo, hinek pêşketinên ku wê demê bûna di xwe de tênine ser ziman. Ji xwe, ku mirov li ser zimên di hizirê, mirov vê yekê ji her weha dibîne. Zimanê deme pêşketinê, bêjeyên xwe yên axiftinê ji, her weha li gor xwe diafirîne. Bi vê yekê re, mirov karê karê bêje ku dem bi dem û pêvajoyên bi pêvajoyên pêşketineke ku rû dide dibêt di zimên de. Di kurdî de ji, di zimên kevn yên ku ji wê demê mana de ji ev yek heya û bûya. Di serî de, ku mirov li kurdî dimeyîzenê, mirov vê yekê her weha pir baş û qanc dibîne. Kurdî bi civaka kurd re bidest pêşketine xwe dike. Ji ber vê yekê mirov karê bêje ku dîroke wê, dîroka civaka kurd e. Kurd, ji wê demê pêde, çend ku bidest pêşketine xwe ye civakê kirin, her weha zimanê wan ji, li gor wê bidest pêşketine xwe kir. Bi vê yekê re, zimanê wan, di rastiyê de, dîroka pêşketine wan ya civakatîyê bi awayê kurdî "kurmancîyê" re têne ser ziman. Kurmancî, ku mirov li ser bihizirê, mirov wê bibîne ku ne tenê zaravayakî zimanê kurdî ya, her weha zimanê demeke pêşketina kurda bixwe ji ya. Ku mirov lê dimeyîzenê, mirov vê yekê her weha di serî de, pir mazin kifş dike.

Hata îro, wilo zêde zanistaka ku zimanê kurdî bi serê xwe û bixwe lêkolîn bike ne afirîya. Lê ku zanistaka wilo ye lêkolînkirinê hebene, wê kifşkiribana ku zimanê kurdî, bi awa û hebûne re, ji wan kêvalbar (teblet)ên sumeriyana yên ku mana hata roje me, ji wan bêtir

pêşketinên wê demê di xwe de diparezê ya. Di serî de divêt ku mirov vê yekê her weha kifş bike. Kurdî, zimanê pêşketinê ya. Vê gotinê mirov karê ji bo kurdiya roje me bênine ser ziman. Kurdiya roje me, ya deme pêşketinê ya. Bêjeyên wê ji her weha yên deme pêşketinê ne. Her hevok û bêjeyên wê, di xwe de hinek pêvajoyên pêşketinê yên ku bûna diparezê. Ev yek, di serî de rastiyaka ku bûya di zimanê de kurdî de. Kurdî, bi vê yekê, divêt ku ji gelek aliyan ve were têgihiştin. Li ser lêkolîn bêne kirin. Ev yek, di serî de ji bo kurdan bixwe pir girîng e. Lê di çerçoveyeke gerdûnê de ji, wê mirov bigihêne pir pêşketinên demên berê yên ku bûna. Kurdî, her weha xwediyê hinek xosletên ku îro ji hê ji, ne hatina kifşkirin in. Li ser zimên, deme ku mirov bihizirê, ku ev ziman kurdî bê, divêt ku hinek têgihiştine civaknasî û kevneşopî ji di ser mirov de di wê kêlîkê de zîn û jîn bê. Ev yek, her weha pêdivî pê heya. Ev yek, wê mirov bigihêne hinekî rastiyên din yên ku bûna. Wê mirov, çêtir û zûtir serwaxt û serwer bike di kifşkirin û pêşketinên zimên de.

Zimanê kurdî, ji deme sumerîyan ye duyemin pêve, ku hata ku digihê deme Mîtanî û Hûriyan, pêvajoyaka deme xwe ye pêşketin bi awayê têgihiştine jîn dike. Bi wî awayê ku pê pêş dikeve ji, têgihiştineke mazin di xwe de çêdike. Bi wê têgihiştine, êdî weke ku xwe ji nû ve ji bi afirêne lê tê. Bêjeyên deme pêşketin ye têgihiştine, êdî zû bi zû diafir in û serwerî jiyane dibin. Bi vê yekê anîna ser ziman ji, mazin pêş dikeve. Mirov wî awayê pêşketine zimên ji, awayê axiftin û nivîsandina wan fahm dike. Awayê axiftina wan weke ku helbestekê bixwêni e. Deme ku kurd di civatên xwe de li hevdû di civin û lev dirûnihin, her weha jêvre tênine ser ziman. Bi wê awayê anîna ser ziman ji, êdî hin bi hin jiyana wan ji di awayê pêşketine xwe de mazin bidest pêşketineke mazin dike. Jiyana wan, bi têgihiştine pêşdikeve. Di deme Gûtî û naîriyan de awayekê hizir yê bitêgihiştin ku pêşketiya, her weha vê yekê bi me dide fahm kirin. Ew awa ji, her weha dihizir de, nêzikatiyaka teherîye ye ku di jiyana wan de bi têgihiştinekê bi hizir pêşketiya ya. Naîrî, bawer dikin û baweriya xwe bi felsefe dikin. Bi vê yekê dihizir in û di afirênin. Hizirên xwe yên ku tênine ser ziman ji, xeyretê dikin ku jev ne qûtbîn. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pêşketineke mazin bi wan re

heya.

LI SER JÎRA JÎRÊ ...

Beş`yek; darêjka jîrê û fahmkirina kirdeya wê: Jîr, hanîna heyîne wê ye li ser ziman, ji gelek aliyan ve dibêt. Me ji ji aliyê derke xêvê û bîre wê û bi gelemperî bi xêvê û bîre wê re hanî ser ziman. Lê hê gelek aliyên wê yên ku werine fahm kirin hene. Deme ku mirov di keve nava zanîna wê de, êdî mirov dibîne ku ew çendî mijaraka kur û divêt ku mirov li ser bisekinê ya. Jîr, bi têtetî, heyîne bîre deme ku mirov pê re li ser di hizirê, mirov rastî aliyê wê yê din ji dihê. Ew aliyê wê ji, jîre jîrê bixwe ya. Jîre jîrê, heyîne hebûne bîre jîre ji bi xwe re dihêne ser ziman. Bi wê re ji, xwediyê aliyekî xwe yê mirov wê bêne ser ziman e. Hizir, deme ku mirov li ser hizirê, mirov ku wê weke mirovekî hizir bike û bêne ber xwe bi xwe, mirov êdî piştî wê hanîne ji bidest hizirkiirna wî mirovî bike, mirov wê di wê hizirkirinê de du awayên hizirkirinê kifş bike. Yek awayek, ku heyîne wê bixwe dihê holê ya. Ya din ji, bi gelemperî ew hizirkiirna ku ew dike têtetiştina di wê hizirkiirna wê de ya. Ev aliyê hizirkirina wê yê din e. Lê ew hizirkiirna wê, di xwe de ji hizirbûnekê dihawêne. Ew hizirbûyin ji, aliyê wê hizirê yê din e. Bi hizir ku mirov li ser dihizir, dibe têtetiştine wê hizir. Lê hizir gelek aliyên wê hene. Aliyê têtetiştinê, bi wê re ji aliyê bîrê û bi wê re ji aliyê hiş heya. Di temenê wan de ji xêv heya. Xêv, mijaraka ku ji gelek aliyan ve divêt ku were têtetiştin e. Biqasî aliyê wê yê ku di xwe de dihawêne, wilqasî ji aliyê wê yê ji heyîne wê dihê holê heya. Jîr, di wê heyîne de xwediyê heyîne ku bi wê re dihê ser ziman e. Bîr jîre wê û jîr bîre wê, bi hev re hin astna ku mirov wan bîne ser ziman di xwe de dihawênin.

Bîr, jîre wê, ku mirov li ser di hizirê, mirov di çerçova wê heyîne wê ye ku heya de, mirov heyîne wê kifşdike. Heyîne bîrê, di xwe de, bi zanîna ku bi pê heya re, bi hişiya di xwe de jîre xwe di afirêne. Jîr, di bîrê

de hişkirinaka bizanebûn û tevger e. Ew zanebûn, bi gelek aliyên xwe yên ku bi heyîneke bi bîre di xêvê de dihêne girêdan heya. Girêdankên di xêvê de, heya wan, bi hin pêvajoyên bandûrbûnên cûr bi cûr ku bi bûna lê re ku bûna hena. Bîr, di çerçove heyîne xêvê û wê heyîne zanî de dibe xwediyê heyîne xwe ye ku wê pê were ser ziman. Ew heyîne wê, bi bûn û safîbûna zanîne re dihê holê. Bûna zanîne, bi safîbûna ku bi pê re dibe re diafirê. Ji vê yekê ve xêv, di wê de, deme ku mirov li ser dihizirê, mirov wê heyîne wê kifş dike. Minaq, deme ku mirov bahse **Êlî Herîrî** û zanîna wî ye di serê wî de bike, mirov wê bibîne ku ew xwediyê zanîna şênber ku wî hanîya li ser ziman. Ew zanîna wî, ku mirov li ser di hizirê, mirov di wê de hinek awayne ji kifş dike. Awayê xweşik axiftinê heya. Bi wê re, deme ku ew di wê yekê de bû xwediyê têgihîştinekê, hingî ew xwediyê zanîna teybet ye bi zanîna xwe re ji ya. Di zanînekê de, heyîne bîr û hişê, di rastkirina gotinan û lev hanîna wan de xwediyê bandûraka pir mazin e. Her gotina ne bê pergal e. Her peyv ji wilo ya. Di wê awayê hizirkiirîna e bi me re, deme ku em gotinekê li ser wê ji di hizir in, em karin bêjin, ku em bi zanîna wî xwediyê zanînekê na. Ew zanîna wî ye şênber temenê wê zanîna me diafirêne. Bi wê re, deme ku em têgihîştinekê bi gotinên xwe yên ku dihênine li ser ziman di xwe de çêdikin jî, em êdî ji zanîna wî digihîştina mazin ye bi wî re di xwe

de. Jîre bîrê, di vir de xwe şanî mirov dide. Jîr, ne bê bîr e. Bîr ji ne bê hiş e. Hiş jî, ne bê di farqêtîyê de ya. Farqêtî, nasînaka ku mirov wê pêre û tede kifş bike heya. Ev nasîn, ew nasîna ku me li jor bi xêv re ku bi lêkerine safîkirinê re hanî ser ziman e. Zanîna û nasiye wê, bi bîre re zanînnasiyekê diafirêne. Temenê wê **zanînnasiyê** jî, bi xêvê re heya. Deme ku mirov li ardekê li ber çemekê di meyîzêne û dibîne ku wa ard ji çem av kişandîya nav xwe û pê bûya avî, bi wê gotina aviyê re têgihîştinê di vir de bi me re bi bîrê re bi me re diafirê. Bîre avî jî her weha mirov karê bîne ser ziman. Bîre avî, di vir de, bahse wê dikin û wê dihênine li ser ziman, ji du aliyan ve dihê holê ku mirov wê bêne ser ziman. Aliyê ku heyîne xêvê şênbertiyekê bi xwe re çêdike heya. Lê aliyê dîn jî, dise bi şênberiyê re ku dihê ser ziman e, bi wê bîre ku bi şênberî bûya re dihê ser ziman. Bîr, ku bû û zanîna xwe di xwe de afirand, hingî, xêve xwe ye razber ku jê navendîtiye xwe digirê diafirêne. Bi wê re heyîne wê bîre bi safîkirina bi xwe re şênberiya ku standîya, wê şênberiyê bi awa û heyîne wê re salixkirina wê dike. Salixkirin, heyîne wate xwe di safîkirin û tîya wê de dihêne holê.

Di zanînê re pêvajoyên ku hene, yek ji wan safîkirin e. Safîkirin, di pêvajoya bûnê de astaka bûnê ya. Lê safîkirin, deme ku em li ser wê gotinê dihizirin, em divêt ku bênine ser ziman, ku têgihîştinaka ku di xwe de xwedî navendîtiyê ya ji, mirov bi wê re kifş dike. Bîr, di hizire ku bi safîbûnê re bû de bicih dibe. Bîre wê, bi heyîne wê ye ku diafirê û bi xwe re di derbarê xwe de nasînekê diafirêne re dibe. Bi safîkirinê re, razberiyaka şênber heya. Bîr bi zanîna mirov e xêve mirov re şênber dike. Di vir de, di xêve de bîreke avî heya. Ew avîtiya wê, hate ku xêv heya, wê ji ku bizabûna avê li lê wê re wê hebe. Zabûna xêvê, bi vê yekê re bi bûnbîre re heya. Bûnbîre ku bi bîrbûn bû, heyîne zanîna ye ku derxistîya hiş, bi wê re xwediyê awayekî ya. Bîr, bi bûnbîre re ji aliyekî xwe yê din ve xwediyê heyîneka xwe ya. Jîre bîre, bi aqilê xêvê re heyîne wê ye ku diafirê û an ji ku afirîya, bi hişkirina ku dibe re bi mirov re xwediyê awayê xwe yê di jîyane mirov de ya. Aqilê xêvê, aqilê bi navî aqilî afiriya ya.

Jîre bîrê, bi bûna bîre jê dibe. Bi wê re bîre jîre, heyîne wê dihê holê. Bîr, bi bûna wê re, ku ew awayê wê yê ku mirov weke pêşnûmayekê bêne ser ziman ku afirî, êdî ku safîbûn pêre bû û hişbûn ketiyêde bi mirov re, wê bi wê safîbûna bi wê re ye ku bû re wê xêve bîrê e razber biafirê. Ev awayê xêvê, bi safîbûnê re dibe. Bi safîbûnê re bi bûna wê re, aqilê bîre heyîne derdikeve holê. Di vir de gotina êqil, lêkeriya ku li xwe dike ji, bizanîna ku bi heyîne bîre afirî ya. Bi wê gotina êqil re, bîre heyîne xwe bixwe ji dihêne ser ziman. Weke aqilekî jî dihêne ser ziman. Xêv, bi jîndîtiya mirov û zîndîtiya (aliyî zîndî heyîne jîndîtiyê ji bi xwe re bi wate dike) xwe re di temenê wê heyînê de ya. Ev bîre ku jîre xwe afirand, wê piştî wê afirandinê re, wê bi heyîne xwe ye bîrî ku di xwe de heyînek afirandiya, wê bi wê û wê afirîbûna wê ye ku bûya re wê bîre xwe ji bi afirêne. Di vir de, divêt ku em bahse safîbûnê û bi wê safîbûnê re bûna pêşketina hişkiirnê ji bike. Hiş, wê ji bîrê ji heyîne jîreke heyînî were holê. Bîre û jîre wê, piştî bûnê re hişiya wê bîrekê ji di xwe de dihêne ser ziman. Bi wê re, piştî ku jîre bîre bû û ew jîr ku wê tewirendinek ji di xwe de çê kir û di ancama wê tewirendinê de safîbûna bîrî heyîne wê hate holê. Wê ji wê jîre ku bi safîbûna bîre re dihê holê, weke zarokaka ku ji nû ve ji dayika xwe bibe wê bîrekê jê biafirê. Bi wê re, wê êdî ji bîre bîrê wê jîre jîrê wê biafirê.

Divêt ku mirov vê bêne ser ziman, ku ji xêvê bîr ku afirî, wê bîr jîre wê biafirê. Bi wê afirandinê re, wê ew jîre ku afirî û wê ne bê bîr û hiş bê di xwe de. Bi demê re bi pêvajoyên ku di buhurin re jî, ew pêvajoyên

afirandinê, wê ji wê bîr û jîre wê, ku wê weke bîr û jîreke çêkerî lê kirin dihê kiirn, bi wê êdî wê afirandina bîrê bi hişkirinê bike. Jîr, ku ew afirî, wê bi heyîne hiş e bi zanîna bîrê re ku temenê wê xêv e, wê jê di ast û dîmene duyemin de wê bîrek jê were holê û biafirê. Çêkertî, di wê rewşê de lêkeriya wê wate xwe bisalix dike. Xêv, dîmenîtiya wê ye bi pê re heya. Ew dîmenitiya xêvê, bi bîrên ku afirîne ku ew bîr weke heyîneka sentezkirî jî ji bîre bi heyîne xwe re dihênine ser ziman, salixkirinekê bi xwe re dihêne ser ziman. Minaq du dîmenitî, ku bû, heyîne zanîna ku heya ye ku di xêvê de bicih bûya, bi pêvajo û sentezkirinên ku dihêne buhurandin re diafirê. Xêv, di dîmene duyem de xwediyê zanînaka di xwe de ku heyîne wê salixkiriya ya. Bîr, li ser saffûna di xêvê de ku bû bi wê êdî ew jî wê salixkiirnekê bi heyîne xwe ye ku dihê hişkirin re wê bêne holê.

Dîmenitî û sentezbûn, du rewşên ku mirov divêt ku wan pir baş û qanc fahm bike na. Bi sentezbûnê re dîmenitî heyîne wê diafirê û dihê holê. Bîr, hertimî bi bîrkirinekê dixwezê. Di rewşê fahmkirina dîmenitiyê de ji, ev yek weke zagonaka bingihîn heya. Di vir de, bi vê û vê rewşê re, em divêt ku vê bêjin, weke ku bi heyîna rakenditiyê re teherek ji destpêkê bi mirov re bi qincokî heya, wilo jî, heyîn û hebûne teherekê bi sentezbûn û bi wê re bi dîmenbûnê re ji bi berahî heya. Aliyê teherî ê qincokî bi heyîne mirov re bi rakenditiye mirov re ku bi zanîna mirov re ji xwediyê dîmenekî xwe ya, bi aliyê teherî ê berahî re ahangbûna ku di nav xwe de diafirênin ji, temenê wê heyîn û hebûna bûnê diafirêne. Xêv, weke xalaka di navengiha çaprezitiyekê de ya, heyîn û hebûne wê heya. Lê biqasî ku aliyê teherî ê qincokî têde berahbûn heya, wilo ji, mirov karê ji bo aliyê berahiyê bêne ser ziman.

Li ser jîre û aqilê wê yê têde ji, divêt ku mirov hinekî bisekinê. Hebûna aqil, hebûna jîre bi heyîne xwe diafirêne. Mirov vê yekê ji, pêşnûmakiirna êqil karê bêne ser ziman. Lê deme ku mirov bahse pêşnûmakirinê kir, mirov karê wê çawa bi aqil bike û bêne ser ziman? Ev jî, di vir de di vê xalê de pirseke ku mirov wê bi pirsê ya. Aqil, heyîne wê bi hebûne wê ye afrîner re, di afirandinê de bi tevgeran re dibêt. Di mejiyê me de, her sînîr û tûrayên wê yên ku hene û an ji dibin ji, di wê afirandinê de xwedî weyn in. Bi sînîran re divêt ku em heyîne genên xwe jî ji bîr nekin. Di çerçova pêşnûmakirinê de, tevgere bi sînîran re di bûn û afirandin pêşnûmê de û mayîndakiirna wê pêşnûmê de heyîne genan, pir girîng e. Di wê xalê de bi hev re di ahangekê de weke ku di kar de na. Lê ji wê zêdetir, pêşnûmabûn, heyîne wê, ji heyîne jîndîtîyê ne dûr e.

Aqil û an jî jîr, mirov karê wê di salixkiirnê de bi du awayan bi salixbike. Aqil, deme ku jîndek bi çavên xwe dimeyîzênê û dibîne, ye li berçav, bi awayekî ku bi heyîne derî wê jîndê bê û an ji bi heyîne wê ku li berçav heya wê di mejî de bi pêşnûma dike. Nehengek, di nav avê de, ku mazin dibe, di jîyana xwe de, di mejiyê wê yê ku dibê de, pergalaka parastinê pêre diafirê. Kêvjalak, di rewşe xwe ye di bin avê de ku pê dijî de, di xwe de xwediyê pêşnûmayaka xavkkirinê ya. Li bejê ji, marak deme ku yekî dibîne karê xwe ji berçav bide veşartin. Mar, bi wan çavên xwe yên balkêş, deme ku li çavekî meyîzend, mirov hê nizanê ku çî pêre di wê heyemê de diafirê. Lê di rewşe xwe ye weke ye "kobra" de, karê bi kêlîkan karê wilo di cihê xwe de bisekinê li ber mirov û li nav çavên mirov meyîzenê. Mar, wan qaytanên ku di jokên xişiqandinê de dike bi heyîne xwe re mirov nikarê wan ji pêşnûmayaka ku bi heyîne wê ye jîndî re heya dûr bêne ser ziman. Bêtevger, sekinîna mirov ye li ber wê û sekne wê ye li ber mirov, hevdû dihoyêne. ..

Bi vî awayî, mirov karê ji jîndayên li jîyanê yên ku dijîn pir mînaqan bide. Her jînda, li xweza di şert û mercên xwe yên ku têde ya, xwediyê rewşeke xwe jîndanin û parastiniyê ya. Jîjo, stiriyên wê bûna wan, di vê xalê de mirov karê bi minaqî bêne ser ziman. Di vir de, ku em weke ku me li jor hanî ser ziman, ku em jîrê bi heyîne tevgerên mejî ên ku bûna bi pêşnûma bi wan tevgeran re bi rewşê re bi nerîne re ku dibin bêne ser ziman, divêt ku em bêjin ku ev rewşên weha yên ku me hanîna ser ziman, di çerçova heyîna jîndatiyê de xwediyê hebûneka jîrî na jî. Bi vê yekê re, em bi têgihîştina xwe re zagonaka jîrîyê ye ku hebûne wê bi heyînin dihêne ser ziman kifş dikin. Ew jî, heyîne jîndîtiyê ya li jîyanê ya. Bi wê re hoyandinak bi pê re weke ku di vir de heya. Jîr û an ji aqil û jîyandin, hoyandinaka wan ye li hevdû û bi hevdû re heya.

Bi vê yekê re, em du jîrîyê jî, ji du aliyên wê ve kifş dikin. Jîrî e di xwe de bi bijîr û bîr û jîre bêjîr e. Vê bêjîrtiyê, mirov karê bi minaqaka aqilê bêaqil jî bêne ser ziman. Aqil, di xwe de, di mejî de bi rewşe ku diafirê re, bi tevgerên ku diafirin re, bêaliyak jî pê re heya. Ew bêalîfî, heyîne êqil e şênber e ku bi tevgerên di mejî re bi mirov re diafirin re dihê holê. Lê bialîfî jî, bi jîrbûna wê ye bi jîndatiyê û jîyanê wê re ya. Jîyan, di vê xalê de, weke ku bialîfîyekê dihê holê bi heyîne xwe re. Di jîyanê de, weke wê bialîfî û bêalîfîyê, mirov di jîyanê de di xwezayê de jîndayan ji bi du alî dibîne. Aliyê wan, yê weke yê bi mirov re bialî ku bi jîr bûya û aliyê dîn ê ku hê jîr nestandiya di mejiyê xwe de. Aqil, çawa ku di xwe de bi bîr dibe, wilo jî bîr ji bi hiş dibe. Weke astaka wê

bihişbûnê jî, jîrtî heyîne wê dihê holê û diafirê. Her aqil, çawa ku jîrtiya wê heya, mirov karê wilo jî, heyîne jîre bêne ser ziman ku di astabûna wê û piştire de aqilê wê jî dibêt. Têgihîştina ku di derbarê wê de bi mirov re bû jî, wê mirov, bigihêne astaka sêyemîn e fahmkirinê di jîyanê de. ..

.. Jîr, aliyê wê ye ku mirov di vir de bi teybet di serî de bêne ser ziman, tevger e. Wekî din ji, zû kirin û hizirkiirn e. Mirov deme ku di jiyana xwe ye rojene de dijî, çiqasî karê û bike û bi tevger bê? Lezbûna di tevgeran de, heyîneke wê ye ku mirov wê bi heyînî bêne ser ziman heya. Nerîn û dîtîn, derk û leze wê ye derkitiyê, karîna zû hijmartin û tevgerê wê, xêv û zanîna de di her deme xwestinê de bi kar hanîna wê, darazkirin û bi rê ve birin, bi zimên re bigotin û bêjekirin û di gotin û bêjekirinê de lêkerkirinên ku bitêgihîştin in lê hatina kirin, têkilî û karîna şîrovekirinê û hwd, ku mirov karê hê ji gelek aliyên weha ve bêne ser ziman, heyîne jîre ji aliyê serwerbûnê ve dihêne ser ziman. Serwerî jî, xwe di lezitiyê di tevger û safikirina pêşnûma û safikirina wê de dîyar dike. Di vir de, deme ku em bahse jîrê bikin, bi hizir û hinderiya wê û naqşitiya têde, bi ye ku bi kirde û lêkeriya wê re bitêgihîştina ku afîriya jev vaqatandina wan ye jev ve re, mirov di jîre dike ku bigihêne dîmenitiya wê ya ku diafirê. Jîr, bi heyîne pêşnûmatiyê re konsantrasyona ku di wê çerçovê de diafirê bi wê re, bi wê re ku mirov pêvajoyên pêşketine hizir ji ji berçav û nerîne xwe dîr neke, karê pêre bahse bûn û safibûna hizir bi pêşnûmatiyê re bike û bi wê re wê heyîne hizrî bêne ser ziman. Mejî, di vir de, heyîne wê, têde tevgerên û riyên ku diafirin, têkiliya wan ye bi hev re, weke di qadaka fezeyî de di çûn û hatinê de, awayekî tevkirinê dihêne holê û ew awa heyîne wê jîrtiyê dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê, jîre xweza e ku jînda pê karê ji hîm bi xwe re bi pê bijî û ye ku piştire bi têgihîştin diafirê mirov bêne ser ziman.

Di serî de, jîre xweza, her mejiyê jînda ê ku heya, têde, mirov nikarê bêje ku nîn e. Lê jîre bi jîr e ku bi asta bilind re ku weke ku bi mirov re dihê ser ziman, bi têgihîştin, ew di safibûna wan rê û tevgerên ku bi mejî re bûna û pêşnûmak bi heyîne xwe re afirandina, ew ji weke xala duyemin dihêne ser ziman. Lê piştî wê bûnê re, têgihîştina bi safibûna wê pêşnûmayê re ku bû, ew jî, êdî bi wê safibûnê re ku weke ku kirde xwe da afirandin, ew dîmenetiye duyemin e jîre e bûna wê dihê holê. Rewş û nerîn, dîtîn û bi pêşnûmakirin û hwd, bûna jîre dihêne holê. Di vir de, ew pêşnûma, temenê xiyalkirinê jî ya. Xiyalkirin, êdî weke dîmeneke dîn e afirandinê e mejî dihê holê. Sawêr(Xiyal)kirin, di wê û hîmê wê de, ji ya ku em dizanîn pêşnûmayaka pirrengî heya. Lê ew pirrengîti, hemû bi hev

re bi du awayan heya. Yek, bi konsantrasyonî ya. Ya din jî, bi hev re û bi hev re bûna ahangî ya. Di wê rewşê de ew têkiliya di nav wan de jî dihê rastkirin. Têkilî, wê bi tevgerên ku bûn re, wê were holê û wê bandûra wê pir mazin hebe. Wê ew têkilî, ku ji wê pêşnûmaye hîmê ku weke dîmenekê xwe dîyarî der dike, hîm û temenê bûna wê xiyalkirinê diafirêne.

Jîr, bi wan tevgerên ku pêşnûma diafirên re, modele wê ye ku diafirê, ew model, pergala jîrî e ku temenê bûna têgihîştina mirov diafirêne jî dihêne ser ziman. Di wê rewşê de gelek rewşên ku mirov wan kifş bike hene. Ziman û bêjeyên wê, gotin û lêkerkiirên lê ku dibin, têkilîya nav bêje û ye bi hev re û hwd, hemû jî di wê modelê de heyîne wan divêt ku mirov jê fahm bike. Jîr, di wê deme modeltiya xwe de, beşên jîrî, ên safîkirin û naqandinê, xêv û bi bêjekirinê û derk û vaca wê ye ku wê biafirê ji estetîkî û sentetîke xwe ye ku bi pêşnûma wê re bi wate ye ra dihêne holê. Ger, gotinaka ku me hanî ser ziman, ew di xwe de ne xwediya têgihîştinekê bin ku ew ji ber çî hate ser ziman û çî di xwe de hanî ser ziman, wê ne wê holê. Rewşên naqandin, vac, bêjekirinê bi derke ku bûya bi rewşe ku hatîya derkkirin re dihê holê, heyîne wê pêşnûmatiyê bi jîrîya wê re pêdîviya wê pê heya.

Di mejiyê mirov de her sînîrên ku hene çûn û hatina wan û vejene di wan de, ji du aliyan ve wê pêşnûma jîrî, bandûra wê lê heya. Sînîr zîzîtiya ku diafirênin, ew zîzîtî, dike ku pêşnûma wê rewş bike. Sînîr, têkilîya wan, ku mirov ji awayê wan awayê heyîna zayendî jî fahm dike di mejî de, jin bi rengê hizirandinê ji aliyê çapê ê bi hizirkiirna xwe ya vacî bi derpêşa pêşhîskirinê bi pêşxistina 'aqilê hêstiyar' re, pêşketina wê(jinê) bi hêstiyartiyê re li pêştir tê dîtin. Jin, ji mêr zêdetir pêşketina bi wê re ya 'aqilê hêstiyar', di vir de, dike ku ew bi aqilê xwe bi fahmtir û zûtir pêşbikeve. Di temenê dayiktîya wê de û mêl nîşandina wê û pêşketina sehkirina wê pirr zêdetir jî ku di temenê wê de ew hêstiyartî heya, dike ku jin di hizirkiirina xwe de li pêştir bê. Sehkirin, di rewşeka ku mirov hîs dike bimêne ya. Weke rewşa duyemin a hizirkiirînê jî, li ser wê re pêş dikeve. Hêstiyarî, hertimî zîzbûnekê di mejî de dide çê kirin. Sehkiir, hinekî jî hîskirinaka hêstiyarî ya. Mejî, di wê rewşa hêstiyarî de, sehkirinê dikarê baştir bike. Xêva mirov, zûtir dide bîrkirin. Hêstiyarî, heta ku hebe, mirov dikarê hêzekê jî bi xêva xwe re û bi bîrkirin û jîrkirinê wê bîrê re bidest bixe. Zayende, ku bi mejiyê xwe re herî zêde hestiyara jin a. Di rewşa jineka ku bûyî dayik de, ev rewş zêdetir xwe dide li berçav. Mejiyê jinê jî, bi têkiliyên wê ên sînîran re û her wusa

awayê təkiliya tûra təkilîyan re rastkirinên teybet dide kirin. Sê rewşên ku em divê ku li vir di temenê wê zîzbûnê û hêstiyarîyê re û bi təkilîya bi sînîran re bênina ser ziman, **Zaroktî, təkilî zayendî a di nava jin û mêr de û bûyîna dayik a jinê jî bi temen dike bi hebûna xwe re. Rengê tevgerî, lezbûna pêşketinê a zaroktiyê û herdû rewşên din ji hevdû cûda na. Xwemal(orjînal)îtî, zêdetir di wê de heya. Rewşa zarok û rewşa jinê a ku bi bûyîna zaroka wê ya pêşî re ku bûya dayik, pîr girîng in. Ji ber ku ev herdû rewş, hinek xwemalîyên wan ên teybet, ku divê ku mirov fahm bike hena. Piştî wê re di temenê xwe ji nû ve afirandina bi keseyetîyê û hin pêşketinên bi mejî re bê, em dikarin bahse dayiktiyê û rewşa wê ya aferîndêrî bênina ser ziman. Sînorê sehkirina zarok û dayikê, zêde ji hevdû ne dûr a. Jî pêşnûma ku heya, kirde wê û wan rewşên ku pêre hene re ne, xwediyê wê modele xwe ye bi wê re ku ne bê hîyerarşîyakê yê ne. Xêv, heyîne wê ye ku di xwe de digirê, wê pêşnûmê, bi zanîna xwe re bi hîm dike. Ji wê, pêşnûmê bi bîrkirin û hatîna bîrkirinê diafirê. Xêv, xwediyê wê heyîne ya di temenê wê pêşnûmê de, ku çendî safîbûnê dike, ewçendî jî bi bîrkirine jîndî dide kirin. Bi bîrkirine jîndî, temenê wê jiberkirinê jî ya. Bi wê re bîrkirin zîndî dibe. Têkilî bi heyîne jîberkirinê re di naqabîna gotina jîndîyê û zîndîtiyê de, bi pergaliyaka xwe ye ku wê rewşê diafirîne ya. Jîberkirin, têgihîştina, bi rewşê re ku xêv bi pêşnûma wê re di xwe de biçih dike ya. Jîberkirin, rewşên weke yên leztiyê, vactiyê bi heyîne pêşnûmê re, bi awa û bêjebûnên wê re ku di xêvê de qalib digirê pêre heya. Xêv, bi kodkirina pêşnûmê re, miftên pêşnûmê yên ku afirandina, wan, di xwe de bi bîrkiirne dihêne bîrkiirne. Lê di wê rewşe jiberkiirne de, bi təkiliya bêja û lêkeriya wê re pergalka ku mirov di wê rewşe pêşnûmê de ku weke dîmenê duyem bêne ser ziman dihêne holê. Pêşnûme jîrî, tevgerên wê yên jî rewşê hene. Ew tevger, wê awayê vaca wê jî raxina berçav.**

Di heyîne jîrî de gotina rastiye, li ser wê sekinandin ji teybemendiyekê ji mirov dixwezê. Di vir de, rastî, wê çawa û bi çi awayê wê were holê? Ev jî, weke pîrseke girîng e ku mirov wê bi bersiv bike ya. Di jîrîyê de, mirov karê ku bêje ku di afirandine jîre de armanc û safîkirina wê girîngiyeke wê heya. Ew girîngiye wê, wê xwe di heyîne gotina rastiya ku di jîrîyê de dihê holê jî bi dîyarî bêne holê. Ev yek, her weha girîng e. Armanc, di çerçova awa, rêrastitiyê û sehê de bi pêvajoyên bûnê re jîre dike. Di vê heyîne bûnê de, weke aqilê gelemper gotinaka jîrî e ku bi wê gelemperiyê were ser ziman jî diafirê. Rewş ku tene jîyandin, jî destpêkê hate dawîya jîyanê, di wê deme jîyanê de ne tenê jîyanê dihêne berçav, jê

zêdetir ku mirov wê deme jîyanê e ji destpêkê hate dawiyê weke aqil û an jî jîre gelemper bihasibênin, ew jî di aqil û an jî jîre teybet. Di dawiyê jîyane mirovekî de, çendî ku pişt wî re bê gotin ku ew ne rast jîya ya û an ji rast jîya ya, wê ew tenê li gor daraza derveyî bê. Lê di derçove wê jîyandina wî û an jî wê de, ew rewşên ku bi jîyane wê re yek bi yek li duv hevdû bûna, wê ahangêkê bênine berçav. Pêşnûma wê temenê jîyanê, di dawiyê de, her weha mirov karê bêje ku xwediyê konsantratiyeka bi xwe re

ya. Zanîna, ku di wê jîyanê ku jîya ya de, ku piştî wê jîyandinê ku mirov karîba, di berçav de bi buhura, mirov wê, çawa ew pêşnûma jîyanê wê, mirov wê dîtiba. Di wê jîyanê de, daraz û nerîne mirov, bi awayê jîyana mirov dihê holê. Lê daraz jî û nerîn jî, rewşna hizrî û nerînî na. Daraz, ku ji aliyê wê sentetîkî ve lê were nerîn, weke ku bi rengê nerînyekê re heya, bi wê re rengên têgihîştinî ên rewîstî, sincî û hwd ku tabûlî wan dike, bi wê re xwe weke kirasekî bi nerînê re li jîyanê kirî dihêne laş li jîyanê. Ew temen, weke ku mirov di jîyana xwe de ku bi têgihîştin dike ku weke bi daraz dijî, di aslê xwe de, ku mirov wê pêşnûma wê jîyanê weke nîgarêkê hildê berçav û lê meyîzêne, mirov wê di asta gelemperî de bêalîtiyekê di çerçove wê heyînê de bibîne. Darazên ku di wê jîyanê de hatina jînkirin, hemû jî teybet in. Bi vê yekê, têgihîştin û zanîna ku mirov di asta teybetiyê de bigihîyê de bi darazî, mirov wê di asta gelemperî de negihîyê de. Di vir de, jî biçûktiyê bi bermazintiyê de çûyin ji, wê di xateke demê de wê gelemperiyê û teybetitiyê dihê holê. Dem, di vir de, heyîne wê di bûna jîre de derdikeve ber me. Divêt ku mirov wê jî baş fahm bike. Di demê de jînkirin û salixkirina wê demê, di fahmkirin û gihîne pêşnûma jîre de girîngiyeke wê heya.

Di mejî de, rewşên ku di xêvê de hene, bi demê re ne. Dem, wan digirê bi xwe re weke nîgaraka ku bi hêt ve hatiya dalaqandin. Li ser ya ku jîya ya mirov karê bisekinê. Lê mirov nikarê li ser ya ku ne jîya ya bisekinê. Di gotina demê de tîkiliyê de demê û xêvê, di sehkirinaka mirov e ku mirov bi xwe re dike de dihê berçav. Mirov, ku jîn kir, mirov wê di sehkiirînê de, bi fêre wê jînkirinê bike. Lê hiskirin, ne wilo ya. Hiskirin, du ji du aliyan ve mirov karê wê fahm bike. Aliyak, rewşe ku bahs dihê kirin ku mirov dîtibe û an jî cihê ku jî jînbûn bûya ku dîtibe û an ji hinek rewşê ku beremberî wê werin ku di xêve me de hebin, wê pêşnûmakirina wê di pêşnûmakirinê de hê hesantir bê. Lê xêv, ew sentekiirînên ku berê wê deme jîyanê e mirov hatina jînkirin û pêre hene, wan jî, ew ji wan fêre digirê. Berî hertiştî di pêşnûmakirinê de, wê ew yek

hebe. Mirovekî ku tenê di mezelekê de jîyana ji destpêkê hate dawiya wê bi buhurêne jî, wê ne bê karînakirina pêşnûmakirinê bê. Tenê ew rohiya ku ew têde dijî wê besî wî bê. Dem, ku mirov di vir de bi gotinekê bêje ku hinekî bi tevgerên ku têde bûne re aqile jî, wê ne xelat bê. Pêşnûma avakirina malekê, jîrîyaka wê ya bi demê re ku pêşketiya û di deme de bi tîrîyêkê re pêre sentezbûn ku bûya heya. Bi zanîna û pêşketina wê ye jîrî ku mirov li vê rewşê meyîzêne, mirov karê wê weke demeke nû e pêşketinê e ku bi aqil biast e bêne ser ziman. Di aslê xwe de, ew jîrîya çêker dihêne ser ziman. Di naqabîna fahmkirin û nerîne li derve de, di bûna wê pêşnûmê de têkiliya aqilî ya ku diafirê, bi pergali divêt ku mirov wê bêne ser ziman û li ser bisekinê.

Bi zanîna xêvê re mirov hinekî divêt ku li ser wê gotina pêşnûmê ye ku em dihêne ser ziman bisekin in. Ev jî, pêdivî pê heya. Pêşnûma, deme ku bû, êdî ew jîrîyaka saf û safî ya. Lê di wê bûnê û piştre de êdî pêdendiyeka ku mirov bi demê re jî bêne ser ziman dihê holê. Çendî ku safîbûn bû, wê ewçendî jî pêdendîtî wê heyîne wê xwe bi awayekî bi deme re weke qormê darekê bi berahîtiya wê ye di demê de wê xwe bide holê. Dem, di xêv de, heyîne pêşnûmakirinê bi safîbûnê re dike. Lê dem, çendî ku di wê pêşnûmê de heya jî, piştre, di demên piştre de bi bûna sentezbûnê xêvî re wê ew qormîtiya demê weke ku jî holê dirabê. Heyîna wê di demê de bi du awayan heya. Yek, bi pêşnûma û ye din ji bi heyîni heya. Bi senteztiyê re heyîntî dimêne. Lê di asta dawiyê de, bi sentezbûnê re awayê ku diafirê jî, ew pêşnûma weke ku zanînaka nû ya. Rewşê çendî vaca wan hebe jî, di heyîne xêvê de vacaka teybet ye ku ew wê êdî pê bi sentez bibin, heya.

Ku cihê bê û necihê bê, çarna bi bîrkiirnên mirov dibin ku ti têkiliya wan bi wê rewşe ku mirov di wê demê de dijî re nîn e. Xiyalkirin, bi pêşnûmayekê heya. Li gor rewşe ku mirov di wê deme ku têde dijî de, ne li gor wê ya. Lê di heyîni û hebûne xwe de vaca wê ye ku mirov nikarê şerîni bike heya. Fahmkirina wê jî, bi kifşkirina wê cihana me ye xêvî re ya. Heyîne fezeyê, bi rêgehe xwe re bi berahî û qincokî firehbûnaka wê ye demî heya. Bi demê re ya. Mirov ku xêve me jî, wê cihana wê, bi nêzîkatîyaka wilo hewl bide û fahm bike, wê çiqas rast û xelat bê? Ku mirov heyîne jînda ku î ro mirov jî di nav de, jî demên destpêka jîyanê ku ji şaneyekê destpêkirin heya, ku mirov hilde berçav, mirov bi têgihiştina ku ji wê têdigihê, karê bi heman awayê cihana xêvê jî bêne ser ziman. Lê divêt ku mirov jî bir neke, ku her pêvajo û demên ku buhurîne bi mejîyê

me re, pêşketinek ji deme piştire ye jiyane wê re hiştiya. Wilo, ev yek ji bo xêve me ji di buhurê. ..

Jîra jîrê, xêv û bîrîya xêvê. ...

Beş du; bîr û darêjka wê: Bîr, hebûna wê di mirov de bi hebûna zanîna ku heya dihê ser ziman. Di kurdî de bîr, deme ku bahse wê bi hişkirinê re dihê kirin a. Hişkirina li vir ku bahse wê dihê kirin, du dîmenî ya. Dîmenê pêşî; bi bîrkinê re tişteki ku jibîrkirî hanîna bîrê ya. Dîmenê duyem jî, bîaqil hizirkirin û ya rastî çî ya, ew kifşkirina. Di vê dîmenê bîrê ê duyem de, gotinên rastîtiyê, têgihîştinkirinê û dîtîne weke kirasna ku bi têgihîştinê lê hatina kirin in. Lê li vir, 'dîtîne' û bi wê re 'kifşkirinê' ku ji xwe re weke kirdeyeka vaşartî dîke temen jî, di temenê eferîndêriyeka têgihîştinê de xwe dide dîyar kirin. Ev eferîndêriya têgihîştinê di temenê bi hişkirinê re dîtîne re ji gotina bîrê re dibe temen. Ji vî aliyê ve, dema ku em li ser wê temenê dihizir in, em dibînin ku gotina bîrê bi temenê xwe yê ku li ser hizir û têgihîştina wê ya, xwe bi awayekî têgihîştinê bi hişarkirinê re dide nîşandin. Li vir, gotina hişariyê, bi zanîna û têgihîştina wê zelal re temen a ji gotina bîrê re.

Em divê ku vê yekê bi teybetî bibîr bikin gotina bîrê, bi wateya xwe ya bi nerîne re weke ku di temenê têgihîştineka eferîndêrî de gotina dîtîne ji xwe re dîke hîm û bîngêh, bi serê xwe jî, bi wê re dibe zanîneka zelal ya bihişar. Di aslê xwe de, dema ku di nava civate kurd de jî, ku dihê gotin «bi bîr bike!» û ankû «ji bîr neke!» jî, li vir ku ew gotina hişarî ji wê re hatîya kirin hîm, bahs, xwestin û dîtîne dihê kirin. Dîtîne, weke rengê heyînî ê bîrê ku di derbarê wê de hişarî afirî, bi wê re bi salixkirinê re êdî zanînekê û têgihîştina wê bi darêjkîya wê re diafirîne. Bîr, bi vî rengî dîtîne, bi hişariyê re dîke darêjk û kirdeya wê jî salix dîke.

Li vir, dîtîne û hişara wê, bi hişkirina ku ji wê re êdî weke navarok a, li ser wê re wê bi têgihîştinkirinê re zanîne û bi zanîne re jî bîrkinê biafirîne. Bîrkin, weke ku dihê dîtîne, çend pêvajoyên wê ên gav bi gav bi serê xwe fahm bikin hena. Di temenê hîyarerşîya wê de, ji dîtîne û hişariya wê, têgihîştinkirin û zanîne heta ku dihê û digihê wê gav û pêvajoyên pêşketinê ên bîrê hena.

Di wê bahskirina wê de, bahseka ku têde zanîna bi têgihîştina xwe ye ku hatiya jînkirin dihê ser ziman. Bi vê yekê re mirov karê wê wilo bêne ser ziman. Ji vê yekê mirov ku gav biavêje û wê bêne ser ziman, mirov wê rastiya wê ku dihê ser ziman, mirov wê wê ji pir baş û qanc fahm bike. Aqil, deme ku bi mirov re bi pêşket, hingî, mirov bi wê pêşketina bi aqil re bi bîr bû. Hê ji demên ku em biçûkbûn di bîre me de me ya,

ku cerna dayikên me, ku karne xwe dikirin, û piştî wê karê ku dikirin re, karna din yên ku wê kiriban ji bo ku di aqilê wan de maban û an ji piştire bo ku hatiban hişê wan, tayek li telîye xwe ye li cem ye mazin ye stûr ku ji wê dirêjtira girêdidan. Di serê xwe de ji bi tê re didana kifşkirin ku kengî deme ku ew ta lê meyîzandin wê ew karê ku kiriban wê hatiba bîre wan. Wê rewşê ji di karê wan de pir mazin alî wan dikir. Cerna ji, bi tayekî ve 31 yek meherk pêve dikiriin, bi wê deme ku wê buhurandiban û deme ku wê gihiştibanê de pê dihasibandin. Bi wê hasabkirinê re, ku dem buhurandin, ku rojek du roj û sê roj û hwd di buhurandin, piştire ku di vegerehen û li wan meherkên xwe yên ku buhurandibûn di meyîzandin, û ku li roje duyemin û an ji ye sêyemin ye ku buhurandibûn bi meherkê ku lê dimeyîzandin, li meherke wê rojê dimeyîzandin û çî di wê rojê de kiribûn ji bi pirranî dihate berbîre wan. Her meherke ku ji bo rojekê di hate hasibandin û dihate buhurandin, bi pêve girêdayî ne tenê ew roj, di wê rojê de ji çî bihişyarî hatibûn kirin û jînkirin dihate bîre wan.

Bîrbûn, di aslê xwe de bi têgihiştina wê ye ku dihê ser ziman, bi şîyarbûnaka jîndî ku hatina bîra mirov dihêne ser ziman. Xêv di nav xalkê de, weke temenê wê dihê ser ziman. Xêv, binê bîre cihê ku zanîn di wê de(têde) tê girtin e. Her weha zanîna me di xêvê de ya. Bîra mirov, ji wê dibêt. Lê deme ku mirov bahse wê kir, divêt ku mirov hinekî pir zelal bahsê bike ku bîr ji bi têgihiştine xwe ye ku pê dihê ser ziman, di xwe de têgihiştinaka ku têdegirtiyê ye zanîne dihêne ser ziman. Mirov vê yekê ji her weha karê wê bêne ser ziman.

Ji Xêvê, cihê ku zanîna me têde bicih bûya ya. Bîr, ye ku ji wê xêvê dihê ser ziman e. Di vir de, têkiliyeke tevlihev ye xêv û bîre bi hev re heya. Divêt ku mirov hinekî li ser wê ji bisekin e. Xêv, çendî ku cihê ku zanîna me tê de ya û têde dihê girtin e, her weha wilo, bîr ji ye ku jê duhê ser ziman e, wilo ji, ew jîre ku ji wê hatiya ser ziman dihê ser ziman ji, bi wê re temenekê xwe bi bîre diafirêne. Bîr, di aslê xwe de, bi têgihiştina ku li xwe lêker dike re, kurbûnaka ku ji bine ve pir kur diçê ji dihêne ser ziman. Bîr, bi vê yekê re, ne tenê wê zanîna ku ji xêvê ye ku dihê ser ziman dihêne ser ziman, ji xaynî wê ji, zanîna me ye ku di xêvê de çendî têde dirêj ku kur diçê wê hebûna dirêjbûn û kurbûnê ji bi xwe re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, bîr, di wate xwe ye ku pê dihê ser ziman de, bi têgihiştinaka ku ji xêvê ku di xwe de digirê ji, pê dihê ser ziman. Bi vê yekê re, hebûna wê dihê ser ziman. Bi vî aliyê wê ve girêdayî, bîr ku dibe xwediyê têgihiştinaka ku di xwe de digirê ji dihêne ser ziman. Bi vê re bîr, têgihiştina gotina xêvê bi xwe re hinekî di kurtir dike. Ew ji çawa

dibe, divêt ku mirov bi mazin bi teybet li ser wê bisekinê.

Bi hizirkirinê re, pêşketine ku bû, bi xêvê re bigirtina wê re bû. Mirov divêt ku vê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman. Hebûna mirov, ye ku di pêşketina xwe re her weha bi bîr û bîreweriyê bi pêşdikeve ji, bi têgihîştinaka mazin ye bi demê re bi pêş dikeve ya. Hizirkirin, deme ku destpêkir, bi wê re, hebûna xêvkirinê êdî dest pê ji dike. Xêvkirin, temenê hizirkiirnê û pê re ji yê pêşketinê jîrtiyê diafirêne bi hizir û pêşketine wê re. Di demên berê de bi têgihîştin, baweriyak bi xêvê re bi kurdan re hebû. Digotin ku "deme ku mirov gotinak bi deng ji devê mirov derket, ew gotin êdî winda nabe, Wê di valahiya fezeyê re hebûna xwe hate ku jiyana heya wê bi parêzê." Bi wê re dihate gotin ku "deme ku mirov mir û çû axîretê, êdî wê ew gotinên mirov werine berme û wê bi lêv bibin û wê şahidiyê ji me re û ji kirinên me yên ku me kirine re bikin". Bi wê re, ev têgihîştin, pir mazin û dirêj dihate ser ziman. Ne tenê weke gotinakê di hate ser ziman. Bi gelek û rewşên ku di gotin ku wê ku bi axîrete me re bibin re pê dihanin ser ziman. Minaq, Dihate gotin ku "telîye me ye herî mazin ye ku di rex telîye me ye herî mazin ye navê de ya û ye di rex wê de ye li aliyê wê yê çapê wê bi êv bibe û bêne sêr ziman." Ev gotin weke baweriyê ku pir mazin lê dihate bawerkirin û ji demên berê mabû, bi xwe re nahaka di deme hizirkirina me ye li ser xêvê de têgihîştinaka ku em pê bînine ser ziman di afirêne.

Ew rewş, wê bi xwe re, di wê xêve wê mirovê rûniştî de, biqasî wê tevgere ku li berçavê wê ya, wê bikeve tevgereke bi xwe re de ji. Di wê rewşê de, du tişt awayê rewşê pir mazin didina guharandin. Yek, deme ku yekî ku ew cara pêşî bê ku li wir rûniştî bê û ew cara pêşî bê wan rewşên li berçavên ku bibîne ya. Ya din ji, her weha ye wê mirovê ku ew pir caran li wir rûniştiya û ew mirovên ku li berçavên wê re diçin ku bêgûman hemûkan bi qadê û rewşê re nas dike ya. Di çerçova xala pêşî

de, wê mejiyê mirovê ku ji nû ve dîtî wê rastî pir nerînên li ser hevdû were. Wê, di wê rewşê de bi xêve wê re wê pir tevgera mazin bibin. Wê tevgerbûnaka di asta herî bilind de wê bi pê re bibe. Lê ew ew mirov cara duyemin meyîzêne, wê ew tevger ne wilo bê. Lê wê di xwe de xêv pir mazin bi hizirkirina di xwe de bê. Hizirkirina xêvê, bi xwandina rewşê û salixkirina wê re dibê. Lê cara sêyemin, wê tevgerkirin cudatir bê û wê naskirin êdî awayê wê rengê xwe bide. Mirovê ku rûniştîya, mirovên ku di ber wê re dimeşin diçin, heya ku wê nas ji nakin. Lê mejiyê yê ku li wan dimeyîzend, wan nas dike bi hebûna wan ye li berçav e. Ew êdî wê wan ji bîr neke. Bi vê yekê re, wê mejiyê ku dimeyîzend, bi salixkirina xwe re hebûna xwe bi naskirinekê ku ew yên ku hatina naskirin ku dibêt ku ne di farqê de ji bin bi wan re di wê de bûya. Meji, wê di wê ya xwe de hebûna xwe bide berdeham kirin. Wê piştî wê re ji wê xêv, hebûna xwe bi bêqûtbûnê re bi hildan û qeydkirinê re wê bide berdeham kirin. Teherêk, hebûna wê, bi mirov re bi girtin û kirina mirov re heya. Ew teher, di mejî de, hebûna wê bi bîre xêvê re bi temen hebûna wê berdeham dibe. Xêv, ji destpêka bûna wê hate î ro, nifş bi nifş berdeham mirovan re hebûna wê bi berdeham e. Ji destpêka wê pêde, zanînên ku hene û hebûna mirov bandûra wan li ser heya bi awayê keseyetiyê re bi tevgerên wê re, hate ku ew nifş bi nifş berdeham hebe, wê ew hebûn ji hebûna xwe bide berdeham kirin. Temenê vê hebûne teherî, ji xêv û bîrîya wê di afirê. ..

.. Ku mirov li ser hebûn û bûnê di hizirê, mirov dibêne ku xwediyê bûn û hebûnaka xwe ye gerdûnî ya. Ew gerdûntiya wê, ji me re di çerçova mijara hebûna wê de hanîna wê ye li ser ziman ji, xalaka pir giring e. Heyîn, çi ya? Çawa bûya û ji kû û çi bûya. Çawa hebûna wê darêjk girtiya? Ev pirs û yên weke wan mijaraka ku li ser wan hatiya hizirkirin in. Bi vê yekê re, em nahaka li ser wan bi hizir in û hewl bidin wê fahm bikin û bînîne li ser ziman. Heyîn, di aslê xwe de, xwediyê destpêkekê bi xwe re ya. Bi wê destpêkatiyê re mirov karê bêje ku xwediyê berdehamiyakê ji bi xwe re ya. Ew berdehamtî ji, xwediyê heyîneke demî ye bi xwe re ya. Dem, bi tevger hebûna wê heya. Hebûna demê di aslê xwe de, hêmana demê ye bi heyîn û hebûn û bûnê re ya. **Heyîn, hebûn û bûn, di çerçova bidarêjkiya li jîyanê re xwediyê hebûna xwe ye ku mirov wê fahm bike ya. Heyîn, çendî ku mirov li ser dihizirê, ku mirov pêde diçê bi hizirkirinê re, mirov dibîne ku çawa ku xwediyê darêjkîya xwe ya. Darêjkî, di aslê xwe de, divêt ku mirov wê weke mijaraka sereke hilde dest û wê fahm bike. Darêjk, ji**

heyîne ku bi hebûn dibê, mirov wê bi bûna wê ye ku bû re bêne ser ziman, hingî mirov wê hebûna wê bêne ser ziman. Rast, darêjke wê çi ya? Rastî, li ser kirde xwe re dîtbar e. Lê rastî, bi darêjke ku bi bû û hate berçav re şênberiyakê distêne. Mirov, ku li heyîne ku hebû, ku lê meyêzend, mirov wê bi nerîne xwe re wê bibîne. Bi wê nerîne me re wê hizre ku ew heyîn heya ji wê heyîne ku mirov dibîne wê bi mirov re bibe. Bi wê yekê re, wê rastî li ser bûna heyînê ye bûyî re şênberiya xwe distêne.

Di çerçova heyînê de, mijara rastiyê û rastbûnê, bi têngiştine bi aqilê re me re ku bi me re jîrîya xwe afirandîya re, xwediyê pêvajoyaka pêşketinê ya. Her weha mirov karê wê bêne ser ziman. Rastî, di her demê de xwe bi me li gor rewş û şert û mercen dide pirsîn. Mirov her demê di bpirsê ku rastî çi ya. Rastî, di vir de, ji du aliyên wê ve hatina wê ya li ser heya. Aliyekî wê yê bi jînbûnê ya. Aliyê din ji, yê bi bûna bûyî re ya. Bûna ku bû, hebûnekê bi xwe re bi demê re diafirêne. Ew heyîn, dîtbar e. Lê bi jîyandinê re pir ji dîtbar e. Di vir de, rastî, kirya û çalektiya mirov ye ku bûyî ji xwe re dike heyîne bûyînê ya ku bûya. Di vir de, bi nerînê re dîtina bûnê, wê di wê heyemê de di serê mirov de ti nîqaşan di derbarê heyîn û bûna wê de nehêle ku bibe. Lê ku bûbe û me bi nerîna biçav ne dîtîbê ji, wê hingî ji, li ser temenê baweriyekê wê hebûna wê were holê bi mirov re. Lê di wê astê de nerîn, ji ber ku rastûrast bi ye me bixwe nîn e, êdî pirsîn wê bibe. Piştî wê bûna wê bûyînê heyînê re, ku yekê were û henekekê li me bike û bêje " ne, nebûya", wê hingî, mejiyê me hizirbike û bi wê hizirkirina xwe re bi pirsê ku ka ma bûya û an jî nebûya. Di vir de, mejî, êdî wê li hinek birhan û nîşanekên bûnê wê bigerihê. Hate ku birhanekê û an ji nîşanekekê ne bîne, wê şik ji ser wê heyîn û bûna wê ye bûya wê di serê me de na rabê.

Di vir de, mirov her weha divêt ku hinekî bi gotina rastiyê pêde here û bêne ser ziman. Mejiyê me, karê di xwe de, wê heyîne ku bahs hate kirin û ku di serê me de bi hiskiirna di der haqe de karê darêjke wê biafirêne û bi heyîn bike. Bi wê biheyînkirina darêjkê re mejî, di aslê xwe de darêjke xwe afirandîya. Ew hiskirin û hizrên ku bihîstina, jê re her weha bûna xaleke afirandîna wê ye ji bin ve. Lê di vir de, bi hebûna heyînê re têngiştinaka ku ew heyîn dervî me bûya bi me re çêdibe. Ew têngiştin, çendî ku ew darêjk mejiyê me di xwe de bi afirêne ji, wê wê weke ye derve bi têngiştinaka derveyî neke. Wê dise bi wê heyînê re li heyîne derve ye ku bûna di der haqe wê de pê re têde qanî û qinyatek afirîya, wê bi wê di lêgerînekê de bê di xwe de. Ew qanî û qinyatên ku bi

heyîne ku bûna bûya ku bi wê bûnbûna wê re bi me re bûya, wê qinyeta heyînî dervî me ku bûya wê bi me re bii têgihîstinekê di xwe de bi bîr û jîr bike. Lê çendî ku ew bîr û jîre wê qinyetê hebe ji, wê darêjke wê bixwe wê di serê mirov de nebe. Lê me meji ji di xwe de wê qinyet û qanîyê ji, bê darêjk nehêle. Ev yek ji weke rastiyeke wê hebûna xwe bêne holê ku mirov wê fahm bike.

Bi mejî re heyîn, hingî bi jîre bi wê qanî û qinyetê ye di mejiyê me de bi me re ku heya re wê darêjke xwe bîafirine. Lê hertimî ji, hate ku ew heyîna ku bûya, hate jîndî(mirov) wê bi çavê serê xwe ne bîne, wê ew şikbariya pê re ye di derbarê wê hebûnê de wê ji holê bi pê re wê nerabê. Ev yek ji, weke rastiyeke ya ku mirov wê fahm bike bi heyîn û hebûn û bûnê re. Bûyîtî, di aslê xwe de ku li gor ku dihê ser ziman, ye ku bûya û heya dihêne ser ziman. Lê di aslê xwe de ji wê zêdetir ji, bûyîna ji berê ku bûya dihêne ser ziman. Ew bûyîn, berê hatiya û bûya. Ji ber vê yekê, di derbarê bûna wê de bi me re hizre bûnê heya. Ew hizre bûnê, hizreke ku bûyî ya. Hizre ku bûya, di wê heyemê de bi me re dibe. Bi wê re, di wê hizre ku di wê heyemê de bi me re dibe re, têgihîştin û an ji lêkereke ji deme buhurtî ya ku bûyîtiyê têde dihêne ser ziman heya. Ew hizire ku di wê heyemê de hate bîre me û ku me hizirkir ku bûya, bi hate wê ye wê demê re hem ya wê demê ya û hem ji bi wê lêkertiya ku li xwe kiriya û bi me dide têgihîştin ku berê bûyin bûya û heyîna wê bûyinê heya re bi têgihîştin wê bûyîna ku di deme berê de bûya ji dihêne ser ziman.

Mejiyê me, di xwe de bi xêve me re xwediyê heyîneke ku têde heya ya. Ew xêve me, têde pir heyînên ku bûna hene. Ew heyîn, têgihîştin in. Ji wan têgihîştinan bîr û bîrewerî, jîr û jîrewerî bi heyîn û heyînweriyê wê re heya. Xêv, tevaka wan e. Ew tevak, di ahangekê de heya. Mirov wê heyîne tevakê, her weha bi têjbehêne hebûna me ye ku em di dinyê de dem bi dem dijîn bînine ser ziman. Her weha weke hebûna dinye me ji di fezeyê de ku dem bi dem dijî mirov karê bêne ser ziman. Heyîn, bi pêvajoyên bûna xwe re xwediyê hîyerarşiyeka ku bi xwe re ya. Hîyerarşîya heyîne, bi hebûn, bûn, darêjkbûn û jînbûna wê re dihê ser ziman.

Darêjk, bi bûn û heyîne re vacê wê ye bi hebûnê re diafirê. Awayê wê yê ku bû, hebûna awayê vaca wê dihêne holê. Darêjk, ku bû û heyîniye wê hat û afirî, hingî, mirov ku li hebûna wê meyîzend, mirov wê di çerçova wê hebûna wê ye ku bûya û awayê wê de bigihê vaca hebûna wê heyîne wê ya ku heya. Awa û heyîn, bi hev re di ahangekê de bi me re têgihîştinê didina çê kirin. Awa, ne tenê nirxatî

û wesiftiya heyînê ji hinek aliyan ve dihêne berçav, ji wê zêdetir hîme hebûna wê ji dihêne holê. Ji heyînê fahmkirina awayê, wê ji awayê, netenê bigihêne fahmkirina heyînê wê bigihêne têgihîştina bûna heyînê ji. Bi vê yekê re, di vir de, mirov karê bêje ku bi heyîn û awayê wê bi du awayan hebûnaka hîyerarşik dihê berçav. Yek, bi ji darêjkê bi berçûn û gihîna heyînê ya. Ya din ji bi ji Awa-darêjkê bi ber bûna heyînê ve çûnê dihêne berçav.

Darêjk, ji xwe xwediyê hebûnaka awayî ya. Bi darêjkê re mirov bitêgihîştinî awayekî têdigihê. Ew awa, heyênêkê têgihîştina wê dihêne holê. Ew heyîn, ne kirdeya. Lê kirdeyêkê têkerî ku şênberiya xwe bi awa û darêjkê wê re distêne ya.

Awayê ku bi darêjkê diafirê, êdî bi ku darêjkbûn bû, êdî ji wê darêjkê derketina têgihîştina darêjkê têgihîştina wê ya ku diafirê ji bi xwe re dihêne ser ziman. Darêjk û zanîna wê, bi têgihîştine re bi fahmkirina wê re şênberiyekê hertimî dixwezê. Ew şênberî, bi darêjkê re heya. Darêjkên, ku weke ku heyînên serxwezayî ku têgihîştina wan heya lê darêjke wan li berçav nîn e ji, aliyê wê yê ku mirov bê bersiv hiştiya ya. Ew aliyên bê bersivî wê bi dîtîna û an ji gihîştina darêjka heyînê re wê bersivê bistêne. Darêjk û zanîna wê, di çerçova ji darêjkê gihîştina heyînê, şênberiyekê di zanîna xwe ye bi me re diafirêne. Ji heyînê ji çûn û gihîştina darêjkê ji her weha şênberiyê di zanîna xwe de bi me re dide çê kirin. Lê berîbûna darêjkê, ye ku temenê bûna darêjkê bû, wê demê bi xwe re ji holê di rakê. Lê dem û an ji ew kêlîya pêşiya bûna darêjkê, zanînaka serzanîn di xwe de ku pê dihê ser ziman diafirêne.

Di heyînê de têgihîştin û zanîna wê ye destpêkê, di vir de, li ser wê hizirandin, pêdivî pê heya. Ji ber ku ev yek, her weha were fahm kirin. Destpêka bûna jîyanê û an ji destpêka bûna gerdûna me, ji xale ku destpêkiriya, hebûnê ji bûnê û piştê dihêne ser ziman. Lê ji bûne û pêş wê ji, weke xalakê ku çawa ku dihêne ser ziman ku ji wê xalaka reş destpêkirin bûya, wilo hê reş maya. Em bi têgihîştin û zanîna heyîn û bûna wê ye piştî destpêkirina bûnê re dihênine ser ziman. Lê zanînaka heyîn û bûna wê ye pêşî ji heya. Ew zanîn, wê aliyekî wê yê ku bi bûn û bûyîna heyînê re dihê holê dihê ser ziman. Bi vê yekê re, hê em bi zanîn û têgihîştina xwe re li aliyekî na. Lê aliyê wê zanîne me yê din ji heya. Ew aliyê din, aliyê ku zanîna me ji aliyekî dî ve ji temem dike ya. Lê em ne weke aliyê ku em lê ne, xwediyê zanîna wê aliyê din in.

Heyîn, bûna wê ye bibûyî, ji darêjkê bi ber awa û heyîna heyînê ve diçê. Darêjk, di aslê xwe de, heyîne wê ye fîzîkî ye ku heya, bi awayê

darêjkê re dihê holê. Bi wê re ji, heyîn dihê holê. Heyîn, bi bûna xwe re heyînê dihêne ser ziman. Lê heyîn, bi demê ve bi awayê xwe yê bû ve weke ku girîdayî ya. Dem, heyîna wê, ji heyînê mirov nikarê dûr bêne ser ziman. Dem, bi demîya xwe ye ku têde jîyan dijî xwediyê heyînîyekê ya. Ew heyînî, tîghiştinê bi heyîn û darêjka wê re diafirîne. Ku mirov bi demê re li ser heyînê û bûna wê dibe, mirov bi sê awayan wê bûn û hebûna wê ye ku dibûyî û dijî berdewamiya wê dibîne. Yek, bi awayê peresendinê mirov dibîne. Ye duyemin, mirov bi wê peresendinê re biastbûnê re ku bi awayekî geometrîkî bi berdewam bûnê dibîne. Ye sêyemin ji, bi hev re û bi hev re bûnê dibîne. Di vê yekê de, heyîna hîyerarşîya heyînê mirov dibîne. Di di berdewam wê de, mirov dembûn û bûna demê re dibîne. Dem, di aslê xwe de, bi jînda û heyîna wê re, bi du awayan dihê berçav. Her dem her jînda ku bû, bi wê wê xala duyemin re ku bi astbûnê dihê ser ziman re hebûna xwe ye demî bi xoslet dihêne holê. Ev yek, wê dike, yê demê. Weke ku ew di wê deme ku dijî ku ew dem bi wê re dawîbû, êdî ew ji holê rabê. Lê hebûna rakendiyê ye jîndayî, di vir de, wê yekê nahêle. Bi vê rakenditiyê re xala duyemin ji dihê ser ziman. Xala duyemin, li ser berdewambûnê ya. Heyîn, bi hebûnîya xwe re gerdûnî ya.

Jîndayîti, di hebûna xwe ye ku pê bi berdewam e, weke xalaka din li hevbûn û lihevkerinê dihêne ser ziman. Awayê levkerinê, darêjkitiyê dihêne holê. Mirov, bi darêjkitiyê re rastiye awayê wê levkerin û bihevrebûnê karê bi jîrîya darêjkitiyê bêne ser ziman. Darêjkîti, di vir de weke ku dihê ser ziman, ji awayê xwe yê heyînî awayê jîrîya xwe bi ahangê bi xwe re ye bi levkerin û bihevrebûna xwe re dihêne holê û bi me dide fahmkirin. Bi darêjka heyînê re jîreke ku mirov ji darêjkê bêne ser ziman heya. Ew jîr, bîrekê têde heya. Bi wê bîre re heyîneke aqilî ku mirov wê weke dendike kirde wê jîre bêne ser ziman heya. Ew bîre di jîre de bi awayê heyînê re bêalîyeka wê ye ku mirov bi darêjke re bêne ser ziman heya. Darêjk, bi awayê xwe yê levkirî û bihevkirî, tevlihevbûnaka bi pergali dihêne ser ziman bi hebûne xwe re. **Darêjk û awa, di jîyanê de bi zîndîbûnê bê û bi jîndîbûnê bê, jîyandina wê heya. Bi vê tîghiştinê, kevirek û mirovak wê bi hev re were fahmkirin bi jîyana xwe ye li jîyanê. Her heyînî, ku ye jîndî bê û ye ne jîndî bê, demên wê yên bi deme re hene. Bûn, tîrbûn, pîrbûn û mirin heya. Mirin, di jîyanê de awayekî wê yê darêjk guharandinê heya. Kûrmekî ku bi kûrmî dijî li ser pelkên darê yên şîn, ku piştê tîrî pê re bû, jê pelîtank bûn ji, vê rewşê dihêne ser ziman. Lê ka ma kûrmên pambû**

mirov karê çî jê re bêje? Ew ji bi wê yekê, mirov karê bêne ser ziman. Ev awayê guharandinê, di xwezê de firk in.

Ku weke ji aliyekî ve heyîna giyane wê dihêne ser ziman, rakendiya wê di wê de bi berdewambûna wê re berdewam dibe. Mirovekî ku ji nû ve bû, ku ew mirov bê kirin li mezelekê bi teneserê xwe ku hate ku mazin bibe û di wê deme derve û ti kesekî ji nebîne, wê dise ji wê hebûna xwe ye bi xwe re wê hinek hişkirin û bi bîrkirina wê bike. Bi wê heyîna xwe re karê cihanekê ji ji xwe re avakê bi xwe re û di xwe de. Ew heyîn, bi jînbûnê re ku heya bi xêvbûnê re diafirê. Mirov, bi xêve xwe re, weke ku mirovekî di xwe de ku dijî û wî hîs bike, wê hîs dike. Bi wê hîskirinê re ji di aslê xwe de dibe xwediyê jîriya jîndî ya bi xwe re.

Heyîn, hebûne wê ye darêjkî, ku mirov lê dihizirê, mirov her weha aliyna wê bii pêşketinê re dibîne. Her jînda jevcuda xwediyê demjînbûn û peresendbûneke bi xwe re ya. Lê ew awa û heyînê jîndî û zîndî hemû bi zagonaka gerdûnî di berdewambûna xwe ye jîyanî de ne. Ew zagon, zagona jînbûnê ya. Zagona jînbûnê, hebûna wê, bi demê re bi heyînê re di berdewamiyê de ya. Lê ew zagona jîyanî û heyîn, çendî ku bi hev re girêdayîna, mirov karê wê bi mînaqa ku mirov hêkak ji cihê xindirand û hate derekê bir û li wê cihê ku me ew bi xindirandinê biriyê de ku li wir ew şikest û ku em nikarin bi demê re wê hêke benine cihê wê yê berê yê destpêkê û wê rewşe ku ji destpêka xindirandinê ku hate şikestina hêke bûya weke ku nebûyî bikin û ji holê rakin re dihê ser ziman.

Di têgihiştina heyînê ya ku bûya de, hebûna wê ye ku jê awayê wê yê darêjkî dibiriqê, ji wê giyanîya wê ye hebûnê diafirê. Giyan, bi heyînê re heya. Bê heyîn, gîyan nîn e. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bêne ser ziman ku giyan, jîreke wê ye ku ji heyînê di navende wê de cih digrê heya. Weke ku me li jor, bahse zagona jîyanê û heyînê ye bi hev re kir, di vir de, bi heman awayî gîyan heyîn bi hev re heya. Gîyan, ji heyînê ku jê kirde wê dibiriqê û aliyê wê kirdeyî diafirênê, mirov karê karê bêje ku giyan bi wî aliyê re aliyekî din yê jînbûnê diafirê. Di çerçova wê de, mirov karê wê bi teybet bêne ser ziman. Çawa ku ji bo berdewambûna jîyandinê xwarin ji mirov re pêdivî pê heya û ji bo ku mirov wê xwarinê çêke, tiştên ku pê tê çêkirin pêdivî pê heya û çawa ku ew tiştên ku pê xwarin tê çêkirin tene çandin û bi çandinê re ku çawa ku baran dibarê û wê av dide û êdî ew pê mazin dibin, her weha xwediyê pêwistinîyeke bi jîyanê ye bi jîndîyê re ya.

Ku mirov bi vê têgihiştinê li gotina rastiyê ye ku me li jor hanî ser ziman lê meyîzenê, mirov wê dervî têgihiştina ku bilêkerî lê hatiya kirin

û kirde wê, wê awayekî wê yê giyanî ji bibîne. Ew awayê wê yê giyanî du aliyên ya. Aliyek, ji şênberiya têrkera ku bi bêja rastiye dihê ser ziman. Aliyê din ji, heyîna jîr û bîre ye heyîne me ya. Di vê heyîne me de ji xêv û bîre bi hiş bi weyn dihê ser ziman. Gîyan, bi vê yekê, weke ançamakê dihê holê. Sedemeke wê ye bi jîyane mirov re dihê ser ziman ji heya.

Rastiya heyîne, di vê yekê de, mirov ku wê dihêne ser ziman, pêşî bi demê re pêwistinîya wê mirov rastî wê dihê. Piştîre bi hebûna wê ye bûyî re bi darêjka wê re bi jîndîbûna wê re li gor zagona xwe ye jîyanî ku dijî, mirov rastî wê dihê. Bi wê re ji, bi demjînen wê re, peresendîne, astbûne û berdewambûne weke xalna wê yê xwe afirandinê ye bi demê re dibîne. Ji aliyê darêjkî ve ku dihê ser ziman, hertimî ji, deme berî xwe bi hebûna xwe ye ku piştîre bû re weke temenekî darêjkî dihêne ser ziman. Ji wê berdewambûna bi ber me de, wilqasî ji berdewambûnaka ku vajî wê ye bi ber me de ku bi şûn de ji, di wê de, bi wê yekê xwediyê heman avayî ya ku hebûna wê pê dihê ser ziman. Xala di pêdeçûnê de, wê di dawiyê wê de, wê neyînek hebê? Bersiva vê pirsê, ku mirov karîba bi destpêka ku li şûn ma ku maya ku bida, me yê pê pêşiya xwe ji bizanîyana.

Heyîn, bi vê yekê, ji du aliyan ve gerdûntiyaka wê ye ku tede veşerbûn heya, mirov karê bêne ser ziman. Yek, destpêka bûnê ye giştî ya. Ye din ji destpêka giştî ye di ya giştî de ya. Destpêka giştî ya di ya giştî de, ku bi bûn û hebûna heyîne dihê ser ziman, di destpêka xwe de bi nezanîna ku ku bi me re bi wê re afirîya, wê veşerbûnê dihêne holê. Ya din ji ye giştî ji, bi destpêka mazin ye gerdûnî ya. Di wê de, xalaka zagonî ye heyînî heya. Bûyin, di aslê xwe de, wê xala gerdûnê di xwe de û bi xwe re bi temen dike û digihne hîmekî. Nezanîn çî ya? Ev pirsî, di vir de, hê ku ne cihê wê ji bê, emê bi pirsin. Ji ber ku em pê re heyîne darêjkê bînine li ser ziman. Darêjka heyîne, di bûna xwe de, bi berdewambûn û bûn û hebûna xwe re, ji sê aliyan ve gerdûntiyaka wê di jîyanê de heya.

Êlî Herîrî, deme ku di serê xwe de kur û dîr diçû, dixwest ku çî bigihiyê de? Ev pirsê wî, bi gotina wî ya rasteqniyê re, mirov dihêne têgihîştinaka dervî fizîkê. Wî ji têgihîştinê di wir de xwest bi ber heyîne ve herê. Bi vê yekê re tehere wî, hizre wî tede ku veşerbûnak bi hebûne re heya lê bi têgihîştina wê re nîn e dihê ser ziman bi wî re. Ev têgihîştin, me di nav hizirkirinê de dibê û pir ji kur dibe. Em di nav de ku di serê Êlî Herîrî de bi hizire wî diçin, em di kevîne çûna sermedî de. Ew çûna

sermedî, me bi xwe re di xwe de dibe û kur û dûr diçê. Di vir de, rastî çi ya? Rastiya ku ye ku mirov digihiyê de bê. Em di wê rêwitiyê de, hate ku negihina dawiyê, emê ne gihina rastiya giştî. Rastiya giştî, di wê têgihîştin û zanîna wê de û çûnê de li pêşiya me ya. Wê çaxê, ew çûne me ye sermedî dawiyaka wê heya li gor wî. ..

Di wê gihiştina li wê dawiyê de *rastiyaka teqez* ku herdemî û timî heya, hebûna wê dihê ser ziman. Bi wê re teqezitiya rastiye ji, di wê çerçove wê de ji wê qad û deme berî bûna darêjkê ye pir mazin û weke ku bê sermed û dawîya, ji wê distêne. Heyîna wê, salixkirina wê, bi wê re ku weke ku dihê ser ziman ji ku darêjk jê afirîya û piştê pêşnûmatiya xwe bi xwe re di xwe de girtiya, bi wê hizirkirina heyînî ye wê re rastiya wê ye ku bi nav dihêkirin dihê holê. Ew rastî, çi ya? Ew rastî, ku em bi gotina Êlî Herîrî e rastteqîniyê re lê dihizir in, ji du aliyan ve wê dibîn in. Aliyek, di wê çûnê de giyanaka bi çûndinê re ku bi mirov re diafirê heya. Ew ji, ji heyîne me ye jîndî diafirê. Aliyê din ji, ku bi wê gotinê re dihê ser ziman ew rastiya ku bi têgihîştin û zanîna *teqezbûnê* re dihê ser ziman e.

Di çerçova bûn û hebûn û jiyandinê re teqezitî, bi hebûna xwe re bi heyînê re dihê ser ziman. Lê heyîn, du aliyên wê yên ku werine ser ziman hene. Aliyê pêşî, bi jîyandinê re bûna jîndîbûnê û berdeambûnê wê ya. Ew ji xala destpêkê ya bi heyînê re dihê ser ziman, bi xwe re hinek zagonne wê yên ku bi bûn û hebûn û berdeambûna heyînê dihên hene. Jiyan, bi heyînê re ji ber ku berdeambûnê bibe, pêdivî û pêwistinîyên xwe yên ku pê bijî bide berdeambûnê kirin hene. Ew ji, di jiyane de dihêne ber mirov. Mejîyê bîaqil, aliyek ji wan aliyan e. Aqil, kifşkariyên wê yên di jiyane de bi heyîne re hene. Di vê yekê de pergambûnaka berdeambûnê ku heya û pêdivî pê heya, mirov karê wê binavkê û bêne ser ziman. Wê ew hemû, di çerçova heyîna heyînê de di jiyane de bi wate bibin. Xala din ye teqezitîyê, weke xalaka ku ji heyîne pêşiya darêjkê dihê ser ziman e. Darêjk, bûna wê, weke nîşanak û birhana wê heyîne berî xwe ya ku jê çê

bûya.

Bi vê re, ku mirov li wê xala ku berîbûna darêjkê ku bûya û darêjk ku jê diafirê, ku mirov li ser wê di hizirê mirov bi têgihîştinekê ku *hebûna xalaka ku jê destpêkirin heya* mirov bi hizirkirine re wê kifş dike. Lê ew xala destpêkirinê, bi heyîna zanînê re bi sînor dimêne. Darêjka wê, çendî ku têgihîştina wê bi me re heya ji, ew bi awayê xwe yê ku mirov wê pê bêne ser ziman, ne dîyar e. Ew ne dîyarî, di xwe de dîyariyakê dihêne holê. Ew ji, her weha hebûna, ji wê destpêkirin e. Bi vê yekê re,

weke ku destpêkirin ji ne dîyariyekê dihê destpêkirin têgihîştinak diafirê. Lê di aslê xwe de ev têgihîştin, di xwe de û bi xwe re bi zanîna wê ye ku di vir de ye berî darêjkê ku dihê holê re me di wê xalê de bi heyîne ku bi jiyane re bûna xwe dihêne holê û bi têgihîştin dike.

Darêjk, heyîna wê ye ku diafirê, ji destpêka pêşî, piştî hebûna xwe dem bi dem dide destpê kirin. Lê ew destpêka pêşî ye heyîne, weke persekê dimêne li holê. Ma mirov karê, weke ku çawa ku feze bi demê re bi velîzandineke ku ji jev di firehbûnekê de ya, ji deme me ye ku em têde dijîn, di wê xate ku tere bûya dise tere bi şûn ve bi heman awayî bi berhevdûnekê ve ku çûyin bibe, wê mirov bigihêne çî xalê? Tenê xalaka reweşe ye ku emê bigihênine de û an ji ji wê zêdetir, ku li gor pêşnûmabûnekê ku her weha wilo ew bûn û pêşveçûn û pêşketin bûya, mirov wê bibîne? Di vir de, her weha ev pirs, di aslê xwe de, aliyên ku bi heyîne re î ro, li ber me ne, wê heyîne dem û pêşketin û darêjka wê zanîna wê dide me. Bi vê yekê re, hebûna heyîne armanc û sedeme wê ye ku mirov ne bi belesebebekê û ne ji bêbelesebebekê re mirov karê bêne ser ziman, di heyîne de û bi bi heyîne re sedem û armanca xwe wê bi xwe re bêne ser ziman û bi me bide zanîn.

Mirov, deme ku bi hizirbû, ew hizirbûna wî ji bo ku jiyana xwe pê bide berdewam kirin, karmendî û barê wê heya. Lê hizir, ji wê zêdetir, hebûne wê ye heyîne ye bi wê xwe bi xwe re dihê ser ziman ji, di vir de, bi têgihîştinaka ku tere zanîna heyîne jiyane heya bi me re ku dide têgihîştin, bi destpêka wê re sedemeke û sebebekê bi wê re ku dihê ser ziman, vebêjina wê ji me dixwezê. Mirov di jiyana xwe de xwediyê berpîrsîyar e. Bi wê re pêdivî û pêwistinîyên ku ew bi wê bicih bêne ji hene. Ew ji, hebûna wan, wê di jiyane de heyîna mirov, bi jiyane re bêne ser ziman. Di rastiyê de, têgihîştin û zanîna ku bi hizirî rastteqniyekê ji bûna xwe dihêne ser ziman û bi me dide têgihîştin, ji me di jiyane de li gor wesiftiyaka ku bi sedemê em pê bijîn ji me dixwezê. Bi wê re, hebûna jiyane, bi heyîne bûyî re bi xwezê re bi salixkirin dihê kirin. Lê di têgihîştinaka bi hiyerarşik de ku mirov li gor wê xala metafizîkê di hizirê, pêşzaniyaka wê ye ku em fahm bikin, têgihîştina wê bi me re diafirê. Pêşzanî, têgihîştinekê ji bo ku heyîne û hebûne xwezayê bi sedemeke xwe re pê were ser ziman dixwezê. Ji wê re, ji bo ku sebebekê bi afirêne.

.. Metafizîk, ku mirov li ser dihizirê, mirov ji aliyê hizirî ve bi gotinê ku em bêjin, em karin bêjin bihizirî têgihîştinaka bi rêzkarî ya. Bi têgihîştin û hizirkirina xwe re, pêşnûmakirina bi pergali û bi wê re bi hanîna li ser ziman ye bi hiyerarşikî re xwediyê vegotinkirinê ya. Vegotina hebûna

heyînan, şert û merc, sedem û zagona wan ye ku pê dijîn di jiyânê de, armanc û rastiya wan hanîna wê ye li ser ziman bi vegotinaka tekûz, avahîya wan ye ji temen û hîm û hwd, hanîna wan ye li ser ziman, di çerçova heyîna jiyânê de dikê ku bêne ser ziman. Bi vegotina wan re û pê re jiberçibûn li ser wê ji hizirkirin, weke xalaka wê ya ku derdikeve pêş e. Di vê çerçovê de, li ser xweza û mirov hizirkiirn, bi wê re heya. Di aslê xwe de, ku mirov di çerçova wê têgihiştina wê de dihizirê, mirov bi giyana xwe re têde xwediyê nemiritiyekê ya. Têrkertî, hebûna wê, bi jîrî, hebûna wê afirandîna wê têde bitêgihiştinî biderfet e. Li ser vê yekê re, pêwistinîya ku jînda di jiyânê de pê dijî, di wê de, têgihiştinaka ku bipêwistinî jînbûn qey karê bibe, têde hebûna wê têgihiştina wê dihêne ser ziman. Di vir de, hertimî pirsîna viyan azad di çerçova wê hîyerarşîya wê de hatiya pirsîn û li hebûna wê jî lê hatiya lêgerîn.

Di têgihiştina wê de viyan, bi serweriya jînbûna li gor pêwistinîyên mirov têde hatiya ser ziman. Di vê çerçovê de, têgihiştina guharandinê ji, têgihiştina ku têde dihê nîqaşkirin e. Her tişt diguharê, gelo? Bersive wê, di çerçova jîyana mirov de ji aliyê jiyandinê ve çendî ku herê bê ji, bi herêkirina têgihiştine teqezitîyê re, pêdandîyaka ku ji heyîne dihê, bi wê re di çerçova xalaka teqezî de wê herê dike. Bi vê re, êdî heya û an ji nîn e guharîn, pê re, dihê ser ziman. Êlî Herîrî, di çerçova hebûne xwûdê de çendî ku weke ku bi teybetbûnekê wê teqeziyê wî herê dike ji, bi gotina xwe ye ku "ti tiştêk weke xwe namêne" re têgihiştina guharînê dihêne ser ziman. Ew, hemû guharînê bi gîrêdanbûnê re dihêne ser ziman.

Li piştî têrkertiya li berçav, li têgihiştinaka heyînî lêgerîn, wê mirov bi hizirkirina mirov re bibe û bigihêne hizirkirina li ser gerdûnê û heyîna wê. Lê têgihiştina ku hertişt ji xalaka bû û çê bû ji, wê bikeve temenê hanîna wê pêşzanîna têrkerê ya ku dihê hizirkirin. Pê re, weke ku Êlî Herîrî, pirsîbû ku "ma em karin hertiştî fahm bikin(?)" re ji, têgihiştina bi hizirkirina wê re ku dihê ser ziman, wê mirov di nav têgihiştinaka heyînî ku li ser dihê hizirkirin lê darêjkirina wê nayê kirin re wê kur bibe û pê re ji, di çerçova jiyânê de bitêgihiştina fahmkirinekê ku wê bibe re bûna wê herêkirina wê ku dihê erêkirin ji, di çerçova heyîne heyîna herîmazin de ji, wê ne dîyariyekê bi hizir bêne ser ziman. Aqil, ji ber çî heya? Ev pirsîna wî, wê bi me re têgihiştinakê çêke ku ew hizirîya ku jîyan mirov karê di derbarê wê de bibe xwedî zanebûn û pêde herê bi zanîna xwe ye wê re. Gotina wî ya ku zanîna dînyê û jiyânê, wê tiştêkî bi me bi heyîne me bi xwe re û bi heyîne xwe re ji bide rewakirin, wê me bigihêne têgihiştina wî ye ku di hîme xwe de lêkeriyaka bitêgihiştinê ye ku veşartiya ji heya.

Ew lêkerîya têgihîştinê, di aslê xwe de, wê li ser wê bê hizirkirin û bi wê re, mazin têde kurbûn bê çûyin, bi wê gotina wî ya ku li ser navê wî dihê gotin ye heyîna pîroz, wê "heyîna pîroz ku ye pêşîya hemû tiştî ya", wê gihiştina wê, li dinyê li jîyanê bi hizirkirinê nebe, lê gihiştina zanîna wî û têgihîştina we wê bibe, temenê zanîna wî ye weke ku diafirêne ya. Mirov, çendî ku dinya xwe qinyet pê bêne û bi baweriya wê heyînê bijî, wê "gîyana wî ya nemir" li axîrete xwe bi serweriyekê di wê sermediye heyî de bijî. Bi vê yekê, ew ji têgihîştin û baweriya li deme xwe hinekî cûdatir, dibê xwediyê têgihîştinê ji. Ew, têgihîştina demê ye ku serwerî zanîstên demê ya û dihê gotin ku "mirov guh nede dinya xwe û di dinya xwe de karê axîrete xwe jîn bike" ji, ew bi guhdana têgihîştina axîretiya dinyetiya piştî mirinê re wê dinye ku têde dijî ji weke nirxeke wê pîroziya wê pîrozitiya heyîne mazin e.

Heyîn çi ya? Hizirkirine wê, bi deman re heyîne ku heya dihê ser ziman. Lê bûna wê, dervî heyîne li berçav ye bi jîr û hiş re ku di xwe de bi berdeambûna heyîne jîndî re ku xwediyê tehereke jîrîya, mirov ku li ser wê dihizirê, mirov heyîne wê ye ku mirov nikarê şerîn bike mirov dibîne. Ew heyîne wê, di xwe de bi povajo bi pêvajo bi jîndatiya mirov re di berdeyamî û pêşketina xwe de ya. Aliyê, mirov yê deronî, car bi car di wê de bi rêwaniyakê re xwe dibîne. Lê ew heyîn, hebûna wê bi hizir û zanîstê re bi jîre heya. Deroniyaka bi aqil û vac, di wê de hîm temenê xwe digirê. Jîndatî, çendî ku hebe ji, wê ew heyîn berdeyamîya wê hebe. Ew heyîn, heyîne jînda ye ku mirov wê hişîya wî wê fahm bike ya. Ew hiş, bi mirov re bixweza ya. Lê ew hiş, têde bi bîrî hişitiyaka wê ya ku têde heya ji mirov karê wê bêne ser ziman. Ew ji, bi gotina hişa hişê dihê ser ziman. Heyîne mirov e bigîyanî û hîşîya mirov çi têkiliya wan bi hev re heya? Ne bi levhanîna hin gotinna, ku mirov bi hişkirina wê re wê hişiyê bêne ser ziman, wê hingê ew were fahmkirin. Hiş, bi hişitiye xwe re ye di xwe de xwediyê bîre xwe ya. Di vir de, aliyên hiş yên ku werine fahmkirin, ku bi hiş re hişitiya wê mirov di serî de bihasibêne, bi pê re ji, bîr û jîre wê ji di vê çerçova wê heyîne aqilê wê yê ku heyîne hişê diafirêne, mirov bi pêvajoyna pêşketinê wê pêşketine ser ziman.

Hiş û gîyan, xêv û bîr, aqil û têgihîştin, di mejî de bi hizir re bi heyîne jînda mirov re heya. Bi hev re bûna wan ji, bi heyîne hebûna mirov re ye heyînî re bi wate ne. Di vir de, pêwiatinê û pêdivîtî, bi bûna aliyê me yê têrkerî re di aliyê me yê gîyanî de bi me re di berdeyam xwe yên bi hev re na. Hizirbûn û kirin ji, di nav wan de bi wan re dibêt. Tîrîtiya heyîne mirov, aliyê wê yê gîyanî yê ku keseyetiya mirov diafirêne ya û ew alî bê

ku ev hebin, wê nebe û ne afirê. Di asta bilind de di jiyane de ku bahse sinçê dihê kirin, bi tûrtiya wan re bûna kesetiye mirov re ku di jiyane de kifşkirina rêwaniya xwe de di jiyane de bi wê dihê holê. Gîyan, ji keseyetiye re aliyekî wê ye hîmî heya. Di wê de aqil ku aqiliyekê diafêne û hiş tede diafirê û hişitiya wê hişê ku şerwer dibe û pê re ji ku xêv bi jîndatiyê re afirî û bi wê bi bîrkin bû, wê xalên ku keseyet pê bijî ji wê bi awayê keseyetiye ku ye ku ji wan aferînekên bi hev re û di hev de ku bûna re ku derketiya holê ji wê xwe bide der. Di wê afirînerbûna keseyetiye de, bi dîmenî tabûyên ku ku êdî wê aferîneke mirov li ser xwe bigirin û mazin bikin, wê bi van aliyên ku diafirînin ku di jîyanê de ji nerînen ku bi wan heyînen afirandinê ku bi têgihîştin kir di xwe de wê bidest afirandina wan bike. Tabû, her yek ji wan, tevliheviyeke wê ye jîrî heya. Ji aliyekî di ve ji bê ku mirov bi têgihîştinaka bi pergali lê bihizirê, mirov wê nikaribe wê fahm bike û bêne ser ziman. Ew aliyên weke hiş û hişitiya wê, xêv û bîr, aqil heyîne mejî bi hev re bi wê hîmê ku ji gîyana mirov ye keseyetî diafirê, di heyîne tabûyê de xwediyê heyîneke bi hev re ku pê bi wê tabûyê bûna na. Tabû, wê dagerên xwe bi wan di jiyane de di jîndîne de biafirîne. Polatiya keseyetiye, bi tabûyê re heya.

Her tişt di nav sedem û encam de, di jiyane de bi heyîna hebûnî ye heyîne re di wê de dihê ser ziman. Ev aliyê ku dihê ser ziman, ye ku ew deme ku bi darêjkî afiriya û bikar û kêrhatiya wê re dihê ser ziman e. Lê bigiştî, ji heyîna wê re weke xalaka sereke ku mirov wê bêne ser ziman, mirov wê di wê demê de wê çaxê herê deme berî bûna wê darêjka wê heyîne ye pêşiya wê. Wilo wê çûnbûnak berdewamiya wê hebe. Mirov, ku hebûnaka wê ye berî bûna wê heyîna wê hebe, wê çaxê çima wê piştre ji nebe. Piştgirêka destpêkê, di zanîna darêjkê de, ne bi darêjkê re ya, di berî darêjkê de ya. Ew berîtiya, ku piştre ku çawa jiyane di ahangekê ku bi xwe re ku hebûna wê bi awayekî ku ji wê dihê zanîn û fahm kirin ku xwediyê pêşnûmabûnaka xweza ye bi xwe re ya, ji wê, berî wê li gor wê têgihîştinê hizirkirinê dihê kirin û bi wê têgihîştina bi pêşnûma li gor wê hizir

dihê

afirandin.

Zanîn û jîra wê û pêşketina hikmê vacê. ..

Beş çar; awayê heyîna darêjkê û li ser wê re pêşketina vacê: Ku em bi wê zanîna roje me rewistê bînine ser ziman, emê ji têgihîştina rewistî ku bandûra wê ye roje me lê nîn e neyênine ser ziman. Ev bandûr wê ji aliyê jîr û têgihîştina wê ve xwe bidiyarî bide holê. Lê rewist, di aslê xwe de, em di zanîn ku bi xwe re û pêşketine xwe re xwediyê dîrokeke xwe

ye teybet ku mirov wê bêne ser ziman e. Lê divêt ku em di serî de vê jî bênine ser ziman ku rewist, heyîne wê, bûn û hatîna ser ziman û bi bandûrbûna jîr û têgihîştina wê ye li jîyanê ku serwer dibe, bi wê re xwe dihêne ser ziman. Bidest hanîna xwe ye li ser ziman dike. Di çerçeve pêşketine wê de rewist, tevger û helwestên li jîyanê ku rûdidin, bi awayên wan xwe biwate dike. Li jîyanê nerîn û nerendin jî di çerçove wê û pêşketine wê jîr e teybet de dihê ser ziman. Bi vê yekê re mirov karê bêne ser ziman ku heyîne wê ye jîrî, bi pêşketin û serweriye jîrî e hizrî re ew teybetmendiyekê bi tevger û helweste mirov e li jîyanê dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê rewistê jî weke mijaraka jîrê û têgihîştin û hizrê wê bêne ser ziman.

Jîr, bûna wê û hatina wê ye li ser ziman, bi me dide fahm kirin ku hizir heyîne wê şenberiyekê ku bi wê li jîyanê dihê nerîntin heya. Ew heyîn, di aslê xwe de, heyîneke rewistî jî dihêne ser ziman. Jîr, heyîne wê ye hizrî, di vir de divêt ku mirov bêne ser ziman. Bi nerînê, deme ku mirov li jîyanê meyîzend, mirov çî û çawa dibîne? Di vê hevokê me ye pêş vê hevokê de, bêje "çawa"bûnê, heyîne rewistî bi wê hizritiyê û awayê wê ku heya re dihêne holê. Mirov, di derbarê jîyanê û mirov de xwediyê têgihîştinaka ku mirov karê wan di nav de bêne ser ziman e. Di vir de, mirov çawa hate ser ziman, bi dîtina wî/wê re û bi dîtina li wî/wê re bi jîrî nerînek heya. Ew nerîn, di xwe de, wê heyîne rewistî dihêne ser ziman. Gotinên weke yên "qanc" û "xirab", Baş" û "xweşik", "spehî" û "Nestilêhî" û hwd, bi heyîn û têgihîştina wan û ye di wan de, rewstitiyekê dihênine ser ziman. Bi kifşbûn û kirina van gotin û bêjeyan û nirxên ku bi wan re dihêne ser ziman re jî, têgihîştin û hizre rewistî e teybet diafirê. Meyîzandin, bi rewistê re ne rût e.

Di aslê xwe de rewist, bi wesiftiyê re heyîn û wesifiye xwe bi heyîne xwe re diafirêne. Bi wesiftiyê re lê hizirkiirn, her weha giringiyeke wê ye ku mirov wê biteybet bêne ser ziman e. Hizre rewistê, weke mirov ji gotine rewistê jî fahm dike, riyaka ku tere binerîneke teybet e wesifî ku afîriya û heya, bi wê bi wesifên jîrî ên ku bi qancî û başiyê dihêne ser ziman re dihê ser ziman. Jîrî û vîn û cêjî, bi wesifiya wan ye ku ji heyîne wan dihê têgihîştin, temen û hîmê wê gotina hizre rewistê dijîyanê de diadilêne û wê dihêne holê. Gotinên weke cêjnê, bi awayê jîyanê ê bi xwe re, wêneyekê ji wê heyîne hizrî e rewistê re diafirênin. Vê jî, her weha mirov karê bi teybet bêne ser ziman. Di kirinê de, tevgerên kirinî ên ku bi qancî jî dihêne wesifkirin û ên ku bi dijî wê jî dihêne wesifkirin, di çerçoveyê ku afîriya de, li goritîye wê û ne li goritîye wê, bi wê dihêne

holê.

Bi wê re, deme ku mirov bahse heyîne rewistê bike, hebe û nebe, mirov wê bahse pêşnûmeyeke tégihîştinê e ku li jîyanê serweriya wê heya bi jîrîyê re. Bi vê yekê re, rastiye rewistê, bi wesiftiye wê re li gor wê dihê ser ziman. Li gorbûn û ne li gorbûn, bi hev re, hinek awayna kiirnê ên ku bi tevgerî gotinên qanciye û xirabiyê bi xwe re salix dikin hene. Di jîyanê de, piştî ku bicihbûn bû, piştê rewist afirî. Piştî ku bicihbûn bû, piştê êdî ji bo pêdivîyên wê bicihbûnê mal û xanî bûn û mirov di wan de bicihbûn û jîyana xwe berdewam kirin. Ku kirineke mirov e ku ew mal û an jî xanîyên ku em di wan de dijîn û pêdivîya me bi wan heya ku kirine me li dijî wan bê û wan xira bike, wê hesteke ne baş bi mirov re biafirîne. Hersbûn û hwd, wê biafirê. Hers, wesiftiyeke wê ye ku mirov nikarê dûrî bûna rewistê bêne ser ziman heya. Hersbûn, deme ku xaniyê me xirabû wê bibe. Bi wê re jî, mirov wê hingî bikeve tevgere dijî ye xirabûnê de.

Bi ji holê rabûna xênî re, wê ew awayê jîyane mirov e ku mirov pê dijî, wê ji holê rabê. Bi wê re, wê rewiste mirov e wê demê ku heya, wê ji holê rabê. Bi wê rabûnê re, çawa ku xaniyê mirov ji holê rabû û mirov êdî xwe ji derve xwe dît û wilo hîskir, wê wilo bi wê re rûtbûnekê bi rewiste xwe re jî ji hinek aliyan ve wê hîs bike. Bi wê re, ew wesifên wê rewistî ên ku bi wî re afirîne, wê jîriya ku ji wan bi mirov re afiriya, wê mirov bike nava hewldanê de ku wê xaniyê xwe carek din lêkê û avakê. Bi lêkirin û avakirinê re, wê bixwezê ku wê jîyana xwe ye ku jî xwe re avakiriya biparezê. Ev jîyane wê, awayê wê, di aslê xwe de, wesifiya wê ye rewistî bixwe ya. Bi wê yekê re, êdî wê lê xwedî derkevin bibe. Rewist, hizre wê, di aslê xwe de divêt ku mirov bêne ser ziman ku jîreke ji jîrê ya. Bi vê yekê re, ew jîre giştî e mazin weke navikekê di navende wê de cihê xwe digirê. Ew jîre giştî, hem temenê wê jîre rewistî ya û hem jî ye ku jîre rewistê ku pişte xwe didiyê de ya.

Jîre rewistê, wê jîre ku pişte xwe dayê û ew ji xwe re kiriya piştî û temen, wê ji xwe re di xwe de dike weke çireyêke ku di nîvê xênî de pêxistîya û ew hundurê xênî hemû jî jê rohnîyê dihildê. Bi wê yekê re navende jîre rewistê, mirov karê bêje ku ew jîre giştî e ku bûya ya. Bi wê re, ji wê fêz û sûde xwe ji digirê. Jîre rewistê, ku mirov birastî bêne ser ziman, awayekî jîrî e ku xêve me jî bi zanîna xwe têde dihê ser ziman ye wê heya. Bi wê yekê, weke ku awayekî hiyererşik ê rakendî radixe li berçav. Bi wê re, jîriya wê xwe dihêne ser ziman. Di jîriya rewistê, temenê jîre wê, aliyekê wê bi xêve me re heya. Weke jîre ji wê xwe

dihêne ser ziman. Lê rewist, deme ku li jîyanê serwerbû, ku mirov jî bi jîn û jîndatiya wê re kirina nava xwe de, êdî wê navenditiya xwe ji mirov dûr dike. Derdixe ser mirov. Bi vê yekê re, ji bo ku wê heyîne xwe ye rewşî e jîrî jî bi temen bike, heyîne xwûdê bi kifşkarî temenê wê diafirêne.

Mirov, lê ji ber ku ji wê navende xwe afrînerê wê rewşê ya, êdî li gor mirov afirandina wê dihê holê. Weke birhana vê jî, her weha wesif û nirxên rewistî ku ji bo herder û mirovî ku karin cuda û cûr bi cûr bibin e. Li gor rewiste yekê, pêvanên rewistê hate ku digihinê yê din diguhar in. Vê yekê jî, mirov divêt ku ji wê navende wê gavê biavêje ku bêne ser ziman. Ev bûn û heyîn û awayê rewistê, ji xalyê hate ku digihê ajoyê, di qadê ku jîyane mirov têde di birehe wê de ye, dibuhurê.

Rewist, ku mirov li ser wê û bûna wê dihizirê û mirov ku kifş dike ku ew piştî bûna jîrê weke jîre ji jîrê dihê holê, êdî mirov pêre heyîne pergaltûnaka ku mirov li ser wê bisekinê û wê bêne ser ziman dibîne. Di çerçove wê heyîne pergaltî de rewist, dibe xwediyê awayê xwe yê jîyanî di jîyanê de. Bi wê re, deme ku mirov wê bêne ser ziman, mirov divêt ku wê awayê wê kifş bike û bêne ser ziman. Di vir de, di naqabîna wê awayê wê yê jîyanê û dervî wê awayê heyîne jîyanê û her weha awayê jîyanî e rewistî e ku li gor mirov e de, fahm kirin giring dibe. Fahmkirina wê, wê mirov di rastiya de, bigihêne rastiya pir giring di derbarê wê de. Di vir de, ma ku bahse rastiya kir, êdî ji wê gotinê mirov karê çend gotinên din ji li ser bêne ser ziman. Di awayê rewistî ê jîyanî de, rastiya wê ye ku bi wê dihê dîtina heya. Rastiya wê, li gor wê heyîne wê ye ku ew pê heya ya. Rastiya hizrî e rewistî e, ku têde dihê ser ziman e jîyanî di aslê xwe de awayekî hizrî ê jîrî ya.

Rewist, di çerçove hanîna wê rastiya û awayê wê yê bi xwe re de, bi wê di çerçove heyîne xwe ye bi pergaltî e di jîyanê de û heyîne mirov û sînorê wê de, dem bi dem pêşketine ku bi hizirî bûya bi wê, her demê derpêşên xwe yên ku ew pê hatiya ser ziman hanîya holê. Di vê de, hertimî ew derpêş, di asta wê pêşketinê ye ku heya de wate û heyîne xwe dîtina. Bi vê yekê û awayê rewistê, di demê de ji demê xwe buhurandiya demê. Têkiliyên biheyînî ên di jîyanê de, bi wê awayê wê yê jîrî, rêzkariya ku dihênina holê, ew rêzkarî di aslê xwe de bi wê re dibe awayê jîyandinê ê di jîyanê de. Bi vê yekê re, ku mirov bi hasibinê destpêka bi zagonî û xalî jîyandinê bi derketin, bûn û pêşketine heyîne rewistê de bûya, mirov wê kifşbike û bêne ser ziman ku rewistî, awayekî jîyanî ê birêzkarî ya jî. Rêzkarî, bi jîreke ku mirov tişte ku dike û nakê kifş dike û

wan bi jîr û bîr dike re heya. Rewist, di çerçove heyînê de heyîne wê ye ku dihê ser ziman, bi mirov û awayê şaxsiyete re weke xosletekî fîzîkî ya.

Di çerçove heyîn û xosletên şaxsiyetê de bi xosletan re bi rêzkariyaka ku jîre xwe jî diafirêne dihê holê. Bi vê yekê, mirov divêt ku hinekî bi şaxsiyet re di çerçova xoslet û rêzkariye wê de li gotina rastiye bigerihin û bênine ser ziman. Rêzkarî, pergalbûnaka bi keseyetê re ku bi xoslet û teybetmendiyên re dihê holê ya. Gotina rastiye, bi awayê jîyanî ê rêzkarî re dihê ser ziman. Rastî, di wê awayê jîyanî de bi awayê jînbûnê re mengîya xwe ye pergali ji awayê jîyanê di afirêne. Bi mirov re, xoslet û teybetmendî, jîrîya ku bi wan re afirîya, rênîşandin bi wan dibê. Di vir de, armanc heyîne wê heya. Kifşkirin û pê meşîna li armanc, wê awayê rewistî bifîzîk dike. Gotina kifşkirinê, di aslê xwe de, di vir de, weke gotinaka destpêkirinê û destpêkê e di wê têgihîştinê de ya. Armanc, çûna bi ber wê de, riya ku tere tê çûyin, heyîne wê jî dihêne ser ziman. Di çûyinê de, çi raste û neraste, wê jî dihêne ser ziman. Minaq, ye li gor rewistê û ye bêrewistî çiya, ew jî di deme çûyinê de, bi awayê çûyinê re, dihê kifşkirin. Piştî kifşkirinê re, sînorê ku hate xîzandin bixat, ew sînor, derketina dervî wê, wê di wê rewşê de bêrewistiyekê jê bêne holê. *Ye ku li gor rewistê, ye ku li gor rewistê pêdivîya û ye ku li gor rewistê bêderfet e ji,* bi jîyandin û jîrîya re kifşkirinê wê dihê û dibê..

Rewist, rastiya wê jîrîya. Biarmancî, ye ku hatiya kifşkirin, ye ku dihê jînkirin û ye ku wê bê kirin, bi hev re xatekê bi pergali dihêne holê. Derketina dervî heyîne rewistî, ye ku bêrewistitiyê dihêne holê ya. Bêrewistitî, xal û kifşkirinên ku hatinakirin, bi derketina dervî wan re dibê. Di civakê de, gotina qanciye li gor kîjen nirx û kevneşopîyan hatiya ser ziman? An jî, gotina neqancî û xirabiyê çi bi xwe re dihêne ser ziman? Hertimî, berjewendiyên civakî di kifşkirina wê de asta. Minaq, î ro, zimanê kurdan li wan li waletên wan hatiya qadaxakirin, li gor vê ye herî bi rewist, ew e ku li ber wê bê sekinandin e. Li ber wê sekinandin, xaleke rewistî e mirovehî ya. Têkiliya ziman û rewistê bi du awayan bi hev re heya. Yek, bi hanîna li ser ziman re ku pê pêşketin diafirê ya. Ya din jî, di wê pêşketinê de, bûna berdewamiya pêşketinê ya. Ziman, wan li ser ziman lingan digirê. Bi vê yekê, pîyekî rewistê ê bi jîrê re ji, ziman e jî.

.. Di zimên de deng, hebûne ku zimên dihêne holê ya. Weke aliyê zimên giring divêt ku mirov wê hilde dest û bêne ser ziman. Di ziman de guharandinên ku bu demê de bûna û yên dibin, û her weha cudabûna ku

bûya, heyîne wê, mijaraka sereke ye ku mirov di vê mijarê de bêne ser ziman e. Ziman, temenê wê yê dengî ku mirov li ser dihizirê, mirov aliyê wê yê giring bi dengê re rastî wê tê. Di gotinan bêjeyekê de dengê ku derkete holê bi çi awayê ye, ew deng; mirov karê wê dahêr bike û bi wê dahûrkirinê temenê wê bi zanî fahm bike. Ziman, weke ku me hanî ser ziman, aliyê wê herî giring, ev yek e. Gotina bêje û awayê ku bi deng re dihê holê, fahm kirina wê, wê me bigihêne pêşketineke mazin ye bi zimên re ku bi demê re bûya. Deng, deme ku bi hanîna li ser ziman ye bêjeyê re derket, wê bi awayê ku tîp çawa hatina rastkirin wê bê. Minaq, deme ku mirov got "wilo" mirov awayekî deng bi tîpên w, i, l û o re di hildê. Li hin herêmnê kurdistanê ev gotina bi awayekî dî dihê gotin. " li herême botanê, li hin herêmnê wê bi awayê "wihlo" dihê ser ziman û gotin. Bi wê re, bêjeyê de bicihbûna "h" yê, dengêkî dî yê cuda derxe holê. Ew dengê ku bi tîpe "h" re di gotina wilo de cuda diafirê, têde cudabûnak bi pêşketinê re heya. Minaqa, dengbêjekî, deme ku bidengbêjî dibêje di wan benên dengî ên di qiriqa wî de ku awa standina, her weha awayekî cuda heya, ku mirov wê bêne ser ziman. Di demê de, ev guharandên weha ên di bêjeyan û gotinan de diafir in. Ew guharandin, ne tenê guharandinna gotinî na. Bi wê re guharandinna bîolojîkî na jî.

Di wê guharandinê de deng, heyîneke wê ye ku mirov bi heyîne peresendinê bêne ser ziman heya. Car bi car, em bi xwe re dihênine ser ziman û dibêjin ku deme ku me "zimanê deme berê" fahmkir, mirov wê pêşketine wê demê fahm bike. Ev gotina ku me dihanî ser ziman, ji aliyê pêşketinê ve me dihanî ser ziman. Lê ev gotin, di aslê xwe de, weke ku em nahaka têdigihin ku wê awayê gotbêjên wê demê jî bi me bide têgihîştin. Deng, awayekî peresendinê ê bi demê re di wê pêşketine bi demê re di wê de heya. Mirov divêt ku vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Lê em di serî de bêjin ku aliyê vê pêşketinê ê genetîkî û bi teybetî û giştî jî ê xêvî jî ji heya. Wan aliyên ji, bi tevlikirina bîolojîyê re mirov karê hê çêtir fahm bike û bêne ser ziman. Ji ber ku peresendinên ku bûna di wê qadê de, xwe di qade heyînî e me ye bîolojîkî de daya nîşandin. Dengbêjek, di vir de, di çerçove mijara me de, rêzînadengî e bi dengê wî re ji me re wê bi hin têgihîştinna pêdivîya wê hebe. Emê wê car bi car, di vir de, di çerçova mijara xwe de cih û war bidinê de.

Di gotin û vegotinê de, rastkirina ku dihê kirin, çendî giring e ji bo zimên, mirov wê di wê xalê de hê baştir fahm bike. Ku dengbêjên bixwe ji, bi ser wê rastbûna benî e di qiriqa wan de vê aliyê pêşketinê, di derbarê wê de bi wan re têgihîştin bibe û wê têgihîştinê di xwe de hewl

bidin ku wê bikar bênin, wê pêşketinekê mazin di wê pêşketine xwe de bidine çêkirin. Vê yekê jî, bi awayê zimên mirov karê wê bêne ser ziman. Ziman, mene wê ye bingeh deng e. Piştî awadana deng e. Piştî wê re jî rêzînegotinî ya. **Rêzînegotinê bi rêzînadengî ye ku diafirê re, xwediyê pêşnûmeyeke jîrî e ku mirov bi têgihîştine zimên (dengzanîyê) re bêne ser ziman e. Di kurdî de tîpe "w" û ye "x", tementiyeke wan ye ku mirov bi zimên re ji aliyê dengnasiyê ve bêne ser ziman heya.** Ev yek bi teybet, divêt ku mirov li ser bisekinê û wê bêne ser ziman. Ku mirov vê yekê fahmneke, mirov wê fahmneke ku ka ji ber çî li tirkî ku çendî ev tîp kurdî de giring in û qadaxayak li ser wan heya. Di dengnasiya kurdî de, pêşnûmeye dengî e kurdî e ku heya, çerçove wê, bi van tîpan ne tenê roje me pêşketine wê di xwe de bi temen dike, demên wê yên berê jî her weha di xwe de bi wate dike.

Di aslê xwe de, ev dengên bi "w" û "x" re di kurdî de kêmbûna wan, wê di kurdî de şamitînaka mazin ye zimên ku hate ku zimên ji holê re jî wê hebe. Her ziman, bi awayê wê pêşnûme xwe ye ku mirov bi dengên wê re dayê de, heyîne wê dihê holê. Dengdana tîpan hinekî teybetmendiye zimên ye sereke ya. Mirov karê bêje ku ev teybetmendî ê sereke ku heyîn û neyîna zimên ji dihêne holê ya. Dengdana tîpê û dengê tîpê, du gotinên ku mirov wan bui teybet jecuda bêne ser ziman in. Dengdana zimên bi pêşnûmekirina deng e bi tîpê re dihê holê. Mirovkarê vê yekê her weha bu teybet bêne ser ziman. Tîp, dengê, ku têde ya, bi zimên re di demên pêşketinê de xwediyê kevneşopîyê jî ya. Deng, aliyekê wê yê kevneşopî heya. Bi vê re mirov karê bêje ku kevneşopî jî aliyê wê yê dengî heya. Di dengdanê û dengdayînê de, awastandin heya. Zimanê di devê me de listandina wê bi afirandina deng re, pêşnûme dengê tîpê dihê holê û bi wê diafirê. Dengdana tîpan, girîngiye wê bi xosletên zimên ve girêdayî ya. Mînaq tîpe "i" di kurdî de û di tirkî de xwediyê dengne ku jecuda na. Mînaq tîpe "j" di kurdî de û di norwecî de dengên ku pê derdikevin pir cuda na. Bi "j" re di norwecî de dengê "Y" ye ku em î ro di kurdî de derdixin derdikeve. Dengê "y" 'ye ku di norwecî de jî, ji ye pê di kurdî de dengê wê heya cuda ya. Mînaq, di norwecî de "Yrke" (=kar)dengê ku di bi tîpe pêşî re distêne dengê ku di naqabîna "i" 'ye ku bê xal û ye ne bibêxal de ya. Xosletê dengê "y" 'ê ku di kurdî de derdikeve jî, her weha hinekî cuda ya.

Dengdana tîpan, ji aliyê heyînî û hebûnî ve zimên dihêne holê. Ziman, bi wê heyîne wê diafirê. Her dem û pêşketine wê, bi pêşketinên nû ku dijî û jîndike re, dengên nû diafirêne. Ew deng, temenê afirandina

Bi teybetî ji, di çerçove vacê de li lêgerîna ku dihate kirin ji, her weha mazin bû. Piştire ev lêgerîn di nêzikatiyan de bi hizir xwe dide nîşandin. Minaq; weke vê gotina zanebûnê ye kurdan di civatan de her weha di wê wate de dihanî ser ziman, gotina "rasti"yê ji, her weha hinek wateyne din jê dihatina kirin û dihate ser ziman. Di deme ku axiftinak û an ji destanak dihate ser ziman, lê dihate hisandin û li awayê vegotinê û li awayê "levanîna" wê dihate lê gerîn. Çendî xweşik levhatiya kirin. Çendî xweşik lev hatiya hanîn. Ev lê dihate lêgerîn. Ku di ahangekê de bû, hingî wê bihate gotin ku ew pir xweşik û rast hatiya vegotin. Lê ji bo ku bihate gotin ku "rast û qanc" hatiya vegotin, "divîyabû ku ji rastiyaka ku di jiyane de dijî ne dûr ba". Ev ji, wilo dihate gotin. Cih û war, di vegotinê de xala ku li ser dihate sekinandin bû. Wekî din ji, her weha di deme vegotinekê de ku li levanîna gotinên wê dihate meyîzandin, dihate nerîn ku ka gotin di vegotinê de hevdû vala derdixin û an ji yên ku li dijî hevdû hene û an ji nîn in. Dij-hevdûbûn, deme ku lê dihate gerîn, di wate hevdû vala derxistinê de lê dihate lêgerîn. Du ahagenkê de deme ku lê dihate lê gerîn, her weha li lihevdûbûn û dizanebûna wê de bi têgihîştina wê re hevdû tememkiirn û hanîna ser ziman lê dihate lêgerîn. Ev xal, xalake ku pir girîng bû. Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman.

Di vê yekê de, di deme ku her weha lêgerînek dibû ji, di zimên de lêgerînek lê dihate lêgerîn. Ziman baş an ji ne baş e. Kare were ser ziman û an ji ne dikarê werêne ser ziman. Her weha ev xalaka girîng bû. Başbûna zimên, dihanîna ser zimên ye ku diahagekê de ku "rast" dihate ser ziman de lê dihate lê gerîn. Rastbûn, her weha bi hebûna xwe ye bêjeyî re têgihîştineka ku mirov bi vacê re bêne ser ziman dihêne ser ziman. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Ev xal, her weha xalaka ku girîng bû. Di her vegotinan de li jiyankê bi şop û hebûne xwe ye ku pê heya re lê dihate lêgerîn. Ev yek, weke xalake girîng ye ku mirov wê bêne ser ziman bû.

Aqil meşandin, di demên pêşketinên yên bi aqil de ji demekê pêde,

pir mazin dibêt. Bi wê re êdî dem bi dem pêşketina vacê bi têgihîştin dibêt. Bizanebûn li dora xwe meyîzendin û bi nerîna xwe re bitêgihîştinaka lihev hanîna ser ziman, vacê diafirêne. Bi teybetî, nivîsandin, destpêka wê, mirov karê weke destpêkakê ji ji wê re bêne ser ziman. Ji ber ku mirov êdî karê di serê xwe de levbêne û bi levanînê ji karê biafirêne. Di afirandina xwe de ji, bi demê re hin bi hin ji nerîna xwe ye li dinyê dihêne ser ziman. Çi dibîne û tê berçavên wî, xwestina hanîna wê ye li ser ziman û nivîsandinê û ku li gor ye ku dibîne, pêşketine vacê destpêka wê dihêne ser ziman. Seh û jîrî, di vir de bi aqil û mejî re mirov karê li ser bisekinê. Sehkirin û jîrkirin, her weha ji nerîneka ku temenê wê li dinyê heya ne qût a. Jîrî, bi teybetî çêkeriyê dide ber xwe û dikê. Çêkerîti, bi jîrîyê aqilê mirov bikar hanîna wê ji mirov dixwezê. Wekî din ji, naqşekê bi hizirandinê di hanîna ser ziman de ji mirov dixwezê. Ew naqş, wê çawa û li gor çi bibe? Ew ji, bi têgihîştina naqşî, hebûna vacê ye bi aqil ku diafirê dihê holê. Aqil, bi di xwe de bikarhanîna vacê re estetizmekê bi xwe re di xwe de bidest pêşxistinê dike. Rast dîtî, li ser bêjeyan re li ser hizirandinê re levhanînekê ji mirov dixwezê. Levhanîn, bigotinan aqilê ku hatiya levhanîna. Gotin bixwe ji, di deme ku mirov li ser dihizirê, ji gelek aliyan ve hebûna wê mirov karê li ser bihizirê. hebûna wê deme ku di serê mirov de dihizirê, li gor naqşeyeka afirandî ye di serî de dibêt. Lê ew naqşa, ne naqşeyeka ku mirov wê weke tenê ji mejiye ku têde hatiya afirandin. Mejî, biçav û guh, dîtî û hiskirinên ku kir, di xwe de di temenê afirandinekê de diafirêne. Di vir de seh û jîrîya biaqil ye mejî ye ku dibêt mirov divêt ku wê fahm bike.

Metafizîk: Metafizîk, bi serê xwe di felsefê de qadaka ku li ser hebûn, xweza, dinyê û gerdûnê bitêgihîştineka felsefî ku li gor vacekê hanîna wê ye li ser ziman e. Di serî de metafizîk, li ser hebûn û bûna wê bitêgihîştina xwe xwediyê vegotinekê ya. Rastî, di serî de mijaraka mazin ye ku dixwezê ku werêne ser ziman. Lê rastî, hertimî mijaraka ku tê xwestin ku were fahm kirin e. Rastî çiya? ev pirs, ne tenê pirs metafizîkê û felsefe wê û bi wê re ye têgihîştina wê ya. Bûya ye herî têgihîştinî û felsefeyî.

Li ser têgihîştina metafizîkê û bi wê hanîna li ser ziman, hertimî têkoşînak bûya. Metafizîk, dîroka wê ku mirov bidest hanîna wê ye li ser ziman bike, mirov divêt ku herê ta deme Sumeriyan. Sumeriyan, bi avakirina şaristaniya xwe re, temenekî mazin yê bi hizir re diafirênin. Hebûna têgihîştinê, temenê pêşketin û pêşveçûnên weke yên şanistani na.

Ku tēgihiştineke felsefîk nebe mirov nikarê bêje ku pêşketineka mazin yeke weke ye şanistaniyê wê bi afirê. Di vir de, berî ku em ji sumeriyên bi sereke ji bê hebûne tēgihiştina metafizîkê bēnîne ser ziman, bi sumeriyên re hebûne mitolojiya wan mirov divêt ku jê hinek bêjene biafirêne û pê aliyekî wê pêşketine wan ye hizrî bēnîne ser ziman. Sumeriyên, di deme xwe de di deme şanistaniya xwe de, hê deme mitolojiyê dijîn. Lê di wê demê de bi wê awayê pêşketinê yê mitolojiyê re pêşketineka hizrî ku mirov bi gotinaka felsefê ya ku di deme mitolojiyê de pêş dikeve bi wê bēne ser ziman. Her weha gotinaka weha di deme wan wateyekê ji pêşketine wan ji awayê distêne. Dem bi dem pêşketine wan, bitēgihiştinekê diafirê û pêşdikeve. Mirov vê yekê her weha dibîne. Destana Gilgameş, deme ku mirov lê dimeyîzenê, mirov vê yekê dibîne. Ew awayê pêşketinê yê bi wan re tê dîtîn. Destana gilgameş, di xwe de bi awayê pêşketina jîreka mazin ye ku tēde ya mirov dibîne. Ew jîre wê ye tēde, mirov karê bêje ku bi demne mazin yê pêşketinê pêşketiya.

Sumerî, ew deme wan, demeke pêşketinê ye ku felsefe pêşketiya ya. Hebûna Nebî Nuh ku di wê de bi navê "Utnapiştin" tê ser ziman, heya. Utnapiştin, hatiya bihistin û navê wî li herderî hatiya bihistin. Gilgameş ji dereke dî(herêmeke dî), di xwezê ku were cem wî. Ew herême ku lê ya, ne dût e ji cihê ku ew lê ya. Li Kurdistanê ya. Di wê demê de navê waletê wan "Kengîr" e. Bi wê destanê re, mirov fahm dike, ku di hizirkiirn û tēgihiştinê de pir mazin heya û ew tēgihiştin ji, dem bi dem ku jev ne qût tê ser ziman. Mirov wê yekê dibîne. Bi aqil û hizirkirinê bi hev ve kirin û bi hev ve hanîna li ser ziman, heya. Pêşketiya. Piştî deme wan re, hate ku tê deme xanadanên Uriyan û Mîtanî û Hûrî û pişt wan re Gûtî û Naîriyan re mirov vê yekê her weha kifş bike. Bi teybetî, di deme Gûtîyan de, mirov bi tēgihiştin dibîne ku jevneqût hanîna li ser ziman heya. Navê xwûdê li cem wan heya. Ê ne li ardê ya. Bi Nebî Nuh re navê xwûdê hatiya bi tēgihiştin ku "mirov li ardê dijî û ew ji li ser wan re li azmana dijî û wan û kirin û dinya wan dibîne". Ev tēgihiştin heya û bicih bûya. Pişt wan re hatina mirovên weke Birehîm xelîl û hwd, wê rewşê bêhtir mazin di aqil de bicih dike û bi aqil pêvajoyên wê yên pêşketinê radixe berçav. Her weha mirov vê yekê wilo dibîne.

Berî Birehîm Xelîl, ji Nebî Nuh hate ku dem tê wî, gelek mirovên weke ku nêzî xwûdê tēne dîtîn tēn û diçin. Bi wan re pêvajoyaka mazin pêş dikeve. Lut, Yunus, Yusuf û hwd, tēn û diçin. Di rastiyê de mirov karê her yekê ji wan bi pêvajoyaka vê xata pêşketinê bi astkirina wê re

salixkirinê sekinandin dibêt. Di vê çerçovê de laş û jîr, li ser wan tê sekinandin. Laş ye ku heya. Ye ku mirov wê dibînê ya. Lê jîrî ji, ye ku razbar e. **Ya razber, ye ku hişar a.** Habûna hizirkirinê, razber tê hasibandin. Bere jîrê ya. **Têrkerî û kirdeyî, farqek di naqabîna wan de heya. Têrker, ye ku "heya". Lê kirde, hê "nîn e". Lê têrker kirde wê heya. Jê biriqîna wê heya. Deme ku lê tê meyîzandin, dîtina lê, wê bi hebûna wê ye ku heya re, dihêne berçav û bi awayê ku tê berçav ji, dîmenekî li berçav diafirêne. Têrker, ye ku şênber li berçav e. Mirov wê dibîne. Lê ev dîtî, ji bo li ser wê ku dihê ser ziman, tê gotin ku "ma gelo ji ber ku em wê bi çavên xwe dibîn in heya an ji ew bixwe heya?".** Bi vê awayê pirsîn, hizirkirina pê re, felsefe wê ye ku tê ser ziman diafirêne. Jîrîtî, têgihîştina ku di deme ku mirov bûya dimirov de bicih e, kifş dike û dihêne ser ziman. Çawa li wir heya û bûya ji, di derbarê de sirekî wê yê ku bersive wê bi hebûna xwûdê dihêne ser ziman heya. Lê jîrîtî, hizreke wê ye ku mirov bi dîtina xwe re dibîne û di mirov de bi mejiyê mirov re dibê hizir e heya. Di mirov de, têgihîştine jîrî, xwemaliyeka wê ye bi mirov re heya. Aqil, pêşketine wê, di xwe de diafirandinê de ya. Di demê de aqil, ji wê pêşketinê, bi deme re pêşketineka wê bi mirov re heya.

Dem û feze, bi hebûna xwe re hebûne wê li ser nîaqş hertimî bûna. Gelo koka wê çiya? ji çiya sedeme wê? Hebûna wê ji çiya? Li ser wê hizirkirin heya. Feze, hebûna wê di demên berê de "bi bûna laşê xwûdê re" dihate ser ziman. Lê piştîre bi bûna têgihîştinê bi felsefê re li ser bi hinek sedemne din lêgerînan di serî de destpêkir. Li fezeyê gelek dinye hene. Ji xaynî me, yên din ji ku xwûdê çêkirina hene. Ew ji, bi hine awayna din dijîn. Lê ew ji, di serî de divêt ku mirov bêje ku bijîyanaka ku xwûdê ku pê ew afiradina hene. Bawerî bi wan re ji heya. Bi vê yekê re, mirov ew dihanî ser ziman. Lê tiştêkî dî ji dihate ser ziman. Ew ji her weh ev bû. Dihate gotin ku "mirov lê jiyana xwe ye piştî mirinê wê bi wan re were çem hev û ew hevdû bibînin". Ti jîndiyên ku xwûdê çêkirina, wê ji dîtina hevdû bêpar nemên in. Bi vê yekê û vegotin û têgihîştina ku têde, dervî gerdûna ku em têde dijîn yeke dî ku heya, hebûna wê ji dihate ser ziman û bahs dihate kirin. Lê gerdûna din, bi giyanê jîyan têde heya û "sermediya".

Aqil, yê ku heya, ne dervî wê hebûna me ye ku xwûdê afirandiya. Aqil, wî bi me re daya çêkirin ku da qana mirov karibe di jiyane de pê bijî. Bi vê yekê, wê mirov jiyana xwe de bi afirandina wî ye bixwûdê re, wê bi bêkêmesî bê. Xwûdê ji ber ku bi bêkêmesî ya. Di wir de, ew

bêkêmesîya wî, ji aliyekî xwe hebûna xwe dihêne holê. Mirin ji, aliyek ji yê wê bêkêmesîbûnê ya. Bi mirinê, bûn û nebûn, çêbûn û jêçêbûn(wate wê; piştî demeke jiyanê re mirinaka ku di xwe de wê çêbûne bike dihêne ser ziman. Jêçêbûn, wate wê ye din ji "jê afir in" e.), wê di jiyanê bi hevdu hoyandinê re dijîn. Mirin, hebûna wê, bi mirov wê jiyanê dide berdewam kirin? De ne, hebûnaka mirov ye li berçav heya. Ma ku mirov mir û binax bû, wê pê re ew hebûne wî xwe bi guharanêne re neguharê tiştne din? Bi vê yekê re, mirov divêt ku wê bêje. Wekî din ji, biaoqilbûna jiyanê, dihate ser ziman. Mirov di jiyanê de dijî, bi wê jiyandina xwe re xwediyê aqilekî ku pê dijîya. Lê ku mirov jiyanê giştî dihêne berçav bi hemû hebûn û nebûnên xwe re, mirov wê bibîne ku wa di wê de "aqilekî serek ye ku li ser hemû tiştî re ye ji, wa heya". Ew aqil, jiyanê bi tê ve dibêt. 'Xwûdê ew aqil afirandiya'. Ew aqil, serê wê û dawiyê wê têde kifş e. Ew aqil, têde wê çawa bê jînkirin ji, têde hatiya kifşkirin. Ew ji bext e. Jiyan, çawa ku destpêkeka wê heya, wê wilo dawiyaka wê ji hebe. Jiyan, lê bi her mirinê re dawiyekê di xwe de dihêne. Lê ew mirin hemû ji, wê wê ji nû ve nû bikin. Bi vê yekê, 'sermediyeke' jiyanê ye bi pêre heya. Ji ber ku xwûdê sermed e, jiyan ji wê her weha sermed bê. Bi vê yekê bawerî, cihê wê ji dihate ser ziman. Lê wê sermediya bi xwûdê re bawerkirin, jê gûman nekiirn û pê re meşên. Her weha xalna girîng yên ku dihatina ser ziman.

Li Kurdistanê, hebûna wê pêşketine ye hizrî, her weha bi pergala e. Têde divêt ku mirov bahse fezeyê û pêre astronomiyê bi teybet bike. Jiber ku di demên berê de pê re ev pir mazin bûna. Lii ser stêran û rojê û heyvê pir mazin têgihiştinne mazin hatina afirandin û pîrozî li wan hatiya kirin. Hêzbûn, pêre mazin bûna wê hebûnê wê ye nixî ye mazinbûna wê dihêne ser ziman. Piştî demekê re êdî bi felsefî ekolên mazin yên felsefê û têgihiştinê ku diafir in û serwer dibin diafir in, Mitra, Zerdest û Manî çend ji wan in.

Zerdeştî; Dualizim, an ji di kurdî de weke ku ji temen tê ser ziman û tê gotin "duoitî", hebûna felsefe metafîzîkê li Kurdistanê û pê re ji li herêmê aliyekî wê dihêne ser ziman. Bi qancbûn û xirabûnê re hebûna wê dihê ser ziman. Weke ku tê ser ziman, "hertiştê ku baş weke ku bemberekî wê heya, wilo ji, hertiştê ku xirab ji beremberekî wê heya." Qancbûn û neqancbûn, nixkeke wê ya teybet e. Di pêşketine wê de, bi têgihiştin, weke ku di felsefe Zerdeşt de dihê ser ziman, bi ahrîman re li xirabûnê kiresekî giyanî tê kiirn. Her weha weha bi ahuramazda re ji li qancbûnê kiresekî qancbûnê tê kirin. Pê re ji têgihiştina wê tê afirandin û felsefe wê

bi zagon û nirxetiye wê re tê kirin. Bi 'Zerwan' re destpêşkeka wê ya ku heya tê ser ziman. Zerwan, bi zaroyên xwe ahuramazda û ahriman re, destpêkirina wî tê kirin. Kurê wî ahriman ne qanciyê diafirêne û mazda ji qanciyê diafirêne. Bi vê yekê re, ev ji di baweriya wê de, weke bextekî tê ser ziman. Ew bext, bi "bextê demê" dihê ser ziman. Bextê demê yê ku dem kifş dike û ser me hemûyî re ya. Tenê xwûdayekî mazin yekî weke mazda karê 'dest li wê werde'. Li dinyê, ji şînatiyê bigire pir wî re dibêt. Zerwan, ji ber ku "hebûna demê" dihêne ser ziman, ew serweriya wê ye li ser hemûkan re heya. Ew dem ku pir mazin hatiya jîn kirin e' Zerwan, daya kifşkirin ku wê her serê sêhezâr salan wê mazda were dinyê. Zerwanî, bi bûjenî û arîşenî hebûne gerdûnê dihêne ser ziman. Stêr, heyy û roj û hwd, her tiştê li azmana hebûnaka wan ye bi wê gerdûntiyê re li berçav heya. Ew "xate bext" ji dihêne berçav û ser ziman. Ji wê dem wê dîtî û fahm kirin. Mazda bûyeniye wê ye ku wê li dinyê bide afirandin û an ji ku dide afirandin dihêne ser ziman. Ew 'têhn û rohniya wê ye afrîner' heya. Di baweriya wî de, ye ku rohniyê û tariyê jev diqatêne valahiyaka li nivê wê heya. Ye ku bûjenê hê ku forma wê ne afiriya diafirêne ji, zerwan û hebûna mazda ya. Di baweriya Zerwan de, hemû tişt ji berê ve hatiya kifşkirin. Di 'giroveriya azman' de, hatiya kifşkirin ku wê çî bi çî bê. Bexte mirov bi stêr, komastêran û gerwêrkan, di naqabîna qancî û xirabiyê de dihê kifşkirin. Pêşketina stêrzaniyê her weha bi wê re ji destpê dike. Bi wê û wê têgihîştina wê ye giyana pîroz û giyana xiraker bi zerdeşt re pêşketine wê xatê her weha tê ser ziman.

Bi nav û serwerî û serdestiya pîroz Zerdeşt bi têgihîştinek di wê duyitîyê de wê xate de demeke nû dide dest pê kirin. Hizrên wî yên ku tene ser ziman, pêşketinê bi têgihîştine duyitîyê lê bi hizre yekitîyê dihêne holê û dide afirandin. Bi vê yekê, bawerî û pîrozî hizrên wê mazin li gor wî û têgihîştina wî mazin dibin. Zerdeşt, bi baweriye ku temen û sebebê hemû tiştê qanc û baş bi mazda(hûrmûz) re têgihîştineka bi yek-yazdantiyê derdixe pêş. Hate deme wî, bi ahriman re duyiti hebû. Lê ew di hanina ser ye li ser ziman de wî dike ku li şûn bihêle. Lê wî ji "ji xwûna yazdanan" dihasibêne. Mazda di têgihîştina wî de temenê 'bûn û hebûnê' ya. Wê dihêne ser ziman. "Avesta", ku bi nav demeke jîndayî û pîroz dihêne ser ziman, pê hizre wî dihê holê. Zerdeşt, wate wî û pêşketine wî, di demê de ji nû ve bûne pergala olî ye li gor demê ya. Awayê bawerîya wî, kirin, nirxbûn û gotinên wî û hwd, li gor demeke nû ku î ro jê bi têgihîştina xwe nabuhurê ya, dihê ser ziman. Zerdeşt, bi wate û hebûna gotinî, bi kurdî "destê zêr" û "destpêka zêr" dihêne ser ziman.

Felsefe wî, hebûne wê tê de, jîrî heya. Mirov divêt ku wê bêne ser ziman. Di deme ku bidengekî bilind diaxivê ji dora xwe re berê rû yê xwe dide bi azmana bi rojê de û diaxivê. Jê wê meyzendina xwe hizrên ku di serê wî de çêdibin dihêne ser ziman ji dora xwe re. Baweriyê ew, bi kirin û rast nêzîbûn re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bêne ser ziman ku jîrtiyê ew pê dihêne ser ziman. Gotina wê ye "gotina qanc, kirina baş û tevgere rast", wê jîrîya hizrî dihêne ser ziman. Pê re ji astaka wê dihêne ser ziman. Dîtin, bi wî re di serê mirov de efrîner e. Her kirde di serê mirov de bi tiştê ku li dinyê ku mazda afirandîya û heya ya. Bi vê yekê, ji dinyê û tiştên wê yê têde ku hene, bi têgihîştinê bi hiyerarşiyeka ku diçê û digihê mejî û têde ye ku wê afirandîya û heya ya, pê re tememiya xwe dihêne ser ziman. Her tiştê li jîyanê mirov çawa lê meyzênê, wê wilo bi mirov re pêşketineke bi têgihîştine bêne. Li gor wê têgihîştina wî, çêkeriya jîrtî, ye ku mirov fahmkirîya ya. Bi biriqîna ji tiştên ku hene, di serî de weke cihana li derve cihanak heya. Herdû cihan, têkiliya wan bi hev re danîna wê lezim û pêdivîya wê heya. Ew cihana serî, ji xwe potansiyale wê ji berê ve hebû. Lê bi bûna fahmkiirnê re êdî wê ji xwe kifşkirîya. Wê êdî bi wê yekê êdî pêş bikeve. Riya wê ya ku diçê mazda û ji wî ji diçê Zerwan e. Roj, ji ber ku bi têhne û ew têhn ji bi şawta, mirov dizanê ku riya çûna li mazda û jîrîya wî, di êgir de diçê. Agir pîroz e. Li dora wê berg û ceng têne girtin. Yê qanc wê ew agir wan ne şawitêne. Wê wan 'qayîm' bike. Lê yênku bidil û serê xwe ne baş bû, wê ku agir têkilî wan bû, wê ew bişawit in. Av û ax, deme ku bi hev re kete têkiliyê de û harî çêkir ji xwe, wê têhne rojê ji wê êdî wê jînd û zînd bike. Agir têde biarîşî têgihîştin heya. Di deme têhn dayinê de, wê zanîne dihêne holê di mirov de. Agir û arîşa, hebûna wan ye bi hev re yek e. Ew ji pîroz û zanebûn e. Agir, hêze arîşetiyê di xwe de dihêne holê ku mirov wê bibîne. Têhn, deme ku da dilê me, wê ev yek were dîtin û kifşkiirn. Dilê mirov ku germ bû, wê bi tevger bibe. Wê hingê 'rahm' û 'zanîn' bi hev re têde 'were holê'. Aqilê mirov ji wê bijîre. Ew jîrbûn, ku mirov wê dît, wê mirov di hinek pêşketinne mazin yên di mirov de bibe. Bi wê re, divêt ku mirov ji bîr nekê ku nerîne dil ji pêş dikeve. Zanebûna mirov, divêt ku bidil bê. Dilê wê, wê mirov bigihêne rastiya rastteqînî ye ku mazina û hîme û heya.

Zerdeşt, pergala wî ya hizrî, mirov karê pir mazin bi vê têgihîştine û hebûne têgihîştina wî ye li azmana bêne ser ziman. Wî bi hanîna xwe ye li ser ziman re, safîbûnak di seran de bi mirov û xwûdê li gor hiyerrarşiya wê afirand. Ew safîbûn, bitêgihîştin di serî de bû. Nêzîkatîyên ku piştre

bûn, bi vê yekê bi bawerî bi jîr û têgihiştine wê dibin. Mirov, zanebûne êdî nas dike. Pê re, wê çawa tevbigerihê wê dizanê û fahm dike. Rastî, di serî de, bi hine awayna hatiya rohnîkirintir. Bi wê têgihiştine wî û bi wê êdî wê pêdeçûna wê ye bi pêşketine bi deman re, wê hizirkirina jîrî ya ku tê afirandin bi afirê û bê afirandin. Nêzîkatî, di wê çerçove tene bi zanetir kirin. Gotina bêhtir bitêgihiştin dibin. Tevger, ji her awa û hebûna wê ve li ser tê sekinandin. Kijan ye qanc e û kijan neya qance tê dîtin û fahm kiirn. Bi wê re demne pêşketinê yêb bi hizir di buhur in. Hate ku dem tê derketina Manî, wê her weha bi pergal li Kurdistanê pêşketineka mazin bê jîn kirin. ..

Manî: Ji aliyê pêşketine wê xatê ye bi têgihiştin û felsefe wê re, derketina Manî demeke nû ya. Ew weke ancanka wê xatê e jîrîya. Her weha mirov karê wî bêne ser ziman. Derketina wî, di demeke pêşketineka mazin bûya û bi têgihiştin, hizir û têgihiştina Zerdeşt di nav xalkê de rûniştîya bi pergal, ew derdikeve. Ew, di derbarê wê hizir û têgihiştine wê û pergala wê bi dîroke wê re de bi zanebûn a. Manî, têgihiştina Zerdeşt bi awayê pêşketin û asta demê di xwe de bi sentez dike. Ew têgihiştine xwe bi hizire xwe re li ser temenê hebûne stêrzanîyê bidest afirandinê dike. Tarî û xirabî, ku di dinye pêzevî de di dinye arîşen ye mirov de têkoşînak pê re heya hanî ser ziman. Rohni, bi hebûne mirov re ye li dinyê re ku hûrmûz da dinyê ya. Têde zanebûn û rastî heya. Rohni, ji rastteqniya herî mazin û bingeh tê. Manî, bi têgihiştine xwe re, di demeke kin de tê kifşkiirn. Hizre wî, tê kifşkirin. Ew, bi jîrîyê dihêne ser ziman. Li ser jîrîyê di sekinê û dihêne ser ziman. Ji aliyê têgihiştina xwe ve bi kok diçê Zerdeşt û ji wir ji diçê yên berî wî. Wî hiz hanîna ser ziman ye rastiyê dikir. Rastî, ji bo wî, pir girîng bû. Li gor wî, mirov dikarê bi hizirkirin û fahmkirina bi jîrîya xwe ye bi xwe re xwe bigihêne de. Wî, mirov, di temenekî dîrokî de bi hebûne xwe ye ku hatiya afirandin hanî ser ziman. Mirov wî, weke nîrxê mazin nîrxand û hanî ser ziman. Rehetbûn, li gor têgihiştina wî bi jîrîya mirov re ya û pê re ji hertimî were û mazin bibe. Wî rehetî weke teybetmendiyeka bizanebûn ye pê wê were dihanî ser ziman. Dem bi dem di ser de mazin bûn, wê bi ber wê de bibe. Di vir de, wî bahse ahlaqe dikir. Li got têgihiştina wî, çend ku ahlaq ji zanebûnê ya, her weha divêt ku mirov zanibe ku ye wê wê û bûna wê kifşbike û biafirêne ji, ew têkoşîna di dilê mirov de ye bi tariyê re ku heya.

Wî dii jiyana xwe de pir mazin nivîsand. Her dere ku çûyê de li wir, jê bi nivîs ji jîre aqilê wî hinek li wir wî bixwe hişt. Fahmkirin û zanebûn,

li gor wê ya ku wê rê şanî mirov bida. Ji ber vê yekê ji, wê guhdida pêşketin bi wê û nivîsandinê. Her ku dihate aqilê wî, wî di nivîsand. Naskirin, xosletekî pêdeçûnê ye li gor wê û têgihîştina wî ya ku bû. Wî, li dinyê û tiştên ku di dîtî li wan dimeyîzend û jê di dil de bi xwe re ji bo fahm kirina bijîr hewl dida. Rast dîtî, ya bi jîre êqil e. Wil wilo di dît. Jîrîti, li gor wî keseyetiyê wê ye teybet heya. Di mirov de, mirov karê xwe bi gihêne wê heya. Lê li gor wî, bi vê yekê, ji têgihîştina wî biqasî ku tê fahmkirin sê awayên şaxsiyetê yên ku diafirin hene. Yek, yê asayiya ku di jiyana xwe de dibêt dubeş e. Beşek qey karê jiyana xwe bidomêne. Yê din ji, hin bi hin bi dîtina xwe re bi pêde diçê û derfetê wê aliyê heya ku bigihê asta bilind ya têgihîştinê. Yê dîn ji, yê ku bi yên ku xwe dana pêşxistina jîrîye êqil in. Ew ji, wê rohnîyak di serê wan de bi demê re pêkeve. Ew ji, divêt ku hertimî bi wê di tekoşîna têgihîştinê de bin, ji ber ku ew bi tariyê re yên di şer de ne li ser navê yazdanê mazin. Wê rohnîya yazdanê mazin, wan ti carî bi têne ne berdê. Ew ji, ye ku wê pêşketine wan bide kifşkirin, dilsafîbûn, jidilbûn û qancbûn e. Pê re ji, hertimî hewldana fahmkirinê ya. Yên dawiyê yên sêyemin ji, yên mazin ku ew bi rohnîya mazin yên yazdanê mazin yên weke Zerdeşt in. Ew, wê wilo dihêne ser ziman. Ev ye dawiyê ji yên ku yên ku hatina naqandin in. Bi wan re, mirov wê di riya xwe ye bi pêş de herê. Wê çend ku herê bi wê bi ber rohnîyê de herê. Bawerî û tekoşîna biwê ji bo wê, di qadekê de digihêne hevdu. Lê hertimî ji hiyerrarşiyeka mazin her weha di nav mirov de heya.

Manî, bawermendên wî, di parastgahên bi navê wî avakirina bi pêşve diçin. Bi wan re, tiştêkî nû diafirê. Hate wê demê ku hate ku hatiye Zerdeşt ji wî ji bi vir de ku hatiya bi parastgahên ku agir têde dihate pêxistin bi rê ve diçû. Wan rûyê xwe bi rastî di êgir de di dît. Lê Manî, bawermendên wî, cara pêşî bi awayekî nû parastgahên xwe yên ku ji pêşketina dêrên filehan re ji dibîna minaq diafirênin. Diafirênin û têde wê çawa berg ji bê kirin kifş dikin û zagon û xalên wê yên bingeh radixina berçav. Manî, li Kurdistanê li herême Merdînê derdikeve. Lê ew li herêmên din ji gerîya ya. Ne tenê ew der, ew, hate bi hindistanê û Çîne ji çûya û li wanderan ji demeke xwe pir dirêj buhurandiya. Manî, şiyana wî ye jîrî, pir mazin û xurt hebû. Li dere ku diçûyê de ji, pir mazin dikarê pir mazin fêrbûnekê ji ye ku heya di xwe de çêke. Nivîsên wî yên ku wî nivîsandina, weke "nivîsên pîroz têne dîtî û di parastgahên wî de ji aliyê bawermendên wî ve têne xwandin. Manî Hinek hizrên wî yên u wî bixwe nivîsandina li ser dîrok, acinîyan ji hebûn. Wî acinî, weke ku berî wî di

têgihîştina Zerdeşt de ji dihate ser ziman, weke yên ku weke me ji adam û hawa na dihanî ser ziman. Lê wî dihanî ser ziman ku mirov ji av û axê ku birohnîyê hatina afirandin dihanî ser ziman. Lê ew ji, bi heman awayê yên "ji ba bûna" dihanî ser ziman. Ev têgihîştin, piştê di musulmanetiyê de ji hatiya ser ziman.

Manî, di deme wî de, çawa ku ew bidinyê ket, herweha pişt wî re misyonerî bi wan re dest pê dike. Di rastiye de misyonerî yên ku her weha li herêman dikirin, bawermendên Manî bûn. Ji bo ku bawerî û hizre bibina herêmên din, ji Kurdistanê ji gelek deverên li gelek deverên din yên cihanê ji aliyê wan ve seferên misyonertiyê yên wan bûna. Li aliyê Imparatoriya Sasaniyan ji dibin. Lê Şahên Sasanî ji wê ditirsihin û piştê li ber wan disekin in. Berî hingî Manî ji, ji ber kirina xwe ye wilo serî wî hatibû lê xistin. Piştê gelek bawermendên wî ji, dawîya wan bi bawerîya wan re dibê weke ye wî. Lê çend ku wilo çûna ser wan çûbûn dibê, bi teybetî ji bi aliyê asya de, pêşketine wê û belavbûna wê nayê sekinandin. Zû belav dibe. Bî wê zû belavbûnê re, di qadekê mazin de êdî mirov karê bêje ku dibê xwediyê hebûn û bandûr. Lê piştê, hin bi hin ji holê di rabin. Derketina filahîyê û piştê herêkirina fermiyete wê û piştê wê re derketina musulmanetiyê, wê mafê jîyanê û qadê ji Manîvan re ne hêle. Manî, Di aslê xwe de, demekê nû ye di wê pêşketine Zerdeştîyê de ya. Mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Pê re ji, mirov divêt ku bêje ku şîrovekirina wê ye li gor demê ya. Afirandina pergala wê ye li gor demê ya. Hebûna wê ye wê demê ya. Bi manî re teybetmendiyê herî sereke ye ku bi teybet derdikeve pêş, bi jîrî afirandina aqil e. Jîrîtî, pê re pêşketiya û weke ku bi teybetî bi hizir di hanîna wê ye li ser ziman pergalak heya. Ew bihizirkirinê afirandina hizir bi awayê çêkeriyaka jîrî dihêne holê û dide berçav. Mirov vê yekê di awayê pêşketine wê de dibîne.

Ev xate pêşketinê bi aqil û bi vaca wê bi deman dibêt. Li ser vaca aqil re dem bi dem êdî pêşketina têgihîştinê bi jîrî dibêt. Hate ku dem tê sadsala me, her weha ev yek berdewam dike. Bi deme me re, em weke çend gotinên dawiyê bi temenê hanîna ser ziman ye jîrîyê pêşketine wê û ku ew weke ancama wê xate pêşketinê de ya, piştê bi pêşketine xwe re çî ancaman derdixê holê. Di roje me de, jîrî, bi serê xwe êdî qadaka ku bi têgihîştine afiriya û pir afrîner e. Mirov divêt ku vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Bî wê re mirov bahse jîrîyê bike, divêt ku mirov hinekî bi teybet li ser wê bisekinê. Ji ber em ji bi vê yekê û bi teybetî di çerçove jîrîyê çêker de li ser bisekin in. Di çerçove biharhanîna vacê û aqil de, ev

yek pir girîng e. Aqilê ku têde vac hatiya bi kar hanîn, wê bi vê yekê xate wê ye pêşketinê hê baş were dîtin û fahm kirin.

Jîrîye çêker: deme ku mirov bahse jîrîye çêker bike, wê di cih de roje me û pêşketinên ku têde bûna werine bîra me. Ev hatina bîrê ji, ne şaş û xelat e. Rast e. Di serî de deme ku mirov bahse jîrîye çêker kir, mirov kare tiştên ku jiyane de di demê de bi aqil hatina afirandin û serweriya wan dike. Di sadsala me de teknolojiyê mirov karê bi teybet bêne ser ziman. Lê divêt ku mirov bêje ku mirov karê qadên zanistê yên ku î ro serdest in ji di na vê bêjê de bêne ser ziman. Aqil ji çi tê afirandin? Ji her tişte ku heya aqil tê afirandin. Hertîştê ku heya ji her yek bi serê xwe tiştêkî di jiyane de dihêne ser ziman. Di mitolojiyê de bahse xwûdayan tê kirin ku hatina dinyê û aqil kirina serê mirov de. An ji fermanak dana ku kirina ku aqil bibe û bi keve ser de. Aqil, bi teybetî jîrîya mirov di afirêne. Jîrîti ji, weke ancama pêsketine aqil, hebûne êqil dihêne ser ziman. Gotina zanebûnê bi ser xwe ku mirov hilda dest, mirov wateyeka vê bêje têde dibîne. Î ro, di roje me de bahse "sibernetik"ê tê kirin. Wate wê, di jiyane de bi pergala jiyana xwe berdeham kirin e. Têde ji, wate bizanebûn berdeham kirin, ji xwe heya. Mirov di hundurê pergala de çawa û bi çi tevger û awayê dijî, her weha karê wê ye ku kifş bike. Sibernetik, gotinaka civakî ye deme teknolojiyê ya. Her weha divêt ku mirov vê gotinê ji bi teybet bêne ser ziman. Di civaka sibernetik de, zanist bi her awayê xwe serweriyaka wê ye li berçav heya. Hebûna zanistê serdest e. Pergala ji, serdestiya wê li hemûkî heya. Têgihîştina wê ye î ro, vê dihêne ser ziman.

Di aqilê çêker de, pêşketina ku bi aqil heya têgihîştina wê bikar hanîna wê afirandinê dihêne ser ziman. Li watekî asya li Japonya robotekî weke "asimo" çêkirina wî ku karê bi hizirê û hizre bêne ser ziman û bihest ji bibe, her weha jîrîye çêker hebûne wê dihêne ser ziman. Bi wê û rewşê re û her weha yên wilo re jîrîye mirov hebûne wê serweri jiyane dibêt. Mirov di jiyana xwe de hertimî dixwezê ku bigihê astaka baş. Bi kirin û cih bê, wê yekê dixwezê. Ji ber vê yekê ji hertimî hewl dide ku aqilê bikar bêne. Bikar dihêne ji. Di roje me de bi internet û tiştên wilo re karê bêhtir aqilê xwe bi kar bêne. Di jiyana xwe ye civaknasî de ast û hunere wî zêdetir dibêt. Li jiyane hebûna pêşketinê her weha pir mazin dibêt. Pêre ji, mirov karê vê ji bêne ser ziman. **"Perwerdehiya zanebûnê"** dîtin, her weha jîrîye mirov pêş dixê û bi pêşve dibêt. Bêhtir mirov bi fahmkirine bi mejiyê mirov re mirov biser dixê. Di perwerdiye aqil de, têrker, teybetmendî, têkilî, vebir û hwd, fahmkirina wan û bi wan

re di jiyânê de li ser rewş, bûyar û hwd serwerbûna bi aqil bidest xistin, ancamaka aqil ye bijîrîya. Dem, di pêşveçûnê de hertimî her weha li gor xwe û rewşe xwe ye demî gav avêtinê ji mirov dixwezê. Bandûrkirin û bûn û sedeman, di derbarê wan de bûna xwedi zanebûn û têgihîştin, jîriye mirov radixe berçav. Di jiyânê bi plan û program bûn, bizanebûn jiyandinê dibêt.

Di roje me de gotina "civaka zanist"ê tê bi kar hanîn. Ev gotin, bi xwe re di nêzîkatî û awa de wêneyekî dihêne berçav. mirovê andamê civaka zanistê, di têkiliyê xwe de bîaqil tevdigerihê. Gavên xwe bi zanebûn diavêje û berî hertiştî ji bi zanebûn dike. Lê bizanebûn kirin ji, serweriyekê bi aqil ji mirov dixwezê. **Bîaqil serweribûn, karê jîrîyê ji mirov re di jiyânê de bêne. Ew ji bi hildanê perwerdeyeka pir baş a. Perwerdeya pir baş ji, bi pêşketina mirov re ya. Zimanê mirov ê î ro, yê deme civaka zanistê, li gor wê xwe bi afirandinê biava dike. Mêl û heste mirov, bi kijan aliyê ve ya? Ew rastî li ser sekinandin û bizanebûn hanîna ser ziman, weke xosletekê wê awayê civakê dihê holê li berçav. Di civaka zanistê de fêrbûna bi venêrîn û bivebirkirin, weke teybetmendiyek wê ye ku bi pêş dixê ya. Lê di civaka zanistê de sînore fêrbûnê û hildanê ji nîn e. Çend ku hildan bû ji, birçibûnak wê piştî her hildanê xwe bide berçav. Mirov karê her weha vê ji bêne ser ziman. Lê divêt ku mirov vê ji bêne ser ziman ku çend ku dem bi pêşveçû, wê jîrîtî serweriya wê bi têgihîştinê re zêdetir bibe. Gihîştina zanebûnê û wergere wê ye li zimên ji her weha derdikeve holê. Ev ji, weke xalaka serwerbûnê bizanebûn dihê holê. Biryardarî û girtin û wilo jînbûn, ji heya. Ew ji, weke xosletekî derdikeve pêş bi mirov re di jiyânê de. Afrînertî û afirandin, derdikeve pêş. Heste çêker ji, weke jîrîye çêker hin bi hin diafirê û derdikeve holê. Pêre di berdewame wê de mirov karê bêne ser ziman ku mejîyê çêker, bîra çêker û hwd hate ku digihê mirov diafirê û tê ser ziman. Ev hemû ancamên jîrîye çêker in. Ancamên serweriya wê ye li jiyânê ye mirov re ya. Her weha mirov karê di dawiyê vê xata xwe de vê ji bêne ser ziman. Pergal, vac, psîkolojî û hwd, diafir in û pêş dikevin û serweriya wan tê holê. Mejiyê mirov, bi afirandina bixwe re, weke ancamna wê, xwe bi ancamên xwe re di jiyânê de xwe bi bûjen dike. Bi demê re têgihîştin, vac, bi dagaran li jiyânê li gor vacaka xwe serweriya xwe dihênine holê. Di jiyana rojane de vac, hebûne wê bi kirinên mirov yên bi hev re diahangekê de dihêne holê. Bi wê jî, derkên weke derpêşkirin bivacî serweriyaka wan dibêt. ..**

Bikarhanîna vacê, di jiyana mirov de bi awayê xwe yê hizrî êdî jiyana mirov dide kifşkirin. Kar û kirinên di jiyane de, bi awayekî rewşenbîrî bi pêşve diçin. Bi vê yekê re, bi vê têgihîştinê li ser sekinandin pir girîng e. Di demên berê yên ku me bi sereke hanîna ser ziman de, ev yek her weha dihê dîtin. Jîrîya aqil, hatiya kifşkirin û pê hatiya afirandin. Çendî ku ew were kifşkirin, wê pêşketineka mazin pê were kirin. Divêt ku mirov ji vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Manî jîrî çawa bi karhanî? Berî wî Zerdeşt çawa bi karhanî? Wan bi pergala di xatekê de bi karhanî. Têgihîştina wan ye ku di demê afirî, di deme piştîre ye ku hat de bû bingeh ji pêşketina ku bû re. Mirov vê yekê her weha bi teybet dibîne. Di roje me de ji, weke ku awayekî pêşketinê ji wê hatiya derxistin û pê bi rê ve çuyin heya. Mirov wilo, ku di hizirê dibîne. Pêşketina deman ye ku di deman de bûya, her weha mazin e. Me li gor bi metafizîkî re aliyekî wê yê pêşketinê hanî ser ziman. Lê piştîre di sadsala me de, aliyê wê yê din ji, ku bi teherê re afirîya heya. Ew ji, her weha bi serê xwe xwediyê pêşketineka mazin e. Teybetmendiye wî aliyê ji, bi hev ve û ji hev hanîna li ser ziman, xala sereke ye wê ya. Bi vê yekê pêşketine wê heya.

Di roje me de, pêşketinên ku dibin, di temenê wan de hemûk ji, jîrîya aqil pêşketine wê ye ku ancaman êdî diafirêne heya. Wê ev awayê pêşketinê êdî berdewam ji bike. Bi vê yekê re pêşketin û li ser wê awayê pêşketine bi fahm kirin û têde çûnê re sekin in pir girîng dibêt. Teknoloji, ancama jîrîya aqil ye çêker e. Mirov divêt ku wê wilo bêne ser ziman. Her weha, wê wilo bi wî rengî hê gelek pêşketinên din bibin û werine holê. Bi teybetî ji, bi zanista mirov re wê di ahangekê de ev di riya xwe de berdewam bike. Minaq, genoloji, her weha mirov weke aliyekî vê yekê bêne ser ziman. Ev yek her weha pir girîng e. Di roje me de pêşketin, her weha bi wê yekê bi awayê xwe yê geometrikî bi rê ve diçêt. Di vir de, divêt ku mirov vê ji bêne ser ziman, zimanl dayikê pêşketina wê hebûne wê awayê pêşketine ji temen mirov bi serwer dike. Bi vê yekê, weke gotina dawiyê, em vê bînine ser ziman.

-VI-

ZANÎN, AZADÎ Û PÊWISTINÎ. ...

Beş yek; pirsgirêka li hevdû kirina pêşketina herîkîna jîyanî û darêjka vacê: Di serî de, dema ku em hewl bidin ku gotina azadîyê fahm bikin, divê ku em pêşî dema xwe û asta wê ya têgihîştinê ya ku hatîyê û gihiştîyê de, bi başî fahm bikin. Li vir, emê hinekî bi têgihîştinî û ankû felsefekî hewl bidin ku wê fahm bikin. Em çendî ku bahse azadîyê dikin û wê gotinê dihênina ser ziman, di serî me de, di keviyeka mejiyê de, hertimî şiqaka wê ya din jî mirov bi hîskirinê jî bê hîs dike û dibîne heya. Ew jî, ku em rastarast bînina ser ziman, wê bi gotina pêwîstîniyê re were fahm kiirn. Lê ku em ji kîjan aliyê ve jî lê diner in, di serî de, li vir, berî hertiştî, em bi têgihîştinî, divê ku têkiliya di nava van herdû gotinan de pêşî fahm bikin. Ev dîroke me ya hizir ku ew ser sê û ankû çar hezar salî re, hertimî, her yê ku bidest hizirkirinê kiriya li ser van mijaran pêşî serî li ser vê wastandîya. Bi vê yekê, kîjan alî wê derkeve li pêş, kîjan ya ku pêşî tê ya, kîjan ya ku di hiyererşîya têgihîştinê de cihê wê li pêş a, weke mijarna hem sergirtî û hem servekirî ên ku li ser wan hatîya hizir in û hatina şîrove kirin in.

Her wusa, heta roja me jî, ku bahse azadîyê hatiya kirin, gotina pêwîstîni jî, weke hevlingê wê bi wê re hatîya ser ziman. Biwê re jî, êdî bahse wê hatîya kirin. Hinekî jî, weke ku di nava kurdên berê de bi bawerî hebû di têgihîştina dûalîsmê de tiştêk, weke ku çawa ku şev û roj bêhevdû nabin, wê bê hevling û ankû ya vajî xwe wê nebê. Di vê temenê de jî, di temenê pêwîstîniyê de li gotinan hatîya nerîn. Li vir berî hertiştî ya ku mirov di serî de fahm bike, ew a ku ka em pêşî kîjan gotinê ji wan weke navend bigir in û ji wê bi ber ya din de gava xwe biavêjin û bidest hanîna li ser ziman bikin. Di serî de, di dema ku bahse azadîyê dihê kirin, pêşî pirsêk bi rengê 'çi azadî' ankû 'çawa azadî' dihê kirin. Yanî, mirov çawa dikarê bahse wê bike. Bi vî rengî, her gotinên ku hatina gotin jî, di xwe de weke kirdeyeka vêşartî, hertimî nîşanaka pirsê di mejî de bi wêneyî zindî hiştina. Bi vê yekê jî, êdî her tiştê ku em ku weke ku têde zelal bûna û me hanîna ser ziman jî, piştê dîsa ji wê xale 'ne zelaliyê' bidest gavavêtina wê hatîya kirin.

Bêgûman, her dem, li gorî xwe û têgihîştin û asta xwe ya têgihîştinî û

zanîni nêzîkatîyekê û ankû ji nû ve şîrovekirinekê dixwezê. Em vê red nakin. Lê ji wê zêdetir, li vir, pêşî weke ku pîrsgirêka teherê li ser dîtbarîya gotinê re xwe bi dîyarî dide li berçav. Ev jî, weke aliyekî din ku divê ku êdî mirov bi demê re bê û di dema wê bixwe de jî bê, divê ku mirov li ser bisekinê. LI ber azadîyê pêwîstîni, dema ku em bahse wê bikin, divê ku em dîrokekê bi serê wê û bi hemû aliyên wê re li ser gotinên ol, rewist û hwd re şîrove bike û bêne ser ziman. Ji ber ku li vir, weke ku ev weke pêwîstînyekê derdikeve li ber me.

Pêwîstîni, hertimî rengê wê bi salixkirina têgihîştinekê bi reng û lingê wê rewistî re hin bi hin ku em di farqê de jî bin û ne di farqê de jî bin, wê xwe bidest dayîna dîyarkirinê bike. Ev jî, wê hin bi hin li ser gotina rewistê re, wê hin bi hin rêgezên ku em li gorî wan bi rêzkarî bijî jî, wê bêne li ber me ku em êdî li gorî wan bijîn. Li vir, êdî li ser wê jîyane me re, salixkirina gotina pêwîstînyê, giringiya wê derdikeve li holê. Azadî jî, sînorê wê, êdî wê di nava sînorên wan rêgezên kifşkirî de wê xwe bide jîyan kirin.

Di vê çerçova ku em nûha bi vê gotina xwe ya di dawîya paragrafa li ser vê re ku ketinê de, divê ku em êdî ji wir hinekî li ser têgihîştinê re bidest hanîna li ser ziman bikin. Wusa xuya dike ku ev weke aliyekî giring ku dihê li ber me ya. Sînor, weke gotineka hevbeş êdî çawa ku çerçova wê di gotina pêwîstînyê de afirîya wê, wê di gotina azadîyê de jî êdî xwe bicih bike. Li vir, êdî wê bike ku mirov wê bijî.

Sînorê gotinê, li vir, weke ku dibê sînorê rêgezî ê ku me li jor bidîtbarî dît û kifş kir. Bi wê re jî, êdî wê ew fahm kirina wê re, wê xwe bide dîyar kirin. Lê li vir, divê ku mirov kifş bike ku azadî û pêwîstîni, weke ku li hevdû hunandî derdikevina li ber me. Em nikarin, bê yekê ya din jî fahm bikin. Çendî ku em sînorên di hundurê pêwîstînyê de kifş dikin, em wate û kirdeya gotina azadîyê jî di hundurê wê de bi têgihîştina wê ya felsefekî kifş dikin dihênina ser ziman.

Emê li vir, li ser gotina "mafê jîyanê" re vê hunandina xwe ya bigotinî bidina domandin. Ev yek, wê êdî me hin bi hin ji destpêka bûyina mirov û heta dawîya jîyanîya wî ku heta ku jîya ya, wê di çerçovê de wê were ser ziman. Di dema ku em mirov û mafê jîyanê, li vir, weke gotinaka bingihîn di temenê vê de hildina li dest û bînina ser ziman, hingî emê şîrovekirina xwe bi gotina xwe ya teybet ya "mafê jîyanê" re bidina domandin. Ev jî, weke aliyekî vê yê giring ku divê ku mirov bi wê re bêne ser ziman a.

Di dema ku piştî ku mirov hat dînyê û pêde, mafê wî û ankû wê yê

jîyanê heya ku bijî. Ev jî, weke aliyekî ku em nikarin li ser nîqaşê bidina kirin jî ya. Bi wê re jî, dema ku me bi heyîn û bûyînê re sînorê wê mafê bi gotina azadiyê re bînina ser ziman, hingî, divê ku em vê yekê ji destpêkê bidina dest pê kirin. Di serî de, di dema ku mirov di zîkê dayika xwe de, ku ew kêlîka pêşî ku dilê wî bidest avêtinê kir, hingî, ew çerçovaya mafê wî û ankû wê yê jîyanê dihê xîzkirin. Li vir, ku em nekevina nava sînorê baxtewariyê û ankû "**qadarê**" de, ku em lê diner in, em dibînin ku destpêk, li vir, bi wê re dest pê kirîya. Lê weke ku heta ku gav bi gav ew pêvajoya bûyînê hatiya wê astê, pêvajoya pêşî ya jîyanê bi wê jîyanê û destpêka wê re jî heya.

Mirov, bi têgihiştinî ku wê xwezatiya xwe di, hingî wê wê sînorê azadiya xwe jî kifş bike. Ji ber ku hinekî jî, sînorê azadiyê bi sînorê xwezatiyê re ya. Ew xwezati, biqasî ku bi wê heyîna mirov û teybetmendiyên mirov re dihê û dijî, wilqasî jî bi heyîna li dordora mirov a xwezayî û hwd re jî dihê û dijî. Ji vê aliyê ve, teybetmenditîya jîndatî û ya hewirdorî, çend ku pêwîstî pê tê dîtin ku mirov di çerçova aliyê pêşî de şîrove bike, ewçendî jî dide pêwîstkirin ku ji aliyê din ê dîyemin ve jî ku şîrove bikê û fahm bike. Her jînda, bi xoslet û teybetmendiyên wî re, dema ku em bahse wê sînorê azadiya wê dikin, di wê demê de jî, em dibînin ku bi wê zanîn û têgihiştina ku di serî de bûya re, weke dîmenekî dîyem jî bixoslet û teybetmendîbûna wê jî derketîya li holê û li gorî wê hatiya kifşkirin. Di naqabîna wê sînorê teybetmendi ê jîndatî û ê têgihiştinî de, ji dû aliyên ve ku di nava hevdu de kifşkiirîn bûya bi hevdu re..

Lê divê ku mirov jî kifş bike, ku li gorî cihê wê rêgezên têgihiştinî û ên jîndatî hevdu digirin. Ankû li hevdu tên. Minaq, dema ku em bi hizir bibêjin, ku emê berê rûyê xwe bizîvirênina bi piştî şûkra xwe, ev wê ji aliyê fizîkîya mirov re ne biderfet bê. Ji ber ku emê nikaribin berê rûyê xwe bi zîvirênina piştî şûkra xwe. Em bîaqil wê bi wêne jî bikin di serê xwe de, emê wê bi jîndayî û kirinî wê nikaribin bikin. Ji ber vê yekê, sînorê kifşkirina me, bi fizyolojikîya me ve bisînora a. Lê sînorê hizirkirina me, bi wê re ne bisînora a. Di vê temenê de, di dema ku em azadiyê di çerçova wê gotina têgihiştinê de lê bihizir in, wê di her rewşê de li ya jîndatîya mirov newê. Teybetmendîya mirov a zayînê ku bi jinê re dihê li holê jî, divê ku mirov bi vê rengî bi xoslet û teybetmendî kifş bikê û fahm bikê û li ser bisekin ê.

Du tişt û ankû alî, li vir divê ku mirov di temenê kifşkirinê de bibîne. Yek, bi jîndatî û teybetmendiya wê re ya. Ya din jî, bi hizirkirin û

têgihîştinkirina wê re ya. Bi wê re jî, divê ku em hizirkirin û têgihîştinkirina wê jî jîbîrnekin û bînina ser ziman. Weke aliyekî giring ku derdikeve li ber em jî, ew aliyê hizirkirin û têgihîştinkirinê ya. Ya ku bi me gotina azadîyê dide nîqaşkirin jî ew a. Aqilkirin û ankû hizirkirin, du gotinên jêvcûda na. Aqil kirin, bi wate xwe ya pêşî ya sereka bi derxistina hiş a. Bi wate xwe ya dûyem jî bi heyîna aqil re û bi çêbûna wê re dihê ser ziman. Li vir, li ser van aliyan ve, gelek aliyên din jî mirov dikarê wan bîne ser ziman. Hizirkirin jî, her wusa, bi fahm kirinê re ya. Ji aliyê din ve jî, bi zanebûnê re dihê ser ziman.

Dema ku em bahse têgihîştinê dikin jî, êdî em xwe nagrin û gotina azadîyê weke gotina "dualîsmê" di çerçoveyeka hizrî û têgihîştinî de wê dihênina ser ziman û li ser wê dihizir in û wê fahm dikin.

Gotina azadîyê, her wusa, li vir, weke ku me hanî ser ziman, sînorê wê bi sînorê me yê jîyanî re ya. Lê li vir, divê ku em bibêjin ku sînorê azadîya me jî, bi jîndatî, heta sînorê azadîya yê din ya li hemberê me ya. Mafê me yê azadîyê, sînorê wê, heta sînorê mafê azadîyê yê li hemberê me ya. Her wusa, sînorê wê dihê li ber me.

Ku em vê rewşê, bi gotina Fostorê re bînina ser ziman, li vir jî, rewşeka din ya teybet derdikeve li ber me. Foster, berî wê hambiriyo heya û pêşketina bi wê re weke destpêka bûyîna heyînî ya jîndatîyê jî ya. Hingî, ez jinek jî bim û ku ez biryara di derbarê jîyane xwe de bidim, wê sînorê min heta sînorê wê fostor´a di zikê min de bê. Di vê temenê de, jîyane bi hev ve girêdayî, divê ku em bahse wê bikin. Gotina jîyane bi hev ve girêdayî, li vir, em wê hîs dikin. Ew jî, êdî li ser wê hîskirinê re bi têgihîştinî xwe bi me re û di mejiyê me de dide serrû. Ew dayîna li serrû, her wusa, destûra jîyana xwe bi navê ´xwe domandina jîyanê´ re ku em lê dihizir in, dike û dikeve bîra me de.

Di jîyane de, bi temenê avakarî ê zayinê aliyê mirov ê jinê pêş dikeve. Li vir, ew alî aliyê mê ya û bi aliyê din ê nêr re hevdû temem dikin. Di wê temenê de, ew hevdû temem kirin jî, weke rêgezeka jîyanî û domandinê dihê li ber me. Di dema ku em kromozonan jî binerin, di jinan de XX a û di mêran de jî XY a. Weke destpêka pêşî, her 23´yên jinê ku bi 23´yên mêr re gihiştin hevdû û bûn 46, êdî wê weke ku di kurdî de dihê gotin wê ´gohn xwarin´ wê biafirê. Ankû bi gotinaka din jî gohn xwarin, êdî gayîn bibêt. Gayîn, yanî êdî bi hevdû re bûnê dihêne ser ziman. Di wê dema ku ew kromozon gihiştin hevdû de, êdî ew kromozona Y, wê di afirandina zayendîtîyê de weyna xwe wê bileyîzê.

Zayendîfî, her wusa, afirandina wê, weke pêwîstîniyeka jîyanî ya. Li ser wê re, zêdebûn û ankû afirandin dihê û dibêt. Du zayend, ku li hevdû hoyandî diafirin in. Ev rewşa ku du zayend ku li hevdû hoyandî û diafirin, weke destûrekê bo hemû jîndayên jîyanî jî ya. Bi hemûyan re, 'nêr' û 'mê' heya. Lê herdû zayend jî, li hevdû hoyandî na. Bi pêdîvî û pêwîstîniya wan ya ji hevdû, dijîn. Hinekî jî azadîya zayendan, bi wê hoyandina wan ya li hevdû û têkilî û teybetmendiyên wan ên zayendî re dihê li holê. ..

Bi vir ve girêdayî û ankû ji aliyê temenê bûyînê ve ku mirov bahse genetîkê jî bike, divê ku mirov bibêje ku genetîk, di her organisma û tevgerên ku hena di kifşkirina wan de, xwediyê roleka pirr giring û bingihîn a. Têkiliya her organizma ya li dervî wê re jî, bandûr û guharîna ku wê bibe jî, ev dide kirin. Gen, di dirêjbûna mirovekî de û kin mayîna mirovekî de jî rola wê bingihîn a. Di zaroktiya mirov de jî, di tendûrîstî û serdemên zaroktiyê di kifşkirina wan de kifşkirina genan bingihîn a.

Rewşên motasyonê, bi sereka bi du awayan dibin, yek ji aliyê dê û bav ve ku bi genan nexweşiyek bê û ankû teybetmendiyek bê buhurandin li zaro ya. Ji vê re "rakendî" tê gotin. Aliyê din jî, di temenê tevlibûna rêzik û ankû pêçokên genan de ya. Di DNA de, di dema ku bi hev re gayîna genan du bi du ku bû, û ku rêz û ankû tayekî din ê genan tevli wan bû, ji ber xwe hingî motasyon dibêt. Ev yek, li gorî rewşa ku heyî, dibê xelat. Ev di kodan û her wusa di proteinan de wê guharînan bi xwe re bêne. Piştî jî, di ancemê de guharîn pêk tê. Ya ku tevli bû, wê bi gena malî re wê gayînê bixwezê bike. Ev jî ku bû, wê motasyonê bi xwe re bêne.

Motasyon, di dema kopîkirinê de dibê. Ev rewş, di hemû organismayan de heya. Bi awayê, zayin û ankû bûyînê dibê. Piştî gayînê êdî zayîn dibê. Zayîn, êdî wê zêdebûnê biafirîne. Her rewşa motasyonî, wê naqandinê bi xwe re jî bide kirin. Wê bi xwe re, awa û rewşa xwe bide afirandin. Awayekê din ê ku weke motasyonê jî ew a ku gen dikin ku li gorî rewşa ku heyî bike rewşekê de ya. Yanî, êdî li gorî wê, êdî di rewşa giştî ya pêçok û ankû tayên genan de wê motasyonê bide çêkirin.

James D. Watson û Francis Crick di 1953 de, DNA kifşkirin. Rosalin Frankling, rohiya X'ê bikarhanî û melokûla wê dît ku bipêçokî û levbadayî ya. Dît ku dupêçokî ya. Bi wê, hat dît ku zanîna genetîkî di wê de vêsartîya. Du ta, ku bi hev re hevling in. Lê her rêza ta, dikarê xwe bixwe jî biafirîne. Genên di kromozonê de jî, bixwezê xwediyê wê teybetmendîya gayîn û zayînê na. Li gorî wê, rastkirin û têgihiştina wan

bi rêzikê re heya. Ev gen, teybetmendiya wan ya cudabûn, rastkirin, awagirtin û hwd, heya. Di hundurê kromozonê de, bi hev re gayînê nakin. Lê cih diguharênin bi genên din re. Bi wê li hevdû cih guharandinê re, temenê afirîn û beşbûna şaneyê jî didin çêkirin.

Destpêka bi 'fostorê' û nêzîkatî..

Beş du; di çerçoveya darêjka vacê de li herîkîna jîyanî nerîn: Ji berkirina zarokan, dema ku jinek bi haml bû û ku nexwest ku ew zaroya ku di zikê wê de bû ku bêne dinyê, hingî wê ji ber xwe dike. Di kurdî de jê re tê gotin "**ji(ê) kirina zarokê" û ankû "ji ber girtina zarokê"** ya. Bo jiberkirina zarokê, heta roja me jî, li her welatê dinyê, nîqaş hena. Weke mijaraka felsefîkî jî hatîya dîtin û fîlosofan li ser hizrên xwe hanîna ser ziman.

Bi teybetî di dema ku fîlosofan hizrên xwe de hanîna ser ziman jî, di çerçovaya du mijaran de hanîna ser ziman. Mijara pêşî weke mijare "mafê jîyanê" hatîya ser ziman. Yê ku di zikê dayikê de bû, li çend ku hê "**cênî**" û ankû "**fostor**" bê jî, li ser nîqaş hatina kirin. Piştî jî, weke mijara duyemîn, ji aliyê rewîst û ankû ahlaqê ve li ser nîqaş hatina meşandin. Di vê çerçovaya mijara duyemîn de, di ancama nîqaşên ku bûna de, di destûrên welatan de zagonên ji zarok ji bergirtin û ên maf ne dayîna ji ber girtinê hatina bicih kirin. Minaq, weke mijareka ku bi vê destûran re tê kifşkirin ku ew a ku zarok di zik de çend hefteyî ya. Ku zaro derketibê ser hefteya 12'an re êdî tu nayê hildan.

Di rewşên ku herî zêde weke sedema zarok ji ber girtinê ku hatina kifşkirin, 'Yek, ku ji aliyê deronî ve, ku nexweyîyê deronîyek bê, weke 'xale duyemîn' jî; ku rewşa jinê xirab bê û nikaribê lê binerê ku nexweşiyên wê yên pirr giran hebin. Xal sêyemîn, ku dema ku were kifşkirin ku dema ku zarok were dinyê wê xareteyeka pirr mazin ku ji bo dayikê çêbike û ankû ku ji bo zaro werine afirandin. ... Ev xatera ku di ancama wê de jîyane dayikê bikeve telûkeya mirinê de. .. Di ancama tezewûzê û ankû têtîliya xizmê ku di nava malê de ku bi haml mabê. Weke van rewşan rewşên ku hena, weke rewşna ku sedem hatina dîyar kirin in.

Weke mijareka civakên hemdem, ku ji aliyê ahlaqî û mafê jîyanê ve hatîya kirin. Di roja me de jî, ji aliyê akadîmîkî ve hê jî, ev nîqaş tê kirin. Heta roja me jî, di nava hizrên ku di vî warî de tên ser ziman, di nava wan de yekbûn ne afirîya. Ji aliyê ahlaqî ve, li ser ji ber girtina zarokê, pirr danûstandin di nava

rewşenbîr, filosof û hwd, hemû dordorên akademîkî de dibêt. Bi vê yekê, li ser vê mijarê, di demên berê de jî. hizir hatina ser ziman. Bi teybetî, ji aliyê olî ve çawa tê dîtin? Ev pirs jî, weke pirsêka pîrr giring ya ku van nîqaşan ji binî ve dide kifşkirin a. Di nava nêzîkatîya rewîstî û mafê jîyanê de, hertimî ev nîqaş çûna û hatina, lê bûna. Di gelek mijaran de, ev herdu mijar bi hevdu re ketina nava nakokîyê de jî. ..

Ji aliyê mafê jîyanê ve, dema ku nîqaş dibin, bi teybetî, lê tê nerîn ku ka zaroka ku bûya ku hê 'fostor' a, di wê de jîyan heya û ankû nîn a. Ev weke sedemeka ku di vê temenê de lê tê lêgerîn a. Sedema düyemin jî, ew a ku dema ku ew zaro hat hildan ku mafê wî zaroyî yê jîyanê ji destê wî tê girtin a. Di temenê "ku ti kesek nikarê mafê ti kesekî ê jîyanê ji destê wî bigrê" de, nêzîkatî tê kirin û li vir êdî temenê nîqaşkirin û gengêşîyê diafirê.

Zarok, ji dayikê dibê. Jin, wê tene dinyê. Di vê temenê de, weke teybetmendiyeka jinê hatîya dîtin, hanîna zarokan li dinyê. Ji aliyê rewîstî ve, di olan û hwd de jî, ev bi awayekî pîrozî jî tê ser ziman. Heta 'roja me, ji pîrr aliyên ve nêzîkatî li vê mijarê hatîya kirin. Lê weke mijareka ku hê jî li ser nîqaş tên kirin. Di çerçova jîyane mirov a demê û hemdem de jî nêzîkatî lê tê kirin. Gelek komelên jinan ên feminîst ava bûna û hertimî di temenê parastina mafê jinê de nêzîk bûna. Wan jî, gotîya ku "bila jin bixwe wê biryarê bide. Maf, mafê wê ya. Mafê wê ye ku biryarê li ser laşê xwe bide heya."

Li kurdistanê, komelên jinan bi dirîşma "em, mafê me heya ku li ser laşê xwe biryarê bidin" xwepêşandin hatina li darxistin. Bi teybetî, piştî ku çend jin rastî tecewûzê hatin, piştî nîqaş bi wê ve girêdayî dest pê kirin. Keçika ku rastî tecewûzê hatî, ji doktor xwestibû ku zaroka di zikê wê de newêne dinyê. Ji doktor re, gotibû ku di ancama tecewûzê de bûya. Lê piştî ku li wê ne hatibû guhdar kirin, êdî di nava civakê de nîqaş li ser mijarê bûn.

Bi teybetî, ev mijar, hinekî jî bi têngîhiştina zayendî û pêşketina wê ve girêdayî jî hin bi hin di nava civakê de bêhtirî êdî tê nîqaş kirin. Civake kurd jî, rêgez û destûrên xwe yên hemdem diafirênê û pêş dikeve. Bi wê re jî, di wê çerçova hemdemîya xwe ya demî de, êdî nîqaş di nava wê de jî dibin. Mafê jinan, di destûrê de li gorî xwestekên wan bicih kirin, wê weke mijareka din ya ku bi mijarê ve girêdayî tê nîqaş kirin a. Yanî di temenê maf de lê tê nerîn û nîqaş kirin.

Ev mijare pîrr nezîk û xesas, divê ku mirov bibêje ku di serî de, di dema ku bahse maf hatkirin, hingî, wê rêgez û destûrên wê yên bingihîn

çi bin? Li vir, berî hertiştî, divê ku em bibêjin ku heta roja me, pêşketin bi pergale olî û nirxên wê bûya. Li gorî wê jî, biryarên di vî warî de jî weke gelek warên din hatina girtin. Li vir, dema ku em em bahse maf bikin, di serî de, divê ku em jinê, weke jîndaya ku bi maf û azad ku karibê li ser laşê xwe bibe xwediyê gotinê wê bêne ser ziman. Ev yek, weke xal û destûra jîndayî ya sereka ku divê ku mirov wê herê bike ya. Lê bi herêkirina vê re, mijar negihijê çareserîyê. Bi wê re, di serî de, ku di temenê wê de ku divê ku ji aliyê rewîstî û derûnî ve ku karibê bibe bersiv di nava civatê de, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya.

Bi teybetî, li vir, di dema ku di têkiliyena zayendî ku ne bixwestekê ku hatîya kirin ku li gorî wê zaro bû di zik de, li vir, mirov nikarê bi tememî bibêje ku divê ku ew were jiberkirin. Bi teybetî, piştî bûyînê û afirîna zaro û bi gîyan bûna wê û ankû wî re, êdî mafê wê yê jîyanê heya. Weke xale sereka, ku weke mafê jîyanê ê wî zaroyî dihê li ber me, ev dibêt. Lê ji aliyê rewîstî ve, ku dema ku em li mijarê biner in, divê ku em bibêjin ku ji pîr aliyên mijarê ve divê ku em lê biner in. Bi teybetî, ku em ji aliyê jîna ku bi darêzorê bi wê re têkilî hatîya danîn û ankû rastî tecewûzê hatîya, bi serê xwe di mejiyê wê de weke pîrsgirêkeka rewîstî disekinê. Ew bixwe jî, wê herê nakê. Ji aliyê herêkirinê ve, mejiyê mirov bixwe jî, dema ku ne pejirend, li dijî wê, êdî di temenê ne pejirendinê de afirandinê dike. Bi wê re jî, temenê wê afirandinê û rêgezên ku li gorî wan afirandin dibê jî, awayê civatî û rêgezên wê ên ku li jîyanê hena na.

Ku mirov ji aliyê derûnî û rewîstî ve nêzî mijarê dibê, mirov rastî awayekî din jî bitêgihîştinî ê rêgezî tê. Lê dema ku em ji aliyê bîolojikî ve nêz dibe, dîsa bi heman rengî em rastî rewşeka din ya ku bi tememî cûda ya tê. Li vir, hem rewşa bi nêzîkatîya bîolojikî ve tê li holê li berçav û ya ku bi derûnî û rewîstî re dihê li holê li berçav, li ser nelevkiirna wan ya bi hev re, êdî nakokîya jîyanî di temenê xwestek û ne xwestekê de li ser jîyanê wî fîstorê dest pê dike. Berî Fîstorê Embirîyo ya. Di wê dema Embirîyo de, bi tememî gîyan û jîyan di wê de bicih nebûya. Lê heyînek li holê diafirê. Di vê çerçovê de, mijare herî giring ku mirov ji kîjan aliyê ve nêz bibe? Ji aliyê nebûna gîyan û jîyanê ve? Û ankû, ji aliyê heyîn û bûyîn û afirîna embirîyo ve? Li vir jî, di serî de, du nêzîkatîyên jêvcuda derdikevina li holê li ber mirov.

**Jînda û pîrsgirêka nêzîkatîyê û ankû rewîstê ...
Beş sê; tangesîya darêjkê ku ji cemidîna wê ya di demê de tê: Di**

nêzîkatîya li jînda de, bi teybetî weke pîrsgirêkeka giring ku ji aliyê rewîstî ve li ser tê nîqaşkirin ku ew nêzîkatîya li wî û nêzîkatîya wî bixwe ku were kifşkirin, weke mijareka giring derdikeve li ber me. Her wusa, di dema ku em nêzîkatîyê li rewşê û hwd bikin, wê ast û rada me çî bê'? ji kîjan xalê emê gavê biavêjin? Weke pirsna giring ku ji aliyê rewîstî ve ji wate wan bi giringiyeka mazin hena na. Bi wê re jî, rewşê bi rewşê re bênina ser ziman. Ev nêzîkatî, piştîre jî, gelek aliyên wê hatina pêşxistin. Piştîre, di nava nêzîkatîya de hat bicih kirin.

Bi teybetî, divê ku em rewîstê, bi du beşan bênina ser ziman. Yek, weke beşa pêşî ku em li rewşan binerin û ji wan rêgezên lê ku bi wê nêzîkatî were kirin ku kifş bikin. Her wusa nêzîkatîyên û ankû rêgezên rewîstî ên kifşkirî, divê ku em bahse wan bikin. Di dema ku em bahse yên ku hatina kifşkirin bikin, divê ku em bi dîrokê re, herina destpêka pêşketina şariştaniyên ku pêşketina û bi wan re dem bi dem bi wan re û dîrok ûû hizir û awayên wan ê pêşketinê re bênina ser ziman. Ev wê, weke aliyekî giring ku wê derkeve li ber me. Ev alî, bi teybetî, divê ku em bibêjin ku xwediya dîrokeka pîrr dem dirêj a. ..

Lê jîyan, bi ya ku hatî jînkirin re mirov nikarê tenê wê bêne ser ziman. Ji wê zêdetir, jîyan, didomê. Bo vê yekê, divê ku em hinekî li ser wê domandina wê û pêwîstîyên kifşkirina wê hinekî jî bihizir in. Ev yek, weke aliyekî din derdikeve li ber me. Pîrsgirêk, hertimî, di dema ku em di temenê rêgezên rewîstî ên hatina hatina kifşkirin de ku em nêzî jîyanê dibin, em hingî rastî pîrsgirêkan tên. Bi wê re jî, pîrsgirêk, di serî de, di wê ne levkirina rewşan û rêgezên ku hena de, aliyê ku di temenê wê gotina pîrsgirêkê de dihê ser ziman a.

Nêzîkatî, berî hertiştî, di dema ku em lê bihizir in, divê ku em çend pirsna di temenê nêzîkatîya wê ya bi awayê rewîstî re ku bi pirsin hena. **"çî baş a?", "çî ya ew?", "divê ku mirov çawa lê nêzîkatîyê bike?"** û hwd, çend ji wan pirsên ku divê ku mirov li wan binerê û bipirsê na.

Her nêzîkatî, di aslê xwe de, keseyetî ya. Lê bi civatî re ew nêzîkatîya keseyetî, dikarê bibe malê pîrr keseyetan û ya civatî. Lê ev rewş jî, wê rewşa tekakesî ya bi nêzîkatîyê re red nakê. Î ro, dema ku ez tiştêkî bikim û ku ji bo min ew tişt pîrr baş bê, heya ku ji bo mirovekî din ne baş bê. Heya ku tiştê ku di wê nêzîkatîyê de ji bo min baş ku tê dîtin û fahm kirin ku ji bo yê din baş newê dîtin û nebê baş. Ev rewş jî bo me hemûyan wusa ya. Her çend ku em dijîn bi jîyane xwe re, ev rewş, bêhtirî wate û giringiya wê derdikeve li pêş.

Lê aliyê din jî, her wusa, weke ku me li jor hanî ser ziman ku **'tiştê ku**

ji bo min baş bê ku ji bo yekî din ne baş bê´, bi wê re nêzîkatîya vacî û ankû matîqî, weke giringiya wê ya ji aliyekî din ve derdikeve li holê û dihê li berçav. Li vir, vac, di nêzîkatîyan de li wê lêgerîn, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov bi teybetî li ser wan bihizirê na. Levkirina nêzîkatîya û her wusa, nêzîkatîya bi vacê, li vir, ne tenê bi nêzîkatîyekê re dihên li holê û hena. Ji wê zêdetir bi pirr nêzîkatîyan re hena. Lê di temen de, ku weke nêzîkatîyekê vac ku mirov wê weke teherekê li berçav girt, hingî jî, dîsa ew nêzîkbûna vacî, ne tenê li ser nêzîkatîyê re xwe dîyar bike. Her wusa, wê li ser rengê têgihîştinê re wê xwe bide dîyar kirin.

Pirsgirêka vacê, weke pirsgirêkeka ku divê ku mirov bi teybetî wê hilde li dest a. Li vir, dema ku em wê hildina li dest jî, bi nêzîkatîyê re, têgihîştin, awayê hizirkirin û ankû zanînê û hwd jî, weke aliyê wê, teybetmendiyê wê û hwd derdikevina li holê. Ku em vê rewşê, her wusa bi vacê re hildina li dest, emê di vê temenê de û di temenê vê de, bigiringiyekê bibina xwediyê nêzîkatîyê.

Li vir, nêzîkatîya li Fostorê û hwd jî, li vir, di dema ku em wê hildina li dest, ji sê aliyên ve nêzîkatî di temenê pirsgirêktîyê derdikeve li holê. Yek, bi awayê wê yê levkirina nêzîkatîya û hwd, aliyê duyemîn bi vacê û rewşê re ya û aliyê sêyemîn jî bi hêst û mela dayikê û hwd re ya. Divê ku em bibêjin ku ev aliyê sêyemîn, di pirr rewşan de dikarê weke nêzîkatî û bi teybetmendî derdikeve li ber mirov. Fostor, hê ku berî ku bibe fostor û hê ku embiriyo ya, di wê demê de, tenê weke heyînekê ku bûyî heya. Lê laş wê dibîne û nas dike. Hêstan di derbarê wê de diafirêne. Piştî ku bi tememî hat zanîn û ew heyîn derket li ser hiş, hingî jî, wê ew hêst bi têgihîştin bibin û bi ber ku bibina hin raman û ankû ramanîyên xwe bi afirênin de wê herin. ..

Lê di dema ku bû fostor û piştî pêvajoyaka wê fostorîyê ku bi gîyan û ankû jîyan bû jî, êdî divê ku mirov ji aliyê wê ve jî lê bihizirê. Hingî, di temenê vaca jîyanî û mafîtîya wê ya bi heyîniyê re, êdî ew bi xwestin derdikeve li ber mirov. Her jînda bo ku bijî, di nava hewldanê de ya. Di dema ku em morîyekî jî, bênina berçav, ku dema ku em bi serde herin, ew hîs û ajoya wê ji jîndatîya wê tê, wê bikeve dewrê de û wê bike ku ew xwe bi rewşa parastinê de. Ev rewş, bi xwestina jîyanê re diafirê û dihê li holê. ..

Mafê jîyanê, bi têgihîştinî û ankû rewîstî, heyîn û ankû biolojîkî, jîyanî û ankû rewşî, nêzîkatîyê ji mirov dixwezê. Di temenê vê de, bi teybetî zanîn û hişê jîndayî heya. Hişê jîndayî, weke kirdeyeka vêşarî di nava

hemû gotin û tevgerên jîyanî de heya.

Di çerçova rewşê de, ku em li rewîstê dinerin, divê ku em bibêjin ku weke nirxeka ku em pêşî li gorî wê di wê de darazê bikin tûna ya. Rewş, bixwe, weke ku dibê ew nirx di darazandinê de. Li vir, di dema ku mirov li rewşê nerî, hingî rewş, çawa bûya û pêşveçûya, bi çi rengî pêşveçûya û bi kîjan tiştan pêşveçûya, weke aliyên ku pêşî mirov li berçav bigrê na. Lê dema ku em li gorî nirxekî şîrove bikin, minaq, weke ku di welatekî de destûr heya û berê hatîya nivîsandin û li gorî wê wê daraza li ser rewşna nû ên ku bûna re bibe, hingî mirov dikarê bahse wê nirxa ku li ser re daraz were kirin. Di vê temenê de, di dema ku bahse mafê jîyanê jî bê kirin, weke mafekî ku ji heyînî tê ya. Bi wê re jî, ew maf û ankû mafîtîya jîyanî, weke gotinaka dervî demê dihê li ber me bi heyîna jînda re.

Di rewşa de ku dema ku **mîrov** birçî bû de, mirov pêwîsta ku bo ku bijî wê xwarinê bixwê. Ev, weke aliyekî rewşê ê rewîstî jî bi xwe re dihêne li holê. Xwarin, weke ancama rewîstî jî heya. Lê ajoyî jî ya. Ev ancama ku bi xwarinê re dihê li berçav, gotina jîyanê ji xwe re dike sedem. Ankû, ji aliyê nêzîkatîyê ve, tiştta ku em ji zaroyekî di jîyanê de bi kirinê re hêvî dikin, ne weke ya ji ya mirovekî mazin a. Nêzîkatîya li herdûyan cuda ya. Ankû, dema ku em li ser teybetmendiyên zayendî ve bêne ser ziman, nêzîkatîya li jinekê nabê weke ya li mêrekî û nêzîkatîya li mêrekî jî nabê weke ya li jinekî. Ji ber ku herdu jî, hem ji aliyê derûnî û hem jî ji aliyê biolojîkî ve jecuda na û xwediyê teybetmendiyên jîndayî û zayendî ên jecuda na. Di dema ku em nêzîkatîya li zaroyekê û ya li mirovekî mazin bike yek û dema ku mirov nêzîkatîya li jinê û ya li mêr bike wek hevdû, wê ji aliyê fîzyolojîkî ve jî nebê rast. Hinekî jî vac û ankû mantiq, li ser li ser vê re xwediyê nêzkatîyaka lêhatîbûnê ya bi teybetmendiyên re ku dihêne li holê ku divê ku mirov li gorî wê tevbigerihe. ..

Di dema ku em minaq, jin û mêrê, bi nirxî weke hevdû şîrove bikin û wekehevdû li wan nêzîkatîyê bikin di temenê ku jin jî û mêr jî, hêjatî û nirxîtiya wan wekhevdû heya, ev aliyekî cûda ê ku rast a. Ev, nayê wê wate ku jin jî û mêr jî, xwediyê xosletên heyînî ên weke hevdû na. Lê her xoslet jî, bi reng û nirx û hêjatîya xwe heya. Ji aliyê rewstî ve, ku an jin li ser mêr re were dîtin û ankû mêr li ser jinê re were dîtin çendî xelat û şaş a, her wusa ewçendî jî di temenê fîzyolojîkî de kirina wekehevdû ji aliyê xosletan ve xelat û şaş a. Her jînda, ku jin û mêr jî yek bi yek di nav de, li gorî xwezaya xwe nêzkatî û hêjatîyê maf dike. Lê ev mafkirina li gorî xwe û xwezatiya xwe, ji aliyê rewîstî ve nikarê bide nîşandin ku jin li ser mêr re ya û ankû mêr li ser jinê re ya.

Mirovê ku dihizirê û xwedî aqila, bi heywanekî ku ne hizirê û aqilê pêre tûna ya re nabê yek û ankû wekhevdu: Her wusa, di temenê vacê de ev yek wusa ya. Di vê temenê de aliyê vacî ê dîtarî ku dihê dîtin, li ser teybetmendiyên zayendî, jîndayî û hwd re ya. Bi wê re jî, di rewşan û nêzîkatîyan de jî, bi heman rengî, nêzîkatîya vacî xwediyê wate û heyîn û giringiyê ya.

Di dema ku jinek bi haml bê û ku dema ku were kifşkirin ji aiiyê doktor ve ku zarok were dunyê wê dayik jîyane xwe ji dest bide, li vir, di naqabîna jîyaneka ku dijî û jîyaneka ku wê were li jîyanê de biryarê dide. Li vir, dayîna, vê biryarê, jîyane pêşî ya dayikê ku dijî, parastina wê ya. Her wusa, li ser wê re biryar dihê dayîn. ..

Li vir, dema ku em bahse rewîstê bikin, weke ku me li jor jî hanî ser ziman, divê ku em di du temenan de bînina ser ziman. Lê li vir, di dema ku em di du temenan de bînina ser ziman, divê ku em li vir, di temenê hin rêgezna de bînina ser ziman. Lê di temenê handarîyê de mirov, ji aliyê hêst, raman, mêl, xwestek û hwd de lê hatîya girêdan bo pêkhanîne û ankû bi serkevtinê. ...

Di dema ku di derbarê jiberkirina zaroyekê li ser xwestina dayikê, hingî ev aliyên weke hêst, raman, mêl û xwestek û hwd jî dihên ser ziman. Lê li vir, çendî ku mirov di wê derbarê de, ew biryar dabê jî, di mejiyê xwe de, hertimî dihizirê û heta ku dibê ku wê heta dawîya jîyane xwe ji bîr nekê û hertimî wê di temenê darazakê de di serî de wê hebê û wê mirov di serê xwe de li ser bihizirê. Li vir, mirov nikarê tenê wê ne jibîrkinê û ankû hertimî di serê xwe de li ser meşandina darazê tenê bi nirxên ku berê hatina jîyîn re bêne ser ziman. Ji wê zêdetir, hinekî jî, aliyekî fîzyolojikî heya ku di mejî de, hertimî li dijî wê rewşê dijberîya xwe dide nîşandin. Ya ku dibê temenê daraza dayîmî heta dawîya jîyanê wê jî, ev a. Fostor, berî wê ku ew embiriyo bû, piştî bû fostor, ew di wê zikê wê dayikê de bû. Ew pêvajoyên ku li ser wê bûyînê re ku buhurîna, temenê wê aliyê fîzyolojikî jî diafirênin. Lê bi vê aliyê re jî, nirxandinên keseyetî ên dayikê jî hena. ..

Refaransên Civatê ên rewîstî

Beş çar; çerçoveya jîrî di jîyanê de: Di dema ku em li civate kurd dinerin, ji aliyê refaransên rewîstî ve, em bi sereke weke bingihîn du xalan dibînin. Refaransê pêşî, li ser kevneşopîyê re, fêr û cerbên dîrokên ên demên berê ku hatina jîn kirin bi jîyane civatî re ya. Her wusa, weke xale duyemîn jî, em divê ku pêşketina pergali ya olê li berçav bigrin. Lê

hertimî jî xale pêşî serdest bûya. Bo vê yekê, dema ku bi teybetî li kurdistanê, bahse rewîstî bikin û hewl bidin ku wê fahm bikin, divê ku em bi teybetî bi dîrokê re kevneşopîyan pîrr baş fahm bikin. Ol, rêgezên wê ên ku weke rewîstî ku mirov wan bêne ser ziman, weke xalna ku di temenê wan de dîsa ev kifşkirin hena na. Lê ev xal, bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku di dema kifşkirina wan de, pêşî, 'ya xirab' û ankû 'ya ne baş' ku hatîya dîtin, kifşkirin û li ber wê ya rast çîya ew hatîya ser ziman. Li ser wê re jî, **'rewîsta baş'** bi rêgezî ji wê rewşê hatîya afirandin.

Li kurdistanê, bi teybetî, ol û pergaliya wê, ku em bahse wê bikin, divê ku em bahse dîrokeka dirêj bi wê re bikin. Dîroka yek-xwûdayîtîyê bi ola êzdatiyê re dest pê dike. Piştî, cihûtî, filehîtî û îslemiyetî têt. Ev ol jî, piştî hatina, li wê qanciya ku ola pêşî kifşkirîya nerîna û qanciya xwe ya ku wê rewîstîya wê biafirêne û piştî temenê xwe yê hizrî û rewîstî afirandina. Li vir ol, dema ku em bahse wê bikin, divê ku em rengê pêşketina wê, çend ku ji temen û referansên wê yên bingîhîn ve divê ku ji wê fêrî û cerba kevneşopîyê bînina ser ziman jî, em divê ku wê bi serê wê weke pergaleka hemdem ku bi gotinên xwe pêşketina xwe dide çê kirin. Gotinên xwe, tenê dike ku temenê wan dêne ser hin dîrok û kevneşopîyna.

Civat, çend ku bi ber demên xwe yên pêş ve diçêt, her wusa, êdî rewşên ku ew li berçav bigrê pîrr dibin. Her wusa, gelek rewşên ku bi rewîstî lê binerê jî pîrr dibin. Gotina rewîstî, li vir, weke gotinaka bi pîrr alî ku divêt ku were fahm kirin a. Bi teybetî, di nava jîyane civatî ya demên pêşketî de, çend ku ji rewşan fêr girtin û ji wan gihiştina nerînen rewîstî wê bibêt, her wusa, nîrxên civatê ên dîrokî û kevneşopîya wê ya demên buhurî re jî, wê were ber mirov û gavavêtinan bide kifşkirin.

Civate kurd, bi teybetî, di demên xwe yên dawiyê de bi gotina "redkirinê" re li gelek kevneşopîyên xwe nerî û bi wê re li cihê wan û ku li gorî demê wê çî dêne li cihê wan, bi nêzîkatîya felsefî ya civatî kifş kir. Rewşên ku berê hatina jîn kirin, ku êdî weke destûrna giştî jîyane demê kifş dikin, cihê wan bi rêgezên nû ên demî ku hatina kifşkirin re dagirt. Bi wê re jî, awayê xwe yê civatî ji nû ve afirand.

Lê divê ku mirov ji bîr nekê ku her dem û rewş, di demên piştî xwe re weke kevneşopî derdikevina ber mirov. Ya afirîna kevneşopîyê, weke destûreka bingîhîn ya civatî bixwe dike jî ev a. Mirov nikarê kevneşopîyê bi tememî înkâr bike. Lê mirov dikarê wan bi rastîya wan re kifş bike û li gorî demê bi wate bike. Her wusa, an jî ku, mirov karê li gorî nîrx û têgihiştina demî wate kirinê li wan bike. Ev biwate kirin, çend ku bi navê

wê kevneşopîyê jî bê, wê bi darêjka wê kevneşopîya dema berê ku hatî formula kirin, wê têgihiştina dema nû bê.

Di demên berê de jî, mijare jiberkirina zaroka bûya. Bi destên 'pîrkan' ev hatîya kirin. Gelek metodên ku hatina bikar hanîn hena. Ji ber vê yekê, gotinên weke "jiberçûnê", "jiberkirinê" û hwd afirîna û hatina ser ziman. Gotina jiberçûnê, di dema ku zaroya jinê berî dema wê were dunyê û piştê jîyane xwe winda bike jî dihêne ser ziman. Lê gotina jiberkirinê, bi teybetî, dihêne ser ziman ku dema yek bixwesteka xwe bixwezê ku zaroka wê newê dunyê û neji û êdî ew were hildan ji zikê wê, dihêne ser ziman. ..

Di demên berê de, di dema bahse zarokan û hatina wan ya dunyê dihatkirin, bi teybetî, gotinaka "meşrûtiyê" ku piştê di olan de jî bikevneşopîya wê re bicih ya û ku temenê wê gotina "meşrûtiyê" bi gotina "mahrê" û ankû ya "zawacê" re ku di hat afirandin hebû. Ev gotin, bi teybetî, bi heman rengî temenê gotina malbatitiyê jî dihêne ser ziman. "Zaroya ku dervî mahrê ku bû", bahse wê dihê kirin. Ev zaro, weke "zaroya zinayê" jî hatîya bi navkirin û meşrûtiya wê zaroyê hertimî di nava civatê de lê hatîya lêpirsin. Ankû, ew zaro ne hatîya herê kirin bi hebûna xwe re. Jê re, gotina "piç" jî hatîya bikarhanîn.

Di vê temenê de, gotina mahrê û ya meşrûtiyê, di hevdû de ku xwediyên têgihiştina di hevdû de na û hevdû dikin in. Weke nirxeka jîyane civatî jî, ev hatîya dîtin. Ku dema ku em gotina 'rewîstê' bi jîyane civatê re bînina ser ziman, em divê ku bibêjin ku mirov bibêje ku gotinên weke 'meşrûtiyê', di temenê ku dihên ser ziman de bi jîyane civatî re, bi rewîstî xwediyê hevbeşîya civatî ya jîyanî ya. Di nava jîyane civatî de, ew gotina ku me li jor hanî ser ziman ya "rewîst, tekakesî ya", li vir, bi jîyane civatî re digihîjê asta din. Yanî, êdî divê ku em hem bi keseyetîyê û tekakesetîya wê re û hem jî bi jîyane civatî re bi serê xwe bînina ser ziman. Ev gotin, bi vî rengî, ku bi yek bi rengê jîyane civatî bê û yek bi keseyetîyê û tekakesetîya wê bê, xwediyê awayekî dudîmenî ya. Li vir, ev jî, derdikeve li holê, ku her rêgeza rewîstî ku em weke ya tekakesî bînina ser ziman jî, weke dîmenekî wê yê dîyemin, û ankû aliyê wê yê ku bi hevbeşîya civatî re dihê li holê heya. Yanî, êdî bi tenê bi serê xwe civatî û ankû tenê bi tekakesî nayê ser ziman.

Herwusa, di mijare jînê û jîyane wê de jî, rewşeka pîrr giring ya ku em divê ku weke minaq ku dikarin li vir bînina ser ziman heya. Minaq, di nava civatê de, "jin, hertimî li malê xwarinê çê dike", "jin, dayik a," "jin,

mêrê wê heya û divê ku li gorî wê bijî" û hwd, ku em dikarin gelek gotinên din ên weke vê bînina ser ziman hena. Ev gotin, ku di temenê wan de derûnîyeka pirr xort ya bifêr ku hena, weke rewîstna civatî ên bi kevneşopî jî pêşketina. Minaq, gotina ku me li jor di dawiyê de hanî ser ziman ya bi rengê "jin, mêrê wê heya û divê ku li gorî wê bijî", di demên berê de bi rengê "jin, xwedî mala û divê ku li male xwe binerê" bû. Lê piştire, ev hatîya guharandin. Ev guharandinên ku pêşî bi gotinên piçûk dihên kirin û piştire ku weke kevneşopîyana civatî pêş dikevin, wê weke rêgez û ankû destûrên jîyanî êdî rengê wan bistênin û jîyanê bidina kifşkirin.

Jina kurd, di nava civate de berê kifşkar bû. Piştire jî, di nava civate kurd de jin û ankû dayik, ew kifşkarîya wê ya ku heyî, winda dike ji dest. Li vir, di vê windakirinê de du tişt pirr giringî weke sedem divê ku mirov wê bêne ser ziman. Yek, windabûna serdestîya civatî û ya din jî, hewldane tişkirina wê valahiya bi windakirina wê serdestiyê re ku bi hêza mêr re dihê xwestin ku were tişt kirin. Yanî li vir azadîya civatê û ya jinê, weke ku bi hev ve girêdayî ya ji navikê ve. ..

Di rewşên weha de, ku serdestîya civatî hat windakirin, derfeta guharandina kevneşopîyan û ankû li gorî demê nûkirina wan ji dest diçêt. Êdî, tenê li gorî yê ku afirîna û hena jîyan kirin, weke rêgez û destûreka xwe domandina civatî jî dihê dîtin. Ev rewş, di jîyane kurdan de pirr xort afirîya. Ji ber vê yekê, di demên ku li ser wê jîyandina li gorî wê kevneşopîyê ku buhurîna re, êdî girêdan pirr xort dibêt. Yê ku derketina dervî wê, weke xîyanetekê li jîyane civatî jî êdî dihê dîtin. Ev hişkbûn, wê xwe di her beşên din ên jîyane de jî bide dîyar kirin. Herwusa, di mijare jînê û kevneşopîyên wê û kevneşopîyên ku bi wê re dihên ser ziman de, wê hê zêdetir xwe bide dîyar kirin.

Kevneşopîya malbatîyê, li vir divê ku mirov hinekî li ser wê rawastihê. Ji ber ku ev pirr giring a. Hemû rewşên bi jinê re di nava wê rewşa malbatî de dihê kirin. Bi teybetî, ew civate ku serdestîya xwe windakir, wê di kifşkirin û nûkirina kevneşopîyên xwe yê malbatî de jî, wê mafê xwe winda bike. Ev rewş, wê hin bi hin hişkbûnê bi xwe re bêne. Hişkbûn, ji du sedeman pêk tê. Yek, bi demeka dirêj bi heman kevneşopîyê re jîyandinê tê. Ya din jî, ew rewşa ku heyî, ji sedema parastina wê tê. Her wusa, ev herdû, sedem jî, di temenê wan de kevneşopî hena. Kevneşopî, di dema ku civat serdestê xwe bê, xwedîyê hêzeka pirr mazin ya xwe nûkirin û peresendinê ya bi jîyane civatî re ya.

Heta ku ez dikarim bêjim ku bi serdestîya civatî re, guharîna herî zêde û ya mazin, bi kevneşopîyê re diafirê. Hişkbûn û muhafazakari, kengî di kevneşopîyan de rûdidê, kengî ku civatê serdestîya xwe winda kir û êdî ku bi wê windakirinê re ku mafê pêşketinê a di nava xwe de ji dest ravand, dibê.

Di nava jîyane civatî de, "rewîst û nirxên wê yên herêkirinê, destûrên wê yên jîyandinê û derfetên jîyandinê jî diafirênin li gorî xwe. Kifşkirina meşrûtîyekê di jîyane de, weke aliyekî vê pirsgirêkê ku li ser nirxên rewîstî re dihê li holê ya." Meşrûtîya, zaroyên ku di hundurê mahrê de ku bûna" û "ne meşrûtîya zaroyên ku dervî mahrê ku bûna" jî, divê ku mirov li vir, di vê çerçovê de lê binerê û wê fahm bike.

Di civatê de rewîst, ku referansên ku di temenê pêşketina rewîstîtiya xwe de, di dema ku ji fêr û cerba berê bê, wê hingê, kevneşopî zêdetir li pêş bin. Di civateka weke ya kurd de ku xwediyê dîrokeka pîr demdirêja jî, wê ev yek heta ku ew li jîyane hebê bi temen wê bidomê. ..

Ez, divê ku vê jî bibêjim ku di civateka hemdem de, wê di sê xalan de referansên di temenê pêşketina rewîstî de wê hebin. Fêr û cerbên dema berê, pêşketin û pêşveçûnên dema nû û rêgezwarîya civatî, destûrî û hwd a.

Di destpêka wê ya pêşî de, ku weke xale pêşî jî ku mirov dikarê werêne ser ziman, wê fêr û cerba wê ya dîrokî û demên wê yên buhurî wê hebê. Ev, wê di demê de temenê pêşketina wê ya demî jî bin. Li gorî wê wê destûr û hwd, werina nivîsandin û afirandin. Piştê li gorî wê, wê rewşên nû ên ku hin bi hin di afir in jî, wê hilde nava xwe û biwê re dem bi dem xwe li gorî wê pêşbixe. Rûdawên nû, wê temenê guharênê bin. Ev jî, wê rewşên demê hin bi hin di nava wê de, bicih bike û weke rêgez û destûrên jîyana nû bi destûrî derxe li holê. Ya ku, wê guharandinê bi demê re di jîyane civatê de bi xwe re bîne jî ev bixwe ya. Her rêgez, bi serê xwe nabê weke teherekê. Lê her rêgez, beşek ji teherê bixwe jî ya. Pîrralîtiya jîyane civatî jî di vir de xwe dide dîyar kirin. Bi vê kifşkirin û pêşketinê re wê, dema nû xwe nas bike û rêgezên xwe yên nû biafirêne. Lê wê di temenê wê de jî, weke dîmenekî wê fêr û cerb wê hertimî hebê.

..

Vac,

jîyan

û zanîn ..

Beş pênc; darêjka vacê: Jîyane ku em bi wê dijîn, berî hertiştî giringiya wê bi zanebûna me re ew a ku dibê temenê pêşketina wê ya bihişarî. Li vir, dema ku em bahse vacê dikin, divê ku em bi wê dîmenekî

jîyanê bi xwezaya wê re kifş bike. Ev dîmen, wê bi rengê wê yê xwezayî ê jîndayî û rewşî û hwd bê. her rewş, bi xwe re û bi bûyîna xwe re, piştî dîmenekî diafirêne. Yê ku wê rewşê dijî em mirov in. Bi teybetî, ya ku wê bi me re dijî jî mejiyê me ya. Mejî jî, rêyên wê hildinê bi dîtin, hiskirin û hwd, bi biyên me wê dike. Ev rêyên hildanê û ankû gihiştinê, rêyna giring ku di temenê wê pêşketina me de na. Têkiliya mejî û rewşê bi derahî, bi teybetî di temenê têkil danînê de ya. Têkilî, pêşî wê temenê me bê. Piştî jî, li ser wê re hiskirin û bi wê re jî fahmkirina ancama û sedemên wê, wê bi wê hişîya mirov re biafir in. Afirandin li vir, ew a ku ew kifşkirina me ya bi hiş a. Yanî, bi gotinaka din jî, hiskirina mirov a.

Li vir, di dema ku em ev hildan kir, du rewşên pîr giring ên ku divê ku mirov wan hem bi yek bi yek kifş bike û li ser bisekinê û hem jî bi hev re li ser wan bisekinê hena. Ew jî, yek; ew rewşa bi bidîmen bû ku di xêva me de ya û ya din jî rengê wê yê ku afirî ya ya. Li ser hevdû aliyan re wê têkilî were danîn. Di dema ku em em bahse vacê bikin, divê ku em ji bîr nekin ku rengê wê yê ku heyî û ankû birewşê re afirî, wê temenê afirîna vace me ya jîyanî jî bê.

Ji aliyê pêşî ê yekemin ve vac di ahangê de têkiliya li nava rewşa pêşî ya duyemin re bi fahm bikirina wê re dike temen ji xwe re. Lê di rewşa duyemin re reng û awayê awayê rewşê ji xwe re dike temen. Li vir, dema ku em bahse aliyê duyemin bikin, divê ku em hinekî jî bahse nirxîtiya wê bi awayekê wê kirdeyî bikin. Li vir, ya ku wê ji me re giring bibe jî ev a di wê xale duyemin de. (ku ji =çerçova= darêjka rewşê afirî)Kirdeye rewşê, xwe bi nirxandina wê re dide li der. Li vir, ew kirdeya wê ya teybet, bi têgihiştina hiskirina rewşê re xwe dihêne li holê. Hiş, di dema ku em lê dihizir in, bi teybetî, têgihiştina bi rewşê re ya. Em vê yekê, weha jî dikarin bibêjin ku aqilê me yê ku rewş hiskiriya ya.

Di aslê xwe de, di dema ku aqil hizir kir û rewş bi dîmen jî kir di xwe de, ku çendî em bibêjin jî ku ew kirdeya rewşê jîya, lê aliyekî wê hizirkirinê ê xwemalî jî heya ku divê ku mirov bi teybetî li ser rawastihê..

Aqil, çend ku di dema ku bihisikirina rewşê re diafirê û wê dike jî, piştî jî, bi hiskirinê re ew dîmenîya ku afirî, em nikarin bi tememî bi wê rewşa ku ew hiş jî wê afirîya bi wê bîna ser ziman. Ji ber wê xwemalîtiya wê. Li vir, ew xwemalîti, bi teybetî bi aferîndêriya mejî re mirov dikare ji aliyekî wê ve bîna ser ziman. Lê ji wê zêdetir, li vir, em dikarin bibêjin ku ew hiş, piştî ku afirî ji rewşê, piştî wê bê têgihiştinek û ew têgihiştin wê hiskirinê jî di derbarê xwe de bide çê kirin. Ev jî, wê

êdî wê weke pêpeloka duyemin wê pêvajoya hişkirina wê derxe li holê. Em ji vê re dikarin bêjin hişkirina hiş jî. ..

Li vir, rewş, piştî ku afir in, êdî piştre, mejî, wê di xwe de, wê bidîtnîya xwe re bihiş bike. Piştre jî, wê têbigihijê wê. Bi têgihîştina wê re, wê rewş, weke xwe nemêne di mejî de. Rewş, wê, wê piştre weke çerçoveya mejî jî wê awa bistêne û wê xwe bike nirxekî darêjkî ku hatî afirandîn. Darêjka rewşê, bi teybetî, wê temenê wê pêşketina hişê pêşî bê. Piştre, wê ew jî, bi xwemalîya xwe re, êdî darêjkê bide afirandin. Ev jî, aliyekî xwemalî ê nû ê mejî ya.

Li vir di vê rewşê de vac, di dema ku em bahse wê bikin, divê ku em bibêjin ku dîsa divê ku em vegerihîna wê ast û care pêşî ku rewş bûya û ji wê hiş bûya. Rengê ku bi wê rewş bûya, ew wê di temenê pêşketina vacî de bê. Vac, aliyekî wê yê şenber heya ku divê ku em bi teybetî li ser bisekin in. Hertimî, şenberkirin, wê bi rengê wê re di temenê nirxandina bi vacê re bê.

Ev darêjka vacê ku em wê li jîyanê bicih dikin û piştre li gorî wê li jîyanê diner in, ew tenê ne weke darêjkeka ku pêşîya ji rewşa jîyanî tevdiqerihê, her wusa weke nirxeka xwemalî a mejî tevdiqerihê. Lê di kirdeya wê nêzîkatîya vacî de jî ew rewşîti weke darêjkê heya ku vac ji wê di her rewşê de û di wê rewşê de jî ku sûd digirê. ..

Piştî afirandina hişa vacê, wê piştre di temenê nirxîtiyekê de bi kirdeyî wê lê binerê. Mejî, wê xwemalîyê bi heyîna xwe re çê dîke. Mejî, piştre lê dinerê. Ku em rewşa xwe ya pêşî xwarina xwarê re salix bikin, emê li vir piştre her rewşên xwarinê, ku em lê diner in, emê bi wê re salix bikin. Lê piştre, ew xwarin, ne tenê bi dahûrîya dîtina xwarinê re, her wusa, bi rengê têj û awayê xwarinê re jî, wê xwe bi wate bike. Emê wan jî di mejî de bisalix bikin. Piştre jî, emê di wan temenan de jî biner in. Piştre jî, di dema ku me xwarin dît, emê, di wê temenê de li ser du awayan re li xwarinê bihizir in. Awayek, wê di temenê xwarin û kirina xwarinê de bê. Awayê din jî, her wusa wê di temenê reng, têj û hwd, ê wê de bê. Ev wê temene me yê xwarinê ê vacî jî hin bi hin bi xwe re bide afirandin.

Li ser têja xwarinê, minaq, ku ka tûja, tahla, şêrîna û ankû miza, wê salixkirina wê bê. Ev jî, salixkirina wan, wê bi wan re, bê salixkirina vaca me jî. Her salixkirin, divê ku em bibêjin ku dîmen û ankû wêneyekî vacî bi xwe re diafirêne. Li vir, êdî tîkiliya vacê û salixkirinê, mirov wê êdî bi zelalî bibîne.

Em li rojê dinerin, roj rohnîya û germa. Em li darê dinerin, dar şîn a û bi çiqil û pel a. Em li kevir diner in, kevir hişk û reş û ankû

rengêkî din a. Em li zaro diner in, zaro piçûk û hê balixnebûyî ya. Em li jinê dinerin, em teybetmendiye wê jîndayî vajî yê mêr dibînin û hwd, her wusa, gelek xosletên ku em dikarin wan li vir rêz bikin, di mejîyê me de bi dîtînen me re biwêna bûna. Êdî piştre, di dema ku yekî bahse darê kir, emê wê wêneyê bibîr bixin. Di dema ku yekî bahse kevir, emê wê wêneyê wê bibîr bixin. ..

Vacê me jî, weke hişê me, sînore wê bidîtîna û hişkirina me re ya. Minaq, dema ku me bahse darê kir û yekî bahse darê kir, emê wê dîtînen xwe yên berê bibîr bikin. Lê dema ku bahse cûreyekî darê kir, emê bibêjin ku me ew ne dîtîya. Bi gotînen ku me di derbarê wê çûreyê de bihistin, emê bikin ku wêneyê wê cûreyê di serê xwe de biafirînin. Bi wê re, emê biafirînin jî. Lê ji ber ku me bi we rê ew ne dîtîya, wê hertimî, gûmana me li ser wê aferîndêrîya me hebê. Ku kengî, piştre me ew cûre bi çavê xwe dît jî, emê hingî wê çêkerîya mejîyê xwe jî bibîr bikin û bi wê re bikina yek. Hingî, wê wêneyê wê çêkerîya me ku wê şenber dîke, wê bê ew dîtîna me ya wê cûreyê. ..

Bi wê dîtîna xwe re, emê hin bi hin bi nerîna me ya ku weke nîrxandinekê ya bi wê re, emê kêmesîyên wê wêneyê xwe jî temem bikin. Yanî, emê her dîtînen xwe bî wê re ji nû ve biafirînin. Ev ji nû ve afirandin, wê di temenê wê xwemalîya mejî de bê. Piştî ku mejî, ew xwe afirandin da kirin, piştre, êdî ew weke çerçoveyeka têgihîştîna ya mejîyê me ya zelal heya. Êdî, ji vê pêvajoya û pêde, wê vace kirinî(pretîk) û ankû zanîna vacî pêş bikeve. Di vê temenê de, rengêkî bi hêza hizirkirinê re di wê temenê de diafirê, êdî di temenê jêvcûdakirina rewşan û kirinîya wan de, zanîna bivac pêşdixe û ser dixê bi mirov re. Zanîna vacî, hinekî jî, serdestîya mejî bi hizirkirinê jî dihêne ser ziman. Di vê temenê de, salixkirinê bi heyînê û rengê wan hatina kirin, serdestîya li ser teybetmendiye wan re, temenê zanîna vacî û pêşketina wê jî diafirîne. Ev jî li ser naskirin û şenberîyê re meşandina bi zanîna re diafirîne.

Vac, hinekî rengê jîyanê û bitêgihîştîna û zanîna ya. Salixkirina reng û cûrehîya jîyanê, di temenê naskirina wan reng û cûrehîyên wê ên jîyanê de bi naskirina wan re vac xwe bi wate dîke. Di vê temenê de vac, weke ku hinekî di temenê jîrbûna mirov de jî xwe bicîh dîke. Her wusa, serdestîya li cûrehîya jîyanê jî, di temenê xwe de, wê diparêzê. Jêvcûdakirin û naskirin, weke teybetmendiya zanîna bizanebûnê ya. Her cudahî, heyîn û şenberî û nasîna wê ya ku bi zanîna wê ku em di farqê de na re heya, rengêkî vacî jî bi xwe re dide li berçav. Bi vê rengê, di aslê xwe de vac, hinekî tekoşîna li ser salixkirin, naskirin

û şenberkirinê re bi nepeniyê re jî ya. Bi wê re jî, bi hev re levkirina wê jî, bi pergali pêşxistin, rengê pêşketina bi vacî a bi demê re dihêne li ser ziman. ..

Emê piştire bi wê çerçoveyê û nasîna wê ya hişî re li rewş û bûyarên din ên ku rûdidin biner in. Hingî jî, ew gotina ku hertimî kurd di nava civatên xwe de dibêjin ku "bizanîn binere!" jî, emê bi wate bikin. Ji ber ku temenê vê gotinê, ew çerçova têgihîştinî û nasîna wê ya bihişî ya. Bi wê re û li gorî wê em diner in. ..

Bandûr, ji tiştêkî dibê. Têkilî jî, bi tiştêkî û ankû yekî/ê re dibêt. Li vir, dema ku em bahse têkilî û bandûra wê bikin, divê ku em hinekî herina temenê têkilîyê û wê lê bikolin. Rewşa têkilîyan, bi afirîna wan re, bi heyîna wan re, xwe dihênina ser ziman. Lê di rengê têkilîyê de, ji aliyê bandûrîyê ve ku em hildina li dest û li wê sentetîkîya wê binerin û her wusa dema ku em ji aliyê wê têkilîya wê ve û dahûrîya wê ve hildina li dest, em divê ku bi awayekî ji bingihîna wê hildina li dest.

Bêgûman ku em bahse xêvê bikin, divê ku em ji bîrnekin û werênina ser ziman ku ceribandin û bandûr jî weke du gotinên ku divê ku em wan bi hiş bikin in. Ceribandin, di serî de, hinekî jî bi jîyane mirov ve girêdayî ya. Em di jîyane xwe de, dijîn. Di nava wê jîyanê de, em dibînin, dibihîzin, biyendinê û hwd dikin. Em seh dikin û bi wê sehkirinê re hişekê jî bi xwe re dibînin ku diafirê. Ev, hinekî jî, di dema ku em jîyan dikin, mejiyê me, wê dîtîne bixwe re qayd dike. Ev qaydkirina di xêvê de, cerbeka ku êdî em divê ku weke jîrekê û bi wê re weke têgihîştinekê ku dikarin werênina ser ziman a. Li vir, ew hildan li mejî û di mejî de çêkirina naqşaya rewşa ku hatî jînkîrn û bi xêvkirina wê, weke hinek pêvajoyên pêşketina mirov, divê ku mirov li ser wan bisekinê na. Lê bi vir ve jî, divê ku mirov bibêje ku cerb, ceribandina wê, hinekî li vir, piştî ku jîra wê di xêvê de afirî û pê de êdî bûyîna wê, divê ku em di temenê jîra jîrê de bikina bi şîroveyê de û şîrove bikin. Lê li vir, em weke ku du sadsalî berê John Locke digot, emê ne bêjin ku "berî cerbkirinê valahî bû ew xêva mirov". Li vir, divê ku em vê yekê bi teybetî bibêjin ku ew destpêka jîyane mirov ku mirov wê weke destpêka pêşketina mejiyê xwe jî, hildina li dest û ji wê pêvajoyîna li ser gotina 'rakendîtîyê' re bi wê re bidina destpêkirin û werênin ser ziman, emê li vir karibin bibînin ku her mirov bixwe jî, weke pêvajoyaka wê herîkîna bi xêvê re. Ev rewş, bi xêvê re weke rewşeka ku girînga ku divê ku em bi teybetî bi aqilê xwe re li ser bisekin in. Li vir, dema ku em di vê çerçoveyê de hildina li dest, em êdî divê ku zanîna xwe re bi cerb û hwd'ê, ku em dihildin jî, ji cerbê

zêdetir divê ku em hin wateyna werênina ser ziman. Dîmenîya hişmendî ku diafirê, di temenê wê de xêv û girtina wê heya. Bo vê yekê, divê ku em ji wir destpê bikin û hewl bidin ku werênina ser ziman.

Li vir, em li ser gotinê re, ku em pêşî bi gotin 'zanînê' re destpê bikin û werênina ser ziman, bi hişariya wê zanînê re têgihîştina ku diafirê, wê bi wê ew hişê ku derkeve li holê, wê piştê li bîra me bikeve. Ev, bi teybetî, di nava xêvê de rewşekê dihêne li holê. Li vir, ew bîrkin, di temenê wê de ew xêvîya ku heya, ku li ser wê re bîrkin bû, em divê ku wê bîrkinê ne tenê bi rengekî hildina li dest û fahm biikin. Di bîrkinê de, hişkirin û hişarî bi hevdu re hena. Li vir, bîrkin, bi aqilê mirov re jîreka mazin ya ku êdî em dikarin li ser wê re xwe jî werênina ser ziman a. Xêv, li vir, bo jîyane me ya ku êdî di wê de zanîn pêşketîya weke temenek û ankû bingehekî ku li ser wê jîyan pêşketîya ya. Di vê çerçoveyê de, dema ku em binerin, em dibînin ku hişkirin, ji ya ku em dibînin bêhtirî weke dîmenekî têgihîştî û bihişar wê derkeve li ber me. Di temenê wê de jî, xêv heya. Lê hişkirin, çend ku gotina bîrkinê dihêne bîra me jî, divê ku em bibêjin ku weke kirdeyeka wê ya vêşartî, rengekî hişarî bi xwe re û bi me re didêt têgihîştin. Bîrkin, zêdetirî, jiberkirinê û di hiş de hiştinê dihêne bîra me. Lê hiş, bi serê xwe de hişariyeka têgihîştî dihêne bîra me. Hişkirin, herî zêdetir, weke ku di çerçoveyeka kevneşopîyekê de di nava kurdan de hertimî lê dihat nerin emê lê binerin û emê ji gotina **'kifşkirina bitêgihîştî'** dûr neyênina ser ziman. 'Bihîş be!', weke ku çawa ku divê çerçoveyê de weke gotinaka xalkê ku bi gotina 'hiş' re dihê ser ziman, her wusa 'bibîr ke!' jî bi gotina bîrê re dihê ser ziman. Lê li vir, ku em li ser van herdû gotinan re herin, em divê ku hinekî ji hevdu cuda şîrovekirinê destpê bikin. Bi hiş be!, beremberî gotina 'bizane be!' tê. Yanî, fahm bike. B vê yekê re, têgihîştinek û hişmendîyek di wê de heya ku hewl bide fahm bike. Yanî, aqil biafirêne di serê xwe de bi hizirkirinê re. Di vê temenê de, nêzîkatîyaka aqilî ya bihişariyeka dîtinî re xwe dihêne ser ziman. Lê gotina bîr, wê têgihîştinê dide me ku weke ku hişekî ku berî hebe û wê hişê bibîr bikê, têgihîştinekê û hizrekê bi me re çê dike.

Di vê temenê de, divê ku em bibêjin ku gotina bîrê, hinekî li vir, bi wê rewşa ku gotina xêvê ji xwe re dike temen û li ser wê re dijî û xwe dihêne ser ziman re, aliyekî gotina hiş'ê jî dike balgih ji xwe re û bi wê re dijî û xwe dihêne ser ziman. Li vir, em divê ku vê yekê bibêjin ku hişkirin, kifşkirinê jî bi hizirkirinê re di hundurê xwe de weke kirdeyeka vêşartî dihawêne. Em divê ku vê yekê jî dibînin ku bi dîtin û fêrkirina bi

wê dtinê re xêve me tişî bûya. Bi wê re, bi demê re êdî xwe bi demê re pêş dixê. Li vir, ew afirîna bi xêvê re ku dibe, di temenê wê gotina bîrê de xwe dide dîyar kirin. Xêv, berhema temenê a afirande ya. Ev temen, divê ku mirov bi wê re werêne ser ziman ku temenê gotinên hişkirinê diafirênin. Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku xêv êdî bi wê heyîn û afirande ya xwe ya ku heya re nerîn û dîtina me ya ku bi dîtinê re digrê jî, bi bandûr dike. Êdî li vir, ev weke pîrsekê derdikeve li ber me ku ew nerîn û dîtine me ya dîtinê a dervayî, çendî zelal û safî ya ku em bi wê bi xwe re digrin.

Em, divê ku vê yekê bibêjin ku piştî ppêvajoyaka xêvî re temenê jiberkirina bi mejî re diafirê. Jiberkirin, ew a ku dema ku mirov bi nerîna xwe bibîne û jibînekê û dema ku guhdar kir, weke ku guhdarkirî ku di hiş de bihêle û piştîre ku karibê weke wê dubarîyê werêne ser ziman. Ev, weke xwe girtin, hinekî jî, bi hişarîya çerçoveya wê rewşê û ankû binetera ku hatî xwandin û mirov jî bihîstî ve jî girêdayî ya ku divê ku mirov li ser wê bisekinê. Li vir, pêkera hişarê, weke aliyekî giring divê ku mirov wê hildina li dest. Hişarî, hinekî li vir, dibê hişarîya di derbarê hişarîya ku afirîya de. Yanî hişara hişarê ya. Li vir, hişarkirin, xêvê me ji temen ve dixwezê. Ev jî, weke aliyê giring a ku divê ku mirov li ser sekinê. Heta ku xêv negirê, wê nikaribê bihişar bike û piştîre jiber jî bike. Ev, weke pêvajoyana ku bi hevdû ve girêdayî na. Hiş, li vir, weke gotina ku di temenê ya hişarê de ya, dema ku em li wê dihizirin, em dibînin ku bi hebûna xwe re wê zanîna ku dixêvê de afirîya dihêne ser ziman. Lê ne tenê ew a. Ji wê zêdetir, hinekî aliyekî wê zanînê bi hişkirina wê re dihêne ser ziman. Yanî, hiş, di vê rewşê de weke ku kirdeya wê zanînê ya ku bi temenê pêşketina hişarê diafirêna ya.

Abdusamet Yigit/Kurdistan(Cizîra bota)/2013
